Berteka ku hûn ê bidin rêberan wê pêşeroja we çawa diyar bike?

Hatiye rewîzekirin & Hatiye guncavkirin

# DI BIN RAYEDARIYÊ DE

JOHN BEVERE

Nivîskarê pirtûka *"Kuştina Krîptonît"*ê yê ku pirtûkên wî pir tê firotin

Dostê Min yê Delal,

Mirovên ji armanc û sêwirandina ku Xweda ji bo rayedariyê diyar kiriye, fêhm nakin; li her deverî êşê dikişînin. Ji bo Xweda her rewşa me ya baş derxîne holê û ji bo em xizmetê ji Wî re bikin, bi armanca bi şexsiyeta xwe bi pêş bixin, wê xwedî bikin û bi şikil û şemal bikin, em fêhm nakin ku hem rêberên baş û hem jî yên xerab bi kar tîne. Gava me kifş kir ku Xweda em afirandine ji bo em bi rayedariyê di nava têkiliyê de bijîn, serokên me çi dikin jî bila bikin, em ê têkevin wê rewşê ji bo ku em bigihêjin başî, parastin û xweşiyê.

Banga ku ji aliyê Xweda ve li we hatiye kirin, li ber we ye. Gava we îteata kesên ku rayedariya wan li ser we ye heye hilbijart, hûn banga ku Xweda ji bo we diyar kiriye fêhm bikin û hûn ê hilbijêrin ku vê bangê ava bikin.

Ev pirtûk xelateke ji bo we ye. Netirsin û parve bikin ku hûn van şîretan li bawermendên pêdiviya wan bi heman teşwîqê heye, bikin. Yeka din jî ji bo gelek çavkaniyên ku jiyanê diguherînin û ji bo hûn wan bi zimanê xwe bixwînin û li ser wan bixebitin, hûn dikarin seriyekî bidin malpera MessengerX.com'ê.

Ji bo hûn bibin kesên ku mîsyona Rebê me yê bêhampa bi cih tînin, ez duayan dikim.

Birayê we yê bi Mesîh re





MessengerX

John
JohnBevere@ymail.com

Messenger INTERNATIONAL

# DI BIN RAYEDARIYÊ DE

**Berteka ku hûn ê bidin rêberan wê pêşeroja we çawa diyar bike?**

**JOHN BEVERE**

**Under Cover** by John P. Bevere, Kurdish Latin
© 2025 Messenger International
MessengerInternational.org
Originally published in English as Under Cover

Additional resources in Kurdish Latin are available for free download and video streaming at **MessengerX.com** and on the **MessengerX** App
To contact the author: JohnBevere@ymail.com

This book is a gift from Messenger International and is
NOT FOR SALE

**Di Bin Rayedariyê de.** Nivîskar John Bevere, Kurdî Latînî
© 2025 Messenger International
MessengerInternational.org
Navê wê yê Îngîlîzî yê resen Under Cover

Hûn dikarin xebatên din yên John û Lisa Bevere yên ku bi Kurdî Latînî çapbûne ji malpera **MessengerX.com** û sepana **MessengerX'ê** belaş daxînin û online temaşe bikin.
Ji bo têkiliya bi nivîskar re: JohnBevere@ymail.com

Ev pirtûk xelateke xizmeta Messengera Navneteweyî ye û NAYÊ FIROTIN

Daxîne ji ser App Store
Werbigire ji ser Google Play

App Store, merqeyeke şîrketa tîcarî ya Apple Inc'ê ye ku li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û li welatên din qeyidkirî ye. Google Play û Google Play logo jî merqeyeke tîcarî ya şîrketa Google LLC'yê ye.

Ez vê pirtûkê diyarî kurikê xwe yê mezin
Addison David Bevere dikim.

*"Kurê şehreza bavê xwe şa dike".*
- Şîretên Silêman 10:1

Navê te tê wateya "Xweşewîstê mirov lê bawer dibe." Bêguman tu li gorî wateya navê xwe jiya û li gorî prensîbên di vê pirtûkê de tu meşiya. Bi hêviya ku tu nîmet û sozên Xweda yên herî dewlemend ji xwe re bike mîras û li ser rûyê Wî şewqa te berdewam bike.  Xweda temenê te dirêj bike û tu di jiyanê de her dem serkeftî be. Ez û dêya te, ji te  hez dikin û ji ber tu kurikê me ye em bi bereket in.

# NAVEROK


1. DI BIN RAYEDARIYÊ DE – DESTPÊK

1. PARASTINA XWEDA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 1

2. SEKNA LI HEMBERÎ HALET ZERARÊ DIDE TE! . . . . . . . . . . . . . . . 9

2.RAYEDARIYA XWEDA YA RASTERAST

3. GUNEH TÊ PÊNASEKIRIN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 27

4. HÊZA VEŞARTÎ YA BINPÊKIRINA QANÛNÊ. . . . . . . . . . . . . . . . . 39

5. ENCAMÊN BÊÎTEATIYÊ 1 . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 57

6. ENCAMÊN BÊÎTEATIYÊ 2 . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 69

7. SÊRBAZÎ. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 87

3. RAYEDARIYA KU XWEDA TAYÎN KIRIYE

8. XWEDA DIZANE BÊ RAYEDARÎ BI KÊ RE YE? . . . . . . . . . . . . . 105

9. JI QRAL RE RÊZÊ BIGIRIN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 121

10. RÊZGIRTINA DU QATÎ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 137

11. GUHDARÎKIRIN Û PÊVEGIRÊDAN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 159

12. AN RAYEDAR JI MIN ... BIPIRSIN? . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 175
13. MUAMELEYA NEHEQ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 197
14. DADWERIYA LI SER XWE . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 219
15. YEK . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 239
16. MÛXTELÎF . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 255
17. BAWERIYA MEZIN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 275
18. ENCAM . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 293

*PIRSÊN NÎQAŞÊ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 297*

1

# DI BIN RAYEDARIYÊ DE DESTPÊK

BEŞ 1

# PARASTINA XWEDA

*Gelek caran ne gotinên nerm, yên êşê didin mirov, azadî û parastina herî mezin bi xwe re ava dikin.*

Di bin parastinê de -ev gotin dibe ku li gelek rewşan bê. Bi gotina herî hêsan, rewşa zarokekî biçûk yê ku xwe xistiye bin germahiya betaniyeyekê û kiriye mal ji xwe re an jî di rewşeke bi talûke de ku xwe li pişt dê û bavê xwe vedişêre, dikare bîne ziman. Pênaseyeke vê ya fermî, dibe ku bajarekî di bin parastina polîs an jî leşkeran de be. Dibe ku heyvanekî di şkeftê de, di nav dêviyan de an jî di binê erdê de veşartî be, îfade bike. An jî mirov dikare weke malbateke ku gava li derve firtone radibe di bin banê mala xwe ya germ û ewlehiya wê de li kêfa xwe dinêrin, pênase bike.

Gava em zarok bûn em li herêmeke ku her dem lê firtone radibûn, dijiyan. Di şibakeyên xwe re me li ewrên reşî tarî yên li dûr ku bi berqan re diçûn û dihatin dinêrî. Di nava çend deqeyan de firtoneyê bi hemû hêza xwe em dorpêç dikirin. Bi vedana berqan re ji nişka ve dengê ewran pê re dihat. Dengê baranê weke çakûçên biçûk ku li banê me bikevin, dihat. Ya rastî bi xêra firtonê mala me

hîn bêtir xweş û ewle dihat hîskirin. Her tiştên li derveyî şibakeya me şil û sar bû û her kêlî di bin talûkeya ku wê berqek lê bixe de bû. Lê em di hundur de di nava ewlehiyê de bûn û banê li ser serê me, em ji zordariya firtonê diparastin. Em di bin parastinê de bûn.

Em hinekî din bibin bi pêş ve, em dikarin bi vê îfadeyê re termeke ku tê heman wateyê bibînin: *ya veşartî.* Ev term, ewlehiya nasnameyên veşartî pênase dike. Ajanekî veşartî, bêyî ku ji aliyê dijmin ve bê girtin, dikare bi azadî tevbigere. Dewleta wî, ew bi navekî sixte veşartiye û li cih û warê dijmin ajanek e ku dikare bi serbestî bigere. Bi kurtasî, eger em vê peyvê an jî îfadeyê bi awayekî herî berfireh bi kar bînin jî, hemû di xwe de *parastin û azadiyê* dihewîne.

Lêbelê îfadeya di bin parastinê de wê ji bo Xirîstiyaniyan çawa derbasdar bibe? Dawid wisa dinivîsîne: “Yê ku, li stara Yê Herî Berz rûdinê, Wê di bin siya Karîndar de aram be. Ez ji bo Xudan dibêjim, «Ew birc û stara min e, Ew Xwedayê min e, ez bi wî ewle me.»” (Zebûr 91:1-2). Dîsa em dibînin ku kesên di bin parastina Wî de ne tên parastin. Bi vê yekê re, ji îfadeya “...yê rûniştî” ya di serî de, em vê pirsa girîng kifş dikin: Yê di bin parastina Wî de kî ye? Ev pirtûka di nava destên we de, lêgerînek e ji bo vê pirsa herî girîng. Eger bi kurtasî bê gotin, kesê tê parastin ew kes e ku di bin rayedariya Xweda de ye.

Adem û Hewa, li bexçeyê di bin parastina Xweda de li tahma azadî û parastinê dinêrîn. Lêbelê kêliya ku bêîteatî kirin, xwe dîtin ku pêdiviya wan bi tişta ku bi dilê xwe dikirin heye. Ev pêdivî “nixumandin” bû (Desrpêk3:7). Ji ber ku li hemberî rayedariya Xweda bêîteatî kirin, mirovên ku demekê ew tahma azadî û parastina şirîn ya ku tahm kiribûn, jê mehrûm hiştin.

Em bipejirînin. Rayedarî ne peyveke populer e. Lê dîsa jî ji ber ku em wê red dikin an jî jê ditirsin, ew fêde û parastina mezin ya ku rayedarî ji me re ava dike, em wê piştguh dikin. Em dicefilin, ji ber ku em vê bi nêrîna Xweda nabînin. Gelek caran helwesta me ya

li hemberî rayedariyê, bûyereke ku em bi kurikê xwe yê sêyem re jiyan, tîne bîra min.

Gava ku Alec dest bi lîseyê kir, bi mamosteyekî xwe re tiştekî nexweş tecrube kir. Mamosteyê wan yekî bihêrs bû, bi awayekî cirnexweş û ji kontrolê derketî her dem bi xwendekaran dixeyidî. Alec gelek caran xwe di nava van hêrsbûnên wî de didît, ji ber ku li şûna ku bêdeng bimîne her dem dipeyivî û xortekî afirîner û enerjîk bû. Ji bo wî dibistan cihekî bêhempa yê civakîbûnê bû. Lêbelê ji ber şexsiyet û bêsebra vî mamosteyî, ne hewce ye ez bibêjim ku ji dibistanê sar bû.

Gelek caran ez û xanima xwe piştî dibistanê ji bo em bi mamoste re biaxivin, em çûn odeya wî. Bi şêwirmendiya mamoste re, me Alec teşwîq kir ku li gorî rê û rêbazan tevbigere lêbelê ev pêvajoya bi stres hezkirina wî ya li hemberî rewşa akademîk, kulek hişt.

Piştre me mala xwe bir eyaleteke nû û Alec dest bi pola duyem kir. Vê carê mamosteyeka wî ya pir cuda hebû. Yeka pir kîbar bû û ji bo bextewariya xwendekarên xwe heta tu bêjî bes yeka nazik bû. Difikirî ku Alec yekî pir şirîn e û ji ber rûkeniya wê bêguman Alec bibû dilketiyê wê lê ji ber vê ji dersên xwe ma û kêm tiştan hîn bû. Alec weke ku ji perwerdeya akademîk dûr diket ji ber vê me ew li dibistaneke bêhempa ya taybet ya ku aliyê akademîk derdixist pêş, qeyd kir.

Li wê deverê xwe weke ku winda bûye û xeyal şikestî hîs dikir. Her du salên pêşî di nava xwendekarên ku pir zû hîn dibûn de cih girt. Îcar aniha mamosteyekî wî yê baş, nazik lê bi disîplîn hebû. Piştî demeke kin ji aliyê akademîk ve diyar bû ku ji xwendekarên din kêmtir e. Dîsa em bi mamosteyê wî re gelek caran kom bûn lê vê carê me civînên bi kêrhatî pêk anîn. Ez û Lisa em hîn bêtir tevlî xebatên wî bûn.

Piştî ku heta êvarî mirov têkeve dersan û îcar êvarî jî dê û bav li ser serê mirov bisekinin, dibe ku ev rewş mirov pir aciz bike. Gelek caran Alec vedikişiya qorziyekê û bi tena serê xwe dima. Gelek

caran digiriya, ji ber ku ya rastî her çiqasî pêşketin çêdibû jî weke ku bêhna wî diçikiya, xwe hîs dikir.

Rojekê ji aliyê hestiyarî ve têk çû. Birayên wî wê biçûna şahiyeke dibistanê lê ew mecbûr bû li malê bimaya û spartekên nîvco yên li ser masê li benda wî bûn, çêkirina. Ji ber spartekên ku mamoste dabûnê, ji hemû şahiyê dima! Ji bilî girî tu tişt ji destên wî nedihat. Dem hatibû ku bav û kur axaftineke nû bi hev re bikin. Piştî çend gotinan bi hêsanî min pirsgirêk dît. Li gorî wî tu hêvî di tu tiştî de nemabû. Hêsirên weke baranê dibarandin û gotinên bavê xwe nedibihîstin. Demeke me herduyan jî ya ku em bêdeng man çêbû. Serê xwe danî ser maseyê û bû kûrekûra giriyê wî.

Pîştre tiştên ku qewimîn ez ê tu carî ji bîr nekim. Ji cihê xwe serê xwe rakir, hinekî aram bû û çavên xwe paqij kirin, dû re bi wan çavên xwe yên mezin ên qehweyî û yên çîkolatayî, bi awireke ji xwe bawer li min nihêrî. Diyar bû ku fikirek hatibû bîra wî, fikreke ku wê pirsgirêkên wî çareser bike û hêstirên wî rawestîne. Ew rûnişt û destên xwe li hev girêdan. Bi dengekî ji xwe bawer got: “Bavo, ez dixwazim tiştekî ji te re bibêjim. Tu Jessica’yê ya di pola min de nas dikî? Ew ji bijîşkan bawer nake.” Ew dudilî ma û dû re lê zêde kir: “Ez jî ji mamosteyan bawer nakim.”

Ji bo ez nekenim û henekê xwe pê nekim, min bi zorê xwe digirt. Bi vê gotina xwe bi awayekî pir ecêbmayî ez şaş hiştibûm. “Eger Jessica’ya di pola min de baweriya xwe bi bijîşkan neyne, ez jî baweriya xwe bi mamosteyan naynim.” Êdî min nikarîbû kenê xwe ragirim. Eger wî bi awayekî asayî bigota, wê ewqasî ne komîk bûya. Lê dengê wî cidî bû. Bi rastî jî difikirî ku ew hin eşkerekirinên nû bi min re parve dike ku dikare hemû pirsgirêkên wî çareser bike. Ew bi qasî kesekî ku li dadgehê şahidiyê dike cidî bû.

Helbet, min fersenda ku eger mamosteyên wî tunebûna bê wê li kuderê bûya jê re diyar kir û bi kar anî. Min jê re behsa dema ez çûm Angolayê ku li wir ji bo zarokên pirçî yên ku di stasyonên

xwarin û vexwarinê de dixebitîn, kir. Wan zarokan dikarîbûn gelek tişt feda bikirina ji bo lu di şûna Alec de bûna! Wê wan fersenda hînbûnê tu carî piştguh nekirana ji ber ku haya wan ji girîngiya perwerdeyê hebû ku rojekê bi xêra perwerdeyê wê alîkariya aboriya malbata xwe bikirina. Piştî daxuyaniya dirêj ya ku min jê re kir, bêdilî xwe dev ji felsefeya xwe ya ku nû kifş kiribû, berda û ji bo spartekên xwe yên ketibûn ser hev li maseya midbexê vegeriya.

Piştre heta çend hefteyan li ser vê axaftina ku min bi kurikê xwe re kiribû fikirîm û bi vê bûyerê re nêrîna hin mirovên li rayedariya ku nêrînan wan dişibiyan hev, min ferq kir. Gelek caran mirovan bi rayedariyên xwe re serpêhatiyên ne baş tecrube kirine: hin ji wan ji ber hişkbûna ne hewce ya rêberên xwe yên di bin siya wan de ne mane, hin ji wan weke Alec ya rastî her çiqasî xwediyê rêber û rayedariyên baş bin jî, hin ji wan ji bo xwe û xwestekên xwe ji ber ku tiştên herî baş yên ku jê bawer dikin û ev tişt ji wan re dibin asteng, bi rayedariyan re pirsgirêk jiyane. Di encama van tecrubeyên nexweş de, helwesteke bihêz ku divê bê ferqkirin, bi pêş ketiye: *Ez ji rayedariyê bawer nakim an jî bi îfadeyeke têgihiştî bê gotin, heta ku ez bi rayedariyê re ne di heman fikrê de bim ez ê pê ve ne girêdayî bim.*

Baş e, di vê meseleyê de bi giştî fikra Xweda çi ye? Her çiqasî rayedarî neheq bin jî gelo divê em bi ya wan bikin? Baş e îcar eger xurifî bin? An tiştekî ku em difikirin xelet e û ew bixwazin ku em vî tiştî bikin? An bibêjin ku em gunehan bikin? Xêz ji kuderê dikare bê kişandin? Ji bilî vê, em çima mecbûr in ku stûyê xwe li ber wan bitewînin? Fêdeya vê heye? Ma em hemû nikarin tenê bi Giyanê Xweda re bên bi rêvekirin?

Gotina Xweda, ji bo van hemû pirsan bersivên taybet dihewîne. Ez bawer dikim ku ev yek ji pirtûkên herî girîng e ku Reb ez peywirdar kirime ku ez binivîsim ji ber ku ev pirtûk sedema bingehîn a gelek zehmetiyên ku mirov di jiyanê de dijîn, vedibêje. Çi bû sedem ku hişt Lucifer bikeve? Serîhildan. Çi bû sedema têkçûna

Adem? Serîhildan. Çi dibe sedema ku gelek kes di rêwîtiya xwe ya bi Xweda re werin avêtin û gêrkirin? Serîhildan. Tişta ku divê em bi taybetî fêhm bikin ev e ku piraniya serîhildanan ne eşkere ne, ew veşartî ne.

Di vê pirtûkê de min mînakên têkçûnên xwe parve kirine. Ez ne rêberekî desthilatdar im yê merakdarê hêzê me ku dixwaze pezê xwe, karmendên xwe an jî malbata xwe bixe bin desthilatdariya xwe. Tîmeke min ya xizmetê û malbateke min a bêhempa heye. Û ez ne pastorê dêreke herêmî me. Ji ber vê yekê ez weke mirovekî ku gelek şaşî kirine an jî bi îfadeyeke baştir, weke zilamekî ku guneh kirine, dinivîsim. Min di salên 1980yî de di du mîsyonên navneteweyî de xizmet kir û ji van tecrubeyan min hemû mînakên xwe yên şaş derxistine. Tiştê ku di her rewşê de herî berbiçav e ev e ku min di dilê xwe de bawer kir ku ez di her rewşê de rast im, her çiqasî ez xelet bûm jî. Ez ji Xwedayê xwe re pir spasdar im, ji ber ku Gotina Wî niyeta min eşkere kir.

Daxwaza min a herî jidil ew e ku hûn ji zehmetiyên min ji xwe re dersan bigirin û ji heman xeletiyan xwe dûr bixin. Ez dua dikim ku hûn ji bêaqiliyên min dersê bigirin û têgihîştineke îlahî fêr bibin û jê sûd werbigirin. Ji ber ku tecrube û rastiyên ku di encama vê pêvajoyê de derketine holê hem sûdewar û hem jî bêhempa bûn. Dema ku min tobe kir, ez gihîştim aramî û bereketê.

Ez bawer dikim ku heman tişt dikare bê serê we jî. Dema ku hûn di vê pirtûkê de mînakên şexsan ji Pirtûka Pîroz bixwînin, wê ronahî li ser dilê we jî şewq bide. Hin xal wê tiştên ku hûn jixwe bi wan dizanin xurt bikin û yên din wê we azad bikin. Di her du rewşan de jî, ez dua dikim ku hûn peyva Wî bi dilxweşî bipejirînin, ji ber ku ji vê yekê armanca min ev e.

Dema ku em bi rastiyê re rûbirû dimînin, em dikarin bi du awayan bersivê bidin. Em dikarin weke kurê Adem Qayîn hêrs bibin û parastvan bin ku em guh nedin gotina ku pêdiviya me pê heye

(Destpêk 4). An jî em dikarin mîna Dawid dilnizm û dilşikestî bin dema ku em bi dijwarbûna Natan re rûbirû dimînin û bihêlin ku êş û tobekirin me bigihîne asta karakterê herî bilind (Samûêl II, 12). Werin em di vê mijarê de li dilê Dawid xwedî derkevin û quretiya ku wê me ji plana dabînkirin û parastina Xweda dûr bixe, red bikin.

Gava ku hûn hatin ser vê rêyê, ji bîr nekin ku gelek caran azadî û parastina herî mezin ne ji gotinên nerm lê ji yên bi êş tên. Dema ku ez zarokek bûm li polê di dorê de li benda derziya xwe bûm, hevalekî min ji min re got ku derzî pir diêşîne. Dema ku min ev bihîst, min biryar da ku bi her awayî ji derziyê birevim. Min bi du hemşîreyan re şer kir heta ku di dawiyê de bela xwe ji min vekirin. Piştre dê û bavê min ji min re gotin ku eger ez derziya jana zirav nebim bê wê çi bê serê min diyar kirin. Min berê bi çavên serê xwe dîtibû ku xwişka min ji ber pençeşêrê miribû, ji ber vê yekê min dizanibû ku dê û bavê min tenê dixwestin ku ez bêm parastin. Min dizanibû ku wê derzî hinekî biêşîne, lê bêguman wê rê li ber nexweşiyeke kujer bigirta ku vê nexweşiyê wê zêdetir êş bidaya min. Dema ku min ev yek fêhm kir, ez bi dilê xwe vegeriyam ku derziyê li xwe bixim.

Gava ku hûn di Gotina Xweda de li rastî rastiyên ku mirov aciz dikin, heta yên bi êş û bêparastinê hatin, vê mînakê bînin bîra xwe. Bizanin ku rêyên Bavê we yê Asîmanî bêkêmasî ne û tiştên ku carinan weke ku bi zerar in an jî bêmirês xuya dikin, di rastiyê de ji bo parastin, bereket an jî xelasiya kesekî din in ku Wî ev ava kirine. Qet ji bîr nekin ku hezkirina Wî ya ji bo me paqij, bêkêmasî û herheyî ye!

Berî em dest bi rêwitiya xwe bikin ka em duayan bikin:

*Bavê Asîmanî, gava ku ez di hebûna nava xwe de rehetî an jî zewqê dixwazim, ez hîn bêtir rastiyê dixwazim. Ji ber vê yekê, ez ji dil û can xwe dispêrim destên Te û dizanim ku rêyên Te bêkêmasî ne. Tu ji min ewqasî hez dikî ku Kurê xwe Îsa weke qurban dişîne bi hawara min ve ji bo ku ez*

*bikaribim bibim xwediyê jiyana herheyî. Eger Tu ewqasî ji min hez dikî, bêguman Tu dixwazî karê ku Te di jiyana min de dest pê kiriye Tu yê biqedînî. Dema ku ez vê pirtûkê bixwînim, ez ji Te dixwazim ku tu bi alîkariya Giyan bi min re biaxivî û rêyên ku Te ji bo jiyana min xwestine, nîşanî min bidî. Çavên min veke ku ez bibînim û guhên min veke ku ez Gotina Te bibihîzim. Îsa nîşanî min bide weke ku min berê qet nedîtiye. Ez ji te re di serî de spasdar im ji bo tiştê ku Tu yê bi gotinên xwe yên di vê pirtûkê de di dilê min de bikî. Bi navê Îsa ez duayan dikim. Amîn.*

BEŞ 2

# SEKNA LI HEMBERÎ HALET ZERARÊ DIDE TE!

*Zor ê ku mirov rêgezên qraltiyê bi hişmendiyeke demokratîk fêhm bike.*

Aniha dijwariyek li ber min e, dijwariyek belkî jî bêyî kerema Xweda ne mumkin be. Hewldana fêrkirina rayedariyê ya di cîhanekê de ku her diçe bêtir qanûnê nas nake. Ji ber vê yekê, piraniya tiştên ku min di vê pirtûkê de bi kurtasî anîne ziman wê li dijî pêvajoyên aqilmendiya civaka me bin an jî li hemberî wan li ber xwe bidin. Bi gelek awayan, em bernamekirî ne ku ji rastiyên bingehîn ên ku em ê li ser cuda bifikirin. Lê ev taqtîka Şeytanê ku dijminê canên me ye -bi nîşandana xerabiyê weke ku xwestekeke cazîb û baş be, bi nîşandana azadî û pîroziyê weke koletiyê me dixe bin desthilatdariya xwe.

Her tiştî wisa dest pê kir. Em bexçeyî bînin bîra xwe, metoda wî ewqasî baş xebitî ku ji wê demê ve neguherand. Ji ber vê em bi lezgînî tên hişyarkirin: “Birayên min ên hezkirî, neyên xapandin!” (Aqûb 1:16) û “Hûn li gor vê dinyayê nekin, lê belê bi nûbûna hişê xwe werin guhertin, da ku hûn fêm bikin daxwaza Xwedê – tiştên

qenc, meqbûl û bêkêmahî – çi ye” (Romayî 12:2).

Li gorî tecrubeyên min, Rojavayî di nava civakan de civaka herî pir li ber xwe dide ji bo peyva Xweda bi rastî nebihîzin. Sedema vê yekê bingeh e. Bi hişmendiyeke demokratîk têgihîştina prensîbên qraltiyê dijwar e. Demokrasî ji bo neteweyên cîhanê baş e lêbelê divê em ji bîr nekin ku Desthilatdariya Xweda di bingeha xwe de qraltiyek e. Ew ji hêla Qralekî ve tê bi rêvebirin û di qraltiyan de pile, rêzik û desthilatdarî heye. Raya giştî, hilbijartin an jî referandûm qanûnên Qraltiya Wî derbas nakin an jî bindest nakin. Qanûnên wî berevajî ku Hewa hatiye xapandin di bin bandora tiştên ku em bawer dikin ji bo me baş e, nabîne. Ji ber vê yekê, weke ku Samûêl “prensîbên padîşahiyê ji mirovan re şîrove kir û ew wekî pirtûkekê nivîsand” (Samûêl 1, 10:25), em jî hewce ne ku îro li ser prensîbên qraltiyê agahdar bibin, ji ber ku ew di civaka me de nayên zanîn.

Eger em hewl bidin ku weke bawermendên xwedî zihniyeteke çandî ya li dijî rayedariyê bijîn, bi gumana herî baş em ê têkevin rewşeke bêbandor û bi gumana herî nebaş em ê têkevin rewşeke bi talûke. Ji ber ku em xwe ji Çavkaniya jiyana rastîn vediqetînin, hem parastina me û hem jî bereketên me dikarin werin astengkirin heta werin qutkirin. Vê rewşê mirov dikare bişibîne dema ku Xweda şampiyoniyeke futbolê bi rêve dibe em bi beyzbolê dilîzin. Nimûneyeke din jî dibe ku ev be: weke mirov bêyî ku amûreke li ser ceyranê fîşa wê têxe pirîzê û hewl bide bişixulîne.

Îro roj eger em gelek caran bi rayedaran re li hev nekin, em dikarin bi rêya gilî an nerazîbûnê wan red bikin. Mane qaşo divê rêveberî “ya gel, ji gel û ji bo gel be” ne wisa? Ev û hişmendiyên din ên demokratîk ketine nav baweriya me ya Xirîstiyaniyê û gelek kesan ber bi rêya xapînok a xwerêveberiyê ve birine. Her ku ev rê berdewam dike, ew ji dijberiya rayedariyê wêdetir ve diçin û bi eşkereyî li ber xwe didin. Jixwe hin kes hene ku di asteke mezintir a nefretê de li hemberî rayedariyê disekinin ku hebûna wê bi temamî

paşguh dikin. Bi vî rengî, ew îxanetê li tirsa Xweda dikin û bi temamî winda dikin.

Lê nêzîkatiyeke ji van jî azadiya em lê digerin ava nake. Ji ber ku Nivîsên Pîroz wisa dibêjin:

> Heke guh bidin û xulamiya wî bikin,
> Ew rojên xwe bi qenciyê
> Û salên xwe di kêfxweşiyê de derbas dikin.
> Lê heke guh nedin, Wê bi şûr tune bibin
> Û ji ber nezaniyê bimirin.” (Eyûb 36:11-12)

“Ew”ê ku di van ayetan de tê behskirin ji bilî Xweda ne kesekî din e. Bala xwe bidin sozê: ji berdêla teslîmbûna di bin rayedariya Wî de rehetî û hebûn. Ya din, bala xwe bidin talûkeya desthilatdariya Wî ku em paşguh dikin. Azadiya ku em di berxwedana li dijî rayedariyê de lê digerin, ya rastî gava em îsyan dikin em wê winda dikin. Gotineke jina min heye: “Di teslîmbûnê de azadî û di serhildanê de dîlgirtin heye.” Ew ayetên ku me ji Eyûb xwendine baş kurteber dike.

Dibe ku hin kes wisa bibêjin: “Ez teslîmî Xweda dibim lê ez teslîmî mirovan nabim heya ku ez bi wan re ne di heman fikrê de bim.” Ew cihê ku terza me ya jiyanê û fikra dêrê ya xelet ku dikarin rê li ber me bigirin ev der e. Îteata me ye ji bo rayedariya Xweda, em nikarin ji îteata Wî li ser ne ferz kiriye veqetînin. Hemû rayedarî ji Wî tên! Guh bidin gotinên Nivîsên Pîroz:

> “Bila her kes bi ya hukûmeta li ser xwe bike; çimkî hukûmeta ku ne ji aliyê Xwedê ve ye tune û yên heyî ji aliyê Xwedê ve hatine danîn. Ji ber vê yekê, yê ku li hember desthilatiyê derkeve, ew li ber sazûmana Xwedê radibe û yên ku li ber radibin, wê dîwankirina xwe bînin.” (Romayî 13:1-2)

Di vê pasajê de gelek tişt hene ku mirov li ser bifikire û piştre em ê lêbikolin lê aniha tenê derbarê çend xalan de dixwazim şîroveyan

bikim. Berî her tiştî, hemû rêvebirên hene Xweda wan diyar dike. Rastî ev e ku tu kes bêyî haya Xweda nikare rêvebireke meşrû ava bike. Vê fikrê divê em di dilê xwe de bi cih bikin. Sedema zorbûna ku gelek kes nikarin vê rastiyê bipejirînin, ji ber ku van kesan rayedar û rêvebirên qebe, zalim, hişk an jî yên ne durust dîtine. Bi vê yekê re, divê em dîsa li gotinên jor bikolin: Ji me re tê gotin ku hemû rêvebir ji aliyê Xweda ve ne, nayê gotin ku hemû rêvebir xwedayî ne. Di navbera van her duyan de ferqeke mezin heye û em ê bi awayekî kûr li ser vê bisekinin.

Ya duduyan, îsyana li hemberî van rêvebiran, tê wateya ku mirov li ber rêkûpêkiya Xweda derkeve an jî îsyana li ber Xweda ye û kesên wisa dikin lêpirsînê tînin ser xwe. Divê em ji bîr nekin ku nivîskarê van gotinan ne rêberekî ku meraqdarê hêzê ye, ew Bavê Me ye, ji ber ku “Tevahiya Nivîsara Pîroz ji bîhna Xwedê ye” (Tîmotêyos II, 3:16). Gava ku ji aliyê mirovan ve xelet bê şîrovekirin, ev nayê wê wateyê ku ev ne ji aliyê Xweda ve hatine nivîsandin.

Her çiqasî ne razî bin ku bipejirînin jî, gelek kes xwe ne li ber rêvebiran, tenê li hemberî Xweda xwe berpirsyar dibînin. Kesên wisa difikirin, bi Kesê ku jê re dibêjin Reb re dijber dibin. Gotinên ku Îsa ji Saûl (Pawlos) re dibêje bînin bîra xwe: “Sekna li hemberî halet zerarê dide te” (Karên Şandiyan 9:5). Di dema Pirtûka Pîroz de cotkaran bi halet cot dikrin. Halet, ji şaxekî rast yê du metroyî yê darberûyê ku hatibû qeşartin an jî ji dareke din ya qewîntir pêk dihat. Ji bo gayên di ber halet de bajon hesinekî serî tûjkirî bi kar dianîn, hebû. Gayan teqez nikarîbû xwe li ber hesinekî serê wî wisa tûj ku êş dida wan, bigirtana. Ji ber vê, di dema Pawlos de ev gotin, ji bo pênasekirina li ber hêza xurt an jî rayedariyê ku belasebeb e li ber xwe bide, hatiye bikaranîn.

Em vê ya bi roja xwe re hîn bêtir têkildar bikin. Li şûna “halet” em bizmar bi kar bînin. Mirov li ber serê bizmarê tûj li ber xwe bide ne karê aqil e û wê bibe tecrubeyeke bi êş. Kesên li ber rayedariya

Xweda çi weke Pawlos rasterast li ber xwe didin û çi jî li ber rayedariya hatiye veguhestin nerasterast li ber xwe didin, wê xwe li ber serê bizmarê tûj ku belasebeb li ber xwe didin, bibînin. Gelek caran dibe ku ev bibe tecrubeyeke bi êş û dersek e ku gelek ji me weke min di rêyeke zor de hîn dibe.

## TECRUBEYA KU ÇAVÊN MIN VEKIR

Dema behsa êşê tê kirin, ez demekê tînim bîra xwe ku çavên min bi êş vebûn û li hemberî vê rastiyê sekinîn ku li hemberî rayedariya ku hatiye veguhestin ku di rastiyê de li hemberî rayedariya Xweda ye. Ji bo min ehmeqiya li ber bizmarên tûj wê weke bîranîneke heta hetayê bimîne.

Di nava salên 1980yî de ji dêreke navneteweyî ya mezin teklîfa pozîsyona pastoriya ciwanî li min hat kirin. Piştî min dua kirin û piştî erêkirina bêhempa, min ev pozîsyon weke xwesteka Xweda pejirand.

Ji ber ku berê tecrubeya min ya xizmeta ciwanî tunebû, min barekî giran li ser pişta xwe hîs kir lêbelê min xwe weke parçeyekî ji dêrên herî bi bandor û yeka ku li Amerîkayê pir zû mezin dibe, dît. Min dest bi xwendina klavûz û pirtûkên derbarê xizmetên ciwaniyê de kirin û min hemû daqurtandin. Yek ji wan pirtûkan ji aliyê pastorê biqidem yê ciwaniyê ku li dêrekê xwediyê bernameyeke bêhempa ya ciwaniyê ya Louisiana’yê bû, hatibû nivîsandin. Min ji sekretera xwe xwest ku li wan bigere û ji bo du rojan bi wê komê re demê derbas bikim, bê dema wan heye an na. Rêberan ez bi dilnazikî pêşwazî kirim û me dîroka hevdîtinê diyar kir.

Piştî em gîhan wir, wê êvara çarşembê ez birim civîneke ciwanan. Ez şaş mabûm. Odîtoryûma wan ya ciwanan ya ji 1500 kesî pêk dihat hebû û hema bêje tije bû! Bi lîstikê nedilîstin an jî peyamên hêsan û lihevkêr nedidan, peyamên wan li ser pakbûn û hêzê bûn. Bi ser de jî ciwan di esasê xwe de ji ber ku li wir bûn bi kelecan bûn. Ez pir bi kelecan bûm û ji bo hîn bibim, min bawer kir

ku min koma rast hilbijartiye.

Roja din, ez û rêberên dêrê em li hev civiyan. Dîsa min ji tiştên dîtin, bawer nekir. Avahiyên wan ya rêveberiya ciwanan hebû, du asîstanên ciwanan yên îdarî yên tam wext dixebitîn hebûn û çar pastorên ciwanan yên tam wext dixebitîn, hebûn. Her du rojên xwe yên din min bi her çar pastorên ciwanan re derbas kirin û bi wan re tevlî civînan bûm. Îstatîstîkên didan, serê mirov li ser wan disekinî. Wan deman di xizmeta lîseyê de 1250 kesên gihîştî yên ciwan hebûn û bi awayekî ecêb her diçû gelektir dibûn.

Her çar pastoran jî heman tişt ji min re gotin. Serkeftina xizmetê, her în li her çar aliyên bajar ji ber “partiyên” ku li sedan cihan çêdikirin, pêk dihat. Ya rastî partî ji bo ciwanan xelas bikin, komên ku li malan dixebitîn ava dikirin.

Konsept têra xwe hêsan bû lê kûr bû. Ciwanên nerizgarkirî ku mirov wan bibe dêrê dijwar e lêbelê ji bo mirov wan bibe şahiyekê hêsan e. Di nav hefteyê de, her endamekî koma ciwanan dihat teşwîqkirin ku kesekî li dibistanê hedef bigire û wan roja înê bi şev vexwîne şahiyê. Dema ku ew digihîştin wir, ew ê wext bi xwarin, civakîbûn û muzîka Xirîstiyaniyê ya hemdem derbas dikirin, piştre rêberê ku xwendekarê lîse an jî zanîngehê bû, nîqaşeke komî ya li ser bingeha Pirtûka Pîroz ava dibû bi rê ve dibir ku wê axaftin ber bi xelasiyê ve bibira. Piştre ew ê ji temaşevanan re derfetek çêbikira ku jiyana xwe ji bo Îsa bibexşînin. Di encamê de, gelek mêvanên ku cara pêşî hatibûn bawerî pê dianîn. Wan kesan xwe dida aliyekî, li ser girîngiya hevaltiyê û dêrê şîret li wa dihat kirin, nav û agahdariyên têkiliyê didan hev û ew ji bo xizmetên ciwanan ên roja çarşemê bi şev dihatin vexwendin.

Ez beşdarî partiyekê ji wan bûm û min dît ku hin xwendekar jiyana xwe ji bo Îsa feda dikin û vê yekê îlham da min. Ez vegeriyam dêra xwe û tiştên ku ez fêr bibûm min bi alîkarê xwe re parve kirin. Piştî duayê, me hest kir ku em ê bi koma xwe re jî heman tiştî bikin.

Yeka din jî min vîzyona xwe roja yekşemê piştî xizmetê bi kelecan bi pastorê herî mezin re parve kir. Wî min teşwîq kir, “Pir baş e. Bike!”

## PLAN Û XEBATA HEYŞT MEHAN

Gava min dua dikirin, Xweda planek li ber min xist. Ji bo rêberê xwe amade bikim, di cih de min poleke rêbertiyê vekir. Min ev şeveke sêşemê ji hemû koma ciwanan re ragihand û bi awayekî jê razî, heftê kes ji wan sibeha yekşema din hatin dersa rêbertiyê. Min ê di şeş mehên pêşiya me de her hefte rêgezên rêbertiyê yên weke dilsozî, durustbûn, bihevgirêdan, xizmet û vîzyon hînî wan bikira.

Piştî pênc mehan, gava dîsa min dua dikirin Reb bi dilê min re axivî û wisa got: Ji civanên pola rêbertiyê bîst û çar kesan hilbijêr û wan weke xwendekar perwerde bike. Ji nava wan tu yê rêberên pêşî yên partiyan hilbijêre. Min ev rêber di cih de ji bo malên pêşî perwerde kirin.

Di du mehên pêş de, min rêberên ji bo şahiyên komên malan amade kirin û min vîzyona şahiyan şeva sêşemê bi şev ji koma ciwanan a sereke re waz kir. Ez û pastorê alîkarê xwe li ser gelek hûrguliyên weke mufredat û cihê şahiyan, dabeşkirina bajêr ya li gorî herêmên dibistanan û qodên postayê, bê wê kom çawa berfireh bibin û şopandina wan wê çawa bibin, sekinîn û me çareser kirin. Em bi motîvasyona ku em ê xwe bigihînin giyanê kesên winda, em bi motîve bûn.

Her kes bi kelecan bû. Vîzyon ji rêberan ber bi karmendên birêkûpêk ên di xizmeta ciwanan de hatibû. Ciwanan ji niha ve qala kesên pêşîn dikirin ku dixwestin vexwînin şahiyên xwe. Ji bo Xweda têkeve dilê beşdaran, ji bo Îsa pêdiviyên wan bibîne û ji bo bi baweriyê pîroz bikin, me dua dikirin. Min û alîkarê xwe xeyal dikir ku wê salona me ya baweriyê bi 2500 ciwanan di şevên sêşemê de tije bibe. Ya rastî, em bi vîzyon û coşê bi ser ve diçûn.

## CIVÎNEKE EZ Ê TU CARÎ JI BÎR NEKIM

Berî ku şahiyên pêşî dest pê bikin bi sê hefteyan, gava ez çûm civîna heftane ya pastoran, tişta ku min di wê civînê de bihîst ez jê re ne amade bûm. Di civînê de serpastorê me ji yazdeh pastorên alîkar re ev gotinên ku ez hilweşandim, kirin: “Gelî camêran, Giyanê Pîroz nîşanî min da ku berê vê dêrê ne li amadekirina komên malan e. Ji ber vê ez dixwazim endamên ku li malan civîna komên biçûk amade kirine, wan petal bikin.”

Min ji tiştên bihîstin bawer nekir. Divê xete an jî şaşiyek bûya ev. Gava min hewl dida ku tiştên diqewimin fêhm bikim, di nava wê matmayînê de çavên min û alîkarê min ketin hev. Min xwe bi vê fikrê re dixapand: *Bêguman behsa ciwanan nake...* behsa pastorên din dike. Pastorê bekar, yextiyar, hevjînan û komên yên din hebûn lêbelê rewşa wan ne baş bû û di rastiyê de ne di nav zîqbûna xizmeta wan de bûn. Yên wan bêtir “komên eleqeyên” bûn ku yên me ji aliyê dîzaynê ve diketin nav karaketerên mizgîniyê. Ya din jî berî çend mehan li otoparkê ez û serpastor derbarê vîzyona min de em axivîbûn û gotibû “Vê yekê pêk bînin.” Ji ber vê min digot xizmetên ciwanan nakevin nava vê birayarê.

Min nema karîbû xwe bigirta. “Biborîne pastor. Hûn xizmetên ciwanan naxin nava vê biryarê ne wisa?”

Li min nêrî û wisa got: “John, Giyanê Pîroz nîşanî min da ku berê vê dêrê ne ber bi komên malan ve ye.”

Ez dîsa peyivîm: “Pastor, tê bîra we berî çend mehan ez bi balafirê çûbûm koma civanan ya li Louisiana’yê? Di komên ciwanan de 1250 xwendekarên lîseyê hebûn. Her çar pastoran jî gotibû ev ji ber komên li malan çêdibin pêk tên.”

Serpastor li min nihêrî û heman tişt got: “John, Giyanê Pîroz nîşanî min da ku berê vê dêrê ne ber bi komên malan ve ye.”

Di hemû seranserê vê demê de ez fikirîm ku min fêhm nake ji ber vê min dengê xwe rakir û ez axivîm: “Pastor, ciwanên ku xelas nebûne

zor e em bînin dêra xwe lê hema bêje em dikarin her xwendekarê lîseyê bînin şahiyekê. Weke ku berê min ji we re diyar kir, ev komên malan di rastiyê de wê li ser kesên winda kûr û hûr bibe."

Dîsa dubare kir: "John, Giyanê Pîroz nîşanî min da ku berê vê dêrê ne ber bi komên malan ve ye."

Di rewşeke bi hestên hîn tîrtir de min îtîraz kir: "Lê Pastor, em dikarin odîtoryuma xwe bi 2500 xwendekaran tije bikin. Em dikarin xelasiya hemû ciwanên li Orlando'yê bibînin!"

Heman gotinên xwe dubare kirin.

Bi wî re li dor panzdeh deqeyan me nîqaş kir. Her kesê li odeyê hîs dikir ku ragêşiya di nava me de zêde dibe. Lêbelê ez bi şens bûn ku ji devê pastor tenê gotina ku jê bawer dikir Xweda jê re gotiye, derdiket.

Di dawiyê de min dengê xwe birî lê agirê di hundirê min de berdewam dikir. Min heta dawiya civînê tiştekî din nebihîst. Tekane tişta ez lê difikirîm ew bû ku em heşt mehan li ser vê yekê xebitîn. Wî dizanibû ku em vê yekê dikin, min çend meh berê jê re got. Wî çawa projeyeke bi wî awayî betal kir ku wê bi sedan, heta bi hezaran kesan bîne nav qraltiyê? Ew tevgera Xweda radiwestîne! Ez ê ji ciwanan re çi bibêjim? Rêberên nû dê çi bifikirin? Ez firiyam çûm Louisiana'yê. Çi dem û pereyekî pir zêde lê çû! Ez nikarim bawer bikim ku ev rast e! Dawî li ramanên min nedihat û hemû jî heta tu bêjî bes bi mantiq bûn. Ez piştrast bûm ku ez rast im û li aliyê Xweda me lê pastor ev nedidît!

Çawa civîn qediya ez ji salonê derketim. Pastorekî yextiyartir û zana; ji bo min bisekînîne gotinên hişyarker, zana û dilxweşiyê gotin lê min li wî nêrî û got: "Fred, ez naxwazim biaxivim!" Gava dît ku wê ber bi cihekî ve neçe, xwe da aliyekî û paş de vekişiya.

Ez vegeriyam malê, sedemên bêhejmar yên ku pastorê me xeteyeke mezin kiriye di serê min de diçûn û dihatin. Hêrsa min, her ku li biryarê wî difikirî hîn mezintir dibû. Ez wisa fikirîm: Haya wî ji

çalakiyên partiyan tuneye ji ber ku lêkolîna berfireh min kir, ne wî kiriye. Tenê hat û bêyî ku lêpirsîneke baş bike, xebata me ya zor û zehmet ya ku bi mehan e em li ser dixebitin betal kir. Tişta ku wê dêr û koma ciwanan mezintir bike dikuje. Rê li ber xelasiya mirovan digire! Ev fikir gava ez vegeriyam malê bi rê de weke mînakan di serê min de diçûn û dihatin. Mantiqekî min yê saxlem hebû û ji bo tiştên di wê civînê de bûn tu mahne tunebûn.

Min li ser rêya xeracê park kir, deriyê xwe yê pêş vekir û jina min silav li min kir. Min silava wê lê venegerand lê bi dengekî pir aciz, min got: “Tiştê kir ez ji te re bêjim tu jê bawer nakî!”

Gava dengê min bihîst, bi diltirsiyê pirsî: “Kê, çi kir?”

“Pastor! Şahiyên komên malan betal kirin! Tişta ku em heyşt mehan li ser xebitîn, hemû vîzyona koma me ya ciwanan. Hemû betal kirin! Tu bawer dikî?”

Li min nêrî û bi dengê xwe yê herî zelal û cidî got, “Wisa xuya dike ku Xweda hewl dide tiştekî fêrî te bike.” Piştre ew di holê re derbas bû û ket odeya me ya razanê.

Niha ez ji wê jî hêrs bibûm. Diyar bû ku ew jî ji zanebûn û ji têgihîştina giyanî bêpar bû. Ew jî bi qasî pastorê min nezan bû. Ez bi lez û bez çûm metbexê li hemberî odeya me ya razanê, min lingên xwe danîn ser kursiyekî, di pencereya pêşî re min li derve nihêrî û min berdewam kir û fikirîm ku pastorê min çiqas xelet e. Lêbelê îcar niha fikra bêhesasiyet û bêhişmendiya jina min jî li van fikran zêde bibû.

## LIHEVRASTHATINA BI MÎR RE

Gava min di pencereyê re li derve dinêrî, Giyanê Pîroz bi dilê min re axivî û wisa got: “John, tu xizmeta kê ava dikî? Ya min an ya xwe?”

Di cih de min got: “Ya te, Reb!”

Di cih de bersiv da: “Na, tu ya xwe ava dike.”

Min wisa got: “Reb, piraniya xwendekarên xelas nebûne em nikarin bikişînin dêra xwe lêbelê em dikarin wan bînin şahiyan…” Te

digot qey nizane min hemû stratejî û mantiqê li pişt pêvajoyê ji Wî re diyar kir. Em çi zû dixapin!

Reb destûr da ku ez ya dilê xwe jê re bêjim û piştre wisa got: “John, ji bo tu xizmetê ji vî zilamî re bike gava min tu anî vê dêrê, min tu kir navbeynkarekî ku tu xizmeta wî bike û min tu emanetî wî kir. Ji bo tu bibî dest û lingên wî min bang te kir, ji bo berpirsyariya xizmetekê tenê ez kesekî peywirdar dikim.”

Min Mûsa anî bîra xwe. Pirtûka Pîroz wisa dibêje: “Mûsa, … di tevahiya mala Xwedê de wek xizmetkarekî dilsoz bû” (Îbranî 3:5). Rêberê ku Xweda ew danîbû ser serê komê ew bû.

Piştre Yaqûbê di Peymana Nû de anî bîra min. Yaqûb rêberê dêra li Orşelîmê bû. Dema nîqaşa meseleya sinetê ya di nava bawermendan de anî bîra min (Karên Şandiyan 15). Pawlos, Barnaba, Petrûs, Yûhanna û şandiyan û hemû yextiyarên dêra Orşelîmê, ji bo vê meseleyê nîqaş bikin, hatin cem hev.

Hin bawermendên Ferîsiyan yên di nava rêberan de pêşî dest bi gotinê kirin. Piştre Petrûs axivî. Pîştî vê, Pawlos û Barnaba bê Xweda di nava neteweyên din de çi kirine, anîn ziman. Piştî axaftinên xwe qedandin, Yaqûb rabû ser xwe, tiştên hatibûn axaftin bi kurtasî anî ziman û di nava axaftina xwe re got “li gorî min” û bê wê çi bikin diyar kir. Weke rêber wî biryar da û Petrûs, Pawlos û Yûhanna jî di nav de hemûyan bi ya biryara wî kirin.

Di Nivîsên Pîroz de, min dît bê çawa vê dînamîkê hişt ku Petrûs ji aliyê ferîşteyan ve ji zindanê serbest bê berdan. Petrûs, ji bawermendên li mala Meryemê re got: “Vê nûçeyê bigihînin Yaqûb û birayên din” (Karên Şandiyan). Heman tişt ji bo Lûqa û Pawlos jî derbasdar bû. Gava ku tên Orşelîmê Lûqa wisa qeyd dike: “Gava em gihîştin Orşelîmê, birayan bi şahî em qebûl kirin. Dotira rojê Pawlos bi me re hat ba Aqûb. Hemû rihspî jî amade bûn” (Karên Şandiyan 21:17-18). Petrûs û Pawlos çima di vê vegotinê de behsa Yaqûb kirine? Ji ber ku navê wî bi awayekî eşkere derbas dibe, diyar e ku Yaqûb rêber e.

Piştî ku Giyanê Pîroz ev xal zelal kir, wisa berdewam kir: “John, gava tu werî hizûra min da ku behsa dema xwe ya di vê dêrê de bikî, tu yê pêşî behsa wê yekê nekî ku te li Orlando’yê çend ciwan ber bi xelasiyê ve birine. Tu yê pêşî hesabê wê yekê bidî bê tu çiqasî dilsozê pastorê ku min tu xistibû bin rayedariya wî.”

Piştre ev hevoka ku hişt ez matmayî bimînim got: “Bi rastî, her çend tu hemû ciwanên li Orlando’yê xelas bikî jî, dema ku tu derkevî hizûra min, dibe ji ber ku te îteatî pastorê tu di bin rayedariya wî de ye nekiriyî û tu dilsozî wî nemaye, tu bê darizandin.” Bi van gotinan, tirseke Xweda ya nû li ser min çêbû! Bi hemû parastinên xwe ve ez hilweşiyam û min xwe teslîmî Mîrê xwe kir.

Reb berdewam kir: “John, eger tu li ser vê rêyê berdewam bikî, ciwan wê bi aliyekî ve biçin û dêr wê bi aliyekî din ve biçe. Tu yê dêrê bikî du parçe. Parçebûn tê wateya ‘du vîzyonên ji hev cuda!’” Çima di roja me de ewqas dêr û mal parçe dibin? Ji ber ku ew xwedî gelek vîzyonan in û yek ji wan teslîmî desthilatdariya ku Xweda destnîşan kiriye, nabe. Xweda hin zilam an rêberan destnîşan dike ji ber ku her rêxistina bi du seriyan mehkûmî parçebûnê ye!

## TOBEKIRIN Û NÛBÛNA PIŞTÎ WÊ ÇÊ DIBE

Min yekser ji helwesta xwe ya serîhildêr tobe kir. Piştî duakirinê, min zanibû ku divê ez çi bikim. Min rahişt telefonê li pastorê me yê mezin geriyam. Dema ku wî bersiv da, min got: “Pastorê min ez John Bevere me. Ez ji te lêborînê dixwazim. Xweda nîşanî min da ku min li dijî desthilatdariya te serî hildaye û min gunehekî mezin kiriye. Ji kerema xwe min bibexşîne. Ez ê di cih de komên malê betal bikim.”

Ew gelekî dilovan bû û ez bexşandim. Hema çawa min telefon girt, min bihîst ku Giyanê Pîroz ev pirs ji min pirsî: “Îcar niha tu yê vê dawiya hefteyê çawa vê yekê ji bîst û çar rêberan re rave bikî?”

Min xewnerojk an jî hêmayek dît ku tê de ez bi rêberan re diketim odeyê û bi dengekî xemgîn min digot: “Zarokno, hûn ê bawer nekin bê çibû.”

Hemûyan bi awayekî merakdar li min nêrîn û pirsîn: “Çi?”

Min bi dengekî monoton ê giran berdewam kir: “Hûn dizanin, em bi mehan li ser vê yekê xebitîn lê pastor komên malan betal kirin. Em ê şahiyên xwe yên şeva înê li dar nexin.”

Min dît ku ji ber biryarê bû himehima hemûyan û serê xwe bi nêyênî dihejandin. Bi hêsanî dihat xuyakirin ku ew ji pastorê mezin hêrs bûne. Em hemû qurbanên wî bûn û bêguman ez ji ber wî ve baş xuya dikirim.

Piştî ku ez di hişê xwe de li ser vê dîmenê fikirîm, min bihîst ku Giyanê Pîroz ev pirsî: “Tişta tu yê bikî ev e?”

Min jî bersiv da û got: “Na, Mîrê min!”

Ez bi mahdekî rûken û bi heyecana li ser dengê xwe, çûm civîna din. Min bi awayekî bicoş got: “Hevalno, gelek tiştên min yên xweş hene ji bo we.”

Bi heweseke meraqdar li min nêrîn û gotin: “Çi ye?”

Min berdewam kir: “Xweda, me ji hebûn û mezinkirina tiştekî ku ne ji Wî ye, xelas kirin. Pastorê me yê payebilind di civîna vê hefteyê de ji me re got ku komên malan ne ew rê ye ku Giyanê Pîroz ji bo vê dêrê destnîşan kiriye. Ji ber vê yekê em şahiyan aniha betal dikin!”

Te digot qey hayê hemûyan ji kelecana min hebû û bi yekdengî qîriyan: “Erê... baş e!” Tu pirsgirêka min bi wan re çênebû! Ez ne tenê bûm yê ku di nava vê serpêhatiyê de mezin bibû, em hemû mezin bûn. Piştî vê yekê, min karîbû bi wan re parve bikim bê ka çi qewimîbû. Piraniya van bîst û çar ciwanan niha di xizmeta tam-dem de ne û bi awayê giyanî saxlem mezin dibin.

## DILEKÎ DILNIZM Û POŞMAN

Dema ku ez li paş xwe dinêrim, ez fêhm dikim ku ev xaleke girîng e di jiyan û xizmeta min de. Eger dilê min nemaya, eger min li ser biryar û serhişkiya xwe israr bikira, ez ê îro di rewşeke pir cuda de bûma. Ax, ji ber ku tu rêyeke din ya min tunebû, bêguman min ê

di dawiyê de şahî betal bikirina lê dilê min wê berxwedêr, serbilind û hişk bimaya. Qet ji bîr nekin: Tiştê ku Xweda dixwaze ne tenê îteata derveyî ye di heman demê de dilekî dilnizm û poşman e ku ji îradeya Xweda re her dem tî ye. Ji ber vê yekê Dawid wisa got:

“Çimkî tu hez nakî ji qurbanê,
Razî nabî bi şewitandina gorîdanê,
An na, minê ji te re pêşkiş bikira.
Qurbana ku tu qebûl dikî ruhê şikestî ye,
Ey Xwedê, tu dilê şikandî û tobekar biçûk nabînî.”
(Zebûr 51:16-17)

Em dikarin di jiyana xwe de fedakariyên mezin bikin, demjimêrên dirêj xizmetê bikin, belaş bixebitin, xewa xwe feda bikin, li rêyên din bigerin ji bo ku bigihîjin bêtir mirovan û her cure tiştan bikin, helbet lîsteya xizmetê dirêj dibe û diçe. Dema ku em di nava van hemû fedakariyan de asê man, hêsan e mirov xeyal bike ku em û hewldanên xwe dikarin dilê Xweda xweş bikin. Lêbelê di nava van hemû çalakiyan de, motîvasyona me ya sereke hîn jî dibe ku bi xapînok ji îradeya me were avakirin.

Guh bidin van gotinan: Xweda, ji teslîmbûna ku rê li ber îtaeta rastîn vedike, razî ye. Armanca vê pirtûkê ne tenê eşkerekirina girîngiya teslîmbûna ji desthilatdariya Xweda re ye lê di heman demê de afirandina evîn û azweriya ji bo îtaeta Wî ye jî.

Ez dizanim dibe ku gelek pirsên we yên bêbersiv li ser şahidiya ku li vir hatiye dayîn, hebin. Yek ji wan dibe ku ev be: “Ma Xweda gava we dua dikirin ji we re negot ku van komên malan ava bikin?” Yeka din jî dibe ku ev be: “An ku pastor derbarê rêberiya dêrê de xelet be? An ku ji bo dêrê avakirina komên malan baştir be û ew xelet be û hûn mafdar bin? An ew di bin bandora xelet de be, wê çi bibe?” Gava ku ev xebat bi pêş ve biçe em ê bersiva van pirsan û hîn zêdetîrî van bibersivînin.

Lêbelê, berî ku em bêtir li ser rayedariya ku hatiye dayîn biaxivin, divê em girîngiya teslîmbûna xwe ya li ber rayedariya rasterast a Xweda diyar bikin. Watchman Nee wisa dinivîsîne:

Mirovek divê pêşî bi rayedariya xwemalî ya Xweda xwe nas bike ji bo ku xwe radestî rayedariya ku Xweda daye wî bike. Tevahiya têkiliya me bi Xweda re bi wê ve girêdayî ye ku em rastî rayedariyê hatine an na. Eger em xwediyê vê bin, wê hingê em li her derê rastî rayedariyê bên û bi vî rengî em dikarin bên astengkirin û dest pê bikin ku ji hêla Xweda ve werin bikaranîn. [Rayedariya Giyanî (New York: Christian Fellowship Publishers, 1972)]

Pêşî, divê bingeheke saxlem a Pirtûka Pîroz li ser girîngiya teslîmbûna ji Xweda re bi xwe were danîn. Tenê wê demê gava ev pêk hat em dikarin ber bi girîngiya teslîmbûna ji rayedariya ku hatiye dayîn ve biçin. Ev dê bibe kevirê bingehîn ê ku em ê her tiştî li ser ava bikin.

2

# RAYEDARIYA XWEDA YA RASTERAST

BEŞ 3

# GUNEH TÊ PÊNASEKIRIN

*Dêr bi piranî ji pênasekirina bingehîn ya gunehê dûr dikeve. Em bi wateya rastîn ya gunehê re têkiliyê nikarin deynin.*

Werin ji bo kêliyekê em lîstikekê bilîzin. Ji ber nebûna sernavekî baştir tuneye, em jê re bêjin lîstika bijîşk û nexweş. Tu nexweşekî li ser textê xwe dirêjkiriye û ez jî psîkiyatrîst im ku li ser kursiya li kêleka te rûniştiye. Ez ê peyvekê bibêjim û tu yê jî tiştê ku berî her tiştî tê bîra te, tu yê ji min re bibêjî. Amade yî? Peyv ev e: Guneh. Tişta ku berî her tiştî tê bîra te çi ye?

Piştî axaftina bi gelek bawermend û rêberên li çaraliyê cîhanê re, ez dikarim texmîn bikim bê ka çi hatiye bîra te. Dibe ku hûn li ser zîna, fuhûş, xerabî an jî li cureyeke din a îstismara cinsî fikirîbin. Ez pirî caran vê hevoka trajîk dibihîzim: "Filankeso guneh kir." Ev hevok bi gelemperî behsa ketina cinsî ya rêberekî dike. Kesê ku min agahdar dike ne hewce bû ku bêtir rave bike, ez di cih de fêhm dikim bê ew behsa çi dike. Di nava derdorên dêrê de, ev raman derdikeve pêş û xuya dibe ku bi peyva gunehê re têkildar e.

An jî dibe ku wêneyê serxweşî an jî tiryakê werin ber çavên mirov. Bêguman bawermend van weke gunehên mezin dibînin.

Belkî qumar, kuştin, dizî an jî sêrbazî hatibin bîra mirov. Her çiqasî ne mimkun be jî dibe ku kategoriya gunehên we nefret, pevçûn, çavnebarî an jî nebaxşandinê di nav xwe de ragirîne. Li gorî min em dikarin lê bifikirin ku lîste dikare pir dirêj bibe.

## PÊWENDÎ NEDANÎNA BI PÊNASEYA BINGEHÎN RE

Piştî hûn li ser vê yekê fikirîn, bihêlin ez vê bêjim: Adem li nav Bexçe, ne bi jineke xerîb re razabû ne jî esrar kişandibû! Lê dîsa jî gunehê wî ewqasî mezin bû ku hemû afirandin xiste bin koletî û dîlgirtinê. Dema ku em gunehê pênase dikin, divê em rewşa Adem li ber çavan bigirin, ji ber ku cewherê tawanbariya wî li seranserê şaxên mirovahiyê belav bûye. Wî çi kir ku ewqas wêranî bi ser mirovahiyê ve hat? Eger bi kurtasî bê gotin, wî îteat ji tiştê ku Xweda jê re gotibû, nekir. Hinekî li ser vê yekê bifikirin. Ez nabêjim lîsteya ku min berî niha diyar kir bê guneh e lêbelê ez xalekê destnîşan dikim ku dêr gelek caran ji pênaseya bingehîn a gunehê dûr ketiye. Em bi wateya rastîn a gunehê re girêdanê nikarin çêbikin. Bêyî vê girêdana girîng, em dikarin bi hêsanî bikevin xapandinê, weke ku em ê di vê beşê de fêr bibin.

Ez mînakeke din bidim we. Em bibêjin ku hemû hişmendiya we an jî têgihîştina we ya bingehîn a nexweşiya giştî ya laş, kuxik, pişkandin an jî ji bilî verişandinê germahiya laş ku 37 pileyan derbas bike. Ev hemû têgihîştina min a derbarê nexweşiyê de bû dema ku xwişka min a delal ya çardeh salî ku bi penceşêrê hate teşxîskirin. Ew gelek caran çû ser bijîşkan û çend hefteyan li nexweşxaneyê ma. Dêya min ji min re got: “Johnny, xwişka te pir nexweş e.” Lê dîsa jî ne taya wê hebû, ne dikuxiya û ne jî dipişkiya. Min fêhm nekir bê çima malbat û xwişka min ewqasî bi fikar bûn. Min digot qey ew tenê westiyayî ye. Min giraniya nexweşiya wê fêhm nekir ji ber ku ez bi tiştên min bi wan dizanîbû û yên min tecrube kiribûn, difikirîm.

Min giraniya rewşê fêhm nekir heta ku rojekê ji pola yekem gazî min kirin malê û min dît ku pastor li hundur li kêleka dê û

bavê min rûniştiye. Piştre ji min re gotin ku xwişka min miriye. Piştre û tenê wê demê, min fêhm kir ku ew pir nexweş e. Di nava wan hemû mehan de, min qet nekarîbû xwe bigihînim tiştê ku bi rastî diqewime, ji ber ku pênaseya min a nexweşiyê bi aliyekî ve sînordar bû. Min pirs pirsîn û kûrtir lêkolîn kirin. Ez hîn bûm ku kesekî nexweş ew kese e ku ji ber cureyeke nexweşiyê tenduristiya wî ne nebaş dibe. Êdî min ê nexweşî bi heman awayî nepîvaya; min pênaseya rastîn ya nexweşiyê fêhm kir bê di xwe de çi dihewîne.

## PÊNASEYA RASTÎN YA GUNEHÊ

Heman tişt ji bo gelek kesên di dêrê de jî derbasdar e. Em gelek caran ji têgihîştina bingehîn a gunehê bêpar in. Ji bo ku em pêşve biçin, divê em li awayê pênasekirina wê ya ji hêla Nivîsên Pîroz ve binêrin. Li gorî Pirtûka Pîroz, “guneh tê wateya binpêkirina qanûnê” (Yûhenna 1, 3:4). Di Grêkî de “binpêkirina qanûnê” “anomia” ye. Ferhenga Grêkî ya Thayer vê hevokê weke “rewşeke binpêkirina qanûnê ya bi nezanî an jî binpêkirinê” pênase dike. Eger bi hêsanî bê gotin, liberderketina qanûnê tê wateya ku mirov li ber qanûn û rayedariya Xweda stûyê xwe daneyne. Ferhenga Vine’yê dibêje ku ev ayet “wateya rastîn a peyva [guneh]ê diyar dike.” Vine wisa berdewam dike: “Ev pênaseya gunehê, eşkere dike ku taybetmendiya bingehîn a gunehê redkirina qanûn an jî îradeya Xweda ye û kesayetî dikeve şûna wê de.”

Ji bo piştrastkirina vê ravekirinê, em li şibandineke Îsa binêrin. Îsa bi çend kesan re xwarin dixwar û yek ji wan kesên ku li ser sifrê rûniştibû wisa got: ”Xwezî bi wî yê ku di Padîşahiya Xweda de bixwe!” (Lûqa 14:15).

Reb ji gotinên wî zilamî sûd wergirt da ku ji me re bibêje ka wê kî di şîva daweta Berx de li ser sifrê rûne. Wisa got û dest bi gotinên xwe kir: “Mirovekî şîveke mezin çêkir û gelek xelk vexwendin. Û çaxê şîvê xulamê xwe şand, da ku gazî yên vexwendî bike û ji wan re bêje: De werin, her tişt amade ye.” (Lûqa 14:16-17)

Kesê xwediyê mîhrîcanê Bav temsîl dike û koleyê wî Îsa bi xwe ye. Ji ber ku peyva “Kole” yekjimar e vê şîroveyê qewîntir dike. Nivîsên Pîroz bi awayekî eşkere wisa dibêjin: “Di demên berê de Xwedê gelek caran û bi gelek awayan, bi rêberiya pêxemberan ji bav û kalan re gotiye. Lê di van rojên dawîn de, ew bi Kurê xwe yê ku ew kiriye wêrisê her tiştî û bi destê wî erd û ezman çêkirine, ji me re peyivî” (Îbranî 1:1-2). Îsa Berdevkê me ye. Her kesê ku di dema Peymana Nû de wazan dike, hîn dike an jî dinivîsîne, divê weke kahînên Reb biaxivin. Divê em tiştên Wî ji me re gotine bibihîzin û bi awayekî rast ragihînin.

Di vê şibandinê de daxwaza Bav tê bi dengkirin: “Fermo, her tişt amade ye.” Ev daxuyanî ne ji bo kesên ku halîhazir hatine vexwendin e, ango ne ji bo kesên bawer nakin ku Mizgînî nebîhîstine, ji bo bawermendan e.

Lêbelê ev kes dest bi mahneyan dikin da ku ji vexwendina “fermo” re dûr bisekinin. Yê yekem wisa dibêje: “Şûşeyek vodka, çend çixareyên min yên biesrar û şahiyeke mezin li cem min heye ku ez ê biçimê. Bi rastî ez dixwazim li wir bim, ji kerema xwe re li min negirin.”

Yê duyem wisa dibêje: “Min sefereke Las Vegasê ya ku hemû mesrefên wê hatibûn dayîn qezenc kir. Ji bilî vê, pênc hezar dolarên min hene ku ez li fahîşeyan û li qumarê xerc bikim. Ez bi rastî dixwazim biçim wir, ji kerema xwe li min negirin ji ber ku ez nehatim.”

Yê sêyem wisa dibêje: “Ez dil ketim sekretera xwe û em ê dawiya hefteyê bi hev re derbas bikin. Min li seyrangeheke li Hawaii’yê rezervasyon kir ji bo ku em bikaribin kêfê ji evîna xwe bistînin. Ji kerema xwe ji jina min re nebêjin, ji wê we ye ku ez ji bo karekî çûme wir. Ji ber vê yekê ez nikarim werim.”

Tiştên dibêje ev in? Eger hûn Pirtûka Pîroz bixwînin, hûn ê bibînin ku bersivên dane pir ji hev cuda ne. Em li her yekê bikolin.

Yê yekem got: “Min zeviyek ji xwe re kirî û divê ez biçim bibînim. Ji kerema xwe re li min negirin.” Berî ku em bêtir pêde biçin, pirseke

min heye: Kirîna zeviyekî guneh e? Eger wisa be wê demê serê gelekan ji me di belayê de ye. Helbet na û em hemû bi vê dizanin. Werin em dîsa li gotinên wî binêrin: “Min zeviyek ji xwe re kirî û divê ez biçim bibînim. Ji kerema xwe re li min negirin” (ayeta 18). Weke ku min got, kirîna zeviyekî ne guneh e lê nîşandana eleqeya me ya ji bo tiştên ku em xwediyên wan in eger têkeve rewşeke girîngtir ya îteata di cih de ya ji gotina Xweda re, wê demê wê têkeve bin pênaseya bingehîn ya gunehê. Ew dibe binpêkirina qanûnê, ew teslîmî rayedariya Xweda nabe.

Zilamê din jî dernediket gera qumar û fuhûşê. Wî wisa got: “Min pênc cot ga kirîn û ez ê herim wan biceribînim. Ji kerema xwe li min negirin” (ayeta 19). Ma kirîna gayan an jî kirîna alavên din ên pêwîst ên ji bo debara me, guneh e? Bêguman na lê gava derdê kar an jî debara jiyanê ji îteata gotin an jî daxwaza Xweda girîngtir bibe, ew dibe guneh! Ji bîr mekin, Adem li Baxçeyê Adenê fuhûş nekir. Wî tenê li ber gotina Xweda stûyê xwe netewand.

Zilamê dawiyê wisa got: “Ez nû zewicîme ji ber vê ez nikarim bêm” (ayet 20). Ma zewicandin guneh e? Helbet na. Eger wisa bûya, wê serê gelekan ji me di belayê de bûya. Lêbelê eger arezûya ku mirov hevserê xwe memnûn bike ji daxwaza Xweda ya ku mirov stûyê xwe li ber ditewîne girîngtir bibîne, ha ev guneh e. Careke din, li Bexçeyê Adenê bifikirin. Hewa hat xapandin (Korîntî II, 11:3) lê ji bo Adem çîrokeke din hebû: “Yê hat xapandin jî ne Adem bû” (Tîmotêyos I, 2:14). Derbarê xwezaya gunehê Adem de Nivîsên Pîroz wisa dibêjin: “…çawa bi neguhdariya yek mirovî gelek bûn gunehkar…” (Romayî 5:19). Adem bêîteatî kir ji ber ku jina wî fêkiyê halîhazir xwar û xwest ku ew jî bixwe. Ji bedêla ku li ber rayedariya Xweda stûyê xwe bitewîne, jina xwe hilbijart. Ev guneh e. Di encama guhnedana Adem de “gelek bûn gunehkar” an jî em dikarin vê wisa îfade bikin: “Gelek ji wan li ber qanûnê derketin an jî stûyê xwe li ber rayedariya Xweda netewandin.” Gunehê rastî ev e. Di vê

şibandinê de, Îsa nîşanî me da ku li ber guhnedana gotina Xweda zilam jina xwe hilbijartiye.

Niha guh bidin gotinên Îsa bê ka çi dibêje li ser wan mirovên ku bi hincetên pir nazik lê xwe radestî deng û desthilata gazîkirina Xweda nakin: “Ez ji we re dibêjim ku yek ji wan mirovên vexwendî, ji şîva min tam nake” (Lûqa 14:24). Çi gotinên bi bandor! Ev zilamên ku berê weke mêvanên rûmetê hatibûn ezimandin, di mîhrîcana dawetê de wê destûr ji bo wan nehataya danîn ji bo ku xwarinê bixwin. Hatina wan ya ji bo mîhrîcana Berxik; ne ji ber îstîsmara cînsî, tiryak an jî bengîtiya alkolê, ji ber ku bi awayekî basît bi gotina Xweda nekirine, li wan hat qedexekirin. Vê çima hişt em şaş bimînin? Eger em kûr lê bifikirin, tişta ku mirovahiyê dîlgirtî dike ma ne bêîteatiya Adem bû?

Ma ne balkêş e ku di vê şibandinê de qet behsa tiryakfiroşan, fahişeyan, jinfiroşan, alkolîkan, kujeran an jî dizan nake?

Xelet!

Eger hûn xwendinê berdewam bikin, hûn ê ferq bikin ku kole ji efendiyê xwe re rewş ragihandiye û hemû mahne jî jê re gotine. Mîrê malê ji kole re got: “Rabe, derkeve ser rê û sêncan, bi zorê xelkê bîne hundir, da ku mala min tije bibe” (Lûqa 14:23) û bi vî awayî ferman dayê. Di vê ayetê de mirovên li ser rê û sêncan kesên weke fahîşeyan, jinfiroşan, dizan, endamên çeteyan, kûjeran, alkolîkan û hwd. temsîl dikin! Ji xwe re lê binêrin, di şibandinê de cih digirin lê bi awayekî baş!

Reb dizane ku di van rojên dawî de, gelek ji van mirovan wê fêhm bikin ku jiyana wan vala ye û ji bilî xemgîniyê tiştek din nagihê wan û dizane ku ew ê ji ber li kutana bizmaran biwestin. Dema ku ew banga Mîr bibihîzin, ew ê di cih de bi îteatê bersivê bidin. Berevajî vê, ew kesên ku hatine vexwendin, yên ku beşdarî dêrê dibin, yên ku xwe di kerema Xweda de rast û ewle dibînin lê tenê heya ku ew destwerdanê li bername, rojev, bereket an kêfên wan neke, wê xwe ji hebûna bi rûmet a Xweda, digel Adem dûr bibînin.

## "DIBE, EZBENÎ"

Pênaseya rastîn a gunehê di şibandina şîva dawetê de weke bêîteatiyê li hemberî rayedariya Xweda tê eşkerekirin. Îsa ev yek di şibandineke din de eşkere kir ku wî bi pirsa "Lê hûn ê ji vê re çi bibêjin?" dest pê kir. Bi van gotinên destpêkê re wî hewl da ku guhdarên xwe yên rast ên ji derve ve kûrtir lê binêrin û rastiyê di bersiva wî de bibînin.

Îsa behsa zilamekî kir ku du kurên wî hebûn. Bav çû ba kurê xwe yê mezin û jê re got: "Kurê min, îro here di nav rez de bixebite."

Kurê wî bersiv da û got: "Ez naçim." Lêbelê piştre fikra xwe guherand û karê di nav destê xwe de hişt û çû di nava rez de xebitî.

Piştre bav çû cem kurê xwe yê duyem û jê xwest ku heman tiştî bike. Kur bersiv da bav û got: "Dibe, ezbenî." Weke kurekî pir bedew û baş xuya dikir û bêguman bi rêzdarî bi bavê xwe re diaxivî. Lê dîsa jî Îsa got ku ew "neçû."

Piştre Îsa pirseke pir girîng lê bersivdayîna wê pir hêsan pirsî: "Ji herduyan kîjanî jê daxwaza bavê xwe bi cih anî?"

Yên ku li şibandinê guhdar kirin, bersiva rast dan: "Yê pêşî."

Piştre Îsa daket bingeha meseleyê û wisa got: "Bi rastî ez ji we re dibêjim, bacgir û fahîşe jî wê beriya we bikevin Padîşahiya Xwedê" (Metta 21:28-31). Niha, eşkere ye ku her bav tercîh dike ku kurê wî bêje: "Belê, ezbenî, ez ê biçim" û ne tenê guh bide fermanê lê di heman demê de bi kêfxweşî û bi dilxwazî biçe. Lê vê meseleyê nîşanî van rêberan da ku wateya bingehîn a gunehê di dawiyê de têkçûna teslîmbûna rayedariya Xweda ye. Ew ne tenê bi zînayê, kuştinê, diziyê û hwd. ve sînordar e.

Rêber serbilind û li xwe bawer bûn ji ber ku ew ne di bin bandora tiştên ku ew weke "gunehên mezin" dihesibandin de bûn. Lêbelê bi pênaseya wan a sînorkirî ya gunehê, ew bi hêsanî hatin xapandin ku heman tiştê ku ew îdîa dikirin ku bi baldarî ji wê dûr dikevin (guneh an jî bêîteatiya rayedariya xwedayî), bikin.

## BAŞ E ÎCAR "YÊN MEZIN IN?"

Em dikarin heman peyamê gelek caran li seranserê Pirtûka Pîroz bibînin. Dibe ku hûn wisa bifikirin: Baş e îcar wê derew, serxweşî, fuhûş, dizî û kuştin çi bibe? Ma ev ne guneh in? Bêguman! Ew jî li ber rayedariya Xweda derdikevin. Xweda derewan ji ser me hildewişîne û dibêje: "Bila her yek ji we rastiyê ji cîranê xwe re bêje" (Efesî 4:24-25). Dema ku dor bê ser serxweşiyê, Reb dibêje: "Bi şerabê serxweş nebin" (Efesî 5:18). Li ser fuhûşê, ew hişyar dike û dibêje "xwe ji fuhûşê dûr bixin" (Korintî I, 6:18). Ji bo diziyê çi gotiye? Ferman daye û gotiye "Divê diz êdî diziyê neke" (Efesî 4:28). Di derbarê kuştinê de wisa hatiye gotin: "Yê ku ji birayê xwe nefret dike, qatil e. Hûn dizanin ku tu kûjer ne xwedî jiyaneke bêdawî ye" (Yûhenna I, 3:15). Peymana Nû, diyar dike ku yên wisa dikin, wê Desthilatdariya Xweda weke mîras bi dest nexin (Korintî I, 6:9-11; Galatî 5:19-21; Peyxama 21:8). Dîsa jî ne tenê yên ku em weke "yên mezin" bi nav dikin, divê em rastiya ku her cure guneh hilweşîner e paş guh nekin.

Werin em vegerin lîstika xwe ya psîkiyatrîst û nexweş. Nexweşê li ser textê rûniştî û guneh baş fêhm dikir, bi hêsanî dikaribû wisa bersiv bidaya: "Serînetewandina li ber rayedariya Xweda." Wî têkiliya di navbera guneh û binpêkirina qanûnê de fêhm dikir.

## ZÊDEBÛNA XERABIYAN

Xwendekarên Îsa derbarê dawiya heyamê de jê pirsîn. Îsa bûyerên ku wê pêk bên û di rojên berî hatina Wî ya duyem de şert û mercên ku wê bi piranî biqewimin, ji wan re got û bersiv da. Yek ji wan şert û mercan ev e: "Bi zêdebûna neheqiyê, hezkirina gelekan wê sar bibe. Lê yê ku heta dawiyê ragire, ewê xilas bibe" (Metta 24:12-13).

Dema ku ez ji temaşevanan dipirsim gelo ev şert û merc ji bo civaka me ya îro derbasdar in an na, ew destên xwe radikin û serê xwe dihejînin; piraniya wan civaka me weke gunehkar dibînin. Kêm kes,

heke hebin, guman dikin ka ev nirxandineke rast e an na. Lê Îsa di vê gotinê de civak pênase nedikir. Wî dêr diyar dikir! Dibe ku hûn meraq bikin ka ez çawa gihîştim vê encamê. Du gotinên cuda yên di her du ayetan de nîşan didin ku ew li ser dêrê diaxivî, ne li ser civakê bi giştî.

Hevoka sereke ya yekem ev e: "Evîna gelek kesan wê sar bibe." Peyva Grekî ya ku li vir weke hezkirinê tê wergerandin, "agape" ye. Zanyarê Grekî W. E. Vine nivîsandiye ku peyva agape "ji hêla Giyanê wehiyê ve tê bikar anîn ji bo ku ramanên ku berê nehatine zanîn derbirîne." Eger bê bîra we, Îsa wisa got: "Ez emrekî nû didim we: Ji hevdû hez bikin. Wek ku min ji we hez kir, hûn jî ji hevdû hez bikin [rewşa lêkerî ya agape'yê agapao ye]" (Yûhenna 13:34). Ev hezkirin berê ji aliyê mirovahiyê ve nedihat zanîn, ew ji aliyê Îsa ve hate destnîşan kirin. Wî ew bi gotina "Çawa ku min ji we hez kiriye" pênase kir. Vines wisa berdewam dike: "Ev hezkirin, 'hezkirin' û eleqeya fikara kûr û mayînde ya Hebûneke bêkêmasî ji bo tiştên ku bêguman ne hêja ne diyar dike." Bi kurtasî, ew hezkirina bê şert û merc a Xweda pênase dike ya ku Îsa dibêje:  "dinya nikare wê qebûl bike" ku bi rêya Giyanê Pîroz di dilê me de tê rijandin (Romayî 5:5; Yûhenna 14:17). Ev hezkirin tenê di wan kesên ku Îsayê Mesîh weke Xelaskarê xwe qebûl dikin de tê dîtin.

Hin peyvên Grêkî yên ku di Peymana Nû de weke "hezkirinê" têne wergerandin jî hene. Lêbelê her yek ji wan bi hêsanî dikare hem ji bo bawermendan hem jî ji bo kesên ne bawermend bê bikaranîn. Yek ji van peyvan "phileo" ye. Li gorî W. E. Vine, ev peyv "divê ji agape were cudakirin ji ber ku phileo bi gelemperî 'hezkirina bişefqat' temsîl dike... Phileo qet di fermaneke ji bo mirov ji Xweda 'hez bikin' de nayê bikar anîn." Ev peyv, weke agape'yê bi taybetî ji bo bawermendan nayê bikaranîn.

Di hevoka Îsa de, "Ji ber zêdebûna xerabiyê, evîna gelekan wê sar bibe" peyva Grekî ya ku weke "hezkirinê" tê wergerandin ne phileo ye lê agape ye! Îsa ev gotin, ne ji piraniya civakê re, ji dêrê re digot.

Wî digot ku di rojên dawîn de xerabî wê di nav dêrê de jî zêde bibe.

Em nikarin gotinên din jî yên Îsa yên têkildarê vê pişt guh bikin. Em gotineke wisa di Mizgînî'ya Metta de dibînin: "Ne ku her kesên ji min re dibêjin: ‹Ya Xudan, ya Xudan› wê bikevin Padîşahiya Ezmanan! Bi tenê yên ku daxwaza Bavê min ê li ezmanan dikin, wê bikevinê" (Metta 7:21).

Ev îfade, pênase û termînolojiya me ya giştî ya derbarê bê kî xelas bûye de betal dike. Me hîn kiriye ku hemû tiştên ku divê mirov bike ew e ku "duayek gunehkar" bibêje û bi vî awayî mirov li bihuştê xwe bigihîne cihekî ewle. Me pabendbûna bi bicihanîna fermanên Wî paşguh kir an jî me zêde pêdivî pê nedît. Ev peyama Mizgîniyê ya ne temam gelek kesan ji rê derdixîne û dibe sedema ku mijara îteatê bi awayekî cîdî neyê dîtin. Îsa got ew kesên ku wê biçin bihuştê yên ku îradeya Xweda qebûl dikin û pêk tînin, bi vî rengî fermanên Xweda diparêzin.

Qenciya birastî, bi armanca ji bo îteata ku Xweda ji me dixwaze em bi hêz bikin, li ser me hatiye dayîn. Nivîskarê Nameya Îbraniyan bi awayê herî baş ev aniye ziman: "Bi vî awayî em bi tirs û hurmetê biperizin Xwedê, weke ku li wî xweş tê" (Îbranî 12:28). Qencî bi awayê ku em Xweda kêfxweş bikin û ji bo em li gorî daxwaza Wî bijîn, me bi hêz dike. Îsa gotinên xwe wisa berdewam kirin: "Wê rojê gelek wê ji min re bêjin: Ya Xudan, ya Xudan! Ma bi navê te me pêxemberîtî nekir? Bi navê te me cin dernexistin? Ma bi navê te me gelek keramet nekirin?" (Metta 7:22).

Di vê ayetê de ne behsa kêm kesan dike, behsa gelek kesan dike. Di gotina Wî ya berê de îfadeya gelek kesan hat bîra we? "Wê hezkirina gelek kesan sar bibe." Wê gelek kes ji Îsa re wisa bibêjin: "Ya Reb, ya Reb! Ma me ne li ser navê te pêxemberî kir? Ma me ne li ser navê te bera cinan da? Ma me ne li ser navê te gelek mûcîze çêkirin?" Kesekî ne bawermend be li ser navê Îsa nikare bera cinan bide (Karên Şandiyan 19:13-17). Ango careke din bang li bawermendên dêrê dike.

Piştre, kesên îdîa dikin ku Xirîstiyan in Îsa wisa bersivê dide wan: “Ji min dûr kevin, hûn ên ku neheqiyê dikin!” (Metta 7:23). Bala xwe bidinê bê çi kirine -nebaşî. Bi gotineke din, xwediyê terza jiyaneke weke ya kesên li dawetê ne. Wan sîstemek pêşxistiye ku rojev, kêf û şahiyên xwe an jî planên xwe li pêş fermanên Efendiyên xwe datînin. Di roja me de ev weke tevgereke normal an jî xwezayî xuya dike. Bi îfedeyeke basît, ew îdiayên xwe yên teslîmbûna ji bo efendîtiya Wî pêk naynin. Ew guh didin tiştên ku îteatê li gorî planên wan dike. Haya wan ji xerabiya wan ya heyî tuneye. Mixabin divê ez bibêjim ku ev rewş, rewşa gelek kesan e ku îro îdîa dikin ku Xirîstiyan in!

Sedema duyem ya ku em dibînin ku Îsa bang dêrê dike, di daxuyaniya wî ya din de tê dîtin: “Lê yê ku heta dawiyê sebir bike, ew ê xelas bibe.” Ji bo ku di vê pêşbaziyê de hûn heta dawiyê sebir bikin, divê hûn pêşî dest bi vê pêşbaziyê bikin. Kesên nebawermend hîn dest bi pêşbirka Xirîstiyaniyê nekirine.

## ÊŞ Û MATMAYÎNA XAPANDINÊ

Dema ku Îsa û şandiyên wî bi mirovên rojên dawî re diaxivîn, em dibînin ku ew bi berdewamî wan li ser pênaseya herî baş ya atmosfera serdema wan hişyar dikin û ev atmosfer xapandin e. Yek ji sedemên hevpar ên xapandinê têgihîştina xelet a wateya bingehîn a gunehê ye. Ev rewş ji têgihîştina min a zarokatiyê ya derbarê mirina xwişka min de, ne cudatir e. Dema ku ez hatim malê û min bihîst ku ew miriye, ez matmayî mam ji ber ku min rastiya ku ew bi rastî nexweş e qet ne pejirandibû. Serpêhatiyeke min ya ku di dawiya salên 1980yî de ez jiyam pir bi vê yekê re girêdayî ye.

Dema ku min dua dikirin, min tiştekî hilweşîner dît ku rêça jiyan û xizmeta min guherand. Di wê tişta min dît de, min qelebalixiyeke pir mezin ku heta wê rojê min qet nedîtibû, min dît. Li ber devê deriyê bihuştê kom bibûn û ji bo bibîhîzin li bendî van gotinên Efendî bûn: “Werin, hûn pîrozên Bavê min, wê Padîşahiya ku ji damezrandina

dinyayê ve ji bo we hatiye amade kirin, bistînin" (Metta 25:34). Lêbelê li şûna van gotinan, bîhîstin ku Efendî wisa got: "Ji min dûr bisekinin, ey kesên ku nebaşiyê dikin!" Min di rûyê wan de îfadeyeke matmayî, biêş û ecêb dît. Bi rastî bawer dikirin ku aîdî bihuştê ne ji ber ku digotin Îsa Reb e û ew jî Xirîstiyan in. Lêbelê wateya bingehîn û rastî ya gunehê fêhm nekiribûn. Herçiqasî bihuşt dixwestin jî ji hewesa ku xwesteka Bav bi awayekî îteatkar bînin cih, bêpar bûn.

Xweda li zarokên arezû dikin ku dilê wan dixwaze bi îtaetê bijî digere. Bandorê li kîjan qada jiayana me dike bila bike, weke bawermendan divê em ji kirina îradeya Wî zewqê bistînin. Di dawiya jiyaneke tijî serkeftina ji ber îteatê û têkçûnên ji ber bêîteatiyê, Silêman zanebûneke ku ji bo her dem û dewranê derbasdar e nîşan da: "Her tişt hat bihîstin, encam ev e: Ji Xwedê bitirse û emrên wî bigire, Wezîfeya hemû mirovan ev e" (Waiz 12:13).

Temamê ayeta Metta 7:23 wisa ye: "Hingê ezê bi eşkereyî ji wan re bêjim: ‹Min hûn qet nas nekirin! Ji min dûr kevin, hûn ên ku neheqiyê dikin!›" Hin kesan, ji bo ku Îsa gotiye "min hûn qet nas nekirin" dibe ku îdîa bikin ku ev gotin ji bo bawermendan ne derbasdar be. Ji bîr nekin ku kesên bawer nakin li ser navê Îsa nikarin bera cinan bidin. Gava ku Îsa dibêje "min hûn qet nas nekirin" girîng e û divê em zanibin ku peyva Grekî "ginosko" weke "naskirinê" tê wergerandin. Ev peyv di Peymana Nû de, ji bo pênasekirina têkiliya di navbera jin û mêran de tê bikaranîn (Metta 1:25). Avakirina nêzîkayiyê temsîl dike. Îsa di esasê xwe de wisa digot: "Min hûn tu carî ji nêz ve nas nekirin." Di Korîntî I 8:3'yê de em wisa dixwînin: "Lê kesê ji Xweda hez dike, Xweda pê dizane." Di vir de peyva Grêkî ya ku weke "zanîn"ê tê wergerandin ginosko ye. Xweda; kesê ku ji Wî hez dike, ji nêz ve nas dike. Kesên jê hez dikin, ew kes in ku gotina Wî tînin cih û serê xwe li ber rayedariya Wî ditewînin. Îsa wisa got: "Kesên ji min hez nakin, bi ya gotinên min nakin" Yûhenna (14:24).

BEŞ 4

# HÊZA VEŞARTÎ YA BINPÊKIRINA QANÛNÊ

*Agahiya ku fermana wê hatiye kirin li hemberî xapandinê parastina me ya herî mezin e.*

Îfadeya “rojên dawî” di Nivîsên Pîroz de pir caran derbas dibe. Ev roj bêguman dibe ku demên herî bi kelecan û di heman demê de demên tirsnak ên dîroka mirovahiyê bin. Demeke bi kelecan e ji ber ku em ê ji bilî eşkerekirina herî mezin a rûmeta Xweda ku her nifşek heya niha tu carî tecrubeya şahidiya çandiniyeke giyanî ya bi heybet nekiriye, em ê bikin. Ew ê bibe demeke rûmet, şahî, darizandin û heybetê.

Ev demeke tirsnak e ji ber ku Pawlosê Şandî bi zelalî ji me re got: “Di rojên dawî de wê demên dijwar biqewimin” (Tîmotêyos II 3:1). Berî vê hevokê wisa got: “Vê yekê bizanibe ku.” Bi gotineke din, bala xwe bidin tiştê ku ez ê binivîsim; di hişê xwe de bikirpînin û binê wê xêz bikin! Piştre wî di beşa sêyemîn de li ser van demên dijwar bi kîtekît şîrove kirin. Sedema demên dijwar wê ne ji ber zilma ji hêla dewlet an jî ateîstan ve pêk bihata. Sedema demên xeternak wê ji ber xapandina gelemperî ya di nava dêrê de pêk bihata. Ev hişyarî di

seranserê Peymana Nû de gelek caran tê dubarekirin.

Xapandin tiştekî pir tirsnak e. Çima? Ji ber ku ew xapînok e! Kesekî hatiye xapand, di rastiyê de her çiqasî xelet be jî bi hemû dilê xwe bawer dike ku ew mafdar e. Îsa di nivîsên xwe yên Mizgîniyê de li hemberî xapandinan gelek caran hişyarî dan. Tenê di Mettaya 24an de, wî çar caran hişyarî da wan ku ji vê haydar bin. Bi rastî, dema ku şagirtên wî li ser hatina wî ya duyemîn jê pirsîn, gotinên pêşî yên ji devê wî derketin yên ku wî roja me diyar kir ev bûn: “Hay ji xwe hebin ku kes we nexapîne!” (Metta 24:4). Acîliyeta di hişyariya wî de ji bo mirov hîn bike hêsan e. Di gotinên Wî de cîdiyet û toneke kûr û giran heye. Wî dixwest ku gotinên wî bandorê li giyanên wan bike. Gotinên wî bi hezaran salan e li ser piyan in û wê tiştekî aqilmend be ku mirov şîreta Wî paş guh neke.

## DU PIRSÊN GIRÎNG

Divê em du pirsên girîng bipirsin. Ya yekem, sedema bingehîn a vê xapandinê çi ye? Ya duyemîn, çima ev xapandin dikare bê kontrol bimeşe? Eger em bersiva ya yekem bidin, sedema bingehîn a xapandinê ne tiştek din e ji bilî tiştê ku me di beşa berê de nîqaş kir: Bêîteatiya li ber rayedariya Xweda, bicihneanîna qanûnê an jî xerabî ye. Ji me re wisa tê gotin:

“Xwe nexapînin û nebin yên ku tenê peyvê dibihîzin, lê peyvê bînin cih” (Aqûb 1:22).

Ecêb e! Nivîsên Pîroz ji me re dibêjin ku gava mirov peyva Xweda dibihîze lê wê di pratîkê de nayne cih, xapandin dikeve dil û hişê wî. Kesekî wisa niha bawer dike ku ew li ser rêya rast e, her çend ew bi rastî di xeletiyê de be jî. Wî rastî bi derewê guhertiye. Dema ku teslîmbûnek bi rastî ji bo rayedariya Xweda, ango ji bo peyva Wî tune be, derî ji bo xapandineke veşartî lê mezin vedibe.

Çima wê xapandin di rojên dawî de pir belav bibe? Pawlos got ku gelek kes wê werin xapandin ji ber ku ew “ji rastiyê hez nakin”

(Selanîkî II, 2:10). Balkêş e ku mirov bibîne ku xapandin ne tenê encama nepejirandina “rastiyê” ye lêbelê encama “nehezkirina rastiyê” ye ku divê em not bistînin. Hezkirina rastiyê ne tenê kêfa bihîstina wê ye lê hezkirina bicihanîna wê ye. Xweda ji pêxemberekî xwe re wisa got:

> “Ya kurê mirovan! Gelê te li ba dîwar û deriyên xaniyan li ser te dipeyive. Ji hev re dibêjin: ‘Em herin û bibihîzin gotina ji Xudan hatiye çi ye.’ Gel wekî hergav tê ba te. Ew li ber te wekî gelê min rûdinin û gotinên te dibihîzin. Lê guhdarî nakin. Bi devê xwe dilxwaz xuya dibin, lê dilê wan li pey qezenca wan e.” (Hezekiyêl 33:30-31)

Gelek kesên di dêrên me de ji waz û hînkirina baş hez dikin lêbelê gava ku dor tê ser rastiyê, ew dîsa jî ji xwesteka Xweda bêtir ji rêya xwe hez dikin (Tîmotêyos 2, 3:1-4). Divê em rastiyê ji her kesî an jî ji her tiştî bêtir hez bikin. Divê em xwesteka Wî ji rehetiya xwe an jî ji jiyana xwe bêtir bi dilgermî bixwazin. Wê demê em ê zewqê jê bistînin ku em daxwazên xwe yên kesane ji bo xwestekên Wî bidin aliyekî. Ji bo em xwesteka Wî bînin cih em ê xaçên xwe hilgirin û em ê maf û îmtiyazên xwe red bikin. Çima? Ji ber ku ew Xweda ye, Afirînerê me ye, Xelaskarê me ye û hezkirina Wî ya ji bo me bêkêmasî ye. Ev bi tena serê xwe jî wê me ji xapandinê biparêze.

Lê gelo ev cureyê dilsoziyê wisa ye ku em îro di nav bawermendan de dibînin? Rewşa rastî pir cuda ye. Ecêb e ku nivîskarên Pirtûka Pîroz, roja me bi rastbûneke mezintir ji ya ku em dibînin bêtir pêşbînî dikin.

## HÊZA VEŞARTÎ YA BINPÊKIRINA QANÛNÊ

Ji bo têgihîştina sedemên belavbûna xerabiya îro roj, faktoreke din jî heye ku divê bê hesabkirin. Em wisa tên hişyarkirin: “Çimkî sira bêqanûniyê ji xwe dixebite” (Selanîkî II, 2:7). Îfadeya ku weke

“bêqanûnî”yê tê wergerandin, peyva Grêkî “anomia” ye ku me di beşa berî vê de nîqaş kir. Bala xwe bidinê ku li pişt wê hêzeke veşartî heye. Di wergera Qral Jamesê Nû de ew weke “veşartina binpêkirina qanûnê” tê îfadekirin. Di vê hêzê de veşartinek heye. Eger binpêkirina qanûnê ji bedêla ku veşartî û xapînok e, ew eşkere bûya wê ji bo bawermendan ne bibandor ba. Ha sedema veşartina wê ev e. Xweda ji bo em ji vê veşartin an jî hêza veşartî ne bêxeber bin me hişyar dike (Korîntî II, 2:11).

Şeytan hosteyê xapandinê ye. Ka lê bifikirin: Ji sê paran parek ferîşte li hemberî Xweda rakirin ser piyan (Peyxam 12:3-4). Ev serhildan di rewşeke bêkêmasî de, li hizûra Rebê me yê mezin pêk hat! Îsa got ku Şeytan ne tenê derewkar e lê di heman demê de bavê derewan e jî (Yûhenna 8:44). Îsa her wiha rave kir ku hîle û xefikên Şeytan wê pir bi hêz bibin, heta ku ji destê wî bê wê kesên hatine hilbijartin jî bixapîne (Metta 24:24).

Çima divê em matmayî bimînin? Eger wî bi mîlyonan ferîşteyên li ezmanan xapandibin, weke “serwerê desthilatdariya ezmanan” (Efesî 2:2), xapandina bi mîlyonan kesên di vê pergala dinyayî de wê çima ji bo wî zor be? Em di wan rojên ku Îsa behsa wan dikir de dijîn. Ji ber vê yekê hişyariya dilsoz a Pawlos a ku ji bo Dêra Korîntî kir bi baldarî lêbikolin:

> “Lê ka çawa mar bi qurnaziya xwe Hawa xapand, ez ditirsim ku fikrên we jî bên xirandin û ji sadebûn û dilpakiya ku ji bo Mesîh e veqetin.” (Korîntî II, 11:3)

Pawlos qelsiya bawermendan şiband xapandina Hewayê. Bêguman, yek ji destkeftiyên herî mezin ên Şeytan xapandina Hewayê bû. Hewa di hawirdoreke bêkêmasî û azad de dijiya ku ne di bin desthilatdarî û bandora şeytan de bû. Ew bê asteng di hizûra Xweda de jiya. Kîn û nefret li ser wê tunebû; kesî tecawiz li wê nekir, jê nedizî, li ser wê gotegot nekir, bi tundî pê re neaxivî, an jî sûcên

din ên ku dikarin di cîhana me ya ketî de çêbibin, nekir. Divê ku serhildana wê yek ji planên herî xapînok ên Şeytan be. Wî taktîkên nazik û xapînok bikar anîn ji bo ku paqijiya hişê wê xera bike. Bi têgihîştina taktîkên ku wî li dijî Hewayê bikaranîn, em çeka herî baş a Şeytan eşkere dikin; em fêhm dikin ka wî çawa hewl da ku me bixapîne û çima îro gelek kes dikevin nav neguhdariyê.

Ji bîr nekin ku Hewa ji bo bêîteatiyê bike hat xapandin lê Adem dizanibû çi dike. Min di dêrê de hin kes dîtine ku bi eşkereyî fermanên Xweda şikandine, her çiqasî ew dizanin bê çi dikin jî. Ev kes nehatine xapandin. Ev kes dimeşin ber bi herêma talûke ve û ber bi mirina giyanî ve diçin (Romayî 8:13). Dilê van kesan kevir e û zehmet e ku mirov xwe bigihîne wan. Piştre yên din jî hene -piraniya wan ji kesên ku di dêrê de bêîteatiyê dikin, pêk tên- yên hatine xapandin. Mîna Hewayê, ji ber nezanîna wan deriyê xwe li xapandin û hêza veşartî ya bêqanûniyê vekirine.

Nezanîn, ji bo xapandinê cihekî hilberînê ye. Xweda got: "Gelê min ji ber nezaniyê wê sirgûn bibe" (Îşaya 5:13). Zanîna fermankirî ya derbarê rêyên Xweda û qanûnên giyanî de me ji xapandinên dijmin diparêze. Ronahiya rastiya Wî hemû derewan serav dike û me ji wan diparêze.

## AGAHIYA LI HEMBERÎ FERMANÊ HATIYE RAGIHANDIN

Xweda mirov di Bexçe de bi cih kir û jê re wisa got: "Tu dikarî ji her dara bexçe bixwî, lê ji dara zanîna qencî û xerabiyê nexwe. Çimkî gava tu jê bixwî, tê esse bimirî" (Destpêk 2:16-17).

Piştî vê yekê, Xweda jin ji laşê mêr afirand. Em dikarin texmîn bikin ku ev bûyer demek şûnda qewimî ji ber ku berî ku jin were afirandin, Adem li hemû heywan û teyrên ezmanan nihêrî û navek li her yekî ji wan kir.

Berevajî Adem, jinê ferman rasterast ji devê Xweda nebihîst. Bêguman dema ku Ew û Adem di nav Baxçe de dimeşiyan ferman ji

Hewayê re ragihand. Em dikarin vê yekê ji bersiva jinê ya ku da mar texmîn bikin. Ayetên li jêr bi baldarî bixwînin:

> "Di nav hemû heywanên kovî yên Xwedê Xudan çêkiribûn de yê herî jîr mar bû. Marî ji jinê re got: "Ma bi rastî jî Xwedê got: 'Divê hûn ji tu dareke bexçeyê nexwin'?" Jinê ji marî re got: "Em dikarin ji fêkiyên darên li bexçeyê bixwin. Lê Xwedê got: Divê hûn ji fêkiyê dara li nava bexçeyê nexwin û dest nedinê yan na hûnê bimirin." (Destpêk 3:1-3)

Pêşî gava ku mar lêpirsîne fermana Xweda kir, bala xwe bidinê ku jinê eşkere, li şûna îfadeya weke "Xweda… got" "… hûn dikarin bixwin" got. Ev ferman an jî qaîde bersiveke klasîk e ya kesekî ku ji yekî din bihîstiye. Ev ne ew celeb bersiv e ku kesek bi dil û niyeta Kesê ku xwediyê fermanê ye, bide.

Ya duyemîn, bala xwe bidinê ku bersiva wê ji fermana orîjînal a Xweda cuda ye. Hewayê ev lê zêde kir: "...fêkiyê darê nexwin, destê xwe nedinê, an na hûn ê bimirin." Xweda qet tiştek li ser destdayînê negot. Vê yekê xeyal bikin: Adem û Hewa gava ku li nav baxçeyekî mezinyê ku bi hezaran lê hebûn, digeriyan; tên ber wê darê û Adem tiştekî wisa dibêje: "Delala min, ew dara ku em ê destê xwe nedinê ev e." Adem li ser vê mijarê bi ya dilê Xweda dizanibû lê Hewayê nedizanibû. Adem bi gelemperî axivî lê Hewayê bi temamî ew fêhm nekir. Em mînaka bêyî ku em fermana gotinên Xweda rasterast ji aliyê Reb bibihîzin, gava em ji aliyê kesekî din ve van dibihîzin bê wê çi bibe, dibînin.

Dema ku Xweda Gotina xwe bi rêya Giyan eşkere dike, ew dibe parçeyek ji me. Ev dikare di xwendina pirtûkekê de, di guhdarîkirina hînkirina kesekî din de, di xwendina bi tena serê xwe ya Pirtûka Pîroz de an jî di hevkariya Giyanê Xweda de pêk bê. Ji bo Adem, fermana Xweda bi qasî her tiştê din ê li dora wî rast bû; parçeyek ji wî bû. Berevajî vê, dema ku em fermana Xweda dibihîzin lê ew bi

rêya Giyanê Wî ji me re nayê eşkerekirin, ew nabe parçeyek ji me. Ew tenê ji bo me qanûnek e û “guneh hêza xwe ji Qanûna Pîroz digire” (Korîntî I, 15:56).

Bi gumaneke mezin Hewayê derbarê vê darê de weke şexsî li Xweda negeriyaye. Wê tenê agahiya Adem weke “ev wisa ye” pejirand. Ji bo wê ev, agahiya veguheztî bû, ne agahiya lê hatibû fermankirin. Bihîstina wê ya ji kesê duyemîn, wê ew bêtir li hember xapandinê bêparastin bihişta. Ji ber vê yekê, mar li şûna Adem ew kir hedef.

Parastina me ya herî mezin ya li dijî xapandinê zanîna li me hatiye fermankirin, ne zanîna veguhêztî ye. Gelek kes bi qanûnê ve girêdayî ne ji ber ku wan tenê agahî, talîmat an jî sînorên di Nivîsên Pîroz de bihîstine. Çi ji dêûbavan, ji mamosteyên Pirtûka Pîroz, ji podcastan, ji medyaya civakî an jî ji pirtûkan, ew hewce ne ku dilê Xweda li ser vê mijarê bigerin da ku ew bikaribin têgihîştina ku wê wan ji xapandinê biparêze bi dest bixin. Bêyî dil lêdanê ew xwediyê qanûnê ne. Ew dikarin beş an jî ayetê ji ber bixwînin lê ji bêhna jiyanê ya li pişt Nivîsên Pîroz e, bêpar in.

Dibe ku ew bi coş û kelecanek mezin hînkirineke nû ya ku di semîner an jî konferansekê de bihîstine parve bikin. Lêbelê ew tiştê ku bi kelecan parve dikin, di pratîkê de naynin cih. Ev ne parçeyek ji wan e. Ew peyvan hildigirin, lê bêber dimînin û nikarin jiyana Xweda hilberînin. Dema ku ev diqewime, ew bi hêsanî têne ceribandina li tiştên ku Xweda dibêje zêde bikin an jê kêm bikin. Ew bi hêsanî dikarin bên xapandin ji ber ku têgihîştina wan a derbarê rêya Xweda de qels e.

Mînakeke ku min gelek caran bihîstiye ev e: “Erê, tu dizanî bira, kokeke hemû xerabiyan yek jê jî pere ye!” Gotina Xweda ne ev e. Xweda gotiye: “Kokeke hemû xerabiyan yek jê jî hezkirina pereyan e” (Tîmotêyos I, 6:10).

Eger pere koka hemû xerabiyan bûya wê demê Îsa jî wê ji rê derketa, ji ber ku qutiyeke pereyan û xwendekareke Wî yê ku berpirsyarê pereyan hebû! Carekê jinikekê rûneke ku hêjayî hemû

heqê salekê yê karkerekî, anî û bi ser Îsa dakir. Cihûdayê ku ji pereyan hez dikir, ji vê kirinê hêrs bû lêbelê Reb ew şermezar kir û pesnê jinikê da (Yûhenna 12:3-7).

Na, koka hemû xerabiyan ne pere bi xwe ye lê hezkirina pereyan e. Arezûyeke bêtendurîstî ya li hemberî pereyan e û bengîtiya bi pereyan ve ye. Ev nêrîna qanûnî dibe sedem ku mirov helwesteke xelet li hemberî pereyan pêş bixe ku Xweda ev qet nekiriye armanc. Ji ber vê, di warê aborî de tu carî nikarin bi helwesteke rastî ya xwedayî kar bikin. Ev nezanî piştrast dike ku gotina Xweda ji dilê wan re nehatiye fermankirin. Ew tenê xwedî zanîneke veguhestî ya derbarê gotina Xweda de ne û ji bo xapandinê vekirî ne.

Naxwe wisa be em ê agahiya hatiye fermankirin çawa fêhm bikin? Bi tirs û hezkirina Xweda ya di dilê me de pêdikeve û jiyana bi dilnizmî ya li ber Xweda. Xweda wisa got:

> "Ez li vî kesê dinêrim, Li kesê bindest, ruhşikestî
> Û ji ber peyva min dilerize" (Îşaya 66:2).

Kesê ji ber gotina Xweda dilerize, fêdeya vê bibîne û nebîne jî di cih de îteatê jê re dike. Kesekî ku bi rastî ji Xweda bitirse wisa ye. Û Nivîsên Pîroz vê beyan dikin: "Sira Xudan ji bo wan e ku ji wî ditirsin, Ew wan haydar dike ji peymana xwe" (Zebûr 25:14).

Îcar aniha em hevoka ku Silêman di dawiya jiyana xwe de got, baştir fêhm dikin: "Ji Xwedê bitirse û emrên wî bigire, Wezîfeya hemû mirovan ev e" (Waiz 12:13). Xweda sir an jî rêyên xwe ji kesên ku ji Wî ditirsin re dibêje û Yûhenna ji bawermendan re wisa nivîsand:

> "Min ev tişt li ser wan ên ku dixwazin we bixapînin ji we re nivîsîn. Îcar heçî hûn in, ew Ruhê ku Mesîh hûn pê mesh kirine bi we re dimîne û hewcedariya we bi hînkirina tu kesî tune. Çimkî mesha wî, li ser her tiştî çawa hînî we bike, rast

e, ne derew e û çawa hînî we kiribe, bi Mesîh re bimînin." (Yûhenna I, 2:26-27)

Ev, nîşan dide bê ka Gotina Xweda ya fermankirî çawa me ji xapandinê diparêze. Hewa, ji ber ku ji agahiya fermankirî ya Xweda bêpar bû hat xapandin û ji ber vê bêîteatî kir. Ji ber vê yekê nikarîbû xapandin û fena di gotinên mar de bibîne.

## MAR EV ÇAWA ÇÊKIR?

Em berdewam bikin û pirsê bibersivînin: Mar çawa jin xapand? Plana wî ya êrîşane ya xapînok çi bû? Pir grîng e ku mirov bi bersivê zanibe. Ka lê bifikirin: Hewa çawa ber bi xapandinê ve bir? Hewa bi temamî li derdoreke bêhempa dijiya. Ji aliyê kesekî ku xwedî rayederiyê ye nehatibû îstîsmar kirin. Bavek, bi patron an jî kêşe re tecrubeyeke wî ya xerab tunebû. Ji tundiya şeytanî dûr, li bexçeyekî hilberîner dijiya. Tekane tişta ku dizane başbûn û xweşkirina Xweda ye. Li hizûra Xweda meşiya û axivîbû. Baş e îcar mar çawa ew xapand?

Fermana Xweda bînin bîra xwe: "Xwedê Xudan li Adem emir kir û got: Tu dikarî ji her dara bexçe bixwî, lê ji dara zanîna qencî û xerabiyê nexwe. Çimkî gava tu jê bixwî, tê esse bimirî" (Destpêk 2:16-17).

Qenciya Xweda weke "dilê te kîjan fêkî bixwazî tu dikarî ji wê darê bixwî" bexş dike, rayedariya Wî weke "lê ji dara zanebûna qencî û xerabiyê nexwe" bi sînor kir. Xweda, yek ne di nav de lê azadiya ku karibin fêkiyê her darê bixwin, anî ziman.

Hezkirin û dayîn bingeha Xweda ne. Wî heval û hogirên ku dixwazin di bexçeyê Wî de, pê re di nava têkiliyê de bin dixwest. Wî robotên ku ji azadiya hilbijartinê mehrûm in nedixwest. Wî hesreta zarokên ku li gorî sûretê Wî hatine afirandin û xwedî îradeyeke azad in, dikişand. Dema ku wî gihîştina wan a darê sînordar kir, wî bijarteyek da wan bê ka gelo wê bi Wî re di têkiliyê de bimînin an na; di dawiya dawî tişta ku wê wan ji mirinê xilas bike ev bû. Vê

yekê îradeya wan vedihewand. Ma gelo wê wan bawer û îtaet jê re bikirina? Bêyî fermanê wê bijarteyeke din tunebûya.

Em gotinên mar ji nêz ve li wan bikolin: “Di nav hemû heywanên kovî yên Xwedê Xudan çêkiribûn de yê herî jîr mar bû. Marî ji jinê re got: Ma bi rastî jî Xwedê got: Divê hûn ji tu dareke bexçeyê nexwi’?” (Destpêk 3:1). Eger em pirsa wî bi awayekî modern îfade bikin, mar “Ez fêhm dikim ku Xweda gotiye hûn nikarin ji her darê fekî bixwin, ma rast e?”

Mar stratejiya xwe berî her tiştî bi xerakirina fermana Xweda re da dest pê kirin. Wateya wê berevajî kir û armanca Xweda xist ber lêpirsînê. Wî dixwest Hewayê bixe nav pêvajoyeke aqilmendiyê ku bihêle ew ji qencî û rastdariya Xweda guman bike. Gava ku wî ev carekê kir û bi ser ket, wê pir hêsan bûya ku vê yekê li dijî rayedariya Xweda pêk bîne.

Mar comerdiya Xweda paşguh kir û bal kişand ser îstîsnaya Wî. Wî bi wan da zanîn ku tiştekî baş ji wan tê veşartin. Mar bi pirsekê, fermana ku ji bo parastina wan hatibû dayîn, veguherand înkarkirineke neheq a qenciyê. Hûn biçûkdîtina di dengê wî de dibihîzin: “Ma got ji tu fekiyê dara li baxçe nexwin?” Her çiqasî xwediyê baxçeyekî mezin bûn ku wan dikarîbû her cure fêkî jê bixwara jî, mar bala Hewayê kişand ser tekane dara ku fêkiyê wê qedexe bû. Wî hewl da ku Xweda weke kesekî ku “distîne” nîşan bide ne weke kesekî ku “dide.”

Marê ku hişt Reb weke kesekî bêedalet xuya bike, îcar bi vî awayî wî dikarîbû êrîşî desthilatdariya Xweda bike. Şeytan ne ehmeq e, wî bingeha rayedariya Reb kir hedef: “Rastdarî û dadperwerî bingeha textê wî ne” (Zebûr 97:2). Textê Wî temsîla rayedariya Wî dike. Eger Şeytan bikaribe bi xapandin û ji rêderxistinê, karakterê rast ê Xweda xera bike, ew dikare bingeha rayedariya Wî di çavên afirandinê de bidarizîne.

Li dijî pirsa mar, jinê ew rast kir: “Jinê ji marî re got: Em dikarin

ji fêkiyên darên li bexçeyê bixwin. Lê Xwedê got: Divê hûn ji fêkiyê dara li nava bexçeyê nexwin û dest nedinê yan na hûnê bimirin” (Destpêk 3:2-3).

Mimkun e ku her çend wî bersiv da jî, wî meraq kir bê ka çi li pişt vê fermanê bû. Niha bala wî li ser wê darê ye. Ew li qenciya Xweda dipirse. Hûn dikarin xeyal bikin bê ka ew li çi difikirî? *Dar xweşik xuya dike... Ez nizanim çima em nikarin fêkiyê vê darê bixwin. Çi zerara vê heye? Tişta xerab ya di vê darê de ji bo me çi ye?* Bi gumanên nû bişkivîne yên li ser niyetên Xweda, ew eşkere bû ku li rayedariya Xweda lêpirsînê bike.

Mar bi wêrekî li dijî gotina Xweda derdikeve ku zerara fersenda rayedarî, rastî û durustbûna Wî bi dest xist: “Hûn qet namirin. Çimkî Xwedê dizane, çaxê hûn ji wê bixwin, wê çavên we vebin û wekî Xwedê, hûnê bi qencî û xerabiyê bizanin” (Destpêk 3:4-5).

Hosteyê xapandinê armanc dikir ku bi eşkereyî li ber dijberiya gotina Xweda derkeve û wê qaneh bike ku ew ê nemire ku bi vî awayî dilsoziya jinê ji holê rake. Daxuyaniya wî di cih de bi van gotinan berdewam kir: “Li şûna mirinê, tu yê bibî weke Xweda. Tu yê bikaribî qencî û xerabiyê bi serê xwe hilbijêrî ji ber ku tu yê bibî zana. Tu yê qet neçar nebî ku tiştekî ji hinekên din bibihîzî an jî teslîmî fermanên neheq bibî.”

## GUNEH WELIDÎ-PIŞTÎ WÊ KOLETÎ DERKET

Hewa matmayî bû û serê wê tevlî hev bû. Meraq kir û got: “Xweda çima min ji vî fêkî mehrûm bike?” Bi çavekî din be jî ji bo li fêkî binêre dîsa li darê nêrî. Biryar da ku fêkî baş û xweş e, ne xerab û ne jî bi zerar e. Wisa fikirî: “Bêguman ji bo xwarinê pir xweşik xuya dikin û ji her tişt li aliyekî wê me bike zana.”

Vê fikrê hişt ku ji hemû tiştên li dora xwe çavkor bibe. Ji ber ku tenê li darekê hûr bû pirbûna nîmetên ku jê re hatibûn avakirin ji bîr kirin. Di dilê xwe de wisa got: “Di vê darê de tiştekî baş ji me re

çêdibe û Xweda ew ji me veşart. Fêkiyê wê ji serê pêşî ve dibe ku bibûya yê me. Çima ev bi me kir? Eger vî fêkiyê baş ji me veşêre, îcar hîn wê çi din ji me veneşêre?”

Bi piştrastiya ku ew ê zirarê nebîne, digel gumanên li ser karakter, durustî û qenciya Xweda êdî tu sedemek wê tunebû ku di vê mijarê de teslîmî rayedariya Xweda bibe. Xwesteka wê li ser ya Bav serdest bû. Hewayê destê xwe dirêjî fêkî kir û ew çinand -tu tiştek çênebû. Dibe ku mar rast gotibe. Piştre wê fêkî xwar û da mêrê xwe jî.

Çawa wê fêkî xwar ji nişka ve çavên wê vebûn û bi fêhmkirina tazîbûna xwe re hesteke tirs û fedîbûnê hîs kirin. Bi bêîteatiya wan re mirina giyanî çêbû. Egoya wan êdî bûbû serkareke hêzdar ku li ser wan hukum dikir. Ji ber ku wan gotina Xweda didarizand û di ramana xwe de xapînok bûn, wan jiyana xwe ji efendiyê bêîteatiyê re vekirin. Efendiyê wan bibû tarî bi xwe.

Weke ku Nivîsên Pîroz piştrast dikin: “Ma hûn nizanin ku hûn ji bo xulamtiyê xwe bidin destê kê, hûn xulamên wî ne û hûn bi ya wî dikin? An ji bo mirinê hûn xulamên guneh in, an jî ji bo rastdariyê hûn xulamên guhdanê ne” (Romayî 6:16). Mirinê ne tenê mafê ku efendiyê wan têkeve jiyana wan dabû, di heman demê de destûra fermî ya ku tevlî dinyayê bibin jî da, ji ber ku Xweda ev alem bexşî mirovahiyê kiribû. Adem aniha ew teslîmî Şeytan kiribû. Pawlos ev wisa diyar kir: “Loma ka çawa bi saya yek mirovî guneh ket dinyayê û ji guneh mirin hat, wisa jî mirin derbasî hemû mirovan bû” (Romayî 5:12).

Berî bêîteatiya wan, nefret, hêrs, nebexşandin, pevçûn, paşgotinî, dejenerebûn, sextekarî, nexweşî û desteserkirin tune bû. Destdirêjiya cinsî, bikaranîna madeyên hişber, serxweşî, kuştin an jî dizî tune bû. Îstîsmara hevjînan an jî ya zarokan tunebû. Nexweşî, hêrsbûn û hejarî tunebû. Afetên xwezayî, nexweşiyên belav û veba ji aliyê mirovan nedihatin zanîn. Alema heywanan di nava

hevkariyeke tam de bihev re dijiyan. Atmosfera dinyayê, bi îradeya Xweda ya ku hukum li hemû afirandinê dikir, sakîn bû.

Bêîteatiyê ev pirsgirêkên tirsnak ên ku li serê mirovahiyê bibûn bela derxistin holê û lîste bi her nifşekî re pir û xerabtir bû. Kiryara wan a tekane ya serîhildanê, destpêka hêza veşartî ya bêqanûniyê nîşan dida. Ji ber xapandina wê mirov, dabînkirin û parastina Xweda winda kir. Şeytan, serîhildana xwe li ser mirovan dabîn kir û deriyê serdestî û hilweşîna xwe heta dawiyê vekir. Wî bi tevahî sûd ji derfeta ku mîna Xweda be girt, lêbelê ne bindestê Wî bû. Wî afirandina Xweda kir kole û xwe li ser text danî (Îşaya 14:12-14).

## KOMPLO DI ROJA ME DE JÎ EYNÎ YE

Şêwaza karê Şeytan îro roj jî ne cuda ye. Ew hîn jî hewl dide ku karakterê Xweda xera bike ji bo ku me li dijî Wî derxîne. Nameya Yaqûb vê yekê bi tevahî eşkere dike: “Birayên min ên hezkirî, neyên xapandin! Her dayîna qenc û her diyariya bêkêmahî ji jor e, ji Bavê ronahiyan tê xwarê. Li ba wî guherîn û siya zivironekiyê tune” (Aqûb 1:16-17).

Nivîskar dixwest ku em bawermend, weke Hewayê nebin qurbanê hêza veşartî ya bêqanûniyê. Wî hişyariyek da me ji bo ku me biparêze, weke Pawlos kir. Divê em guh bidin van gotinan û wan di dilê xwe de bi cih bikin, li derveyî çarçoveya xwesteka Xweda tiştek baş tuneye. Dibe ku ji derve ve baş xuya bike lê heke ew ne li gorî xwesteka Xweda be, piştrast bin, ji bo me tiştekî baş tuneye.

Yaqûb dubare kir ku eger hûn bawer bikin ku li derveyî dabînkirina Xweda qencî heye, hûn ê weke Hewayê werin xapandin. Bi baldarî lê bifikirin bê ka em li ser çi diaxivin. Çiqasî xweş xuya bike jî, çiqasî tahmeke xweş bide an jî çiqasî xweş bide hîskirin jî, we çiqasî dewlemend, serfiraz, aqilmend an jî serketî bike jî, eger ne ji Xweda be, wê we di dawiya dawî de ber bi rêya xemgînî, poşmanî û di dawiyê de jî ber bi mirinê ve bibe. Dabînkirin û parastina Xweda, wê bi rêya xapandinê re têkeve talûkeyê. Her diyariya bêkêmasî û

baş ji Xweda ye, Ew Çavkanî ye. Vê rastiyê hembêz bikin û di dilê xwe de bi cih bikin wê demê wê şikl û şemal we nexapîne! Eger Hewayê ev bikira, wê ji rê derneketaya. Wê li derveyî dabînkirina Xweda nihêrî da ku arezûyên xwe bicîh bîne.

Çend kes ji ber sedemên xelet bi kesên xelet re dizewicin? Dibe ku Xweda bi rêya dê û bav an jî bi ya pastoran wan hişyar kiribe, an jî dibe ku rasterast bi dilê wan re axivîbe lêbelê wan destûr da ku aqilê wan van dengan bifetisîne. Belkî jî ew tenê bûn û hevaltî dixwestin. Belkî jî ew kes li ber çavên wan xweş xuya dikir û biryar dayîna wan hêsantir kir. Bêyî ku karibin jê birevin wan xwesteka xwe neda bi ya Xweda û gelek caran êşên mezin kişandin.

Bêguman, Xweda dikare biryarên me yên xelet bibexşîne. Guneha Dawid a girtina Batşeba piştre di çêbûna Silêman de hate bexşandin. Lêbelê Dawid ji ber bêîteatiya xwe gelek xemgîn bû ji ber ku şûr qet ji mala wî kêm nebû. Wî sê kurên xwe di temenê wan yê herî xweş û ciwan de, winda kirin. Çiqasî baştir e ku em rêya îteatiyê hilbijêrin.

Gelek caran mirov ji cihê ku Xweda ew lê bicih kiriye -cihê kar, dêr, bajar- terk kirine ji ber ku ew nikarin bi rayedarên li ser serê wan in li hev bikin. An jî belkî dibe ew dibînin ku jiyana wan sakîn bûye an jî ew bawer dikin ku li cihê ku ew lê ne pêşerojek ji bo wan tuneye. Di demek kurt de derfetek derdikeve holê û ew diçin, her çiqasî tu sedem tunebe ku ew ji Giyanê Pîroz dûr bikevin jî xwe jê dûr dixin. Ne tenê ev jî lê bi çûyînê re ew pirî caran jiyana paqij a ku Xweda bang wan kiriye jê tawîzê didin. Ew difikirin û wisa dibêjin: “Ev demeke dirêj e ez li ser vî refî rûniştime êdî divê ez tiştekî bikim.” Dûv re ew didin dû tiştê ku bawer dikin ji bo wan baş e û li dijî xwesteka Xweda derdikevin. Dibe ku ew ji hêla aborî ve di rewşeke baş de bin lêbelê dilê wan demeke dirêj e ji têkiliyeke nêzîk û bicoş ya bi Reb re dûr ketiye.

Bi awayekî giştîtir çend kes bêîteatiyê li hemberî xwesteka

Xweda dikin? Ew bi tiştên baş û xweş tên xapandin. Belkî jî ew ê ji bilî şîreta Gotina Xweda, rêyeke bextewarî an jî serfiraziyê ji xwe re bibînin. Ew li dû wan diçin û ji bo demekê be jî kêf, bextewarî an jî heyecanê dibînin. Ew di tişta ku Xweda jê re dibêje "na" de "başiyê" dibînin. Ew ditirsin ku Xweda wan ji tiştên balkêş an jî yên xweş mehrûm bike! Ew difikirin ku Xweda hewcedariyên wan fêhm nake an jî girîngiya arezûyên wan paşguh dike. Eger duayên wan di demên diyarkirî de neyên bersivandin, ew bawer dikin ku Xweda ne dilsoz e. Difikirin û dibêjin: "Çima ez ê li bendê bim? Ez ê tişta baş û xweş aniha rahijimê!"

## LI ÎSA BIFIKIRIN

Li Îsa bifikirin. Çil şev û çil rojan li beyebanê tî û birçî û di halekî xerab de ma. Êşên ji ber birçîbûnê zikê wî dikir ku qul bikin. Eger di demeke kin de nexwara û venexwara wê teqez bimira. Lê pêşî çi hat: başbûn an xapandin?

Tam di wê rewşê de, Şeytan hat ku Îsa bidarizîne: "Eger tu Kurê Xwedê be, bêje bila ev kevir bibin nan" (Metta 4:3). Dijmin careke din tişta ku Xweda bi eşkereyî diyar dikir, lêpirsîna wê dikir. Bav li qiraxa Çemê Şerîa bi awayekî eşkere diyar kiribû ku Îsa Kurê Wî ye. Şeytan dîsa hewl dida ku karakterê Xweda ne xweşik bide xuyakirin: "Eger tu Kurê Xweda be çima ji bo ku tu ji birçîna bimirî tu aniye vir? Ew çima alîkariya te nake? Belkî jî dema ku tu li çareseriya serê xwe binêrî hatiye. Di demeke kin de eger tu tiştekî nexwî tu yê bimirî an jî tu pir dereng bimînî, wê pirsgirêkên te yên cîdî yên fizîkî çêbibin. Ji bo ku tu xizmetê ji xwe re bikî rayedariya xwe bi kar bîne. Van keviran bike nan."

Îsa li ber xwe da û li benda başkirina Xweda ma. Nehişt ku karekterê Xweda di hişê wî de ji rê derxe. Zanîbû ku pêdiviyên Bavê xwe bi cih tîne. Di wê rewşê de rewş çiqasî nexweş xuya bike jî bila bike, serê xwe li ber rayedariya Xweda tewand.

Ji bo ku bibe serwextê meseleyê, piştî ku li ber xapandina Şeytan li ber xwe da, “Îblîs dev ji wî berda û milyaket hatin û ji wî re xizmet kirin” (Metta 4:11). Çi ma? Nivîskarê nameya Îbraniyan, Îsa wisa pênase kir: “Îsa di jiyana xwe ya li ser erdê de bi gazî û hawar, bi hêstirên çavan dua û lavan pêşkêşî wî kir, ku dikarî ew ji mirinê xilas bikira û ji ber xwedêtirsiya xwe hatibû bihîstin. Bi ser ku Kur bû jî, ji cefayên ku kişandin hînî guhdanê bû” (Îbranî 5:7-8). Ji ber tirsa Xweda Bavê Wî, Ew bihîst. Ji qenciya Bav tu guman nekir. Li hemberî êş û xapandinên mezin ên ku tu kes nikare xwe li ber wan bigire jî, her çiqasî bê maneya ku zordariyên pir zor in jî Wî îteatî hilbijart.

Beravajî berteka Adem û Hewayê, îteatî û sertewandin; hemû rêyên ku dijmin wê karibin têkevin nava jiyana wî girtin. Wisa şahidî kir: “Çimkî serokê vê dinyayê tê. Tu tiştê wî bi min re tune, lê bila dinya bizane ku ez ji Bav hez dikim û Bav çawa emir daye min ez wisa dikim” (Yûhenna 14:30-31).

Berevajî Ademê yekem, Îsayê ku weke Ademê Dawî dihat binavkirin, bi îteateke bêkêmasî ji bo Bavê xwe re jiya û şahidiya ku tu rayedariya Şeytan li ser wî tuneye, kir. Ha ji ber vê yekê ev ferman li me tê kirin: “Kesê bibêje ez di Xweda de dijîm, divê li ser rêya Mesîh bimeşe” (Yûhenna I, 2:6). Ew mînak û pêşengê me ye. Kesê bedel daye û rêya em ê bidin ser ronî kiriye Ew e. Êdî em ne êsîrê rê û nebaşiaya Ademê pêşî ne lê ji bo em bidin ser rêya îteatiya Ademê dawî, bang li me hatiye kirin û bi vê armancê em hatine bihêzkirin.

> “Îcar li gor ku ewrekî evqas mezin ê şahidan hawirdora me girtiye, em jî her giraniyê û gunehê ku bi hêsanî xwe li me dipêçe ji ser xwe bavêjin, bi bîhna fireh wê hevbezîna ku li ber me ye, bibezin. Em çavên xwe bidin ser pêşeng û temamkarê baweriya xwe Îsa. Wî ji bo şahiya ku li ber wî bû, xaç ragirt ser xwe û şermî bi tiştekî hesab nekir û li milê Xwedê yê rastê rûnişt. Îcar li ser wî bifikirin ê ku dijraberiya mezin a

gunehkaran ragirtiye, da ku hûn newestin û di dilê xwe de sist nebin.” (Îbranî 12:1-3)

Ev ayet rewşê bi kurtasî vedibêjin. Ji ketina Ademê pêşî ji xwe re dersê bigirin û xwe li îteatiya Ademê dawî bişidînin.

Di beşa pêşiya me de, em ê encamên bêîteatiyê binirxînin. Ev encam her gav di cih de xuya nakin lêbelê teqez ew ê derkevin holê. Dema ku bêîteatî bi eşkereyî derkeve holê, divê hûn careke din qet nefikirin ku li wê tehemûl bikin.

BEŞ 5

# ENCAMÊN BÊÎTEATIYÊ 1

*Bawerî û îteatî ji hev nayên qutkirin ji ber ku*
*îteat delîla baweriya bi rastî ye.*

Encamên cûrbecûr ên bêîteatiyê hene. Bandora her dem di cih de xuya nake lêbelê ew, mîna tovên hatine çandin ku wê fêkî bidin, zû an jî dereng derdikevin holê. Dijminê canên me hewl dide ku vê zanînê ji me veşêre û bi hêviya ku em ê îteatê bi tiştekî nehesibînin û bikevin nav xefikên wê yên xapînok.

Hin kes difikirin ku destkeftiyên wê kêlîkê yên ku ew ji bêîteatiyê bi dest xistine wê ji encamên demdirêj girantir bin. Ez matmayî mam ku ev fikra xapînok û kujer evqasî berbelav e. Hêza veşartî ya bêqanûniyê ewqas e. Her sê beşên pêşî, ji bo di dilê we de biryara lîstika bêîteatiyê çêneke, hêvî û duaya min ya herî jidil û can e.

## ZAROKÊN ADEM

Werin em bi îbreta Qayîn, kurê pêşî yê Adem dest pê bikin. Karê Qayîn cotkarî bû. Kurê duyemîn ê Adem, Habîl jî şivan bû. Nivîsên Pîroz dibêjin ku piştî demekê, Qayîn ji çandiniya xwe ya pêşî ji Reb re pêşkêşek kir, Habîl jî ji keriyên xwe yên ku berê pêşî zan,

pêşkêşek kir. Piştî vê em wisa dixwînin: “Xudan Habîl û pêşkêşiya wî qebûl kir. Lê Qayîn û pêşkêşiya wî red kir” (Destpêk 4:4-5).

Weke jêrenotekê, ev ayet di dêrên me de îro roj gotineke ku em gelek caran dibihîzin pûç dike: “Hûn çi bin wê Xweda we wisa bipejirîne.” Ya rastî eger em tobe bikin, em çi bin wê Xweda me wisa bipejirîne! Vê gotina kêm, di ser Hananya û Safîra re biceribînin. Li rewşa wan nayê, her du jî mirine (Karên Şandiyan 5:1-11).

Xweda pêşkêşa Qayîn qebûl nekir; ji bilî vê Qayîn qebûl nekir! Redkirina wî ya neqebûlkirina Qayîn nayê wê wateyê ku ew wê bi awayekî daîmî çarenûsa wî bê redkirin, lê qebûlkirina bê şert û merc a Xweda di teolojiya îro de ne rast e. Ya rastî, ev ramaneke bi talûke ye, ji ber ku ew tirsa Reb ji dilê me dûr dixîne. Tirsa Reb me diparêze û me ji gunehan dûr dixe (Derketin 20:20). Piştî mirina Hananya û Safirayê, Pirtûka Pîroz ji me re wisa dibêje: “Tirseke mezin ket ser tevahiya civîna bawermendan û ser hemûyên ku ev tişt bihîstin” (Karên Şandiyan 5:11). Êdî bêîteatî ne meseleyeke sivik bû!

Ez dixwazim çîroka her du kurên Adem ji bo zelalbûnê hinekî din nûjen bikim. Kur di nav malbatekê de mezin bûn ku ji Reb bawer dikirin. Her duyan jî qurbanek pêşkêş kir ji Reb re ku jiyana wan temsîl dikir. Pirtûka Pîroz dibêje, divê em bedena xwe weke qurbaniyên zindî pêşkêş bikin (Romayî 12:1). Her gava ku qurbanekî tînin hizûra Xweda, ev xizmeta me ya ji Wî re ye temsîl dike. Ji ber vê yekê, em aniha ferqa di navbera Habîlê ku xizmeta Xweda dikir û Qayînê ku xizmeta wî nedikir, nakin. Qayîn li qumarxaneyan, li salonên striptizê an jî li baran nagere û ji dêrê dûr nakeve. Qayîn bi mirovekî ku ti têkiliya wî bi Xweda re tuneye, tevlihev nekin. Her du jî wê weke bawermendên ku niha bi Xweda re di têkiliyê de ne werin hesibandin.

Her du mêr jî ji bo pêşkêşkirina qurbanên ji Reb re di hewildanên xwe de bi xîret bûn. Ya rastî, mirov dikare bi dilrehetî bibêje ku Qayîn ji Habîl bêtir dixebitî. Ez di derbarê çotkarî û şivantiyê de

pir kêm tiştan dizanim lê ez texmîn dikim ku çotkarî ji şivantiyê dijwartir e. Di şivantiyê de, berpirsiyariyên we yên sibehê û yên piştî nîvro hene lêbelê pirî caran di germahiya rojê de, hûn dikarin di bin siya darekê de bêhna xwe berdin û vexwrinên xwe yên sar vexwin.

Çandinî bêtir kedê dixwaze. Pêşkêşiya Qayîn ji xwêdana eniya wî hat ku li ser erda ku Xweda nifir lê kiribû dixebitî (Destpêk 3:17-19). Qayîn erd ji kevir, dar û bermahiyên din paqij kir. Piştre cot kir û çand. Wî bizir da, av da, gubre da û xwedî li zeviyan derket. Ji bo ku pêşkêşiyekê bike wî gelekî hewl da.

## XWEDA ÇIMA QAYÎN NEPEJIRAND?

Naxwe her çiqasî zanîbû ku wî bêtir ked da ye jî, Xweda çima pêşkêşiya Qayîn nepejirand? Bersiva vê di dê û bavê wî de veşartiye. Li Bexçe, ji bo her tiştê ku Xweda afirandibû, perdeyek hebû. Hiriya heywanan, pûlên masiyan û perîkên çivîkan hebû. Hûn tu carî hirçekî cemseran yê ku pantorekî kot li xwe kiriye nabînin, pêdiviya wan bi perdeyekê tuneye.

Adem û Hewa jî ne îstîsna bûn. Cil û bergên wan ên fîzîkî tunebûn; li şûna vê, ew bi rûmetê hatin “tacdarkirin” (Zebûr 8:5). Peyva tacdariyê tê wateya “rapêçandin an jî dorpêçkirinê.” Ew bi rûmetê hatibûn nixumandin. Rûmeta ku Xweda li wan pêça bû ewqasî balkêş bû ku tazîbûna wan a fîzîkî li ber çavên wan vedişart. Ji ber vê yekê Nivîsên Pîroz wisa dibêjin: “Adem û jina wî tazî bûn lê şerm nedikirin” (Destpêk 2:25). Ji aliyê rastiyên xwe ve nedihatin birêvebirin, berevajî vê jiyanên wan berî Xweda dihatin. Fikra cil û bergan qet nehat bîra wan ji ber ku pêdivî pê tunebû.

Kêliya ku bêîteatî kirin rewş guherî. Berî bêîteatiya wan, giyanê wan bi temamî desthilatdar bû lêbelê aniha desthilatdarî derbasî bedenê bibû. Piştî ku fêkî xwarin gotinên pêşî yên ku di Pirtûka Pîroz de hatin qeydkirin ev bûn: “Çavên herduyan jî vebûn û wan fêm kir ku tazî ne” (Destpêk 3:7 ). Peyva “fêhm kirin” ya li vir îfadeya

sereke ye. Bûn xwediyê agahiyeke ku berê haya wan jê tunebû.

Prensîba zanîna qencî û xerabiyê ew e ku mirov li gorî rast û xeletiyê bijî. Berî Ketinê, kirinên wan ne ji hêla zanîna qencî û xerabiyê ve an jî rast û xeletiyê ve, lê ji hêla zanîna Xweda ve dihatin birêvebirin. Ew ji aliyê hesta îtaeteke ku ji bawerî û evînê zabû, dihatin motîvekirin. Rastî û xeletî ne di hişê wan de bû, di destê Xweda de bû. Em wisa dixwînin:

“Ew zinar e, karê wî kamil e,
Hemû riyên wî adil in.
Ew Xwedayê dilsoziyê ye, neheqiyê nake,
Ew rast û dirust e.”
(Dubarekirina Şerîetê 32:4)

Adem û Hewa bi hişmendiyeke kamil ya Xweda re û bi Xweda re di nava ahengê de dijiyan. Bi xwarina fêkiyê Dara Zanîna Qencî û Xerabiyê re, wan çavkaniyeke zanînê li derveyî Xweda dît bê ka çi baş e û çi xerab e. Em dikarin vê yekê weke prensîba aqil an jî weke rêbaza têgihîştinê binav bikin. Ji bo rêvebirinê êdî hewcedariya wan bi Xweda tunebû, di nava wan de hişmendiya rast û xelet hebû. Ji ber vê yekê pirsa yekem ya ku Xweda piştî ketina wan ji wan pirsî ev bû: ”Kê ji te re got?” (Destpêk 3:11).

Kengî Xweda pirseke dipirse, li agahiyê nagere. Ew we dikişîne nav mijara ku dibêje. Xweda jixwe dizanibû ku wan ji darê fêkî xwariye û li gorî zanebûna xwe diaxivin. Wan li şûna îteatê serî li aqilmendiyê da. Ya rastî wisa digot: “Ango niha we li derveyî Min çavkaniyeke hesta rast û xelet dîtiye. Diyar e ku we ji fêkiyê Dara Zanîna Qencî û Xerabiyê xwariye.”

Piştî bêîteatiyên wan di cih de, wan tazîbûna xwe bi pelên hêjîrê an jî bi berhemên axê veşart. Her çiqasî wan tiştek li xwe pêça bû jî, xwe tazî hîs dikirin û xwe vedişartin. Piştre Xweda pirsî: “Kê ji te re got ku tu tazî yî?” (Destpêk 3:11). Bi hesta xwe ya nû

dîtî ya rast û xelet, wan hewl da tiştê ku li gorî wan rast bû bikin, lê dîsa jî wan xwe tazî hîs dikir. Ev nuxumandin ne rêya Xweda bû. Xweda heywanek bêguneh kir qurban û bi çermê wê Adem û Hewa nuxumand ku bi vî awayî nuxumandin an jî pêşkêşiya ji bo tazîbûnê bê çi ye, nîşan da. Rêya Xweda ya ji berê ve diyar kiriye, ne berhema axê bû, ev bû.

Di wê gavê de, Adem û Hewa di mijara daxwaza Xweda de cahil bûn lê Qayîn û Habîl ne cahil bûn. Dê û bavê wan pêşkêşiya ku Xweda dipejirand, hînî wan kiribûn. Ji ber vê yekê, dema ku Qayîn ji berhemên axê pêşkêşiyek anî, ev pêşkêşiyek bû ku nedihat pejirandin. Wî li gorî rêya xwe ji Xweda re xizmet dikir! Weke birayê xwe Habîl li şûna ku bi dilê paqij îteatiya pak bike, wî berê xwe da laneta ku pişta xwe dide mantiqê xelet û rast yê ku bi rêya aqil dixebite.

## DIVÊ TU DESTHILATDARÊ WÎ BE

Nivîsên Pîroz ji me re wisa dibêjin: “Bi baweriyê, Habîl goriyeke ji ya Qayîn çêtir pêşkêşî Xwedê kir. Bi wê baweriyê ew mirovekî rast hat erêkirin, çimkî Xwedê diyariyên wî erê kirin. Rast e, Habîl mirî ye, lê bi saya baweriya xwe hê jî dipeyive” (Îbranî 11:4). Nivîskarê Peymana Nû îteata Habîl û bawerî wekhev dît. Di beşeke pêş de em ê fêr bibin ku baweriya rastîn ne tenê wekhevî îtaetê ye lê li ser wê hatiye avakirin. Baweriya rastîn ji îtaetê tê, ne ji zanîna rast û xelet.

Dema ku Qayîn fêhm kir ku hewl û pêşkêşên wî ji hêla Xweda ve nayên qebûlkirin, “gelek hêrs bû, mahdê xwe kir” (Destpêk 4:5). Ev berteka klasîk a kesayetiyekî olî ya durû ye ku bi rastiyê re rûbirû dimîne. Ew hêrs dibe. Hûn vê yekê di seranserê Nivîsên Pîroz de dibînin ku rast e. Ev hêrs ji serbilindiyê têr dibe û serbilindî îrade û rêyên Xweda red dike.

Xweda, bi dilovaniya xwe re pirs ji Qayîn kirin ji bo ku çavên wî veke: “Çima tu hêrs bû? Tu çima mahdê xwe dikî? Eger tu tiştê rast bikî, ma ez te nepejirînim?” (Destpêk 4:6-7). Derbaskirina baş ya bi

Xweda re tê wateya îteata ji bo Wî. Ew îteatê dixwaze, ne qurbanan. Gelek caran Wî ji gelê xwe re got ku dev ji muzîk û amûrên xwe berdin, deynin aliyekî û dev ji anîna qurbaniyan jî berdin. Çima? "Ji ber ku gava min gazî kir, kesî bersiv neda; gava ez axivîm, wan guh neda min" (Îşaya 66:4). Wan qurban serjêkirin lê wan guh neda gotina Wî an jî îteat jê re nekirin. Awayê herî bilind ê hebandinê îteat e.

Bi vê zanînê, eger gava em hevoka "kirina tiştê rast" bi "îteata ji bo min" biguherînin, ayet dikare bêyî guhertina wateyê wisa bê şîrovekirin: "Qayîn, tu çima hêrs bûyî? Ne hewce ye ku tu hêrs bibî. Ji vê yekê dersê bigire. Eger tu weke birayê xwe îteatê ji min re bikî, ez ê te û qurbaniya te qebûl bikim."

Reb hişyarî da: "Lê heke tu ya rast nekî (îteatê nekî û li ser fikra xwe ya heyî be) guneh li ber deriyê te ye. Di kozikê de li benda te dimîne. Lê divê tu bi ser guneh bikevî" (Destpêk 4:7).

Li vir bala xwe bidin du tiştan. Pêşî, arezûya guneh (bêîteatî) heye. Hêza li pişt bêîteatiyê û efendiyê ku qanûnê nas nake Şeytan e. Dema ku bidestxistina vê hêzê ji aliyê Adem ve destûra wê hat danîn, tenê armanceke wê hebû: kontrolkirina her kesî û her tiştî û desthilatdariya hemûyan. Em dikarin vê yekê bi zanyarekî xerab re bidin şibandin ku gelek gaza jehrîn berdide atmosfera me. Her çend hebûna zanyar bi rastî belav nebe jî, gaza ku ew berdide wê li her derê belav bibe. Wî hêzeke kujer xistiye tevgerê. Kesên ku xwe ji van gazên kujer diparêzin tenê ew kes in ku maskeyên parastinê didin ber devê xwe. Nivîsên Pîroz pir zelal in: "Em dizanin ku em ji Xwedê ne lê tevahiya dinyayê di bin kontrola yê xerab de ye" (Yûhenna I, 5:19).

Nimûneyeke din jî ew e ku kişandina gunehê bi qanûna kêşehêza erdê re were şibandin. Kêşehêz, hêzeke domdar e ku her tim dixebite û bandorê li ser hemû madeyê dike. Eger hûn xwe ji avahiyekê bavêjin, hûn ê bibînin ku ev qanûn dixebite û hûn ê bi lez ber bi jêr ve bikevin. Dibe ku hûn nexwazin bikevin an jî hûn

nexwazin hay ji qanûna kêşehêza erdê hebin an jî baweriya xwe pê neynin lê dîsa jî hûn ê bi wê re rûbirû bimînin.

Rojekê zanyaran qanûneke din keşf kirin -qanûna aerodînamîkê. Ew fêr bûn ku gava şert û mercên normal tên avakirin, qanûna aerodînamîkê cihê qanûna kêşehêzê distîne. Dahênerên nûjen balafirên nûjen li ser bingeha qanûna aerodînamîkê sêwirandin. Dema ku hûn bi balafirê difirin, hûn li cîhekî azad in ku ne di bin kontrola qanûna kêşehêza erdê de ye û ji ber kêşehêza erdê hûn nakevin. Nivîsên Pîroz ji me re wisa dibêjin: “Çimkî qanûna Ruhê ku bi Mesîh Îsa jiyanê dide, ez ji Şerîeta guneh û mirinê azad kirim” (Romayî 8:2). Çi nûçeyeke bêhempa!

Ez gelek caran bi balafirê rêwîtiyê dikim. Di sîh salên ku ez Mizgîniyê li seranserê cîhanê belav dikim de, hema bêje ez nêzîkî deh milyon km rê çûme. Dema ku ez li van balafiran siwar dibim, ez kêfxweş im ku qanûna aerodînamîkê min ji qanûna kêşehêza erdê azad dike. Lêbelê heke pîlot biryarê bide ku motoran bisekinîne an jî baskên wê lê bibin, balafir wê hêza tevahiya qanûna kêşehêza erdê hîs bike û ew ê bi awayekî pir xurt bikeve erdê. Em ê êdî ji hêza kêşehêzê kêfê negirin lê em ê bibînin ku ew ji alî qanûna ku em berê li ser desthilatdar bûn tên îdarekirin.

Nivîsên Pîroz di heman beşê de vê beyan dike: “Îcar birano, madem ku wisa ye, em deyndar in, lê ne deyndarên nefsê ne ku em li gor wê bijîn. Çimkî eger hûn li gor nefsê bijîn, hûnê bimirin” (Romayî 8:12-13). Her çiqasî qanûna Giyanî ya ku jiyanê bexş dike me ji qanûna gunehê azad dike jî, qanûna gunehê xera nabe û dimîne. Ji bo em parastina vê azadiyê an jî serweriya qanûna gunehê bikin, ev ji baweriya rastîn an jî ji îteata di dilê me de ye, derdikeve holê.

“Qanûna Giyanî ya ku jiyanê bexş dike” di heman demê de weke “prensîba baweriyê” jî tê binavkirin (Romayî 3:27). Em dizanin ku prensîba baweriyê qanûna gunehê betal dike. Baweriya rast bi kirinên îteatiyê re tê pênasekirin (Aqûb 2:19-23). Bawerî û îteat ji

hev nayên veqetandin, ji ber ku îteat delîla baweriya rast e.

Habîl, bi bawerî an jî îteata Xweda re bû desthilatdarê qanûna guneh û mirinê. Lêbelê Xweda Qayîn wisa hişyar kir: Guneh li benda te ye (weke tu ferq di navbera bandora kêşehêza erdê ya li ser madeyekê tunebe); eger tu îteatê ji Min re bikî, tu yê bibî desthilatdarê gunehê (weke çawa ku aerodînamîk kêşehêza erdê betal dike). Guneh bi îteatê tê kontrolkirin.

## KETINA SERBEST

Tişta duyem ya ku Xweda ji Qayîn re kir, di îfadeya "Lê eger tu tiştê rast nekî [îteatê ji Min re nekî], guneh li ber deriyê te disekine..." (Destpêk 4:7) de veşartiye. Li vir bala xwe bidin peyva derî ku bi kar aniye. Di jiyana her kesî de deriyekî mecazî heye, hûn di ferqa wê de bin an jî ne di ferqa wê de bin, li wir e. Ev derî ketina nav jiyana we temsîl dike. Di vê çarçoveyê de, ew ketina guneh û hêza şeytanî ye ku dikeve nava jiyana mirovan. Xweda hîn ji destpêkê ve ji me re dibêje bê ka çi deriyê guneh û bandora şeytanî vedike û çi digire. Bêîteatî deriyê gunehê vedike, lêbelê îteat wê bi hişkî digire.

Çi bû ji Qayîn? Di zanebûn û ramana xwe de israr kir. Hesûdî ket dilê wî û zikreşî pê re çêbû. Piştî wê nefretê dest pê kir. Kuştin ji berê ve hatibû plankirin û pir dom nekir ku Qayîn birê xwe bi hêrsê bikuje. Yekî şerxwaz bû û ji tirsa Xweda bê par bû. Gava ku Xweda li birê wî pirsî bê li kuderê ye, bersiveke bêrêz ku gef li Xweda dixwend, da: "Ez nizanim, ma ez nobedarê birayê xwe me?" (Destpêk 4:9). Derew li Xweda dikir ji ber ku zanîbû bê birayê wî li kuderê ye.

Her kesekî aqilmend wê bizanibe ku Xweda dizane Habîl li kuderê ye lê dema ku kesek berê xwe dide zanebûna xwe û di jiyana xwe de destûrê dide bêîteatiyê, tişta dibe ev e. Ew têkiliya xwe bi rastiya tiştên giyanî re winda dike. Ew hewl dide ku îmaja Xweda daxîne ast û sînorên xwe û dibe ku xwe weke Xweda aqilmend, heta carinan jî xwe aqilmendtir bifikire. Hişê wî ne li serê wî ye. Lusifer

ji bo vê mînakeke baş e: Ramanên wî yên ji xerabiyê ava dibin, pê didin bawerkirin ku ew dikare Xweda têk bibe. Çi fikreke eletewş! Lê dîsa jî gelek kes ji rê derxistine (Îşaya 14:12-17).

Eger hûn bi Qayîn û Habîl re heval bûyana û haya we ji mesleyê hebûya, dibe ku vê bûyerê hûn şaş bihiştana. Mirovekî bi xîret ku dest bi xizmeta Xweda kiriye, çawa çê dibe ku di encamê de dibe kujerekî bêrêz? Ev çawa çê dibe? Israrkirina di bêîteatiyê de, deriyê giyanî ji qanûna gunehê re vekiribû. Hûn bi gotina “me ji yekî re got merheba, vekir devê kurk û eba” dizanin. Ev gotin qanûna bêîteatiyê bi awayekî bêkêmasî rave dike. Gava hûn rêya jiyana xwe hinekî jê re vedikin, dişibe derzeke biçûk ya di bendavê de. Hêza avê di dawiya dawî de bendavê hildiweşîne.

Zêdetirî sîh salan e ez bûm xwediyê wê şerefê ku min xizmeta Mizgînî’yê kir. Di nava vê demê de, ez bûm şahid ku ev qanûn di gelek bûyeran de hat bikaranîn. Min ew kesên ku ji bo xebatên Xweda destpêkeke bicoş kirine, dîtin. Ew di dêrên xwe de çalak bûn û her dem ji kesên din re behsa Îsa kirine. Ew weke Qayîn in ku bi hewildaneke mezin dest bi kar kirine. Lê bi demê re rewşên ku aliyên îradeya wan derdixîne holê, diyar dibin. Ev qadên îradeyê weke di Qayîn de, dibe ku li dijî rayedariya Xweda rasterast an jî rayedariya ku dewirkiriye, bin. Di her du rewşan de jî dibe ku her dem xuya bibe weke ku bi rayedariyê pevdiçînin.

Min dîtiye ku ew red dikin ku îradeya xwe teslîm bikin û li ser rêya xwe israr dikin. Kêliyek maye ku nehesabkirina qanûnê jiyana wan di bin avê de bihêle. Dibe ku ew xwe di kuştinê re dernexîne lêbelê tişta teqez ev e: bi awayekî xwe nîşan bide. Belkî çavbirçîtî, nefret, hêrs, nebaxşandin, pevçûn, gotegot, zinê an jî awayên bêhejmar ên cureyên koletiyê şexsiyeta wan zeft dike. Gelek caran di vê rewşa xapandî û aciz de, ew difikirin ku ew li ber Xweda rast in û hemû rayedariyên din ên bêkontrol, qanûnî an jî bêfikar in.

Di rewşên weke yên Qayîn de, eger ew li dijî rayedariya rasterast

a Xweda serî hildin; ew îmaj, rayedarî û hêza Xweda ji bo xwe kêm dikin û digihînin astekê ku ji bo wan bêtir bê bikaranîn û bi vî awayî bêtir dikevin rewşeke bêrêziyê. Ew Wî weke Reb îlan dikin lê di rastiyê de ew xizmeta Îsayekî derewîn dikin ku li gorî wêneyê wan hatiye afirandin. Bêyî ku haya wan jê hebin, ew ramanên xwe li ser text û rayedariya Xweda bilind dikin. Di her rewşê de, ew ji ber xapandina di dilê xwe de ji rewşa xwe ya rastîn re kor dibin.

Eger dema ku ew hîn xortekî dilnizm û xizmetkarê Xweda bû, ji Qayîn re bigota: “Rojekê, tu yê birayê xwe bikujî” ew ê matmayî bimaya û wê zû nerazîbûn nîşan bidaya: “Ev ne mumkin e. Ez ê tu carî vê nekim!” Lêbelê piştre wî xwe ji bêqanûniyê re vekir û tiştê ku berê ji bo wî ne mimkun bû, kir.

Mirovên hem di hundir û hem jî li derveyî dêran de, rojekê wê li ber Xweda rawestin û ji ber xerabiyên xwe wê bên darizandin. Lê dîsa jî eger we bikaribiya rêça jiyanên wan bişopînin, we yê qet xeyal nekira ku ew ê bigihîjin cihekî wisa. Heta niha jî ew xwe weke kesên bêqanûn tu carî nabînin lê di Roja Dadgehê de dema ku rastî eşkere bibe ew ê vê meraq bikin: Ez çawa evqasî ji girêdana rêyên Xweda dûr ketim? Bersiva xemgîn wê ev be: Wan ji rastiya ku di bin rayedariya Wî de ne hez nekirin û nepejirandin.

Ji bo mirovên xapandî tenê hêviyek heye, ku rehma Xweda çavên wan veke ku ronahiya rastiyê perdeya tarî ya xapandinê ji holê rake. Qîrîna dilê min -û armanca vê pirtûkê- ew e ku mirovan ji hêza xapînok a bêqanûniyê rizgar bikim û bi nîşandana ronahiya rastiyê ji bo kesên ku jixwe di nav lepên wê de ne, wan azad bikim. Min ev peyam li seranserê cîhanê belav kiriye û gava ku ez ji mirovan dipirsim bê ka ew ketine qadên bêîteatiyê an na, bi gelemperî ji nêvî zêdetir dibêjin ku ketine. Piraniya wan li vê mikur tên: “Heta ku rastî wê derxîne holê, min nizanibû ku di dilê min de serîhildan heye.”

Ez li vê jî mikur têm ku ez vê pirtûkê weke kesekî ku qet ji hêla hêza veşartî ya bêqanûniyê ve nehatiye xapandin, nanivîsim. Na,

min xwe di nav lepên wê yên tirsnak de dît û Xweda, bi dilovaniya xwe xeletiya dil û rêyên min derxistin holê. Ez tiştên ku bi wan dizanim û ji wan xelas bûme bi we re parve dikim. Ez ji Rebê me yê hêja re ji bo dilovanî û dilsoziya Wî spas dikim!

Xweda bi dilovanî hewl dide ku çavên me li ser deverên bêîteatiyê veke lêbelê weke Qayîn em ê rastiyê nebînin heya ku em pêşî xwe dilnizim nekin. Di beşa bê de, em ê girîngiya mezin a ku nizimbûn di xelasiya me de dilîze û her weha encamên kujer ên serbilindiyê bibînin.

BEŞ 6

# ENCAMÊN BÊÎTEATIYÊ 2

*Îteata qismî di çavên Xweda de bi tu awayî ne îteat e.*

Jiyana Şawûl, qralê yekem ê Îsraêlê, wêneyekî zindî dide me bê ka çi diqewime dema ku mirov bi bêîteatiyê re flortê dike. Jiyana wî çîrokeke trajîk e ku ji bo me bawermendan gelek dersan dide. Mifteyên têgihîştinê di şermezarkirina ku Reb daye Wî de veşartî ne. Nirxandineke li ser jiyana wî têgihîştineke zelal û eşkere dide me li ser encamên giyanî yên îteata bi giştî ya rayedariya Xweda. Eger em destûrê bidin wê ev têgihîştin me xurt bike û ketina Şawûl wê hem bibe hînkirinek û hem jî bibe hişyariyek. Ji ber ku "Îcar ji berê ve her çi hatibe nivîsîn, ji bo perwerdebûna me hatiye nivîsîn…" (Romayî 15:4). Û "Ev tiştên ha bi mînaktî hatin serê wan û ji bo ku ji me yên ku gihîştin dawiya deman re bibin şîret, hatine nivîsîn" (Korîntî I, 10:11).

## ÎTEATA QISMÎ

Werin em bi Samûêl, pêxemberê mezin ê Îsraêlê dest pê bikin ku bi fermaneke ji devê Xweda derketibû çû cem Şawûl. Wî Şawûl hişyar kir ku bi baldarî guh bide talîmatan: "Rabe here li Emalêq

bixe û her tiştê wan bi tevahî tune bike. Li ber wan nekeve. Ji mêr, jin û zarokan bigire heta zarokên berşîr, ga, pez, deve heta bi kerên wan hemûyan bikuje" (Samûêl I, 15:3). Ferman rasterast û zelal bû. Tiştek ji Emalêqan, çi mirov be çi heywan be, divê sax nehata hiştin. Her tiştê ku zindî bû, wê bihata tunekirin.

Li bersiva Şawûl binêrin. Wî negot, "Ez ê wisa nekim... ev pir dijwar e!" Pirî caran em têgihîştina xwe ya serhildanê tenê bi tiştên diyar re bi sînor dikin -bêîteatiya eşkere. Lê em ê kifş bikin ku ev ne rast e. Şawûl pêşî pejirand û piştre jî fikra xwe neguhert. Gelek ji me vê şêweya bêîteatiyê fêhm dikin. Şawûl jî ew ji xwe re kir pêşîniyek û dûv re jî ji ber jibîrkirinê bêîteatî nekir. Bi piranî wê bê pejirandin ku ev tevger ne îteatkarî ye lêbelê ji ber niyetên baş wê bê bexşandin. Bi gumaneke mezin her kes hemfikir e ku ev senaryo şêwazên bêîteatiyê temsîl dikin lê em bala xwe dîsa bidin Şawûl.

Wî di cih de artêşa xwe kom kir û xwe amade kir ku êrîşî Emalêqan bike. Her tişt pir xweş xuya dikir. Wî êrîşî her mêr, jin, zarok û pitikên di dergûşan de kir û ew kuştin. Bi deh hezaran ji wan ji aliyê Şawûl û artêşa wî ya mezin ve di şûr re hatin derbaskirin.

Lêbelê Şawûl qralê Emalêqanê bexşand. Çima? Ev yek dibe ku li gorî çanda wê demê be. Eger hûn welatekî fetih bikin û serokê wî welatî sax bihêlin, ev dihat wê wateyê ku te koleyek dianî qesra xwe ango cureyekî qûpayê yê zîndî bi dest dixist.

Şawûl bi hezaran heywan jî serjê kirin. Lêbele dîsa jî wî pez, ga, heywanên qelew û berxên herî baş hişt û ew dan gel ji bo ku ji Xweda re bikin qurban û karekî "li gorî Nivîsên Pîroz" bikin. Xeyal bikin bê ka gel çawa kirinên wî nirxandine. Dema ku wan heywanên girtî ji Yehowa re qurban kirin, ew li vê fikirîn: "Çi qralekî me yê xwedayî heye ku her dem Reb dixe dora pêşî."

Lê nêzîkatiyeke pir cuda ya Xweda ku derbarê vê mijarê de heye. Bi gazinî ji Samûêl re got: "Ez poşman bûm ku min Şawûl kir padîşah. Çimkî êdî ji pey min vegeriya û gotinên min bi cih neanî"

(Samûêl I, 15:11). Şawûl bi deh hezaran kes kuştin û tenê yek ji wan xilas kir. Wî ji sedî 99 tiştên ku jê re hatibû ferman kirin, bi cih anî. Piraniya me wê di vê seferê de îtaet bidîta lê Xweda bêîtaetî dît. Di encamê de, çend ayet şûnda bi rêya pêxember, ev weke serîhildanê bi nav kir. Ji ber vê yekê em fêr dibin ku îtaeta qismî di çavên Xweda de îtaeteke sifir e. Bi rastî, hema hema temam e, heta ji sedî 99 jî weke îteatê nayê hesibandin; berevajî vê, ew serîhildanek e.

Em vê şîroveyê çiqasî dibihîzin: “Çima tu li ewqas tiştên ku min kirine, nanihêrî? Tu li ser tiştên biçûk ê ku min nekirine disekinî!” Şawûl bê guman dikarîbû wisa bigota. Her çiqasî ev li gorî mantiqa mirovî be jî, bi ya xwedayî re li hev nake!

Samûêl ji bo biçe cem Şawûl ji wir veqetiya û gava Samûêl gihîşt cem wî, Şawûl bi coş pêşwaziya wî kir: “Tu ji aliyê Xudan ve pîroz bî. Min gotina Xudan pêk anî” (Samûêl I, 15:13). Hûn dikarin şahî û baweriya di dengê wî de bibihîzin. Ez bi temamî bawer dikim ku Şawûl samîmî bû. Wî bi rastî bawer dikir ku wî fermana jê hatiye xwestin, kiriye lêbelê Xweda got ku wî serî li ber Min hildaye.

Em çawa dikarin cudahiya mezin a ramanên di navbera tiştên ku Xweda şeva berê gotibû û tiştên ku Şawûl di dilê xwe de bawer dikir de, rave bikin? Bersiv di van gotinan de tê dîtin: “Xwe nexapînin û nebin yên ku tenê peyvê dibihîzin, lê peyvê bînin cih” (Aqûb 1:22). Gava ku mirovek li hemberî Gotina Xweda ya ku bi eşkereyî li ser wî hatiye ferzkirin bêîteatiyê dike, perdeyek li ser dilê wî tê nuxumandin û ev perde têgihîştina wî hildiweşîne û asteng dike. Ev xapandin e. Şawûl di ramanên xwe de hatibû xapandin û ya rastî her çiqasî xelet bû jî ew ji xwe piştrast bû ku wî tiştê rast kiriye. Her çiqasî baweriya wî bi mantiqê mirovan re lihevhatî bû jî, bi rastiya Xweda re li hev nedikir.

Ev ne cara yekem bû ku Şawûl bi temamî bêîteatî ji Gotina Xweda re kiribû û bi ser neketibû. Berê jî Samûêl ew ji ber bêîteatiyê şermezar kiribû (Samûêl I, 13:1-13). Dibe ku bûyerên din

jî hebûne yên ku nehatine tomarkirin. Şawûl ketibû nav çerxeke bêîteatiyê. Gava ku ev çerx carekê çêdibe, jihevderxistina rastî û derewan her ku diçe dijwartir dibe.

## PERDEYA XAPANDINÊ

Gelo tê bîra we piştî ku we bawerî bi Xweda anî û hûn xelas bûn îcar gunehê pêşî we kir? Ê min tê bîra min. Weke ku kêr di dilê min de çikiliye, min hîs kir. Weke zarokên Xweda em hemû bi vê hestê dizanin. Ev, îknakirina Giyanê Pîroz e û lêdana dilê me ye. Lê gava em kiryarên xwe mafdar derdixînin û pişta xwe didin tobeya bi rastî çi dibe? Du tişt. Ya pêşî, ji bo dubarekirina kirina heman bêîteatiyê em tên bicîhkirin. Ya duyem, perdeya xapandinê dilê me dinixumîne, bi vî awayî hesta îknakirinê kêm dike û mihakeme xwe li cihê wê digire.

Di îhlalkirina piştî vê de, em tûjbûna kêrê ewqasî hîs nakin, ji ber ku perdeyek wê dinixumîne; li şûna vê, tenê hinek nerehetî ava dibe. Dîsa em xwe mafdar derdixînin û perdeyeke din dilê me dinixumîne û banga rastiyê hîn bêtir ditepisîne. Gava ku careke din em îhlal dikin, em tenê hesteke sûcdariyê hîs dikin. Eger dîsa em xwe mafdar derxînin, perdeyeke din a mirinê dilê me dinixumîne. Dema ku em dîsa gunehê dikin, perde êdî ewqasî stûr e ku tu hesteke îknakirinê tuneye -tenê mafdarî heye. Xapandinê rastî ji me veşartiye. Wijdanek wisa êdî bêhest û qalind bûye.

Di vê xalê de, mirovek dikare ji xuyabûna xwedaparêziyê dûr bikeve an jî pir caran dikare bi xuyabûneke xwedaparêz bijî lêbelê dikarin weke kesên ku bi Xweda re peymaneke wan tuneye, bijîn. Her çiqasî ew îdîa dike ku Xirîstiyan e jî ew bi zanîna xwe ya xelet a baş û xerab re dijî. Hesta wî ya rast û xelet êdî ji çavkaniyeke ji bilî Gotina zindî ya Xweda tê ku ji aliyê Giyanê Pîroz ve di dilê wî de bi cih bûye. Ew bi talîmatên xapînok ên dilê xwe dijî. Ev talîmat dikarin qanûna ku mirinê tîne (Korîntî II, 3:6) an jî ramanên ku civak wan rast an jî xelet dibînin, bin. Di her du rewşan de jî, temasa wî Xwedayê zindî ji

hev qetiyaye. Êdî rêya ku ew dikare niha bigihîje wî ew e ku bi rêya peyameke pêxemberî ya ku ji hêla Xweda ve ji wî re tê şandin.

## PÊVAJOYA SÊ GAVÎ

Reb, ji bo xwe bigihîne kesê bêîteat, wî di pevajoyeke gav bi gav re derbas dike. Pêşî, ew her dem hewl dide ku bi rêya qanihkirinê bigihîje wî. Lêbelê heke wî gelek caran bêîteatî kiribe û ji ber perdeya xapandinê têkiliya xwe ji dil û talîmatên Xweda qut kiribe, wê demê Xweda wê berdevkekî pêxemberî bişîne, weke ku Samûêl şand cem Şawûl. Xizmeta rastîn a pêxemberekî ew e ku çavên mirovan veke ji bo ku mirov rêyên Xweda bibînin. Xweda dikare her kesî bişîne ji bo ku peywira pêxembertiyê bike. Ne hewce ye ku pêxemberekî bi xwe were şandin; peyam dikare bi rêya pastorekî, dêûbavekî, patronekî, hevjînekî an jî bi rêya hevalekî re were. Aqûb wisa diyar dike: “Birayên min, eger yek ji we ji rastiyê averê bibe û yekî din careke din wî li rastiyê bizivirîne, bila bizane, yê ku gunehkar ji riya wî ya averê bizivirîne, wê canekî ji mirinê xilas bike û gelek gunehan binixumîne” (Aqûb 5:19-20). Bala xwe bidinê ku ev peyam ji bo bawermendên ku di gunehê de dijîn hatiye şandin. Her wiha, bala xwe bidin îfadeya “gelek gunehan.” Derketina ji ser rêya rast ji ber bêîteatiya dubare dibe, pêk tê.

Piştî ku berdevkê pêxêmberiyê (an jî berdevkên) hatin şandin, eger hîn jî em li wan guhdar nekin, Xweda bi rêya darazê digihêje me. Pawlos wisa nivîsandibû: “Lê eger me xwe bi xwe hêre bikira, em nedihatin dadbarkirin” (Korîntî I, 11:31). Koka peyva *darizandinê* di vê ayetê de du carî derbas dibe. Lêbelê her yek ji wan îfadeyeke Grekî ya cuda ye. Ya pêşî, ango “Eger me xwe bi rastiyê *bidarizanda*” wergera peyva *dîakrîno* ye ku di wateya “veqetandina bi awayekî giştî” de ye. (Ev, ji bo ya bi nirx ji ya jirêzê bê veqetandin, derbarê ku em xwe baş binirxînin de ye) Em vê bi mikurbûna bêîteatiyê û rêya tobê re, dikin. Ya duyem jî

peyva “krîno” ya Grekî ye ku tê wateya “em nedihatin darizandin” “cezakirin an jî mahkûmkirin.” Pawlos berdewam dike: “Ji bo ku em bi dinyayê re sûcdar dernekevin, em ji aliyê Xudan ve tên terbiyekirin” (Korîntî I, 11:32). Xweda, ji bo em bi dinyayê re neyên cezakirin dixwaze em dev ji bêîteatiya xwe berdin (Metta 7:20-23; Lûqa 12:45-48).

Pirsa ku divê em bipirsin ev e: Xweda çawa gelê xwe yê ku hişyariya pêxemberî paşguh dike an jî red dike, çawa didarizîne an jî ceza dike? Bersiv bi gelemperî zehmetî, nexweşî an jî êşên din in. Nivîskarê zebûrê ev beyan kir:

“Beriya dilkovaniyê, ez ji rê derketibûm,
Belê niha ez bi gotina te dikim.
Ez dizanim ya Xudan, dadbariyên te rast in;
Te ez bi dilsozî nizim kirim.”
(Zebûr 119:67, 75)

Em dikarin vê yekê çêtir fêhm bikin eger em li tiştên ku Pawlos di ayeta berê de ji vê dêrê re gotin: “Ji ber vê yekê gelek ji we nexweş û lewaz in û hin jî mirine. Lê eger me xwe bi xwe hêre bikira, em nedihatin dadbarkirin” (Korîntî I, 11:30-31).

## MÎNAKEKE BIBANDOR

Min gelek rewş dîtine ku mirov ji ber ku bersiva du gavên pêşîn ên pêvajoya cezakirina Xweda nedane, hatine darizandin. Mînakeke bibandor di destpêka salên 1990an de çêbû, dema ku min li kampeke ciwanan li Teksasê waz didan. Destpêka hefteyê pir bi pevçûn derbas bû ji ber ku gelek ciwanan ji ber gunehê hesasiyeta xwe ya li hemberî Reb winda kiribûn. Di her civînê de bi dehan xort û keçên ciwan derketin pêş û gelek ji wan ji gunehên xwe yên ku ji ber zayendiyê kiribûn tobe kirin û bi xwîna Îsa bi awayekî rûmetdar hatin paqijkirin. Min di êvara dawîn de ji ber

tovên tobekirinê yên ku tevahiya hefteyê hatibûn çandin, li bendê bûm ku bereketên giyanî yên bihêz hebin.

Dema ku ez çûm civîna dawî, min fêhm kir ku xizmet wê weke ku min hêvî dikir dest pê neke. Dîsa, min hewcedariya bangkirina dîsîplîn û tobekirinê hîs kir. Gava ku dema axaftinê hat, min rahişt mîkrofonê û dest bi duayan kir. Giyanê Pîroz ev nîşanî min da: Di vê odîtoryûmê de hîn jî kesekî ku serî hilde heye. Derfetek din bidin vî kesî ji bo ku derkeve pêş. (Min di civîneke berê de li ser serîhildanê waz dabûn.) Min banga xwe kir û çend ciwan derketin pêş lê min di dilê xwe de dizanibû kesê ku Giyanê Pîroz ew ji xwe re kiribû hedef ne di nav wan de bû. Ew kesên ku hatin pêş, dibe ku ciwanên dilnizm bûn ku dixwestin pirsgirêkên din bînin ji Reb re.

Giyanê Pîroz dîsa bi dilê min re axivî: Ji vî kesî re bêje eger ew îşev bersiva bangawaziyê nede, wê darizandin bê jiyana wî. Min tam tiştê ku Wî got ragihand û ciwanên din derketin pêş lê dîsa ew kesê ku Giyanê Xweda ji xwe re kiribû armanc, min hîs kir ku ne di nav wan de bû.

Giyanê Pîroz dîsa bi dilê min re axivî: Ji vî kesî re bêje eger ew bersiv nede bê wê çi darizandin bê serê wî. Dîsa min dengê Wî di dilê xwe de bihîst: Jê re bêje eger ew îşev bersiv nede, di hundurê sê hefteyan de wê qezayeke trafîqê ya pir giran bê serê wî.

Bi tirs û lerzê, min bi awayekî cîdî gotinên ku Wî gotibûn dubare kirin. Hîn bêtir xort û keçên ciwan derketin pêş û careke din, min zanibû ku tu kes ji wan ne ew kesê ku Reb ji xwe re kiribû armanc. Reb ez serbest berdam ji bo kesên ku derketibûn pêş ku xizmet û duayan bikim. Min dua kirin û ji vir şûnde me bereketên giyanî yên bihêz ên ku ez li bendê bûm wergirtin. Gelek ciwanan peyvek ji Reb bihîstin, yên din jî bangek ji bo xizmetê wergirtin. Hin ji wan baş bûn û ji bo jiyana xwe ji Reb rêbertî wergirtin. Bû êvareke ku tu kes ji me wê qet ji bîr neke.

Çend meh derbas bûn û ez bi telefonê bi pastorê ciwanan re axivîm. Wî ji min re behsa tiştên ku piştî kampa ciwanan qewimîbûn

dikir. “John, di koma me ya ciwanan de keçek ciwan ya diçe lîseyê heye ku ji her kesî bêtir me aciz dike. Wê her dem bêîtaetî dikir û pirsgirêk derdixistin. Min di dilê xwe de dizanibû ku ev keçik ew kes bû ku Giyanê Pîroz wê êvarê pê re axivî bû. Ez xemgîn bûm dema ku wê bersiv neda.” (Min qet nizanibû bê ev keçik kî bû.)

Wisa berdewam kir: “Piştî kampê bi sê hefteyan, eynî weke te hişyarî da, bi erebeyekê din re serserkî li binguhê hev ketin û qezeyeke pir dijwar qewimî. Erebeya wê hûrîhera bû.”

Ez direlizîm, min xwest bizanibim çi bi serê wê hatiye. Min zanibû ku wê êvarê bi Giyanê Xweda re axivîbûm lê min hêvî dikir ku ev kes wê banga Xweda bibihîze berî ku tirajediyek bi serê wê de bê.

Wî berdewam kir: “Xweda jiyana wê bexşand! Rewşa wê giran bû, lêbelê ew bi demê re baş bû û niha yek ji keçên herî dilsoz ên xizmetê ya di dêra me de ye. Ew êdî mirovek bi temamî cuda ye. Jiyana wê bi temamî guherî!” Ez rehet bûm û ji bo wê bi kelecan bûm. Gotinên Dawid dîsa bibihîzin: “Berî ku ez êşê bikşînim, ez ji rê derdiketim lê niha ez guh didim peyva te.”

Niha ez ê li ser xaleke pir zelal bisekinim. Ne Xweda ye yê ku van êşan li ser me bar dike. Di şûna vê de, Xweda destê xwe yê parêzvan ji ser me radike û eger me îteat bikira wê bihişta em êşekê ku em xwe jê biparêzin bikişanda. Nivîskarê Zebûrê wisa beyan kir:

“Te siwar kir, mirovan li stûyê me,
Em ketin agir û avê,
Lê te em derxistin firehiyê.”
(Zebûr 66:12)

Di wergereke din de ev ayet wisa ye: “Te em gîhandin têrbûneke dewlemend” (NKJV). Qezayê bala vê jina ciwan kişand. Li nexweşxaneyê wê tobe kir û gihîşt têrbûneke dewlemend. Ev qeza ne hilbijartina yekem a Xweda bû ku wê terbiye bike lê dema ku yên din têk çûn, bi bandor bû.

Xwezî min bikarîbûya bigota ku hemû bûyerên bi vî rengî bi vî şiklî bi dawî bûn lê mixabin ew bi vî rengî bi dawî nebûn. Nimûneyeke din tê bîra min. Dîsa xortekî ku hewl dida serî hilde ji aliyê xizmetkarekî ku min nas dikir ve hat hişyarkirin. Xort ew bi tiştekî hesab nekir û piştî demeke kin di qezayeke trafîqê de mir. Ez dikarim gelek mînakan bidim -gelek ji wan tobe kirin û hatin pîrozkirin, yên din jî aqûbeta wan bû weke ya Qral Şawûl û hatin şandin.

## GUHDARÎKIRIN AN QURBAN?

Werin em vegerin çîroka Şawûl. Samûêl dît ku Şawûl hatiye xapandin û weke berdevkê pêxemberekî rastîn daket nav dilê meseleyê. Samûêl ev pirsî: "Naxwe ev lêbandina mîhê ya tê guhê min çi ye? Çi ye ev orîna çêlekê ya tê min?"

Şawûl di cih de bersiv da: "Samûêl bi hêrs got: "Gel ew ji Emalêqiyan standin ku ji Xwedayê te Xudan re bikin qurban. Wan dil neda pez û dewarên herî baş bikujin. Lê me yên mayîn bi temamî kuştin" (Samûêl I, 15:14-15).

Dema ku ew û rastiyê ketin rûyê hev, sûcdarî ji xwe dûr xist û berê xwe da gel. Wî xwest bêje: "Min xwest îtaetê bikim lê gel zor da min." Her kesê ku xwedî dilekî bê tobe ye gava ku bêîteatî wî dorpêç dike, kesên din sûcdar dike û bi vî awayî berpirsyariyên kirinên xwe napejirîne.

Adem, Xweda û Hewa sûcdar kir. Hewayê mar sûcdar kir. Belê, Adem mafdar bû; Xweda jin dabû wî û wê jî fêkî dabû wî. Lê kesî zor lê nekir ku bixwe. Wî bi îradeya xwe xwar. Belê, Hewa hat xapandin lê dîsa jî wê bêîteatî hilbijart.

Gel rêberiya Şawûl nedikir, Şawûl rêberiya gel dikir. Şawûl ne tenê ji bêîteatiya xwe, lê di heman demê de ji bêîteatiya gel jî berpirsiyar bû. Kesê ku xwediyê rayedariya rêberî û talîmatê bû, ew bi xwe bû. Rêberno, bi baldarî guhdar bikin: Hûn ê hesabê bêîtetiya

wan kesên ku jiyana xwe spartine we û hûn çavderiya wan dikin, hûn ê bidin.

Rêberê Îsraêlê û çavdêrê Samûêl, Elî; dizanibû ku kurên wî fermana pîroz a Xweda biçûk dibînin lê wî tiştek nekir. Wî bi awayekî sembolîk ew şermezar kirin, mîna ku ew “li destê wan dixe” lê wî rayedariya xwe bikar neanî û ne rê li ber wan girt û ne jî ew ji ser peywirê dûr xistin. Ji ber vê yekê, Xweda got: “Min ji Elî re got ku ji ber sûcê ku haya wî jê heye, ezê malbata wî heta hetayê bidarizînim. Çimkî zarokên wî li dijî Xwedê bêrûmetî kirin. Elî rê li ber wan negirt” (Samûêl I, 3:13). Kesên hatin darizandin ne tenê kurên wî bûn, Elî jî hat darizandin.

Piştre Şawûl hewl da ku bêîteatiya xwe bi gotina ku pez û dewar ji bo qurbankirina Reb hatine parastin, rewa bike. Kesekî difikire ku bi bêîteatiyê, dikare qurbanekî maqûl an jî xizmetekê ji Xweda re pêşkêş bike, eşkere bû ku ew hatiye xapandin. Ev celebeke serîhildanê ya nazik û xapînok bû.

Îsa ev daxuyanî diyar kir: “Eger yek bixwaze li pey min bê, bila xwe înkar bike, rahêje xaça xwe û li pey min bê” (Metta 16:24). Hin kes xaçê hildigirin û li ser îmaja êşê ya ku jiyaneke wî ya hatiye qurbankirin temsîl dike, disekinin. Lêbelê, di van gotinên Îsa de xaç ne tekane an jî xala dawî ye. Hûn dikarin jiyaneke înkarkirî û qurbankirî bijîn lêbelê dîsa jî armanc an jî xwesteka Xweda, dibe ku hûn nikaribin bi cih bînin! Ya rastî, hûn dikarin xweînkarkirin û xwequrbankirinê hilbijêrin lê dibe ku hûn dîsa jî li dijî Xweda di nava serîhildanê de bin!

Bala gotinên Îsa li ser îteatê ye. Tekane rêya ku em ê karibin îteatê bikin hilgirtina xaçê ye. Ji ber ku bêyî em ji bo rojevên xwe û xwestekên xwe bimirin, em ê di dawiya dawî de, di navbera pevçûneke îradeya Xweda û arezûya mirovan de bijîn. Eger em jiyana xwe teslîm nekin, em ê rêyekê bibînin ku li şûna daxwaza Wî, arezûyên xwe bicîh bînin û heta weke ku Şawûl kir em ê Nivîsên

Pîroz jî bi kar bînin ji bo ku piştgiriyê bidin wê. Divê em vê pirsê ji xwe bipirsin: “Gelo xizmeta Xweda di xwe de bêîteatiyê dihewîne?” Eger wisa bûya, wê Şeytan ji pratîkên me yên olî an jî ji qurbaniyên me mezinahî bistanda, ji ber ku ew afirîner û efendiyê serhildanê ye.

Di vir de Samûêl, mantiqê ku Şawûl derxist pêş fetisand:

> “Samûêl ji Şawûl re got: “Hiş be! Ezê niha tiştên ku Xudan îşev ji min re got, ji te re bêjim.” Wî jî got: “Keremke.” Samûêl got: “Tevî ku te xwe biçûk jî didît, ma tu nebûyî serekê eşîrên Îsraêl? Xudan tu kirî padîşahê gelê Îsraêl. Xudan tu şandî û got: Here û Emalêqiyên sûcdar bi tevahî tune bike û kit ji wan nehêle. Çima te guhdariya dengê Xudan nekir, te çavê xwe berda malê talên û te xerabî di çavê Xudan de kir?” (Samûêl I, 15:16-19).

Samûêl wisa got: “Her çiqasî tu xwe kesekî bikêrnehatî bibînî jî, ma tu nebûyî rêberê eşîrên Îsraêlê?” Bi gotineke din, ey Şawûl, gava tu bûyî qralê pêşî, tu kesekî bêpesn, dilnizm û sade bû. Berî bi salan gava Samûêl ji Şawûl re got tu yê bibî qral, Şawûl bi bertekeke bê bawerî wisa bersiv da: “Ma ez ne ji eşîra Binyamîn im ezbenî ku eşîra herî biçûk a gelê Îsraêl e? Malbata min jî, malbata herî biçûk a tevahiya malbatên Binyamîn e. Çima van tiştan ji min re dibêjî?” (Samûêl I, 9:21). Şawûl nefikirî ku wê bibe qralek. Ji ber ku Xweda yekî weke wî ku bi kêrî tiştekî nayê hilbijart, matmayî ma.

Piştre, gava ku Reb biryar da ku wî bi hemû gelê Îsraêlê bide nasîn, ji bo ku her eşîr pişkê bikişîne, civiyan. Di pişkê de eşîra Benyamîniyan hat hilbijartin. Ji nava wan jî malbata Şawûl hat hilbijartin. Piştre Şawûl hat hilbijartin. Lê “her çiqasî lê geriyan jî ew nedîtin.” Dîsa ji Reb pirsîn: “Ew hîn nehatiye vir?” Reb jî got: “Ew li vir e, xwe di nava alavan de veşartiye” (Samûêl I, 10:21-22).

Şawûl, ji ber fikra Xweda ya ku dixwest ew rêberiya gelê xwe bike, hejayibû. Ew di çavê xwe de bêqedir û qiymet bû. Samûêl ev

yek bi bîr xist û dû re gotinên xwe berdewam kirin: “Niha Reb tu şandiye, ji bo peywirekê û got: ‘Here û bi temamî wêran bike.’ Çima tu aniha difikirî ku tu ji Reb bêtir dizanî? Kengî şehrezayiya te Xweda derbas kir? Ma êdî tu ketiye şûna Wî? Çima tu ji bilî çavkaniyeke li derveyî Xweda li rastî û xeletiyê digerî? Çi bi serê wî zilamê dilnizm û kîbar hat?”

Ma kesek ji me ji Xweda bêtir dizane? Bêguman na! Lê gava em bêîteatiyê bikin, peyama ku em ji Xweda û ji kesên li derdora me re dişînin ev e. Çiqasî bêaqilî ye ku mirov bifikire ji wî kesê ku li ser textê rûmetê rûniştiye zanatir e! Wî ne tenê gerdûn afirand lê di heman demê de yê ku gerdûn dagirt jî Ew e. Ew Afirîner e ku stêrk bi tiliyên xwe li ezman neqişandin. Lê dîsa jî gava em şîreta Wî paşguh dikin, em zanebûna mirovên basît di ser Wî re dibînin!

## SERÎHILDÊRÎ Û FALBAZÎ

Samûêl awirên xwe dan ser Şawûl û bi werekiya peywirdariya pêxemberiyê, ev tişt beyan kir:

“Guhdarîkirin ji qurbanan
û îtaetkirin ji bezê beranan çêtir e.
Çimkî serhildêrî wekî gunehê falbaziyê
û serhişkî jî wekî pûtperestî xerab e.”
(Samûêl I, 15:22-23)

Samûêl, serhildêrî bi falbaziyê re rasterast girê da: “Ji ber ku serhildêrî, bi qasî falbaziyê guneh e.” Peyva “bi qasî” ya di vê îfadeyê de hem di wergera Qral James û hem jî di ya Qral Jamesê Nû de, ji bo ku diyar bikin ku di metnên orjînal de xuya nakin, bi tîpên îtalîk hatiye nivîsandin. Ev peyv ji bo zelalbûnê ji hêla wergêran ve lê hatiye zêdekirin. Di wergereke lîteral de ev peyv tuneye (Interlinear Bible, cild 2, r. 750).

Ev nivîs bi esasî divê weke “Ji ber ku serhildêrî gunehê falbaziyê

ye” bê xwendin. Bi vî awayî çarçoveya vê ayetê zelal dibe. Mirov serhildêriyê bişibîne falbaziyê tiştek e lê îdiakirina ku ew di rastiya xwe de falbazî ye tiştekî bi temamî pir cuda ye. Eşkere ye ku Xirîstiyanekî jidil wê qet bi zanebûnî nekeve nav falbaziyê. Lê çend kes ji ber serhildêriyê bêhemdî xwe di bin bandorê vê de ne?

Peyva falbaziyê, di hişê me de wêneyê wan jinên bi cilên reş ku li wan topên krîstal dinêrin û ji pêşerojê agahiyan didin me, tîne bîra mirov. An jî belkî versiyona wê ya hîn nûjen, kesek be ku ji bo bandorê li yên din bike sêrbazî an jî nifiran dike. Werin em herdu têgehan li dû xwe bihêlin û bi çi awayî dibe bila bibe, em bingeha falbaziyê kifş bikin.

Peyva Îbranî ya ku li vir ji bo “falbaziyê” tê bikaranîn qesem e. Ev peyv tê wateya kehanet, pîrebokiyê û sêrbaziyê. Lêbelê, pispor ji me re dibêjin ku wateyên rastîn ên van peyvan di têkiliya bi okultîzmê de nayên zanîn, ku ev jî cûrbecûr wergerên vê peyvê rave dike (Ferhenga Îlahiyata Peymana Kevin, cild 3, r. 805). Girîngiya vê têgehê ne di form an jî rêbazê de ye lê di encam an jî armanca falbaziyê de ye.

Falbazî mirov rasterast ber bi cîhana şeytanî ve dibe. Armanca kesê fazlbaz ew e ku şert, rewş an jî mirovan, pir caran bêyî ku ew ji yên di cîhana giyanî de agahdar bin bi rêyên cûbecûr kontrol bike. Weke çawa şexs qet agahiya wî tunebe bê ka ew ê çi bike, dibe ku ji hêzên tarî yên di hundurê wî de ne bi temamî haydar be jî. Di bingehê de, falbazî dikare an bi temamî bi awayekî bêhiş an jî bi zanîneke tam bê kirin. Armanca wê kontrolkirin e lêbelê ji ber girêdana wê ya bi cîhana şeytanî re, ew bêguman dikeve rewşa kontrolkirî.

## KOLETIYA BI RÊYA BÊÎTEATIYÊ

Weke pastorekî ciwanan ê berê, fersenda min çêbû ku ez wan mijûlbûnên okultîzmê nas bikim. Lîseyên herêmê, ji ciwanên ku di astên cuda de bi spîrîtualîzmê dadiketin, bi ser ve diçûn. Rêberên

min yên koma ciwanan, radigihandin ku hevalên wan ên polê bi awayekî rêkûpêk bi sêrbazî, falbazî an jî bi Şeytanîzmê (satanîzm) re eleqedar in.

Yek ji prensîbên herî balkêş a ku ez di derbarê pratîkên okultîzmê de fêr bûm ev bû: Dema ku kesek di nav komeke pîrebokan de (komeke ku bi okultîzmê re mijûl dibe) tê pejirandin, serokên komê wî kesî teşwîq dikin ku tevlî bikaranîna madeyên hişber, serxweşî, fuhûş, dizî û kiryarên din bibe yên ku qanûnên Xweda an jî yên welêt binpê bike. Ez ji sedemên vê ne piştrast bûm heya ku Xweda ev rastî ji min re eşkere kir: "Serhildêrî falbazî ye."

Ew tên hînkirin ku ew çiqasî li dijî rayedariyê serî hildin, ew ê ewqasî bêtir hêzê bi dest bixin û ew her dem li hêzê digerin. Ev rast e ji ber ku serhildêrî falbazî ye. Çiqasî zêde serî bê hildan, ji bo bandora li jiyana wan, kontrolkirinê û hêzê ew ê ewqasî bêtir rêya qanûnî ya ku xwe bigihînin hêzên şeytanî bi dest bixin. Bi serhildana li dijî ferman, qanûna Xweda û rayedarên ku Wî tayinkirine re, bi zanebûn xwe ji bo cîhana şeytanî ya ku wan kontrol dike, amade dikin.

Ev raman, di metneke ku sêrbaz jê re dibêjin "Pirtûka Reş" de bi awayekî zelal xuya dibe. Çend sal berê, gava ku ez û xanima xwe piştî xizmeteke hebandinê li odeya otêla xwe me kanalên TV'yê diguhertin, em li rastî kanaleke taybet hatin ku behsa Şeytanperestî û sêrbaziyê dikir. Min dikir ku kanalê biguherînim û di rewşeke wisa normal de guhertin aqilmendî ye, ji ber ku derbarê şerê giyanî de her tiştê ku divê em zanibin, ez bawer dikim ku divê ji Giyanî Xweda bê. Dîsa jî min hîs kir ku divê hinekî lê temaşe bikim. Di bernameyê de "Pirtûka Reş" dihat nîqaş kirin. Pêşkêşvanê bernameyê fermana yekemîn a vê pirtûkê rave kir: "Dilê te çi dixwaze wê bike."

Vê îfadeyê bala min kişand. Di cih de Nivîsên Pîroz hatin bîra min. Nivîskarê Zebûrê wisa beyan dike:

"Hingê min got:
Va ye ez têm;

Di tomara kitêbê de li ser min hatiye nivîsîn.
Ez zewqê ji bicihanîna daxwaza te distînim, ey Xwedayê min,
Di kûrahiya dilê min de ye şerîeta te.»"
(Zebûr 40:7-8)

Îsa derbarê xwe de wisa got: "çimkî ez ne li daxwaza xwe, lê li daxwaza yê ku ez şandime digerim" (Yûhenna 5:30). Xebatên ku bi salan min kirin, ez ji wan hîn bûm ku Reb nêzî kesên ku bi îteatê dijîn dibe. Lêbelê min dît ku berevajî vê yekê jî rast e: giyanên tarî nêzîkî wan kesan dibin, ew kesên ku bi serîhildana li hemberî Xweda dijîn. Hevoka "Dilê te çi dixwaze wê bike." tam berevajî Gotina Xweda ye û bi temamî lihevhatî ye bi tiştên ku Xweda li ser serhildanê dibêje.

Ew kesên ku bi dilxwazî xwe didin xizmeta Şeytan bi vê prensîbê dizanin lê yên din tên xapandin. Kesên nezan bêqanûniyê bi azadiyê re tevlihev dikin. Lê di serîhildanê de azadî tune. Peymana Nû wêneyekî zelal a tiştên bê çi dibe û çi nabe, derdixîne holê. Mirovên wisa dibin koleyên dejenerebûnê. Petrûs xeletiyên wan bi vî rengî eşkere kirin: "Bi ser ku ew bi xwe xulamên xerabûnê ne, ji wan re soza azadiyê didin. Çimkî mirov dibe xulamê wî yê ku mirov bindest dike" (Petrûs II, 2:19).

Rastî eşkere ye. Azadî tune ye; li şûna wê, koletî û dîlgirtin heye ku giyan ji zor û kontrola şeytanî re vedike. Pawlos careke din bal kişand ser vê xalê: "Ma hûn nizanin ku hûn ji bo xulamtiyê xwe bidin destê kê, hûn xulamên wî ne û hûn bi ya wî dikin? An ji bo mirinê hûn xulamên guneh in, an jî ji bo rastdariyê hûn xulamên guhdanê ne" (Romayî 6:16).

Îsa bal kişandiye ser vê prensîbê: "Îsa li wan vegerand û got: «Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, her kesê ku gunehan dike, ew xulamê guneh e" (Yûhenna 8:34). Gava ku Qayîn qurbanek ji Reb re pêşkêş kir, bêîteatiya wî tê bîra we gelo? Piştre, Xweda ji wî re bi awayekî zelal jê re eşkere kir ku wê hilbijartinên wî çarenûsa wî

diyar bikin. Wî dikaribû îradeya Xweda bi cih bîne û deriyê kontrola gunehê (falbaziyê) bigire, an jî dikaribû serî hilde û bi gunehê ku bêyî parastina Xweda li wir veşartî bû û bi serdestiya wî dikir re rûbirû bimîne.

Samûêl Şawûl hişyar kir, weke ku Xweda Qayîn hişyar kir. Serîhildana wî ew xist bin bandora giyanekî kontrolker ku ew kir ku bi awayekî ku ew ê qet bi hişê xwe yê rast nekira tevbigere. Şawûl tobeyeke jidil nîşan neda û di Samûêl I, 16:14ê de, em dixwînin ku di demeke kurt de piştî serîhildana wî, giyanekî xerab hat jiyana wî ji bo ku aciziyê bide wî. Ji wê gavê û pê ve, giyanê xerab bi qanûnî bû xwediyê jiyana Şawûl. Ji bo Şawûl hizûr tune bû, ji ber ku di jiyana wî de tobeyeke bi rastî tune bû. Şawûl bû mirovekî pir cuda ji yê ku me ew ji pêşî ve nasdikir.

Gava ku hîn zilamekî dilnizm bû weke bavê xwe û Pêxember Samûêl ku îteat ji rayedariyan re dikir û rêz ji karên Xweda re digirt, ew veguherîbû kesekî qure ku tiştên Xweda qedir û qiymet dida wan, davêt bin lingê xwe û pê li wan dikir. Eger hûn di ciwaniya wî de nêzî wî bibûna û we jê re bigota “Şawûl, wê roj bê ku tu ji ber hêrsa xwe tu yê heştê û pênc kahînên bêguneh û jin û zarokên wan bikujî” ew ê weke ku tu dîn bûyî li te binêriya û îtîraz bikira û wê wisa bifikiriya: “Ne mimkun e! Ez qet nikarim vê yekê bikim!” Rastiya ku me xemgîn dike ev e ku wî tam jî wisa kir (Samûêl I, 22)!

Giyanê xerab mirov ber bi jiyaneke bi çavnebarî, hêrs, nefret, pevçûn, kuştin û xapandinê ve dibe. Ji ber netobekirin û bêîtaetiya wî, ew kontrol dikir. Da dû Dawidê ku yek ji xizmetkarên Xweda û yên herî dilsoz bû û hewl da ku wî bikuje. Wî bawer dikir ku Dawid xayîn e lê di rastiyê de, ew li gorî dilê Xweda bû. Ji ber kontrola şeytanî, Şawûl tenê dikaribû di nav ewrekî stûr ê xapandinê de çirûskên rastiyê bibîne. Rastî bibûn derew û derew bibûn rastî.

Ax, çend caran min ev yek dîtiye ku pêk hatiye! Ne tenê di yên din de lê di xwe de jî. Ez li demên bêîteatiyê yên di jiyana

xwe de dinêrim û dixwazim ji ber xapandina ku ez di nav de dimeşiyam, bigirîm. Wan deman min rayedariyên xwedayî, qanûnî an jî xelet didît û min gelek caran dostên xwe yên xwedayî weke dijmin dihesibandin. Ez bûm alîgirê serîhildêrên din û agirê min yê bîteatiyê yê ku jixwe gur bû, min benzîn pê dadikir. Me xwe bêtir nêzîkî Reb dît û bawer kir ku em "nifşê nû" xizmetkarên Xweda ne. Ax, Reb çawa dilovaniya xwe nîşanî vê rewşê kir! Bila çavên we ji vê xapandinê re baş vekirî bin, ji bo ku hûn jî weke min neyên xapandin.

BEŞ 7

# SÊRBAZÎ

*Ronahiya Gotina Xweda xapandinê eşkere dike û niyet û fikrên di dilê mirov de ji hev derdixe.*

Serhildêrî falbazî ye. Bandorên vê prensîba veşartî ya bêqanûniyê di civaka me de bi zelalî xuya dibin û her çiqasî xwe bi dizîka bigihîne hundur jî di dêrên me de jî dîtina wê ne kêm e. Ev beş nêrîneke berfireh li ser aliyê serhildêr yê falbaziyê ya ku bandora xwe li ser bawermendekî serîhildêr pêşkêş dike. Ji bo lêkolîna kontrola ku ji ber bêîteatiyê pêk tê, em ê li Peymana Kevin, Peymana Nû û bûyerên ku îro diqewimin bikolin.

## LANETA TÊ REDKIRIN

Pêşî em li Îsraêlê binêrin. Di dema rêwîtiya xwe ya ber bi çolê ve, neviyên Birahîm li deştên Moavê leşkergeh ava kirin. Wan vê dawiyê êrîşî Başanê kiribû û ew têk biribûn û Amoriyên ku li dijî derbasbûna wan di herêmê de bûn, tune kiribûn.

Dema ku Îsraêlê li deştên Moavê leşkergeh ava kirin, Balaq û Moavî û Midyaniyên rêbertiya wan dikir, ketin nav fikaran. Ji tirsan

dilerizîn. Reb wisa soz dabû Îsraêliyan: “Ezê tirs û sawa xwe li pêşiya te bişînin û her gelê ku tê li dijî wan herî, şaş bikim. Ezê bikim ku hemû dijminên te ji ber te birevin” (Derketin 23:27). Wan zanîbûn ku çi gelê ku li ber Îsraêliyan radibûn têk dibirin û gelê herî xurt û bihêz Misirî jî hilweşandin.

Qral Balaq, ji pêxemberekî bi navê Balam re şande şandin û alîkarî jê xwestin. Balam bi pêşbîniyên xwe yên rast û bi kehanetên xwe dihat nasîn. Qral, dizanibû ku wê gotinên Balam pêk werin. Eger wî pîroz bikira, ew jî dihatin pîrozkirin; eger wî lanet bikira, ew jî dihatin lanetkirin. Piştî du komên şandiyên ku Balaq şandin, Balam pejirand ji bo ku Îsraêliyan lanet bike bi asîlzadeyan re çû cem qral. Pêşniyara qral a pere û rûmetê ew ji ser hişê wî biribû.

Roja din, ew çûn ser girekî bilind ê Baalê îlah û ji wir Balam li gelê Îsraêl temaşe kir. Wî ji qral re got ku heft pêşkêşiyan ava bike û ji bo her yekê qurbanek amade bike. Piştre Balam devê xwe vekir ji bo ku nifiran li Îsraêliyan bike lê li şûna vê wî ew pîroz kirin.

Ne hewce ye ku em bêjin qral ji ber vê rewşê aciz bûye. “Te çi bi min kir? Min tu anî ku tu naletê li dijminên min bînî, lê tu hatî û te ew pîroz kirin” (Hejmartin 23:11).

Ji ber vê yekê Balam, pêşniyar kir ku ew ber bi cihekî bilindtir ve biçin, bi hêviya tiştê ku Balaq dixwaze bidin wî. Belkî ji bo ku ji bilindahiyeke bilindtir lenetê bike, dibe ku enerjiyeke zêdetir lazim be. Dîsa heft pêşkêş hatin çêkirin û hin qurbaniyên din hatin pêşkêş kirin. Lêbelê ji bo ku Balam laneteke falbaziyê bibêje, gava dîsa devê xwe vekir, li şûna vê wî dîsa Îsraêl pîroz kirin.

Pêvajoyê wisa berdewam kir. Kengî gava Balam hewl dida ku lanetê bike, mecbûr dima ku pîroz bike. Di kehaneta duyem ya Balam de em vê îfadeya kûr dibînin: “Sêrbazî li dijî ziriyeta Aqûb vala ye Û falbazî bandorê li gelê Îsraêl nake” (Hejmartin 23:23).

Balam ragihand ku tu sêrbazî an jî falbazî nikare li dijî gelê Xweda

bibandor be! Çi gotineke bi kelecan û bi hêz! Ji bo em vê rastiyê li roja me bînin, em dikarin vê bibêjin: “Tu sêrbazî li dijî gelê Xweda kar nake; tu falbazî li dijî dêra Wî kar nake” (Hejmartin 23:23, şîroveya nivîskar).

Divê ev gotin me bi cesaret bike. Falbaz û sêrbaz dikarin biqîrin, hêrs bibin û mûmên xwe vêxin. Dikarin fal, sêrbaz û lanetên xwe bixwînin lê nikarin zerarekê bidin zarokekî Xweda. Li hemberî dêra Xwedayê zindî nikarin bi ser bikevin. Şîretên Silêman 26:2 vê rastiyê diçespînin: “Çawa ku çivîk divirvire û hechecik difire, Wisa jî nifira neheq pêk nayê.”

## LANETA HATIYE BEREVAJÎKIRIN

Werin em dîsa vegerin rojên min ên ku min pastoriya ciwanan dikir. Li lîseyê, keçeke ku bi falbazî û sêrbaziyê dadiket, baweriya xwe bi Îsa anî. Dayika wê dema ku ew hîn di zikê dayika xwe de bû, ew ji Şeytan re terxan kiribû. Piştî ku wê baweriya xwe bi Reb anî, ew bi asîstana min re li ser jiyana xwe ya berê axivî. Di dema axaftinê de, wê gotineke balkêş got: “Me nikarîbû sêrbazî an jî lanet li Xirîstiyanan bikira.”

Asîstana min jê pirsî: “Çima?”

Wê got: “Ji ber ku gava me lanet li wan bikira, li me vedigeriya.” Asîstana min pir bi kelecan bû.

Weke hûn dibînin, vê daxuyaniya keçikê bi gotinên Balam re li hev dike. Di kehaneta xwe ya pêşî de ev pirs pirsî: “Kesên Xudan nifir li wan nekirine, Ez çawa li wan bikim?” (Hejmartin 23:8). Eger Balam lanet li Îsraêliyan bikira jî, wê ew lanet bihata serê wî. Dawid vê wisa îfade dike:

“Ji şêwrên dizî yên xeraban,
Tu min veşêre ji welwela fesadan.
Ew ku, zimanê xwe wek şûr tûj kirine,
Tîrên xwe wek gotinên tal ava kirine,

Da ku ji dera veşartî, bavêjin zilamê gihîştî.
Ji nişka ve, bê tirs davêjin wî."
(Zebûr 64:2-4)

Kesên lanetkirî, sûcdar ango ji aliyê yên serî hildane (yên serî li falbaziyê dane) ve tên awiqandin lêbelê li ser rastiyan nasekinin. Li kesên ku gotinên lanetkirî dixwînin temaşe bikin:

"Belê wê Xwedê, bavêje wan tîran,
Ji nişka ve birindar bike wan.
Wê zimanê wan, wan bibe xerabûnê,
Yên ku wan bibînin, wê serê xwe bi wan bihejînin."
(Zebûr 64:7-8)

Ji ber zimanên xwe wê hilweşin. Ji bo bi kesên din êşê bikişînin, wê gotinên wan li wan vegerin. Dawid ji bo vê bisêwirîne îfadeyeke balkêş dibêje: "Li pêş min çal vedan, Ew bi xwe ketinê" (Zebûr 57:6).

## XAPANDINA BÊÎTEATIYÊ

Balam dizanibû ku di vê rewşê de lanetkirina Îsraêliyan ne mumkin e. Wî bixwesta jî derfeta wî tunebû ku kopalekî ji bo lanetê çêbike. Mûsa rewş bi vî awayî şîrove kir: "Çimkî gava hûn ji Misrê derketin, ew bi av û nên nehatin pêşiya we. Wan Balamê kurê Beorê ji bajarê Petorê Aram-Naharayîmê bi pere girt ku naletê li we bike. Lê belê Xwedayê we Xudan nexwest guhdariya Balam bike. Xwedayê we Xudan ji we hez kir û ji bo we naletê zivirand bereketê" (Dubarekirina Şerîetê 23:4-5). Heman parastin ji bo me jî derbasdar e.

Qral Balaq bi hêrs qêriya: "Ji bo tu naletê li dijminên min bînî min gazî te kir, lê ev sê car in tu wan pîroz dikî. Niha derkeve here mala xwe! Min gotibû ezê te xelat bikim. Lê Xudan tu bêxelat hiştî" (Hejmartin 24:10-11).

Qral, soz dabû Balam ku eger ew bi serkeftî dijminê xwe yê

xwînmij lanetê lê bike wê xelateke mezin a pere û rûmetê bide wî. Lê di bingehê de tişta ku qral got ev e: “Tu dikarî xelata xwe ji bîr bikî. Diyar e Xweda naxwaze ku bibî xwediyê vê. Bila çavên min bi te nekevin!”

Lêbelê Balam bi biryar bû: Ev xelat bi rastî dixwest. Sedema wî ya li wir ev bû û hindik mabû her tiştî winda bike. Ji bo rewşê hinekî bi ser hev de bîne, ji Qral Balaq re behsa plana êrîşeke din kir. Her çiqasî zanîbû ku Îsraêlî nayên lanetkirin jî fêhm kiribû ku wê xwe çawa xwe bi xwe têxin bin lanetê.

Balamê ku bi têkiliya giyanî ya di navbera serîhildan û falbaziyê de dizanîbû, şîret li qral kir ku jinên Moavî bişîne nav artêşgeha Îsraêlê. Bi vî awayî jinan pûtên xwe bi xwe re birin û mêrên Îsraêlê teşwîqî gunehên cinsî kirin û hiştin ku li dijî qanûnên Xweda serî hildin. Wî dizanibû ku serîhildana wan wê gelê Îsraêl têxe bin lanetkirinekê.

Em dizanin ku ev bûyer qewimiye ji ber ku hem Mûsa û hem jî Îsa, behsa şîreta ku Balam li qral kiribû, dike. Mûsa ev bûyer wisa ragihand: “Ew jin ew in ku guhdariya şîreta Balam kir! Ew di meseleya Peor de bûn sedema nedilsoziya gelê Îsraêl a bi Xudan re. Loma kul ket nav civaka Xudan” (Hejmartin 31:16). Piştî gelek salan Îsa jî ev diyar kir: “Wî hînî Balaq kir ku zaryên Îsraêl ji rê derxe, da ku goriyên ji pûtan re hatine şerjêkirin bixwin û fuhûşiyê bikin” (Peyxam 2:14).

Ev laneta ku bi serê xwe ve anîn di Nivîsên Pîroz de hatine eşekerekirin. Piştî kehanetên Balam di cih de em vê dixwînin: “Gava gelê Îsraêl li Şîttîmê dima, hinek mêrên wan bi keçên Moaviyan re zina kir. Çaxê van jinan qurban pêşkêşî îlahên xwe kir, wan gazî wan mêran kir. Wan jî xwarina Moaviyan xwar û li ber îlahên wan çûn ser çokan. Bi vî awayî gelê Îsraêl xwe bi Baal-Peor ve girê da û hêrsa Xudan li dijî gel rabû” (Hejmartin 25:1-3). Di encamê de nexweşiyeke kûjer derket holê û gelê Îsraêlê ji hev de xist.

Bêîteatiyê, ev gelê ku nedihat lanetkirin bû sedem ku têkeve bin laneteke nexweşiyê. “Kesên ji ber vê kulê mirin 24.000 kes bûn” (Hejmartin 25:9). Bîst û çar hezar! Haya we jê heye bê ev hejmar çiqasî mezin e? Di roja me de gava ku qezayeke balafirê an jî bahozek çê dibe ku bi sedan kes ji ber wan dimirin, diqewime; li dinyayê dibe rojev. Li vir em ne behsa bi sedan kesan dikin, em behsa bîst û çar hezar însanan dikin! Ev, di seranserê rêwitiya beyebanê ya Îsraêlê de, windakirina mirovan ya herî mezin bû û hemû jî ji ber serîhildana gel pêk hat.

Bêîteatiya radîqal rê li ber nexweşiyeke radîqal vekir. Serhildanî bi awayekî eşkere li holê bû. Bi ser halan de Îsraêliyekî bêşerm; li ber çavên Mûsayê digiriya û li ber çavên gelê Îsarîlê, di hizûra Xweda de jineke Mîdyanî anî (Hejmartin 25:6).

Baş e, tişta ku rê li ber nexweşiyê girt çi bû? Bêguman we texmîn kiriye: îteata radîqal!

> “Gava Pînehasê kurê Êlezarê kurê Harûnê Kahin ev yek dît, ji nav civatê rabû û rimek da destê xwe. Wî da pey wî Îsraêlî, ket hûndirê kon û bi rima destê xwe li zikê wî û jinikê xist. Bi vî awayî kula bi ser gelê Îsraêl de hat, sekinî.” (Hejmartin 25:7-8)

Destûrê bidin min ez dîsa vê bibêejim: Xweda ne Afirînerê bela û nexweşiyan e. Îsraêliyan bi eşkereyî serî hildan û rayedariya Wî binpê kirin. Ji ber vê yekê, parastina Reb hate rakirin û dijmin bi destûra Xweda gihîştina qanûnî bi dest xist. Careke din ev nîşan dide ku serhildanî falbazî ye ku gihîştina qanûnî dide kontrola hêzên şeytanî. Îsraêlî ji laneta falbaziyekî xelas bûn lêbelê ji ber bêîteatiyê li wêraniyê qelibîn.

## KÊ SÊRBAZÎ LI WE KIR?

Me di Peymana Kevin de mînakeke ku serîhildan falbazî ye, dît û gelekên din jî hene. Niha em li Peymana Nû bikolin. Pawlosê

şandî nameyeke tund ji dêrên li Galatyayê re nivîsand. Ev name bi taybetî ji bo dêrê hatibû şandin, ne ji bo hemû gelê Galatyayê bû. Daxuyaniya Pawlos bi baldarî bixwînin: "Ey Galatiyên bêhiş! Kê sêrbazî li we kir? (Galatî 3:1). Deqayekê! Pawlos ji dêrê re dibêje ku di bin sêrbaziyê de ne gelo? Lê hûn dikarin bibêjin: "Min digot qey falbazî an jî sêrbazî li hemberî gelê Xweda nagire." Ev rast e. Kesê îteatkar be tu lanet xwe lê nagire. Lê ji bîr nekin, serîhildan an jî bêîteatî mirov dixe bin sêrbaziyê.

Sohbeta asîstana min û ya wê keçika falbaz ya ku ji sêrbaziyê xelas bibû, bînin bîra xwe. Li ser gava bihîst ku lanet li Xirîstiyanan naxe û bi kelecan bû, wê di cih de ev lê zêde kir: "Lê Pastor, em dikarin bandorê li ser kesên nerm (yên bêîteat) bikin." Ji bo piştrastkirina vê yekê, ya rastî Pawlos ev digot: "Ji bo hûn ji rastiyê re îteatê mekin kê sêrbazî li we kir?"

Sêrbazîkirin, ne lanetên ku sêrbaz dikin pistepist in, bêîteatiya li hemberî gotina Xweda ye. Çima? Ji ber ku serîhildan falbazî ye! Bi kurtasî eger em bibêjin, dêra Galatyayê ji ber bêîteatiyê hinekî jî di bi sêrbaziyê de bû.

Berî ku ez bêtir pêde biçim, divê ez vê xalê zelal bikim. Em dikevin bin bandora sêrbaziyê dema ku em li gorî tiştê ku Xweda ji me re eşkere kiriye tevnagerin, ne dema ku em li gorî tiştê ku ji me re nehatiye eşkerekirin tevnagerin. Gotinên Pawlos vê yekê zelal dikin: "Kê sêrbazî li we kir? Ma li ber çavên we, Îsa Mesîh xaçkirî ji we re nehat sûretkirin?" (Galatî 3:1).

Ev bûyera diyar rastiyeke gerdûnî derdixîne holê. Xweda, bi dilovanî rizgariya xwe bi rêya wazên Pawlos ji van dêran re eşkere kiribû. Lêbelê hîn gelek derbas nebibû wan bîrdozî û kevneşopiyên din qebûl kirin û li hember rastiya ku Giyanê Pîroz bi eşkereyî ji wan re eşkere kiribû, bêîteatî kiribûn. Wan dest bi hînkirin û pratîkkirina wê baweriyê kirin ku rizgarî bi şopandina qanûnê tê. Lêbelê, prensîba gerdûnî ya ku em dixwazin li ser bisekinin ev e: *Dema ku*

*em li hember rastiya ku Xweda bi eşkereyî ji me re eşkere kiriye, derdikevin, em xwe dixin bin bandora laneta sêrbaziyê. Çima? Ji ber ku serîhildanî falbazî ye.*

Min bandora vê di hemû civak, malbat û kesan de dîtiye. Min gelek kesên mudawîmê dêrê naskirin ku ji ber vê an jî wê sedemê her dem di rewşeke bêîteatiyê de dijîn. Piraniya van nikarin giraniya rewşê fêhm bikin ji ber ku ew ji hêla doktrîneke nehevseng a kerema ku girîngiya îteatiyê kêm dike ve hatine bêzar kirin. Di jiyana wan de krîzek li dû ya din tê. Her gav pirsgirêkek an jî guneheke wan heye ku ew nikarin ji nav derkevin. Ew ji xefikekê direvin û dikevin nava yeka din. Her senaryoya wan her ku diçe xirabtir dibe. Ev pirsgirêk dem, enerjî û debara wan dixwin. Li cîhekî, wan gihîştina rewa ya zext an jî bandora şeytanî bi dest xistine. Bêîteatiya wan ew bêparastin hiştiye.

Min dît ku zewacên wan di zoriyê de mane an jî ya herî xerab bi êşa devjihevberdanê bi dawî bûne. Yên din payeya meqamê wan bilind nabe an jî ya xerabtir karê wan jî ji destê wan diçe. Hin ji wan ji dizî, aboriya têkçûyî û trajediyê re dibin êm. Weke kesekî xeyal şkestî her dem li yekî digerin ku sûcdar bikin. Gelek caran ji dê û bav, pastor, patron, hevjîn, zarok, dewlet an jî muameleya ji kesekî ku bi wan re ne hemfikir in, tînin ziman û wan sûcdar dikin.

Her du sûcdarên ku bûne sedema vê, di bingeha xwe de hevdu xwedî dikin. Ya pêşî xapandin e. Ji ber ku îteatê bi Gotina Xweda nakin, tariyê daye ser dilê wan. Sûcdariya duyem, ew xefkên tevlihev in yên nebaşî ku êrişî wan dikin ku ji ber bêîteatiya wan pêk tê. Pawlos, kesên ku bela xwe di bawermendan de didin, wisa talîmat da wan: “Divê ew bi nermî şîretan li yên dijraber bike, belkî Xwedê fersendê bide wan ku tobe bikin û rastiyê bizanin û bi ser hişê xwe ve bên, wisa ku ji xefika Îblîsê ku ji bo daxwaza xwe ew girtine, xilas bibin” (Tîmotêyos II, 2:25-26). Pirsgirêk: Dîlgirtiyên hatine xapandin ji bo bêîteatiyên xwe veşêrin, kesên din sûcdar

dikin lêbelê kirina vê ji bo azad bibin bêteqez tişta ku pêdiviya wan pê heye, wan kor dike.

Em spasdar in ji bo Gotina Xweda. Şewqa Wî xapandinê derdixîne holê û fikir û niyetên di dilê mirovan de ji hev derdixîne. Mixabin, gelek mirovên ji ber bêîteatiyê di bin rayedariyê de ye, fêrbûnê red dike. Li şûna ku xwestek û arezûyên wan ji rêyên xelet ji xwe re dersê derxînin, her kesî sûcdar dikin û li beyebana bêîteatiyê dimeşin û berdewam dikin.

## "TU NE DILOVAN Î"

Bûyereke ku kesekî ji xwe re ders jê derxistiye tê bîra min. Di xizmeteke navneteweyî ku ji dibistaneke dêrê û Pirtûka Pîroz pêk tê, ez gihîştim wê rûmetê ku bi rêk û pêk ji wan re biaxivim. Min ji pastorê vê xizmeta ku bandor li jiyana min kir, hez kir û min rêz jê re digirt. Rojekê ev pastor li min geriya û ji min re wisa got: "John, ez li hemû dostên nêz yên xizmeta me digerim û behsa tiştên wê pêk bên dikim, ji bo ku ji hin kesên din nebihîzin. Divê ez ji te re bibêjim ku ez û xanima xwe em ê dev ji hev berdin. Ev hêjdeh sal in ku em zewicî ne û nêrîn û fikrên me yê derbarê jiyana me de ber bi aliyên cuda ve diçin. Em weke hevjînan bi hev re tu tiştî nakin û tiştên em ji wan hez dikin pir cuda ne. Bi salan me hewl da em bi pêş bikevin lêbelê rewş hîn bêtir xerab bû."

Min ji tiştên bihîstin bawer nekir. Di dilê xwe de ez wisa difikirîm: Na, ez rîca dikim, vê neke. Min ji van hevjînan û xizmetên wan pir hez dikir. Ez ewqasî matmayî mabûm ku min nikarîbû gotinekê pêde bikim û bibêjim.

Gava em bêdeng man pastor berdewam kir: "Îcar aniha, John tu dizanî ku ez pir ji Îsa hez dikim û eger ez tiştekî xelet bikim wê nîşanî min bike." Ev rêber bi min re li ser rewşa xwe çend deqeyên din axivî, piştre telefon girt. Min kêm tişt gotibûn ji ber ku hîn jî min tiştên bihîstibûn diserifandin û ez matmayî mabûm.

Wê rojê ji sibehê û heta êvarî, min nikarîbû ji tiştên ku min bihîstibûn dûr bikevim. Min ew gotin dubare kirin û dubare kirin. Ez fikirîm ku ev rewş dişibe xewneke nebaş. Di nava ramanên xwe yên pirsgirêk de, min hîs kir ku Giyanê Pîroz min teşwîq dike ku ez li wî kesî bigerim û rastiyê jê re bibêjim.

Sibeha din, min telefon kir. Di ser axaftina me re şevek derbas bûbû ji ber vê yekê ne axaftineke bi bertek bû lêbelê ji hêla Giyan ve ev axaftin hat birêvebirin. Dema ku pastor dengê min nas kir, pirsî: "Silav John, çi qewimî?"

Min dest bi axaftinê kir: "Ez dixwazim derbarê devjihevberdana we de bi te re biaxivim. Hevala te bêehlaqiyek kir?"

Bersiva wî ev bû: "Na, bêguman tiştekî wisa tuneye!"

Li ser vê min wisa got: "Ew tiştê ku tu dikî xelet e. Îsa dibêje ku jinberdan tenê di rewşa nedilsoziya zayendî de mimkun e (Metta 5:32) û Pirtûka Malaqî ji me re dibêje ku Xweda ji jinberdanê nefret dike ji ber ku ew dibeje ku ev dibe weke ku mirov bi ser kincên xwe de zordariyê li xwe bike (2:16). Doh, te ji min re got ku ez ji Îsa hez dikim û eger ez tiştekî xelet bikim ew ê nîşanî min bide. Lê çima Xweda wê dîsa nîşanî te bide ku jixwe Wî tişta tu dixwazî di Gotina xwe de eşkere kiriye? Tu çawa dikarî bi dilxwazî li dijî tiştê ku Gotina Xweda dibêje derkevî? Eger tu wisa bikî, tu çawa dikarî li ber civata xwe an jî li ber dibistana Pirtûka Pîroz biaxivî û ji wan re bibêjî ku li hemberî gunehê li ber xwe bidin û di pîroziyê de bimeşin? Tu deriyê xwe û yê xizmeta xwe li tengasî û xapandinê vedikî."

Pastor gotina min birî û bi awayekî şid wisa got: "John Bevere, tiştên hatine serê min, nehatine serê te û tu ne kesekî dilovan î!"

Tişta dûra min bihîst dengê qutkirina ragihandinê bû. Pastor telefon li ser çavên girtibû. Piştî nîv saetê, ji ofîsa min li min geriyan û gotin ku axaftina te ya tu yê li wê dêrê bikî, betal bûye. (Piştî sê mehan şûnde ji bo axaftinekê li wir bikim plan hatibû çêkirin) Min ji jina xwe re got: "Min dizanibû ku ew ê vê bikin lê ez nefikirîbûm

ku ew ê ewqasî zû vê bikin." Hemû têkilî bi temamî qut bûn û piştre pastorekî din ê navdar ku li wir xizmet kiribû ji min re got ku navê min li wir "hatiye reşkirin." Lê hemû tiştê ku min hewl dida bikim ev bû ku ez bibim hevalekî jidil û rast.

## HIŞYARIYA GIŞTÎ YA BI DARIZANDINÊ RE

Bi awayekî ji nişka ve, hema bêje piştî heft mehan, wî pastorî telefonî min kir: "John, divê ez jidil bi te re biaxivim. Tu dizanî piştî ku min telefon qut kir û axaftina te betal kir çi qewimî? Tam mehek şûnde, gurçikên min têk çûn û şansê min ê jiyanê ku bijîm ji sedî 50 bû. Piştî diyalîza duyem, hişê min hat serê min û min xwebixwe ji xwe re got: 'Ez bi jinberdanê çi tînim serê xwe?' Min fêhm kir ku ez pir xelet bûm. Têkçûna gurçikên min hişyariyek bû. Min telefonî jina xwe kir û tobe kir. Ez derketim ber dêr û dibistana me ya Pirtûka Pîroz û min tobe kir. Min ji dibistana Pirtûka Pîroz re wisa got: 'Min John Bevere betal kir ji ber ku wî ji min re got ku jinberdana min xelet e. Ez ê telefonî wî bikim û bibînim ka ew vedigere an na.' John, ji kerema xwe tu dikarî vegerî?"

Min bersiv da û got: "Helbet." Ji bo wî ez pir bi kelecan bûm û rêzgirtina min ya li hember vî rêberî hîn zêdetir bû. Di ber van hemûyan re, pir zûtir baş bû û piştî salekê gurcikeke bêhempa jê re hat dîtin. Vî pastorî xizmetek çi ye di ser re neqevizî û bijîşkên pêşketinê şaş man. Ya din jî, bi tobeyê re hêz û rayedariyeke giyanî ya pir mezin li jiyana vî rêberî belav bû. Aniha, piştî bi salan, ev pastor ji her demê bêtir bi bandor hîn bêtir rêbertiyê dike û axêverekî xwediyê malbatake pir bextewar e ku her kes lê digere. Bi van hevjînan re em kengî bên cem hev, hezkirina wan ya li hemberî hev pir diyar e. Hûn tu carî nikarin texmîn bikin ku berî çend salan dikirin ku dev ji hev berdin.

# NEXWEŞÊ SÊ MEH Û NÎVAN

Ji bo min hêsan bû ku ez vî pastorî nedarizînim ji ber ku çend sal berê tecrubeyeke wisa hatibû serê min jî. Ev ne bi zewaca min ve girêdayî bû lê bi qadeke bêîteatiyê ya xizmetê ve girêdayî bû. Dema ku cara pêşî me Messenger International damezrand, Reb; bêyî ku em xwesteka Wî hîn bibin, sirf ji bo ku baş xuya dike û ji bo em fersenda xizmetekê nepejirînin, talîmateke eşekere da me.

Çend sal di navberê re derbas bûn û teklîfek derket holê ku weke derfeteke mezin xuya dikir ji bo pêşketina xizmeta me. Lêbelê di dema duakirinê de, Xweda bi eşkereyî hem ji min û hem ji jina min re digot “Na,” me yê teklîf qebûl nekira. Lêbelê teklîf bi israr hat kirin û min bi serbilindî guhdar kir. Di demek kurt de, min dest bi ramanan kir ku ez ji gotina ku Xweda di dilê min de danîbû, dûr bikevim. Serê min tevlihev bû û hişê min ji ber hemû gotinan xumamî bû. Jina min hewl da ku şîretê li min bike ji bo em vê nekin lê wê fêhm kir ku ez ê zû îkna nebim. Di dawiyê de, min teklîf pejirand.

Ji dema ez xelas bûme ve, hema bêje tu nexweşî an pirsgirêkên tenduristiyê li min çênebûne (rûmet ji Xweda re be). Ez kêm caran nexweş dikevim û bi gelemperî di nava bîst û çar û heta sîh û şeş saetan de nexweşiya min derbas dibe. Ez bawer dikim ku Îsa, dema ku li çarmixê mir, ne tenê bexşandina gunehan peyda kir lê di heman demê de şîfaya laşî jî peyda kir (Îşaya 53:4-5; Zebûr 103:2-3). Lê roja ku min ev teklîf pejirand, ez nexweş ketim û min kir û nekir ez ji nexweşiyê xelas nebûm.

Pêşî weke ku min ta girtibe dest pê kir. Ji nozdeh saliya xwe ve ev cara duduyan bû ku vedireşiyam. Piştî ku çend rojan min bi tayê re şer kir, vîrûsek li min belav bû. Ez û jina xwe ji bo pîrozkirina salvegera zewaca xwe, em derketibûn derveyî bajêr û germa laşê min bi rojan ji 38 pileyan daneket û betlaneya me serobino bû. Min di dawiya wê hefteyê de bi germa laşê xwe û di nav lerzê de waz dan. Tayê heta hefteya din li civînên li Kanadayê berdewam kir. Min

bi taya bilind waz dan û dûv re vegeriyam odeya xwe û heta xizmeta din di nav nivînan de lerizîm. Hêza min pir kêm bû.

Germa laşê min sê hefteyan berdewam kir. Me fêhm nekir bê çi min heye. Berî vê tu carî bi nexweşiyeke wisa re me li ber hev nedabû. Min Gotina Xweda bi kar anî û min dua kirin û li ber xwe da lê min kir û nekir jê xelas nebûm. Ez çûm bijîşk. Antîbiyotiyek bi qewet nivîsî û di demeke kin de ez baş bûm.

Lê hefteyek piştî qedandina antîbiyotîkan, ez bi bapêşeke (flu, girîp) giran ku hemû hêza laşê min têk bir, ketim. Ez perîşan bibûm. Êşa qirikê, bêvila tije û her cure nîşanên din ên nexweş. Ev yek bi hefteyan berdewam kir û ji aliyekî ve jî min xizmeta xwe berdewam kir.

Piştî ku ez ji bapêşê baş bûm, îcar vê carê gava ez bi dîwarekî ve hilkişiyam, min çokê xwe seqet kir. Ewqas giran bû ku min bi kursiya bi teker rêwitî kir û piştî vê heta çend hefteyan jî ez dikuliyam û min piştgiriyeke çokê bi kar dianî. Gava ku birîna min hêdî hêdî baş dibû, ez dîsa bi vîrûseke din ketim û ketim nava nivînan. Germa laşê min gihîşt 39 heta 40 pileyî. Ji bo ku ez vê yekê derbas bikim, ez neçar mam ku dîsa antîbiyotîkan vexwim. Hema bêje hefteyek bê nexweşî derbas nedibû. Ev rewş sê meh û nîvan berdewam kir.

Tevî hemû nexweşiyên min, jina min rojekê jî nexweş neket. Ji bilî pirsgirêkên laşî, gelek pirsgirêkên din jî derketin holê. Min hest dikir ku ez bi dijminekî re şer dikim ku ji min bihêztir bû û dev ji min bernedida. Bêîteatiya min a bi zanebûn ez di bin lanetekê de fetisandibûm!

## BAŞBÛNA JI NIŞKA VE YA KU BI TOBEYA RAST RE PÊDE BÛ

Çar meh derbas bûn û min gunehê xwe qebûl kir. Lêbelê, dîsa jî divê min dev ji soza ku min dabû berdim û bêyî destwerdaneke mûcîzeyî rêyek ji bo derketinê tune bû. Min û Lisa me bi destên

hev girt; min tobe kir û ji Xweda min rehm xwest. Wî em ji dafika demdirêj a ku min em xistibûnê, rizgar kirin.

Çend meh şûnde, min û jina xwe li ser tiştên qewimîbûn nîqaş kir û me hemû nexweşiya min bi bêîteatiya min ve girêda. Çawa min tobe kir, me fêhm kir ku min tenduristiya xwe ya berê bi dest xistiye. Pirsgirêkên din ên ku barê me giran dikirin, çareser bûn û ji holê rabûn.

Di wê demê de, gotinên Aqûb ji min re hîn zelaltir bûn. Bi rastî, min gelek caran ew gotin bi bîr dianîn: “Li hember Îblîs bisekinin, wê ji we bireve” (Aqûb 4:7). Berê, dema ku min êrîşek hîs dikir, min bi xîret bi karanîna Gotina Xweda re li hemberî tariyê li ber xwe dabû û min her gav encamên vê yekê didîtin. Lê dîsa jî, di vê ezmûnê de, min tu encam bi dest nexistibû. Dema ku ez li ser vê yekê difikirîm, min fêhm kir ku min tenê nîvê tiştê ku Aqûb digot fêhm kiriye: “Loma bi ya Xwedê bikin. Li hember Îblîs bisekinin, wê ji we bireve” (4:7).

Dema ku em bi îteatkariyê xwe teslîmî rayedariya Xweda bin, Îblîs wê ji me bireve. Em dikarin heta ku em şîn û reş bibin ji Nivîsên Pîroz jêgirtinan bikin, lê heke em bêîteatiyê bikin, em ê encamên wê nebînin.

## DAXUYANIYEKE GIRÎNG

Ji kerema xwe vê yekê fêhm bikin: Dema ku kesek bi zehmetî, nexweşî, pirsgirêk an jî dijwarîyan re rûbirû ma, sedema vê ne hewce ye ku teqez ji ber bêîteatiyê be. Gelek kes her çiqasî jiyaneke îteatkar dijîn jî êşan dikişînin. Dawid zilamekî wisa bû. Wî bi tu awayî serhildêrî nekir li ber Xweda. Wî tiştekî xelet nekiribû ku xezeba rêberê xwe bikişîne ser xwe. Lê dîsa jî, ew hate sirgûnkirin û neçar ma ku di şikeftan de û li çol û beyaran bijî. Ew zilamekî bê mal û milk bû. Bi salan, ew weke serseriyekî jiya û gelek zehmetî kişandin. Hinekan ew darizand û difikirîn ku ew ji ber bêîteatiyê êşan dikişîne, lêbelê yên ku hîs dikirin, dizanîbûn û dîsa hîs dikirin

ku Xwed padîşahekî nû ava dike û kerema li ser jiyana wî jî dîsa hîs dikirin. Ev ji zanebûna wî ve diyar bû.

Nimûneyên bêhejmar ên mirovên îteatkar hene ku êş kişandine: Îsa, Ûsiv, Hannah, Daniyal, Yêremya, Eyûb û yên din. Cudahiya di navbera kesên îteatkar ku zehmetî kişandine û kesên di bin lanetê de ew e ku yên îteatkar ji aliyê giyanî ve pêş ve diçin. Ew serê xwe li dîwêr naxin; ew bêyî ku bigihîjin cihekî li dora çiyayekî nazivirin.

Çîrokeke cuda bû ji Qayîn. Bêîteatiya wî bû sedema êşeke mezin. Ew ji tobekirinê aciz bû û ev yek bû sedema lanetê li ser jiyana wî. Ew bi salan weke kesekî reviyayî û rêwî jiyana xwe derbas kir. Ger û geştên wî yên bêarmanc û bêhêvî ders û hişyariyek e ji bo nifşên pêşerojê.

Ez ê bi vê yekê dawî li axaftina xwe bînim: Ranehijin rastîyên du beşên dawî û ji bo darizandina kesên din bi kar neynin. Ji ber ku zehmetiyên wan kişandina, dibe ku bibin ceribandinên ku Xweda wê bi wan were rûmetdarkirin. Armanca vê beşê ew e ku alîkariya we bike ku hûn giraniya bêîteatiya li hemberî desthilatdariya Xweda fêhm bikin. Eger hûn di nava bêîteatiyê de bin, hûn dikarin van rastiyan bikar bînin ji bo ku hûn xwe bidarizînin û vegerin ser rêya jiyanê.

3

# RAYEDARIYA KU XWEDA TAYÎN KIRIYE

BEŞ 8

# XWEDA DIZANE BÊ RAYEDARÎ BI KÊ RE YE?

*Eger em hîn bibin bê em ê çawa ji Xweda re îteatê bikin, di nasîna rayedariya Xweda de li ser kesekî din em ê tu pirsgirêkan nekişînin.*

Me girîngiya teslîmbûna ji rayedariya rasterast a Xweda, diyar kir. Niha em li ser rola bi heman rengî girîng a teslîmbûna ji bo kesên ku Xweda rayedariya xwe daye wan nîqaş bikin. Ji bo amadekirina qonaxê, em bi ayetên ku di beşa duyemîn de hatine destnîşankirin, dest pê bikin:

> "Bila her kes bi ya hukûmeta li ser xwe bike; çimkî hukûmeta ku ne ji aliyê Xwedê ve ye tune û yên heyî ji aliyê Xwedê ve hatine danîn. Ji ber vê yekê, yê ku li hember desthilatiyê derkeve, ew li ber sazûmana Xwedê radibe û yên ku li ber radibin, wê dîwankirina xwe bînin." (Romayî 13:1-2)

## RÊVEBERIYA SERDEST

Berî her tiştî "rêveberiya serdest" kî ne? Di vê nivîsa diyar de, Pawlos behsa rayedarên giştî an jî yên hikûmetê dike. Lêbelê bi vê yekê re, ev gotinên teşwîqê, ne tenê ji bo rêberên dewletê lê di heman demê de ji bo deverên din ên rayedariya ku ji wan re hatiye dewirkirin jî dorpêç dike. Tişta ku em ê ji vê metnê fêr bibin, divê li hemû qadên rayedariya hatiye dewirkirin bê bi cîhkirin.

Peymana Nû behsa çar kategoriyên rayedariya dewirkirî dike: dewlet, dêr, malbat û civakîbûn. Ez kardêran, mamosteyan û patronan dixim nava qada civakîbûnê. Peymana Nû ji bo her kategoriyê rêbernameyên taybetî dide; lêbelê di pir rewşan de, rêbername sînoran derbas dikin û digihîjin hemû warên rayedariya hatiye dewirkirin.

Bala xwe bidin îfadeya destpêkê, "her kes." Tu kes ji vê ne mûaf e, ji ber vê yekê vê di hişê xwe de bi cih bikin. Ev fermanek e, ne pêşniyarek e. Reb tiştan li ber mirov naxîne an jî şîretan nake.

Wisa berdewam dike: "Bila hemû bi rêveberiya serdest ve girêdayî bin." Peyva Grêkî ya ji bo "girêdayî"nê tê gotin, di vê hevokê de "hupotasso" ye. Ew têgeheke leşkerî ya Grêkî ye ku tê wateya "rêxistinkirina (dabeşên leşkeran) bi awayekî leşkerî di bin fermandariya rêberekî de." Di karanîna derleşkerî de, tê wateya "helwesteke dilxwaz a teslîmbûnê, hevkariyê, girtina berpirsiyariyê û hilgirtina barekî" (Ferhenga Grêkî ya Thayer). Bi kurtasî, ev peyv di ayetê de me teşwîq dike ku em bi niyeta teslîmbûna tevahî bi dilxwazî tevlî rêveberiyan bibin.

Divê her kes girêdayî rêveberiyan be, ji ber ku hemû rêveberiyên ku di jiyana me de hene Xweda ava kirine. Koka hemû rayedariyê digihêje heta Xweda. Îstîsna tuneye. Ya rastî, hevoka ku di vê ayetê de weke "avakirin"ê hatiye wergerandin, peyva Grêkî "tasso" ye ku tê wateya "tayînkirin, diyarkirin an jî bicîhkirinê." Ev peyv bi tu awayî nayê wateya "bi tesadufî." Raste rast tayînkirin e. Ji ber ku

Xweda hemû rêveberî tayîn kirine, heke em bêrêziyê li wan bikin an jî red bikin ku teslîmî wan bibin, wê demê em rayedariya ku piştevaniyê li wan dike, red dikin. Em di ferqa vê de bin û ne di ferqa vê de bin jî, em li dijî ferman an jî rêkûpêkiye Xweda derdikevin. Dema em rayedariya ku ji aliyê Xweda ve hatiye dayîn dixin ber pirsê, em li dijî Xweda bi xwe derdikevin!

Weke Xirîstiyaniyan gava ku em bi kesên rayedar re têkiliyê datînin, divê em ji kesayetî an jî tevgerê wêdetir bibînin û rêzê ji meqamê wan re bigirin. Em îteatê ji kesên xwedî rayedar re digirin, ji ber ku rayedariya Xweda bi wan re ye. Her çiqasî em ji kesayetî an jî ji şêwaza rêberiya wan hez nekin jî, an jî heke em bawer bikin ku ew ne hêjayî vê meqamê ne jî, em rêzê li wan digirin. Gelek caran, bawermend îdîa dikin ku ew stûyê xwe li ber Xweda ditewînin lêbelê ev kes rayedariya ku Xweda dewrî hin kesan kiriye, paşguh dikin û wê îhmal dikin. Ev kes hatina xapandin!

Eger em fêr bibin bê em ê çawa îteatê ji Xweda re bikin, em ê di naskirina rayedariya Xweda ya li ser kesekî din de, tu pirsgirêkê nejîn. Gelo demên ku divê em di navbera rayedariya rasterast a Xweda û rayedariya ku ji hêla Wî ve hatiye dewirkirin de, hilbijartinê bikin an na? Belê! Lêbelê ne ewqas caran ku piraniya bawermendan lê difikirin. Îstîsnayek heye ku em ê di beşeke pêşiya vê de bi berfirehî li ser bisekinin. Lêbelê pirsgirêka li vir ew e ku gelek Xirîstiyan difikirin ku îteat îstîsna ye û hilbijartina şexsî ya azad jî tiştekî normî ye. Xwedîbûna vê celeb ramanê dikare me ber bi rêyeke hilweşînê ve bibe. Weke ku me di beşên berê de dît wê encamên wê giran bin. Helwesteke wisa wê tenê me nexe bin darizandina Xweda lê di heman demê de gihîştina meşrû dide hêzên şeytanî. Eger em bixwazin ku em ji Xweda re îteatê bikin û jê re pîroz bimînin, dema ku dor tê ser rayedariya ku hatiye dayîn, tenê yek bijareya me heye: girêdayîbûn û îteat.

## RÊVEBERIYÊN XERAB JI ALIYÊ XWEDA VE TÊN AVAKIRIN?

Ji ber vê yekê, ji ber ku hemû rêveberî ji aliyê Xweda ve tên tayînkirin, li me tê ferman kirin ku em rêzê ji wan re bigirin û bi wan ve girêdayî bin. Bi gelemperî di vê xalê de di hişê mirovan de dîwar bilind dibin. Îtîrazeke hevpar wisa ye: “Ez rêberên dijwar û bi awayekî eşkere xerab nas dikim. Tu çawa dikarî ji min re bibêjî ku ew ji aliyê Xweda ve hatine tayînkirin?” Dîsa ji bîr nekin ku Pawlos nivîsandiye ku hemû rêveberî ji Xweda ne lê wî negotiye ku hemû rêveberî îlahî ne. Rayedarî ji Xweda ye, lêbelê dibe ku tevger ne wisa bin. Ji ber vê yekê, em li ser senaryoya herî xirab bifikirin: Bila kesekî ku di kategoriya Hitler an jî ya Stalîn de be. Ev her du bi îhtîmaleke mezin weke du rêberên herî xirab ên sedsala borî derdikevin pêş. Em hemû li hev dikin ku rêberek di vê kategoriyê de bi awayekî pir hov û xerab e. Ma ne wisa ye?

Werin em li ser Fîrewn, hukumdarê Misrê biaxivin. Bêguman ew bi wan re di heman kategoriyê de ye. Gelê Îsraêlê yê di bin rêveberiya Wî de bi awayekî hovana bi wan re tevgeriyan. Fîrewn gel kir kole, feqîr kir, bi awayekî fîzîkî û derûnî ew îstîsmar kir û ji bilî vê bi hezaran ji wan bi awayekî hovane qetil kir. Ew yekî serhişk û serbilind bû, bêyî ku rêzê ji jiyana mirovan an jî ji REB re bigire. Rayedariya ku xwediyê wê bû ji kuderê hat? Gelê Xweda çawa ket bin kontrola wî? Ma ev qezayek bû gelo?

Li gorî Nivîsên Pîroz, Xweda bi rêya Mûsa ji Fîrewn re wisa got: “...min tu li ser lingan hişr (Derketin 9:16). Pawlos ev yek di nameya xwe ya ku ji Romayiyan re nivîsandiye, piştrast kir (9:17). Di her du referansan de jî em dizanin ku ev rast e û şaş nehatiye şîrovekirin, şahidiya du kesan derbasdar e (Yûhenna 8:17). Guman tuneye ku yê Fîrewn li ser lingan hişt û ew kir kesekî rayedar, ne Şeytan e, Xweda ye. Bi gotineke din, Xweda rayedariya li ser neviyên Birahîm da Fîrewn. Ev rewş, bi rastiya ku “rêveberiyên heyî ji hêla Xweda ve têne damezrandin” bi awayekî bêhempa li hev dike.

Werin em nîqaş bikin bê ka gelê peymana Xweda çawa ket bin rêveberiya vî rêberê xerab. Dema ku Birahîm heftê û pênc salî bû, Xweda jê re xuya bû û jê re got ku eger ew bawer bike, ew ê wî bike neteweyekî mezin. Birahîm bawerî pê anî û Xweda ji baweriya Birahîm ewqasî kêfxweş bû ku jê re "bavê hemû kesên jê bawer dikin" hate gotin (Romayî 4:11-12). Li ber vê baweriya Birahîm, Xweda peymanek bi wî re çêkir. Dema ku REB peymana xwe bi Birahîm re çêkir, jê re got: "Baş bizanibe ku wê ziriyeta te li welatekî xerîb bijî û çar sed salan bibe kole û zilmê bibîne" (Destpêk 15:13)

Di wergereke din li şûna peyva tundiyê îfadeya aciziyê derbas dibe (nkjv). Ev peyveke dijwar e ku mirov biserifîne! Weke bav û kalê kur, keç û neviyên bêhejmar ez ê qet kêfxweş nebim eger mîrateyeke wisa bikeve destê zarok û neviyên min. Ev bêguman qet ne gotina pêxemberîtiyeke teselîker an jî yekî kêfxweş e. Ka li ser vê bifikirin. Em di sedsala yekem a mîlenyûmeke nû de dijîn. Eger peyveke wisa ji min re bihata gotin, wê bandor heta sala 2400î ya PZ'ê li kesên ji ziriyeta min hatine, bikira. Dibe ku ez bi hêsanî werim xapandin ku ez wisa bifikirim: "Ji ber ku ez îteatê ji Xweda re dikim ma soz û pîroziya ku li min tê kirin wê ev be?" Ya balkêştir jî, ev gotin berî ku Îshaq têkeve malzarokê hatibû ragihandin.

## SEDEM TEVGERÊN WÎ YÊN XERAB BÛN?

Dibe ku hin kes wisa bifikirin: "REB ev yek ji berê ve ji Birahîm re got ji ber ku kesên wê ji zireyeta wî çêbibûna wê bêîteatî bikirina û ji ber vê yekê wê weke cezeyê tevgerên nebaş di bin rêveberiya Fîrewn de bihatana bicihkirin lêbelê plana Xweda ya ji bo wan qete ne ev bû!" Werin em lêkolînê bikin û bibînin bê ka gelo ev fikir rast e an na.

Ji bo bersivê, divê pêşî em pê zanibin bê çawa ketine bin rêveberiya Fîrewn. Îshaqê kurê Birahîm, jiyaneke bi îteat û pîroziyê tije û zilamekî ji Xweda ditirsiya. Du kurê wî û Rebeqaya jina wî hebûn: Yê mezin Esaw û yê biçûk Aqûb bû. Ev her du ji gelek aliyan

ve du zilamên ji hev cuda bûn. Xweda, fikrên xwe yên derbarê wan de hîn berî ku çêbibin, wisa diyar kiribû: “Min ji Aqûb hez kir û ji Esaw nefret kir” (Romayî 9:13).

Her çiqasî Aqûb di destpêkê de hinekî ji rê derket jî, wî li Peniyêl li rastî rastîyeke radîkal a Xweda hat (Destpêk 32). Ev li hevrasthatin bû sedema peymaneke bereketê bi Xweda re û navê wî hate guhertin bû Îsraêl ku tê wateya “Mîrê Xweda.” Ji wê demê û pê ve, em di jiyana wî de dilsoziyeke xurt ji Xweda re dibînin. Wî ferman da malbata xwe ku ji pûtperestiyê birevin û li ber Xweda pak û paqij bimînin. Di encamê de, dema ku malbata wî rêwîtî dikir, tirsa Xweda li ser kesên bawer nakin belav bû (Destpêk 35).

Îsraêl bavê diwanzdeh kuran bû. Kurê yanzdehan Ûsiv, ji aliyê birayên xwe ve dihat biçûkxistin ji ber ku ew bijarteyê bavê xwe bû. Xweda du xewnên pêxemberî dan Ûsiv ku nîşan dan ku ew ê bibe rêberekî mezin û birayên wî dê xizmeta wî bikin. Xewnên wî birayên wî ewqas bi hêrs kirin ku wan komployek li wî kirin ku wî ji holê rakin û Ûsiv weke kole firotin Misrê.

Gava di nava tenêtî û bêhêvîtîya xwe ya bêdawî de bû jî, Ûsiv li Misrê ji REB re dilsoz ma. Piştî ku deh salan ji xulamekî Fîrewn re xizmet kir, ew rastî bêbextiyê hat û bi tecawiza jina mîrê xwe re hat tawanbarkirin. Ew zêdetirî du salan di zindanê de ma lêbelê ew sebatkar û dilsoz ma. Piştre, REB ew bi kar anî da ku xewnên du xulamên girtî yên Fîrewn şîrove bike. Yek ji wan hate îdamkirin, yê din hat efûkirin û vegeriya xizmeta xwe ya berê lê xulamê sax ma, tevî daxwaza Ûsiv, demek dirêj ew bi bîr neanî. Lê dîsa jî, Ûsiv dilsoz bû.

Piştre dema ku Fîrewn ji xewneke ku dît aciz bû, xulamê ku hatibû efûkirin jê re behsa Ûsiv kir. Ûsiv ji bo ku xewna Fîrewn şîrove bike, ji zindanê hat derxistin. Şîrovekirina xewnê hişyariyek bû li ser birçîbûneke giran ya piştî heft salên hebûn û bereketê. Xweda zanyarî da Ûsiv da ku şîretê li Fîrewn bike ku di salên hebûn û bereketê de hişyar be. Fîrewn ewqasî di bin bandora zanebûna

Ûsiv de ma ku wî Ûsiv weke rêveberê duyemîn yê Misrê yê ku piştî wî tê, tayîn kir.

Li welatê Ûsiv; bavê wî Îsraêl, derbarê tiştên ku wê biqewimin de haya wî jê tunebû. Xweda xelaya ku nêz dibû ji wî re eşkere nekir. Rawestin û demekê li ser vê yekê bifikirin. Xweda nîşanî Fîrewn da ku wê çi biqewime lê wî ev xetere ji xulamê xwe yê dilsoz ê peymanê, ango ji Îsraêl veşart. Ev ji ber ku wê bibûya sedem ku vê xelayê neviyên Birahîm ber bi Misrê ve bibirina. Di sala duyemîn a xelayê de Îsraêl, kurên xwe şandin Misrê da ku genim bînin. Eger genim tunebûya wê ew ji nêza bimirana. Tekane cihê biçûyanê Misrê bû ji ber ku tenê Misrê ji xelayê re amade bû û bi zanebûna REB re hatibû xemilandin. Di encama rastiya ku Xweda ji Fîrewn re eşkere kir, wî welatê Misrê geş kir. Wî Misrê bilind dikir ki bo ku bibe welatê herî bihêz û bibandor ji hemî welatan xweştir û geştir. Bêguman, armanceke vê yekê jî hebû.

Dema ku Îsraêlî gihîştin Misrê, ew anîn ber hizûra Ûsiv lê wan ew nas nekir. Ne tiştekî ecêb e. Kî wê xeyal bike ku koleyek li ser text bibîne? Ji aliyê din ve, Ûsiv ew nas kirin û heta dibe ku li benda wan be jî lê wî nasnameya xwe veşart. Wî genim bi belaş da wan û ew pîroz kirin lê planek çêkir û birayekî xwe girt û yên din neçar hiştin ku vegerin. Dema ku xwarin û vexwarinên wan xilas bûn, Îsraêlî vegeriyan. Dema ku ew hemû kom bûn, Ûsiv xwe da nasîn.

Piştî ku nasnameya Ûsiv hîn bûn, birayên wî pir tirsiyan. Ûsiv di rewşekê wisa de bû ku dikarîbû tola xiyaneta lê kirin ji wan hilîne. Lê li şûna vê, wî ew teselî kirin:

> "Ûsiv ji birayên xwe re got: "Nêzîkî min bibin." Çaxê ew nêzîk bûn, wî got: "Ez birayê we Ûsiv im ku we ew firot Misriyan! Niha ji ber ku we ez firotim, li ber xwe nekevin û bila li zora we neçe. Çimkî ji bo parastina jiyanê, Xwedê ez li pêşiya we şandim. Ev du sal e ku li welêt xela heye. Wê hê pênc salên din jî çandin û çinîn çênebe. Lê Xwedê ez li pêşiya we şandim

ku li ser rûyê erdê ziriyeta we biparêze û jiyana we bi serfirazî rizgar bike. Ji ber vê yekê, kesên ku ez şandim vir ne hûn in, lê Xwedê ye. Wî ez ji Fîrewn re kirim bav, li ser qesra wî xweyî û ji seranserê welatê Misrê re kirim serwer.” (Destpêk 45:4-8)

Piştî bersiva wî, dibe ku hûn bipirsin gelo Ûsiv ewqas dem li Misrê derbas kiribû ku perspektîfa wî hatiye tahrîfkirin. Dibe ku wî salên êş, xiyanet û tenêtiyê ji bîr kiribûn. Axir, Xwedayekî dilovan çawa dikaribû ewqas êşê pê bikişîne? Çawa dikaribû bihêle ku kurê herî dilsoz û îteatkar ê Îsraêlê, her çiqasî bêguneh bû jî, ji bo zêdetirî diwanzdeh salan zehmetiyên koletiyê û zindanê bikişîne? Li nêrîna dirêj, Xweda çawa dikaribû gelê xwe yê ku peyman pê re çêkiriye, ji hêla serokekî herî zordar û xedar yê hemû deman ve were birêvebirin? Ma Ûsiv bi rastî bawer dikir ku Xweda ne tenê destûr daye vê yekê lê di heman demê de plan jî kiriye?

Ji bîr nekin ku şahidiya du kesan derbasdar e. Guhê xwe bidin nivîskarê Zebûrê bê piştî bi salan çi nivîsandiye:

“Wî li welat xela rakir,
Hemû xwarinan qedand.
Wî zilamek li pêş wan şand,
Ûsivê ku bi koletî hat firotan.
Zincîr li lingê wî xistin, ew êşandin,
Bi hesin ew ji stûyê wî girêdan,
Heta ku gotina wî hat cih,
Peyva Xudan ew ceriband.”
(Zebûr 105:16-19)

Wey ji xwe re lê binêrin, dema ku Ûsiv ew gotin kirin, ne di nava xapandinê de bû! Werin em li vê pasajê hîn ji nêz ve binêrin. Pêşî, Xweda xela plan kir, ne Şeytan an jî şert û merc. Ya duyemîn, weke Ûsiv got, Xweda ew ji ber malbata wî bir. Ji ber ku hevoka “Wî

(Xweda) zilamek li pêş wan şand" derbas dibe ev nabe ku bibe karê kesekî din. Ûsiv ne di nava înkarê de bû, ew bi rêya Giyanê Xweda diaxivî. Ya sêyemîn, hemû êşên ku Ûsiv kişand ji bo wî ceribandinek an jî pêvajoyeke paqijkirinê bû. Di dawiyê de, ew hat zincîrkirin û zengilek hesinî li dora stûyê wî hat gerandin. Bêguman, zindanên wan deman ji zindanên roja me pir xirabtir bûn. Lê Ûsiv kurê herî dilsoz ê Xweda bû! Ma ev, tê wê wateyê ku çawa mirovên baş dikarin ji hêla rêvebiran ve rastî muameleya herî dijwar bên û ev ne qezayek an jî planeke Şeytan e gelo? Ma hûn dibêjin ku şert û mercên wisa dibin ku kirin an jî plana Xweda be?

## RIZGARIYEKE BÊHEMPA?

Em berdewam bikin û bersivan ji van pirsên girîng re bibînin. Li gotinên Ûsiv careke din binêrin. Bînin bîra xwe ku di bin hêza Xweda de axiviye: "Lê Xwedê ez li pêşiya we şandim ku li ser rûyê erdê ziriyeta we biparêze û jiyana we bi serfirazî rizgar bike. Ji ber vê yekê, kesên ku ez şandim vir ne hûn in, lê Xwedê ye. Wî ez ji Fîrewn re kirim bav, li ser qesra wî xweyî û ji seranserê welatê Misrê re kirim serwer" (Destpêk 45:7-8).

Rizgariyeke bêhempa! Deqeyekê li bendê bin. Ne bêîtaetiya Birahîm bû ku ew xistin bin rêveberiya Fîrewn lê plana Xweda bû. Wekî din, Xweda ji pêşî ve dizanîbû ku piştî mirina Ûsiv, wê Fîrewnekî din bi ser bikeve û zilm û zordariyê li Îsraêliyan bike (Derketin 1:8-14). Berî bi salan, Xweda ji Birahîm re gotibû ku wê nifşên wî çar sed salan bindest bibin û zilmê bikişînin. Ango, rizgariya bêhempa ya ku wê REB ava bikira ev bû? Mirov çawa lê difikire gava li dijwariyeke wisa rast tê dibêje ev rewş rizgariyek e?

Dibe ku hin kes wisa bipirsin, "Çima Xweda li şûna Misrê, ji bo ku di heft salên xelayê de xwarin ji bo neviyên Birahîm peyda bike, zanebûn neda wan? Wê demê Ûsiv wê ji hemû êşan xilas bibûya." Sedema vê eşkere ye: Xweda xwestiye ku ew di bin

rêveberiya Fîrewn de bijîn. Wî ji bo vê yekê plan kiribû. Lê hûn dikarin wisa bibêjin: “Lê Fîrewn ji Hitlerekî antîk ne cuda bû. Wî bi hezaran kuştin û zehmetiyên mezin anîn serê gelê Xweda.” Erê, ev rast e, lêbelê divê em ji bîr nekin ku pêşîniya Xweda ne ew e ku em bigihîjin rehetî û kêfên vê dinyayê -pêşîniya Wî rizgariya me ye! Guh bidin zanebêna Xweda dema ku ew bi Fîrewn re diaxivî: “Lê ji ber van sedeman min destûr da ku tu bijî: Ji bo hêza xwe nîşanî te bidim û tevahiya dinyayê navê min bizanibe” (Derketin 9:16).

Berî van rêzebûyeran, kesên ku REB Xweda nas dikirin tenê Birahîm, Îshaq, Aqûb û nifşên ji ziriyeta wan bûn. Cîhana mayî Xwedayê Birahîm, Îshaq û Aqûb nas nedikir. Ji ber vê yekê, gava Mûsa hat ba Fîrewn û ferman da wî ku bi navê REB destûrê bide ku Îsraêliyan berde, Fîrewn wisa bersiv da: “Ma Xudan kî ye ku ez guhdariya dengê wî bikim û gelê Îsraêl berdim? Ez Xudan nas nakim, gelê Îsraêl jî bernadim” (Derketin 5:2). Fîrewn û gelê Misrî Xweda nas nedikirin. Lêbelê tişt guherîn dema ku Xweda nîşanên xwe diyar kirin ji bo ku gelê xwe rizgar bike.

Piştî çend belayan, hin Misriyan guh dan dengê Xweda. Hîn berî ku belaya teyrokan dest pê bike, “Karmendên Fîrewn ji gotina Xudan ditirsiyan, yekser kole û keriyên xwe anîn malê” (Derketin 9:20). Di demeke kurt de, xulamên wî ji Fîrewn lava kirin û gotin: “Wan berde! Bila herin û xulamiya Xwedayê xwe Xudan bikin. Misir helak bû, ma tu hê fêm nakî?” (Derketin 10:7). Heta sêrbazên Misrê jî ji Fîrewn re gotin, “Xwedê ev kiriye” (Derketin 8:19).

Tiştên nû yên derbarê Yahwe de hîn bûn ji vê hevokê diyar e: “Jixwe Mûsa li welatê Misrê, li ber çavê karmendên Fîrewn û gelê wî gelekî mezin bû” (Derketin 11:3). Ji zilamê Xweda re rêzgirtineke jidil digirtin ji ber ku êdî fêhm kiribûn bê REB kî ye. Ya din jî em dixwînin ku gelê Misrê, zêr, alavên zîv û kinc dane kesên ji ziriyeta Birahîm (Derketin 12:35-36). Fîrewn jî di cihekî de ev îtîraf kir: “Min vê carê

guneh kir. Xudan rast, ez û gelê xwe sûcdar in” (Derketin 9:27). Di dawiya dawî de hemû Misiriyan fêhm kir bê kî Xwedayê jîndar e.

## HEMÛ DINYAYÊ FÊHM KIR

Ne tenê Misrê lê tevahiya cîhanê Yahwe weke Xwedayê rastîn û jîndar nas kir. Ev zanîn, encameke Wî ya rasterast a biçûkxistina welatê herî bi hêz yê li ser rûyê erdê bû. Xweda, bi rêya Ûsiv zanebûn da Misrê û vê zanebûnê Misrê kir welatê herî bi hêz -lêbelê di dawiya dawî de ji hêla koleyên Îsraêlî ve hat hilweşandin. Têkçûna koleyan a gelê herî bihêz ê heyî, ne gelekî xizan, bêhêz, an jî navîn, bandoreke kûr li ser cîhanê kir ku şahidê van hemû bûyeran bû. Xweda bandorek wisa li ser tevahiya erdê kir ku piştî salên Îsraêl ên li çolê geriyan, hemû gel hîn jî ji wî ditirsin û li ber wî dilerizin.

Ev bandor, her çiqasî piştî ku nifşek li dû xwe hişt jî diyar e. Yêşûyê ku ket şûna Mûsa, du sîxur şandin bajarê Erîhayê. Rahavê ku zilam pêşwazî kirin, ji wan re wisa got:

> “Ez dizanim ku Xudan welat daye we. Tirs û sawa we ketiye ser me hemûyan. Hemû şêniyên welêt ji tirsa we dihelin. Çimkî me bihîst gava hûn ji Misrê derketin, çawa Xudan ava Derya Sor li ber we ziwa kir û we bi çi awayî li rojhilatê Çemê Şerîayê, Sîhon û Ogê padîşahên Amorî bi tevahî tune kirin. Gava me bihîst, dilê me heliya. Ji ber we êdî bi tu kesî re derman nema. Çimkî Xwedayê we Xudan hem li jor li ezmanan, hem jî li jêr li ser rûyê erdê Xwedê ye.” (Yêşû 2:9-11)

Anî ziman ku REB Xweda ye û “her kesê li welat dijî” ji tirsan qudûmê wan şkestiye. Navê REB li hemû dinyayê dihat zanîn!

Ev zanîn ne tenê ji bo mezinbûna Wî bû, lê di heman demê de ji bo rizgariyê jî bû. Berên pêşîn, dema ku ev fahişeya biyanî bi tevahiya malbatê re rizgar bû, derket holê. Ya girîngtir, ev jin bû dapîra mezin a Qral Dawid û di secereya malbata Îsayê Mesîh de cih

girt. Eger Xweda, zilamê ji bo rêveberiya gelê xwe mezin kiriye, ango eger biçûkxistina Fîrewn re navê xwe li ser rûyê hemû dinyayê îlan nekira, wê ev pêk nehataya.

Çend sed sal piştî Derketina ji Misrê, delîlên tirsa Xweda hîn jî di nav gelan de hebûn. Di dema Eli'yê kahînê de ku ji gelê Îsraêlê re hakimtî dikir, navê Xweda dîsa ji ber tiştê ku wî bi Fîrewn kiribû, hate bibîranîn. Îsraêlî bi Filistîniyan re di şer de bûn û di roja pêşî de gelek kes ji wan hatin kuştin. Roja din, Îsraêliyan Sindoqa Peymanê anîn qada şer. Dema ku Sindoqa Peymana REB gihîşt artêşgehê, hemû Îsraêliyan ewqasî bi dengekî bilind qîr kirin ku erd û ezman hejiya (Samûêl I, 4:5). Filistîniyan qîrîn bihîstin û ji hev pirsîn bê ka ev dikare çi wateyê bide. Piştre, ew hîn bûn ku Sindoqa REB anîne artêşgeha Îsraêliyan. Werin em lê binêrin bê wan piştî vê çi gotiye:

> "...bi tirs got: Îlah hatine artêşgehê. Wey li me! Berê tiştekî wisa qet nebûbû. Wey li me! Wê kî me ji destê van îlahên xurt rizgar bike? Îlahên ku Misrî li beriyê bi her belayê ceza kirin, ev îlah in." (Samûêl I, 4:7-8)

Îbraniya peyva "xwedayan" di van ayetan de "elohiym" e. Ev peyv di Peymana Kevin de ji bo danasîna REB Xwedayê ku em dihebînin, ji du hezar caran zêdetir tê bikaranîn. Tenê di beşa yekem a Destpêkê de, sî û du caran derbas dibe ji bo ku Xwedayê me û Afirînerê me pênase bike. Ji ber vê yekê, ew dikarîbû bi awayekî rasttir weke "Xweda" bê wergerandin ne weke "xwedayan." Heta Filistînî jî piştî sedsalan hejiyan; her çiqasî Wî nehebînin jî, wan dizanibû ku Xwedayê rastîn û jîndar kî ye.

## KÛRBÛNA ZANEBÛNA XWEDA

Gava Fîrewnê xerab hat ser rêveberiyê, Xweda ne bê amadekarî bû: "çimkî hukûmeta ku ne ji aliyê Xwedê ve ye tune û yên heyî ji aliyê Xwedê ve hatine danîn" (Romayî 13:1). Di seran serê hemû

heyaman de, çi baş û çi jî zalim, her rêberê ku xwedî rayedariya meşrû ye, ji aliyê Xweda ve hatiye tayînkirin. Ji ber sedemeke diyar hatiye tayînkirin û qet ne ku şensê wî heye hatiye tayînkirin.

Hûn aniha dikarin bibêjin: “Ma çi fêdeya rêberekî weke Stalin an jî Hitler çê bû?” Ji bo bersivê destûrê bidin ku ez ji Pawlosê Şandî jêgirtinekê bikim:

> “Loma ew bixwaze rehmê li kê bike, dike û bixwaze dilê kê hişk bike, hişk dike. Ey kûrahiya dewlemendî, şehrezayî û zanîna Xwedê! Ma kî dikare dîwankirina wî fêm bike! Ma kî dikare riyên wî salix bide! Ma kê bi fikra Xudan zaniye? An kî jê re bû şîretkar?” (Romayî 9:18; 11:33-34)

Dibe ku Xweda karên di ser têgihiştina me re bike. Divê tiştên ku Wî guncav nedîne ku bîne ziman, em bi baweriyê bipejirînin.

Pawlos derbarê zanebûna Xweda de pirsan dipirse: “Lê camêr, tu kî yî ku tu li hember Xwedê bersîvê didî? Gelo tiştê ku ji herriyê hatiye çêkirin, ji yê ku ew çêkiriye re dibêje: Te çima ez weha çêkirim?” (Romayî 9:20). Te pirsa Wî ya “Tu kî yî?” bihîst. Bi gotineke din, ma mafê we heye ku hûn Wî bidarizînin?

Xweda mantiqê mezinkirina Fîrewn nîşanî me da, ji bo ku em li zanebûn û qenciya Wî ewle bin ku ji bilî mînakekê ji bo ku zanebûn û têgihiştinê bide me. Lêbelê, ew her gav vê yekê ji bo her rêveberî nake. Xweda dixwaze ku em baweriya xwe bi zanebûn û qenciya wî bînin.

Xweda, bi zanebûna xwe, bêyî ku armanceke Wî hebe qet destûrê nade êşê. Ew her gav planan dike ku êşê ji bo armancên rizgariyê bikar bîne, her çiqasî em di wê demê de nikaribin wan armancan bibînin jî. Lêbelê, perspektîfeke demdirêj an jî herheyî wan armancan eşkere dike. Ew, bi qenciya xwe wê heta hetayê nehêle ku zerar bigihêje me. Lê hûn dikarin wisa bibêjin: “Lêbelê, mirovan ji destên rêvebirên dejenere bûne ve gelek zerar dîtine.” Ev ji perspektîfeke madî ve rast e lêbelê Xweda ya giyanî ji ya madî

bêtir dinirxîne. Mirina Habîl belasebeb xuya dikir lê xwîna wî hîn jî diaxive (Îbranî 11:4). Bi hezaran Xirîstiyan ji hêla rêbebirên dejenere bûne ve hatin kuştin, hem di dema Engizîsyonê de û hem jî di dema zilmên ku beriya wê û piştî wê çêbûn lê xwîna wan bê fêde nehat rijandin. Xwîna wan hîn jî diaxive.

Em derfetan dibînin dema ku em dikarin bi rêya dilnizmî, îtaet û duayan bandorê li rêvebiran bikin. Dema ku gelê Xweda xwe dilnizm dike, duayan dike û ji rêyên xwe yên xerab vedigere, Xweda wê ji ezmanan bibihîze û welatê wan xweş bike. Nimûneyek ji vê yekê weke di Pirtûka Dadgeran de, tayînkirina serokatiya îlahî ye,. Peymana Nû wisa diyar dike: “Îcar berî her tiştî ez ji we dixwazim ku ji bo hemû mirovan lava, dua, mehder û spasî bê kirin, wisa jî ji bo padîşahan û ji bo hemû serweran bikin, da ku em bi hemû tirsa Xwedê û bi rêz û edeb jiyaneke bêhengame û bê teq û req bijîn. Li ber Xilaskarê me Xwedê ev qenc e û bi dilê wî ye” (Tîmotêyos I, 2:1-3).

Rêvebirên heyî di bin bandora duayên me de dimînin. Ev bandor dikarin bi qasî tayînkirin û hilbijartina rêvebiran dûr û dirêj bin. Lêbelê tevî van hemûyan, îstîsna hene. Şande û pîrozên dêra destpêkê gelek caran rastî rayedarên dijwar û zordar hatin ku zilm li wan kirin. Wan ne ji ber şêwazên jiyana xwe ya bêxwedayî an jî bêduakirinê êş dikişandin; berevajî vê, van rêvebiran di armancên rizgariya Xweda de roleke wan hebû ku dilîstin.

## HÊRODÊS AGRİPPA’YÊ I.

Em li yek ji wan kesan ango Hêrodês Agrippa’yê I. binêrin. Navê Hêrodês ji bo çend rêvebirên Romayî yên li Filistînê berî jidayikbûna Îsa, di dema xizmeta wî ya li ser erdê de û piştî vejîna wî dihat bikaranîn. Hêrodês Agrippa’yê I. di sala 37an PZê de ango piştî vejîna Îsa hat ser rêveberiyê. Wî ev bi hîlekariya xwe kir. Wî pêşiya xwe dît û wî her rê bikar anî da ku rê li ber bilindbûna xwe veke. Piştî kuştina Împeratorê Romayî Caligula, manevraya wî ya

siyasî ya sereke ew bû ku alîkariya Claudius bike ku hilkişe ser text. Claudius manevraya wî ya jîr xelat kir û Cihûstan û Samerya dagir kir û rêveberiya axê da wî. Ew bû hukumdarê qraltiya mezin ya bi qasî ku ji hêla bapîrê wî Hêrodêsê Mezin ve dihat birêvebirin.

Di dema rêveberiya xwe de, Hêrodês Agrippa'yê I. neçar ma ku di têkoşîna di navbera Cihûtî û Xirîstiyaniyê de, bibe alîgirek. Wî bê dudilî li Xirîstiyaniyan bi barbarî zilm kir. Di Karên Şandiyan de, em wisa dixwînin: "Wê demê Hêrodês padîşah destê xwe dirêjî hin kesên ji civîna bawermendan kir, da ku cefayê bide wan. Wî Aqûbê birayê Yûhenna bi şûr kuşt. Gava wî dît ku ev yek li Cihûyan xweş hat, ew zêde çû, wî Petrûs jî girt. Ev yek di dema Cejna Nanê Şkeva de çêbû" (Karên Şandiyan 12:1-3). Qral helwesteke tund li dijî bawermendan nişan da ji ber ku ev yek ji bo armancên wî yên siyasî bû û di dilê Cihûyan (piraniya welatiyan) de cihê xwe ava kir. Wî Aqûb, yek ji sê şagirtên herî nêzîk ên Îsa kuştibû û niha wî plan çêdikir ku Petrûs bikuje.

Divê em wisa bipirsin: "Rayedariya Agrippa ji kuderê tê?" Her çiqasî wisa xuya bike ku tevgerên wî yên siyasî hêz dabênê jî, bêyî zanebûn û tayînkirina Xweda, ne pêkan e ku bê asta rayedariyê.

Petrûsê di nava destê Agrippa de êşê dikişîne, ji bawermandan re gotiye: "Ji Xwedê bitirsin û ji padîşah re hurmetê bikin" (Petrûs I, 2:17). Çi? Rûmetdayîna qralekî ku Aqûb kuştiye? Çima Xweda rêveberekî ewqasî dijwar li ser axa ku piraniya zarokên wî lê dijiyan tayîn bike û dûv re ji wan re bibêje ku "rêzê jê re bigirin?" Beşek ji bersiva me di Nivîsên Pîroz de tê dîtin: "Îcar Petrûs di zîndanê de girtî bû, lê civîna bawermendan ji dil û can ji bo wî ji Xwedê dixwest" (Karên Şandiyan 12:5). Di encamê de Xweda, ferîşteya xwe şand û Petrûs bi awayekî mûcîzeyî ji zindanê derxist û ew bire nava ewlehiya civîneke malê. Eger bawermendan qral rûmetadar nekirina û li dijî fermana Xweda ya derbarê rayedariya hatiye dewirkirin de

serî hildabana, ew ê wan destê Xweda ku bi awayekî mûcîzeyî tevgeriyaye nedîtibûna.

Niyeta Agrippa ya kuştina Petrûs bi alikariya dua û îteata dêrê hate astengkirin. Vê bûyerê bi awayekî giştî bawermend teşwîq kirin. Eynî weke Fîrewn, Xweda ji bo armancên xwe yên rizgariyê hêza xwe nîşan da. Şahidiya herî mezin a vê yekê di Nivîsên Pîroz de tê dîtin: “Lê peyva Xwedê fireh û zêde dibû” (Karên Şandiyan 12:24).

Nîşandana dua û rayedariya berdewam a pîroziyan, bandoreke mezin kir ku rêça bûyeran guherand. Dema ku em xwendina xwe didomînin, em dibînin ku Hêrodês Egrippa’yê I. di rojeke diyarkirî de derket ber gel, cilên xwe yên qraltiyê li xwe kiribûn û li ser textê xwe rûnişt û ji gel re axaftinek pêşkêş kir: “Hingê xelkê kir qîrîn û gotin: Ev dengê xwedayekî ye, ne yê mirovan e! Û di cih de, ji ber ku wî rûmet nedabû Xwedê, milyaketekî Xudan li wî xist, kurmî bû û mir” (Karên Şandiyan 12:22-23).

Darizandin çêbû lê ne bi destê gelê Xweda, bi şûrê Reb re çêbû. Em ê di demeke nêzîk de fêr bibin ku ew kesê rêvebiran didarizîne Xweda bi xwe ye. Ji me re hatiye ferman kirin ku em ji bo kesên rêvebir duayan bikin, rêzê li rêveberiya wan bigirin û bi wan ve bên girêdan. Eger hewce bi darizandinê hebe, ji me re tê gotin ku divê em cîh ji Xweda re vekin.

Tiştên ku min di vê beşê de nivîsandine ji hêla bûyerên din ên Pirtûka Pîroz ve piştgriya wan tê kirin lêbelê ew ji aliyê gelek kesên ku li dêrê tiştan hîn dikin û têdigihêjin ve, li hev nakin. Ew kesên ku rehetiya xwe di ser rêya rizgariyê re dibînin, ji xebata Xweda ya di vî warî de kor in. Bila dilê me ji bo zanebûna Xweda vekirî be. Ji bîr nekin, Ew ji bo me ye, ne li dijî me ye.

BEŞ 9

# JI QRAL RE RÊZÊ BIGIRIN

*Divê em hîn bibin ku rêzê ji kesên di rêvebirê de ne bigirin, em wan bi hurmet û îteatê re rûmetdar bikin û erkên wan ên pê re têkildar in bicîh bînin.*

Talîmata Petrûsê şandî ku di beşa dawî de em bi kurtasî behsa wê dikin, di roja me de hewceyî baldariyeke mezin e. Berî ku em li ser vê ayetê zîq bibin, em wê di çarçoveya gotinên berê de binirxînin: "Hezkirîno, ez ji we hêvî dikim ku hûn xwe ji xwestekên nefsî yên ku li hember can şer dikin, dûr bixin, ji ber ku hûn li vê dinyayê xerîb û mêvan in. Di nav miletan de jiyaneke qenc bijîn. Û eger wek ku hûn xerabkar in ketma we bikin jî, bila kirinên we yên qenc bibînin û di Roja Edaletê de pesnê Xwedê bidin" (Petrûs I, 2:11-12). Hindik maye em kifş bikin ku teslîmbûna li ber rêvebiran ya tê behskirin tevgereke erênî be. Şerê ku tê behskirin di navbera îteatkirinê û xwesteka serhildêr a bêîteatiyê de ye. Lêbelê, pirî caran em berevajî vê difikirin, em xwesteka bêîteatiyê weke hevalbendê xwe û teslîmbûnê jî weke dijminê xwe dibînin. Ev têgihîştin ji rastiyê pir dûr e.

Divê em tiştên ku Petrûs nivîsandiye ji bîr nekin, ji ber ku her çend em teslîm bibin û îtaet bikin jî, dîsa jî dikarin em bi "kirina

xerabiyê" werin tawanbarkirin. Min bihîstiye ku mirov wisa difikirin, "Bi kêrî çi tê? Ez teslîm dibim lê dîsa jî ez bi tiştên ku min xelet nekirine têm tawanbarkirin." Wan rastiya ku îtaeta wan ji Reb re ye û xelata wan ji Wî tê, paşguh kirine. Nameya Efesiyan vê xalê bi awayekî xweşik derdixîne holê:

> "Xulamno, wek ku hûn li ber Mesîh serî datînin, bi tirs û lerizîn û ji dil û can li ber mîrzayên xwe yên li ser dinyayê serî deynin. Vê yekê ne bi xizmeta ku li ber çav tê kirin ku li mirovan xweş bê, lê belê wek xizmetkarên Mesîh, daxwaza Xwedê ji dil û can bînin cih. Ne wek ji mirovan re, lê wek ku ji Xudan re tê kirin ji dil û can xizmetê bikin. Û hûn dizanin ku her kî çi qenciyê bike, wê bergîdanê ji Xudan bistîne, dixwazî bila xulam be, dixwazî bila azad be." (Efesî 6:5-8)

Em li talîmata Petrûs vegerin: "Ji bo xatirê Xudan, bi ya hemû sazûmanên mirovî bikin, dixwazî bila padîşahê ku di ser hemûyan re be, an jî dixwazî bila ew waliyên ku ji aliyê wî ve hatine şandin bin, da ku xerabkaran ceza bikin û rûmetê bidin qencîkeran" (Petrûs I, 2:13-14). Giyanê Pîroz, bi rêya Petrûs, weke ku bi rêya Pawlos kir, ji me re dibêje ku em teslîmî saziyên rayedar bibin. Ji bîr nekin ku qralê behsa wî dikir pir zalim bû û bawermend di bin desthilatdariya wî de rastî zulmeke giran hatin. Mîna Pawlos, Petrûs ji me re dibêje ku divê em rayedariya Xweda nas bikin, ne ku rayedariya ku mirovan li ser me ferz kiriye. Heta fêhm nekir ku li ser serdestiya qral rayedariya Xweda heye, wê tu carî weke şexsekî li ber Hêrodês Agrippa'yê I. teslîm nebûya. Eger em hîn rastî rayedariya Xweda nehatibin, ji bo me wê zehmet be ku em teslîmî rayedariya dewirkirî bibin. Eger em nikaribin rayedariya rastîn bibînin, em çiqasî xwe pir hînî îteatê bikin, kirina vê ewqasî dijwartir dibe.

Petrûs em hişyar kirin ji ber dizanibû ku serhildan di eslê xwe de doza giyanên dijî Mesîh an jî dijî Xirîstiyanan hîn jî bi pêş ve dixe.

Ji ber ku ev hêz; rê, rêbaz, kiryar û tayînkirinên Xwedayê zindî jî di nav de “li dijî her tiştê ku jê re xweda tê gotin an jî tê hebandin derdikeve” (Selanîkî 2, 2:4). Weke bawermendan divê em vê pirsê ji xwe bipirsin: “Ma ez alîkariya karê bêqanûniyê dikim an jî ez wê asteng dikim?” Eger em alîkariya wê bikin, em li gorî prensîbên Şeytan (serhildan) tevdigerin, ne li gorî yên Xweda.

Petrûs berdewam kir: “Ji biratiyê hez bikin. Ji Xwedê bitirsin û ji padîşah re hurmetê bikin” (Petrûs I, 2:17). Ji me re tê gotin ku ne tenê em teslîm bibin, lê di heman demê de rêzê li kesên rêvebir jî bigirin. Peyva Grêkî ya ji bo “rêzgirtin”ê “timao” ye ku tê wateya “rûmetkirin, hurmetgirtin, rêzgirtin.” Ev îfade gava ku Îsa dibêje: “Ez Bavê xwe bi rûmet dikim” (Yûhenna 8:49) di wateya hemen peyvê de ye. Ferhenga Webster (wersiyona 1828) peyva rêzgirtinê, weke “rûmetkirina bi hurmet û îteatê û bi cihanîna peywiran” pênase dike. Ez dubare bikim: qralê ku Petrûs li vir behsa wî dike, zordarekî tirsnak bû ku zilm li bawermendan dikir! Ne mumkun bû ku weke kesekî ji rêzê behsa qral bike; ew behsa wî weke rêvebirekî ku ji hêla rayedariya Xweda ve hatiye tayînkirin û divê em jî wî bi rûmet bikin, diyar kir.

## HEVPEYVÎNEKE KU DILÊ MIROV DIÊŞÎNE

Berî bi salan, radyoyeke navdar a Xirîstiyaniyan ku ji bajarekî mezin ê Başûr weşan dikir, bi awayekî zindî di ser telefonê re bi min re hevpeyvînek çêkir. Me li ser pirtûkeke min nîqaş dikir. Nêzîkî deh deqîqeyan piştî destpêkirina hevpeyvînê, pêşkêşvan çû navbereke reklamê. Ji ber ku ez di vê demê de ne li ser weşanê bûm, min çend reklam û ragihandin bi dengekî nizm bihîstin.

Dema ku min dengek bihîst ku rewşa hewayê ya neteweyî radigihîne, bala min ji nişkê ve belav bû. Wî ji sed hezaran temaşevanan re got ku hewa li eyaleteke bakur ewqas sar e ku dikare devê waliyê eyaletê biqerisîne. Wî navê walî da wan û ji wan

re piştrast kir ku berevajî pratîka xwe ya her car, ew ê devê xwe veneke û tiştekî bêaqil nebêje ji ber ku lêvên wî qerisîne ne.

Ez matmayî mam û min nikarîbû bawer bikira ji gotina berî niha min bihîst. Gelek fikir û raman di hişê min re derbas bûn: Ma ev radyoya Xirîstiyaniyan e? Na, teqez nabe. Paşê ez li vê fikirîm: Eger ew radyoyeke Xirîstiyanî be, dibe ku wan rewşa hewayê ji çavkaniyeke medyayê ya hevpar peyda kiribe. Heta ku pêşkêşvan dîsa venegeriya ser weşanê, min nikarîbû bandora tiştê ku min nû bihîstibûn ji ser xwe bavêjim.

Dema ku em vegeriyan weşana zindî, wî pirseke nezelal pirsî ku min jî bi gotina girîngiya hebûna dilê Xweda ku di her tiştî de heye, bersivand. Hîn jî ji tiştên ku min bihîstibûn aciz bûm û min got: “Nimûneyek baş ew e ku min di navbera reklamê de bihîst.” Piştre min pirsî: “Ev der radyoyeke Xirîstiyaniyan e?”

Bersivand û got: “Erê.”

“Belkî jî tiştên min bihîstin ji çavkaniyeke sekuler hatibûn girtin ji ber ku kesê ku berî çend deqîqeyan axivî di gotinên xwe de ne xwediyê dilê Xweda bû.”

Pirsî û got: “Tu dixwazî çi bibêjî?”

Min got: “Îfadeya ku digot ev sar û seqem dikare devê walî biqerisîne û bigire.”

Dengê pêşkêşvan bilind bû: “Ew kes ez bûm.”

Min got, “Pirtûka Pîroz dibêje divê em ji Xweda bitirsin û qral an jî rayedaran bi rûmet bikin.”

Bi awayekî aciz û şid bersiv da: “Belê lê hinek mîzah ne tiştekî xelet e.”

Di cih de min lê zêde kir: “Derbarê mijara ku Xweda ji me re dibêje bi rûmet bikin de, mîzah nabe. Pawlosê şandî gotiye ‘Tiştekî xerab ji serokê gelê xwe re nebêje’ (Karên Şandiyan).”

Li ser vê pêşkêşvan, hevpeyvîn berî dema ku hatibû plankirin got: “Ez û John di her mijarê de ne weke hev difikirin.” û bername girt.

Bi dilekî êş min telefon girt. Ev tevgera min, ma gelo ji bo ku ez walî bi rûmet bikim, rêzê jê re bigirim an jî ji bo hurmetê bû? Ez dikarim li xwe mukur bêm ku waliyê behsa wî dikir her dem bi awayekî ku rêzgirtinê heq bike, tevnedigeriya lêbelê dîsa jî peywira xwe bi cih dianî. Weke Xirîstiyaniyan divê em rêzê ji vê rayedariyê re bigirin. Çend kesên bawermend di bin bandora wê weşana bêhurmet de man gelo? Divê em ji ber windakirina rêzgirtina gelek unsûrên civakê şaş nemînin.

Ev ji helwesta dêra destpêkê ya ku ji destê rêvebirê zilm dîtiye, pir dûr e. Wan rûmetdarî li rayedaran digirt. Dema ku em bi vî rengî tevdigerin û diaxivin, em beşdarî hêza bêqanûniyê dibin ku îro serdest e. Lê dîsa jî Pirtûka Pîroz ji me re wisa dibêje: “Çimkî sira bêqanûniyê ji xwe dixebite, lê yê ku niha dibe asteng wê bibe asteng heta ku ew ji holê bê rakirin” (Selanîkî II, 2:7). Ev tevger, li hemberî hêza astengker ya Giyanê Pîroz şer dike. Ji ber ku ev prensîba Şeytan e!

## TIRSA REB PIŞTGIRIYA RÊZGIRTINÊ DIKE

Werin em li gotinên Petrûs vegerin: “Ji Xwedê bitirsin, ji padîşah re hurmetê bikin.” Yên ku ji Xweda ditirsin, ew in ku her gav pozîsyona bilind û bi heybet a Rebê Mezin di ber çavan re digirin. Ew bi rayedariya Wî ya bêdawî re li hev rast hatine û ew di hundurê xwe de bi cih kirine. Ew rêzê li tiştên ku Xweda rêzê li wan digire, digirin û ji tiştê ku Ew jê nefret dike nefret dikin. Rêz û rêzgirtin ji bo hemû kesên ku di meqamên rêveberiyê de ne, di jiyana wan de kok vedane ji ber ku Xweda rayedariya xwe dewrî wan kiriye. Tirsa REB, kêmasiya giyan gava ku em li ber rêvebiran rêzê digirin, diyar dibe. Bînin bîra xwe bê Îşaya çawa Îsa dide naskirin:

“Wê Ruhê Xudan,
Ruhê şehrezabûn û fêmdariyê,
Ruhê şîret û hêzdariyê,

Ruhê zanîn û tirsa Xudan li ser wî be.
Wê bi tirsa Xudan şa bibe.
Wê li gorî dîtina çavê xwe dadbar neke
Û li gorî bihîstina guhê xwe biryarê nede."
(Îşaya 11:2-3)

Tirsa REB li xweşa Îsa diçe. Tirsa REB nehişt ku Îsa li gorî tiştên ku dît an bihîstiye darizandinê bike. Fêkiyên ku wî dan, eşkere kirin ku pêşkêşvanê radyoyê di derbarê rayedariya ku hatiye dewirkirin de ji tirsa REB bêpar bû. Li cihê ku walî bi awayekî rûmetdar tevnegeriyabû, pêşkêşvanê radyoyê li gorî tiştên ku guh û çavên wî dîtine wî darizandin dikir û li gorî wan pîvanan, dibe ku ew mafdar bibûya. Lêbelê heke wî bi çavên tirsa REB bidîta, wî yê desthilata ku Xweda daye wî walî fêhm bikira. Rexnekirina rayedarên dewletê qet ne karekî xwedayî ye.

Yûhennayê waftîzkar, xerabiya Qral Hêrodêsê ku xwedî rayedar bû, paşguh nekir lêbelê nêzîkatiya wî ji ya pêşkêşvanê radyoyê pir cuda bû. Pêşî, Yûhenna ji Hêrodês re wisa got: "Nabe ku tu jinbira xwe bînî" (Metta 14:4). Bêrêziya wî li hember wî kiribû, ne meqamê wî kir hedef ji xwe re lê gunehê wî kiribû hedef. Ya duyemîn, wî Hêrodês bi rayedariya ku wî weke pêxemberê Xweda hesab dikir, hişyar kir. Ya dawî, Yûhenna henekên bêrêzî li ser qral nedikir.

Tenê kesayetiya xwedayî di Pirtûka Pîroz de ku hûn ê bibînin ku henekan li ser kesên di meqamên serokatiyê de dike Îlyas e (Padîşah I, 18:27). Wî tinazên xwe bi pêxemberên derewîn ên Baal û Aşerayê û îlahên ku ew temsîl dikirin, kir. Ne rast e, ev zilamên ku xwediyê rayedariyeke sixte ne, gelek Îsraêlî ber bi tariyê ve birin. Ew ji hêla Xweda ve nehatibûn tayînkirin. Ew ne hêjayî rêz û îteatê bûn. Rêberên rêxistinên wisa divê mirov tu carî bi wan ve negirêdayî be û îteat ji wan re neyê kirin.

Dema ku em vegerin ser rayedarên rastîn ên hatine destnîşankirin, zehmet e ku em rêzê li wan kesan bigirin û teslîmî

wan bibin, heya ku em bi çavên ku ji tirsa REB ronî nebûne, nebînin. Lê dîsa jî guh bidin tiştên ku Nivîsên Pîroz dibêjin: "bi taybetî jî yên ku li pey xwesteka pîs ên nefsê dikevin û desthilatî kêm dibînin, ji bo cezakirinê heta Roja Dawî hiltîne. Evên curetkar û qure, ji çêrkirina yên xweyî rûmet natirsin" (Petrûs II, 2:10). Tişta li vir ya bi rastî hişyarker, ew e ku Petrûs û Yehûda derbarê kesên li dêrê, diaxivin (Yehûda 12; Petrûs II, 2:13-15).

Min di destpêka vê pirtûkê de hişyarî da ku ji bo hin kesan wê zehmet be ku bipejirînin, ji ber ku em pir caran bi zihniyeteke demokratîk li Qraltiya Xweda dinêrin. Ji ber vê yekê, ji me re ferman tê dayîn ku em di hiş û giyanê xwe de xwe nû bikin (Efesî 4:23). Eger hişmendiya pêşkêşvanê radyoyê tenê ji bo wî bûya, belkî min ê behsa wê nekira lê ev hişmendî hemû dêrê dorpêç dike. Min ev di dema serokatiya Bill Clinton de kifş kir.

## DU XELETÎ RASTIYEKÊ NAKIN

Dema ku Serok Clinton di sala 1992an de hate hilbijartin, ez sê rojan di depresyonê de mam heta ku Xweda bi min daket. Wî bi awayekî teqez nîşanî min da ku kes nikare bêyî agahdariya Wî were ser desthilatdariyê û ew kesên ku desthilatdar in ji hêla Wî ve têne tayînkirin. Gava ku ev yek ji min re hate eşkerekirin, min dest pê kir ku ne li ser jiyana kesane ya kesekî lê li ser rayedariya ku ji wan re hatiye dayîn, bisekinim. Dema ku min ev kir, hezkirineke rastîn ji bo vî rêvebirî di dilê min de mezin bû, digel xwestekeke dilsoz ku ez wî bibînim ku di rastiyê de, bêyî xapandinê, dimeşe.

Ez bawer dikim ku ev yek ji bo dilê Yûhennayê waftîzker li hemberî Hêrodês jî derbasdar bû. Tevî gotinên wî yên dijwar, ji bo vî rêvebirê dejênere, teqez xwediyê dilê Xweda bû. Sedema ku Yêremya ji bo wan kesên ku bi tundî diaxivîn, digiriya ev bû. Çawa hin kes hene ku ji dilên tije nefret û qanûnparêz diaxivin, hin kes jî hene ku dilên wan bi peyva terbiyekirina Reb re bi dilovanî dişewite.

Tişta ku Reb bi hêrs dike, ew kes in ku li gorî rastiyên xwe darizandinê dikin û “xeteyan dibînin.” Min ev lîstika li dijî Serok Clinton li gelek dêran dîtiye. Berî ku ez berdewam bikim, ez ê dîsa dubare bikim ku min di her du hilbijartinan de jî dengê xwe nedaye Serok Clinton û ji ber zirara ku kiryarên wî dane vî welatî, ez pir xemgîn im.

Di sala 1992an de, dema ku min rêwîtî dikir, bawermendan ez teşwîq kirim ku ez zilamekî pir muhafezekar temaşe bikim ku pir caran ev zilam li ser televîzyonan xuya dibû. Wisa xuya bû ku wî gelek tişt li ser rêberên lîberal ên welatê me, nemaze serok û jina wî, digotin. Min ev şîrove her hefte li bajarên cuda bihîstin. Wan ji min re digot: “Divê hûn li vî zilamî guhdar bikin. Ew çi tiştên li Washingtonê diqewimin derdixîne holê.” Ji ber ku min baweriya xwe bi wan dianî, ez fikirîm û min got divê ez wî li ser TVyê bibînim û bibihîzim bê ka ew çi dibêje. Ez pir li televîzyonê temaşe nakim, ji ber vê yekê hema hema neh meh di ser re derbas bûn heta ku min rojekê lê temaşe kir.

Dema ku ez piştî xizmeteke li Kalîforniyayê vegeriyam odeya otêla xwe, min televîzyon vêxist û min dît waye ew li hember min e. Ew pir henekbaz bû û kravateke ecêb xistibû stûyê xwe. Piştre wî dest bi axaftina derbarê Serok Clinton de kir. Ji nişkê ve min fêhm kir: Ev ew zilam e ku her kesî ji min re qala wî dikir. Ez bi heyecan bûm ku di dawiya dawî de ez ê guh bidim vî zilamê navdar. Ez li wir rûniştim û amade bûm ku temaşe bikim û bibihîzim bê ka ew çi dibêje.

Bîst deqeyan min lê guhdar kir ku wî bi peyvên xwe êrîşî serok dikir û weke kesekî nebaş nîşan dida. Henekên wî komîk bûn, gotinên wî bi qerf bûn lê di tevahiya wê dema min lê guhdar kir de, êşeke nebaş di mîdeya min de çêbû. Ez fikirîm, gelo pirsgirêk çi bû? Her tiştê ku wî digot rast bû. Wî hişmendiya lîberal a serokê me zeft kiribû. Piştre min ji xwe pirsî: “Xwedayo, çima ev hesta nexweş di nava min de heye?”

Giyanê Pîroz di cih de bersiv da: “Tiştekî xerab ji serokê gelê xwe

re nebêje” (Karên Şandiyan 23:5).

Di hişê min de pasajeke din ya Pirtûka Pîroz diyar bû: “Îcar berî her tiştî ez ji we dixwazim ku ji bo hemû mirovan lava, dua, mehder û spasî bê kirin, wisa jî ji bo padîşahan û ji bo hemû serweran bikin, da ku em bi hemû tirsa Xwedê û bi rêz û edeb jiyaneke bêhengame û bê teq û req bijîn. Li ber Xilaskarê me Xwedê ev qenc e û bi dilê wî ye” (Tîmotêyos I, 2:1-3). Ev gotin weke tuxlayekî ku tonek be li biguhê min ket. Xweda ferman li me kir ku em rêzê ji rêvebirên xwe re bigirin, ji bo wan duayan bikin, lava bikin, spasiya wan bikin û ji bo wan navbeynkariyê bikin. Wî her wiha ferman da me ku em li dijî wan neaxivin. Wî ferman neda me ku em derbarê wan de bi qerfî biaxivin, ji wan re gotinên nebaş bibêjin, bi wan re şer bikin an jî tinazên xwe bi wan bikin. Her çend şîrovekarê televîzyonê di piraniya gotinên xwe de rast bû jî, du xeletî rastiyekê nakin!

Ya rastî ez ne ji bo wî zilamî lê ji bo bawermendên ku bi kelecan li gotinên wî guhdar dikirin, aciz bûm. Îcar em bên şîrovekar, min ew weke kesekî ku haya wî ji tiştê baş tuneye didît. Tişta ku min fêhm nedikir ev bû ku çima bawermendan ewqasî bi coş piştgirî didan peyama wî û ew îlan dikirin. Bi kirina vê yekê re çawa “rêz ji qral re digirtin?” Xweda ji me re gotiye bê em ê weke Xirîstiyaniyan çi bikin: dua bikin, daxwaz bikin, lava bikin û spasdar bin. Pawlos rave kir ku darizandina Xweda ne tenê li benda wan kesan e ku kiryarên cûrbecûr ên bêqanûniyê dikin, lê di heman demê de li benda “wan kesên ku kirinan erê dikin” jî ye (Romayî 1:32).

## EM LI GORÎ KÎJAN QANÛNAN DIJÎN?

Min li wê odeya otêlê li seranserê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dest bi wazan kir li ser serpêhatiya xwe. Gelekan ronahî te de dîtin û tobe kirin, yên din jî ji min hêrs bûn. Wan anî ziman ku şîrovekar jiyaneke rast û azadiya axaftinê ya ku ji aliyê hikûmeta me ve hatiye dayîn, parast. Ev rast e lêbelê fermanên me hene ku vê yekê ji rewacê

radikin. Ma em bi rêvebireke demokratîk dijîn an jî bi qanûnên Qraltiya Xweda re dijîn? Tenê ji ber ku li welatê me alkol û hin eyalet destûrê didin bikaranîna esrarê, ma îcar divê em weke bawermendan, serxweş bibin an jî bi awayekî azad esrarê bi kar bînin?

Em xwediyê qanûneke hîn bilindtir in. Pûtperestekî Romayî yê ku sedsala yekem jiyaye li ser Xirîstiyanên hemdem wisa nivîsandiye: “Ew rojên xwe li ser rûyê erdê derbas dikin lê ew welatiyên bihuştê ne. Ew îteatê ji qanûnên dewletê re dikin û di heman demê de bi jiyana xwe ya ku dijîn re wan qanûnan derbas dikin” (Nameya ji Diognetus re, beşa 5).

Guhdarîkirina nebaşkirinê çi fêdeya wê heye? Çi berhemê dide? Ma dema ku em ji bo temaşekirin û belavkirina peyama vî mirovî derbas dikin, ji bo rêberên xwe yên neteweyî weke navbeynkarekî bi kar bînin wê bibandortir nebe? Ma Xweda “ji bo em jiyaneke bêdeng û aram ya giran û girêdayî rêya Xweda bi temamî bijîn?” negotibû ku wê encama tevgera îteatkariyê be?

Ez xizmekarekî nas dikim ku dema bi Serok Clinton re civiya, jê re got, “Rêberekî ku kuştina zarokên bêguneh bi qanûn bike, wê bi darizandina Xweda re rûbirû bimîne û di dojehê de bişewite.” Ev pastor, ji Yûhennayê waftîzker ku bi Hêrodês re tevgeriya, ne cuda bû. Ev peyamberê Xweda; ji bo zarokên jidayiknebûyî û ji bo serok, ji dilekî tije hezkirin û tije hêrsa pîroz, axivî. Her çiqasî rêz li rayedariya serok girt jî, vî xizmetkarî rastî got. Ev kes qet ne ew kes bû ku tinazê xwe bi serok bike. Dema ku em guh didin şîrovekarên televîzyonê ku rexneyên tûj li rayedaran dikin, em dilê Xweda winda dikin. Guhdarîkirina nebaşkirinê ti fêkiyekî mayînde nade.

## DILÊ NÎŞANDANA RÊZGIRTINÊ YA JI BO RAYEDARIYÊ

Xwesteka nîşandana rêzgirtina ji bo rayedariyê divê bandorê li tevgerên me bike, ji ber ku bi vê kirinê tayîna ku Xweda kiriye em bi rûmet dikin. Pawlos em wisa teşwîq kirin:

> "Çimkî hukumdar ne ji bo karê qenc, lê belê ji bo karê xerab tirsdar in. Ma tu dixwazî ku ji hukûmetê netirsî? Tu ya qenc bike, tê ji aliyê wê ve bêyî pesindan. Çimkî ew ji bo qenciya te xizmetkarê Xwedê ye. Lê eger tu ya xerab bikî, bitirse; ji ber ku ew badîhewa şûr hilnagire. Ew xizmetkarê Xwedê ye, da ku xezebê li yê ku xerabiyê dike bibarîne û wan ceza bike. Loma ne tenê ji ber xezebê, lê belê ji ber wijdanê jî divê serî bê danîn. Ji ber vê yekê hûn bacê jî didin, çimkî ew xizmetkarên Xwedê ne û karê wan ev e. Heqê her kesî bidinê: Yê ku heqê wî yê bacê heye, bacê bidinê yê ku heqê wî yê gumrikê heye, gumrikê; yê ku heqê wî yê tirsê heye, tirsê û yê ku heqê wî yê siyanetê heye, siyaneta wî bigirin." (Romayî 13:3-7)

Min li salona werzîşê ya herêmî antremana xwe ya rakirina giraniyan dikir û min bi jin û mêrekî ku her du jî li ser xwe bûn, sohbet kir. Piştî deh deqeyên axaftinê, ez hîn bû ku ew endamên daîreya polîsên Colorado Springs bûn. Min di cih de wisa got: "Ez ji we herduyan re rêzdariyeke mezin digirim, ji ber ku Pirtûka Pîroz dibêje ku hûn xizmetkarên Xweda ne!"

Polisê mêr şaş ma û di nava rewşeke bi kelecan û matmayî de, pirsî: "Birako, ev bi rastî jî wisa ye? Pirtûka Pîroz dibêje ku ez xizmetkarê Xweda me?"

Min pirsa wî bi nîşandana ayetên jor re bersivand.

Li ser vê got: "Ez ê van ayetan li ser pişta xwe bikim deq!"

Piştî çend hefteyan ez û wî dîsa li salona werzîşê li hev rast hatin. Gava ez dîtim tîşortê xwe ji xwe kir û ayetên li ser pişta xwe nivîsandibûn, nîşan da. Ev ji bo wî wahiyeke mezin e.

Îro roj kes li ser vê rastiyê baş nasekine. Xweda kesên ku rayedar in weke "xizmetkarên xwe" bi nav kirine û ji ber vê yekê ew hêjayî rêz û hurmetê ne. Her cara ku ez polîsek, agirkujek, şaredar, walî, endamê meclîsa eyaletê, dadgêr, endamê kongreyê an jî her rayedarekî din ê dewletê dibînim, ez ferq dikim ku ev rêzgirtin di dilê

min de peyda dibe. Dema ku ez diçim ofîsên bajar, eyaletê, an jî diçim daîreyên federal, ez dibînim ku ew rêz di hundurê min de mezin dibe. Hevalên min hene ku senator in û her gava ku ez wan dibînim, ez ne bi navê wan, lê bi gotina “Senator” silavê li wan dikim. Ez dixwazim rêzgirtina xwe ji bo pozîsyona ku Xweda daye wan nîşan bidim. Ew xizmetkarên Xweda ne ku xizmeta gelê Wî dikin.

Herwiha, bala xwe bidinê ku di ayetên jorîn de, rayedar “bi xîret ji bo Xweda dixebitin" erkên xwe bi cih tînin. Vê yekê wisa bifikirin: eger hûn erebeya xwe panzdeh kîlometreyan di ser sînorê lezê re diajon û ji nişka ve di neynika xwe ya di ser serê we re çirayên sor ên biriqok hûn bibînin, ji bo şerkirina li dijî Şeytan duayan nekin. Polîs ji bo Şeytan naxebitin; berevajî vê, ew ji bo Xweda dixebitin! Di şûna wê de, divê hûn ji bo dilovaniyê duayan bikin!

Berê jî cezayên leza zêde li min hatibûn birîn û piştî wergirtina cezayê, min her dem ji memûrê cezê li min dibirî re digot: “Birêz, ez xelet bûm û ez dixwazim spasiya we bikim ji bo ku hûn karê xwe dikin û xizmeta bajarê me dikin. Ji kerema xwe sûcê min bibexşînin.” Divê we rûyên wan bidîta. Carekê, helwesta memûr bi temamî guherî. Pêşî bi tundî dest pê kir lê gava wî rêzgirtina min a ji bo rayedariya wî dît, ew nerm bû. Her çiqasî niyeta min ne ew bû jî, ez fikirîm û min got hema bêje hew cezayê li min dibire.

Di eyaleta rêveberiya walî de ya ku pêşkeşvanê radyoyê bêrêzî kiribû, hevalekî min hebû li vê eyaletê pastorî dikir. Wî ji bo bajarê xwe dua dikir û ji Xweda dipirsî bê ka ew ê çawa ferqekê ava bike. Wê demê, dêra wî xwedî civateke biçûk bû. Xweda ev yek xistibû dilê wî ku rêzê li rayedarên giştî yên bajarê xwe bigire. Piştî gelek duayên din, wî dizanibû bê wê çi bike. Wî û rûspiyên dêrê li ser hewcedariyên herî mezin ên bajêr lêkolîn kirin. Di encama lêkolînê de ew fêr bûn ku teşkîlata agirkujiyê hewceyî bi maskeyên ku di nav dûmanê de dibînin, heye; lêbelê ev hewcedarî di nav xerckirina teşkîlata agirkujiyê ya wê salê de nehatibû hesibandin. Buhaya her

maskeyekê 25.000 dolar bû. Ev ji bo dêreka bi qasî ya wan mezin, pereyekî pir zêde bû.

Pastor vîzyon bi civakê re parve kir û di encama berhevkirinê de ew perêyê lazim bûn, dan hev. Wî û rûspiyên dêrê çek pêşkêşî meclîsa bajêr kirin. Wî ji min re wisa got: "John, tu yê matmayî bimînî bê ka pereyê ku me berhev kir çawa xizmeta rayedarên bajêr kir. Wan nikaribû bawer bikin ku dêrek dikare qenciyeke ewqas baş bike. Ew bi gilî û gazinên mirovan li ser hewcedariyên bajêr û ne pêşkêşkirina piştgiriya aborî ya belaş ve hatibûn hîn kirin."

Ji wê demê ve, mezinbûna dêrê gelekî zêde bûye. Dema ku cemaeta dêrê avahiyeke nû vekir, gelek berpirsên bajêr tevlî dêrê bûn û hin ji wan hîn jî beşdar dibin. Berhema vî pastorî bi ya pêşkêşvanê radyoyê re bidin ber hev.

Min ji gelek bawermendan bihîstiye ku ji ber bacên didin gazinan dikin. Min di dêran de mirovên lêkolînan dikin ji bo rêyekê bibînin ku baca xwe nedin, nas kirin. Ew îdîa dikin ku ev mafê wan ê qanûnî ye. Ez ji wan re wisa dibêjim: "Fermana we ji Xweda stendiye qaşo di şûna mafê we yê qanûnî de ye. Xweda ji me re dibêje ku 'bacên xwe bidin.'" Piştre ez ji van kesan re dibêjim: "Kî pereyê rêyên ku hûn lê erebeyên xwe diajon dide? Kî pereyê polîs, agirkuj û parlementerên ku we diparêzin dide?" Min ji hesabgiran (mûhasebe) bihîstiye bê bawermend çawa rêbazên xapînok bikar tînin ji bo ku ji bacê birevin. Ev dilê mirov diêşîne. Min ji hesabgirên me re wisa got: "Ez deverên gewr naxwazim; ez naxwazim tu qul û bergên derqanûnî hebin." Dayîna bacê fersendek e ku em li rêveberiya ku xizmeta me dike, vegerînin. Eger em hilbijêrin ku bidin, ew nikarin ji me bidizin! Em bawermend em ê kengî ji vê rastiyê zewqê bistînin?

Eger laşê Mesîh bi vê yekê ve bi awayekî şidandî girêdayî be, em ê ji bo welatê xwe û cîhanê şahidiyeke bihêztir bikin. Divê em fêr bibin ku rêzê li kesên desthilatdar bigirin, bi rêzdarî û îtaetkirinê rêzê li wan bigirin û erkên wan bicîh bînin. Bi vê yekê re em rêzê li

Bavê xwe yê Ezmanî digirin. Dema ku em rêzê li qral digirin, em tirsa xwe ya ji Reb re nîşan didin.

## DI HER QADA RAYEDARIYÊ DE WEKHEV E

Weke ku min di beşa dawî de nivîsand, fermana rêzgirtina ji qral re rasterast rayedariya giştî vedihewîne; ev ferman ji bo deverên din ên rayedariya ku hatiye dewirkirin jî di xwe de dihewîne. Bala xwe bidin referansên ji bo rêzgirtinê di ayetên jêrîn de. Derbarê malbatê de, Xweda ferman da: “Rêzê ji dê û bavê xwe re nîşan bide (Efesî 6:2). Wî dîsa wisa ferman da: “Jin jî divê rêzê ji mêrê xwe re bigire” (Efesî 5:33). Derbarê rayedariyên civakî de, em wisa dixwînin: “Hemû yên ku di bin nîrê xulamtiyê de ne, bila axayên xwe tam hêjayî hurmetê hesab bikin, da ku ji navê Xwedê û ji hîndariyê re peyvên xerab neyên gotin” (Tîmotêyos I, 6:1). Eger derbarê rayedariya dêrê de be, ferman wisa daye: “Ew rihspiyên ku serweriya qenc dikin, bi taybetî ew ên ku di ber peyivîn û hînkirinê de zehmet dikişînin, bila du qat hêjayî siyanetê bên dîtin” (Tîmotêyos I, 5:17).

Di zêdetirî sî salên xizmeta xwe de, min gelek caran dîtiye ku ciwan bi bêrêzî bi dê û bavên xwe re diaxivin. Dev ji rêzgirtina ji dê û bavên xwe re berdin, van ciwanan dê û bavê xwe bi tiştekî jî nedihesibandin. Di rewşên ku dê û bavên wan li ber wan pasîf diman, min gelek caran hema di cih de erza wan ciwanan jî dişkerand. Eger wan bizanînûya ku ew tenê zirarê didin xwe, wê cesaret nekirina ku tiştekî wisa bikin. Xweda wisa dibêje: “Nalet li wî kesî ku dê û bavê xwe kêm dibîne. Bila tevahiya gel bêje: Amîn!” (Dubarekirina Şerîetê 27:16). Laneta ku me di beşên pêşî de behs kir, ji bo kesên ku li ber dê û bavê xwe bêrêziyê dikin.

Ji aliyê din ve, Xweda soza bereketeke mezin nîşanî kesên ku rêzê li dê û bavê xwe digirin, dide: “Qedrê dê û bavê xwe bigire – emrê pêşî yê bi sozê, ev e: Da ku qencî li te bibe û li ser erdê emrê te dirêj be” (Efesî 6:2-3).

Xweda bi rastî soza du pîroziyên cuda dide wan kesên ku rêzê li dê û bavên xwe digirin. Ya yekem, ew ê qenciyê bibînin. Ew kesên ku rêzê li dê û bavên xwe nagirin, nikarin li bendê bin ku di jiyanê de qenciyê bibînin. Ji ber ku ew di bin lanetê de ne. (Ez ê şahidiya xwe derbarê vê yekê de di beşekê pêş de parve bikim.)

Soza duyem jîyana dirêj e. Çi bereket e ku mirov li beramberî rêzgirtina li dê û bavê xwe vê bi dest bixe! Dibe ku hûn wisa bifikirin: Deqîqeyekê li bendê bimînin. Ez kesên ku rêz li dê û bavê xwe girtine nas dikim lê di temenekî ciwan de mirine. Ez bawer im ku di Gotina Xweda dibêje ev fermana pêşî ye ku di xwe de sozekê dihewîne. Em dikevin tengasiyê dema ku em dihêlin tiştên ku em li dora xwe dibînin ku sozên Xweda berhewa derdixîne. Li vê yekê bifikirin: Bavê me, kesên ku aîdî wî ne, ji tirsê soza azadiyeke tam dide. Bi gotinên Wî: “Tê bi edaletê xurt, Ji zordestiyê dûr bî. Tê qet netirsî. Wê helakbûn ji te dûr be, Wê qet nêzîkî te nebe” (Îşaya 54:14). Dîsa jî Xirîstiyaniyên bi nirx di nava tirsê de dijîn. Eger soz otomatîk bin, çima ewqas kes di bin vê îşkenceyê de dijî? Bersiva vê pirsê ev e: Sozên Xweda bi rêya duakirinê tên stendin û bi têkoşîna mezin ya baweriyê tên bi destxistin.

Kurê Birahîm, Îshaq ji bo vê mînakeke baş e. Xweda derbarê Îshaq de ev soz da Birahîm: “Ezê bi wî û ziriyeta wî re peymana xwe her û her berdewam bikim” (Destpêk 17:19). Xweda soza xwe ragihand lêbelê piştî ku ew zewicîn, diyar bû ku zarok ji jina wî Rebeqa re çênabin! Ya ecêb, Îshaq Rebeqa nehilbijart; Giyanê Pîroz ew hilbijart. Dibe ku hûn wisa bipirsin: “Tu dixwazî bibêjî ku Xweda bi taybetî jineke ku zarok jê re çênabin hilbijart?” Belê! Soz ne otomatîk bû, diviyabû xwedî lê derkeve. Guhdarî bikin bê ka Nivîsên Pîroz çi dibêjin: “Îshaq ji bo jina xwe ji Xudan lava kir, çimkî kordunde bû. Xudan bersiv da lavakirina Îshaq û jina wî Rebeqa bi zaro ma” (Destpêk 25:21).

Îshaq, lava ji REB kir û ji bo ku sozê bi dest bixe mecbûr ma ku

şer bike. Li gorî xwesteka Xweda dua kirin û bersiv stend. Em di vê mijarê de tên teşwîqkirin: “Cesareta me ya li ber wî ev e: Çaxê em tiştekî li gor daxwaza wî bixwazin, ew guhê xwe dide me. Û eger em bizanin ku em her çi bixwazin ew guh dide me, hingê em dizanin tiştên ku me jê xwestine, me standine” (Yûhenna I, 5:14-15). Xweda di peymanê de daxwaza xwe bi awayekî eşkere diyar kiriye. Eger me soza Wî stendibe, em dizanin ku em ê karibin li gorî daxwaza Wî duayan bikin.

Bi rêzgirtina li ber dê û bavên xwe re, hûn dikarin bi rêya duayê, xwe bispêrin du sozên Wî yên peymanan û jiyaneke baş, dirêj û berhemdar bi dest bixin. Baweriya xwe li ser peymana Xweda ava bikin, ne li ser jiyana kesên din.

Belkî ji ber ku hûn ji dê û bavên xwe re rêz û hurmetê nagirin, hûn bi fikar in. Cihê ku tobe lê dikeve dewrê ev der e. Bi duakirinê berê xwe bidin Xweda û weke şexs biçin ber bi dê û bavê xwe ve û ji wan bexşandinê bixwazin. Dest bi rêzgirtina li ber wan bikin û bawer bikin ku sozên peymana Xweda wê di jiyana we de pêk werin.

Ev prensîb ji bo patronan, karsazan, mamosteyan û rayedarên din ên civakî jî derbasdar e. Dema ku em rêzê nîşanî wan bidin, em ê qenciyê bibînin û ji Reb xelata xwe bistînin. Pawlos ev talîmat da xebatkaran: “Hûn her çi bikin, wek ku hûn ne ji mirovan re, lê ji Xudan re dikin, bi dil û can bikin. Hûn dizanin xelata ku mîras e, hûnê ji Xudan bistînin. Çimkî hûn ji Xudan Mesîh re xizmetê dikin. Lê yê ku neheqiyê dike, ewê wê neheqiya ku kiriye bistîne û xatirgirtin tune” (Kolosî 3:23-25).

Di beşa bê de, em ê li ser bereketên berfireh ên ku li me hatina bexşandin, dema em xizmetkarên Xweda yên di dêrê de dipejirînin û rêzgiritina ku heq dikin em didin wan, bisekinin. Dema em di naskirina tiştên ku Xweda ji me re dişîne de bi ser nakevin, her wiha em ê bibînin bê em çi jî winda dikin û nagihên ser wan.

BEŞ 10

# RÊZGIRTINA DU QATÎ

*Xweda gelek caran tişta ku pêdiviya me pê heye di nava ambalajeke ku em naxwazin de dişîne.*

"Yê ku heqê wî yê siyanetê heye, siyaneta wî bigirin" (Romayî 13:7). Di vê beşê de, em ê bibînin ku yek ji sedemên sereke ku Xweda dixwaze em rêz û hurmetê nîşanî kesên ku li ser me rayedar in bidin ne ji bo wan e, lê ji bo me ye. Balkêş e ku şopandina vê fermana di Gotina Xweda de, di dawiyê de pîroziyekê bi xwe re tîne ku ev tiştekî bi kelecan e. Em mînakeke vê yekê di Samûêl Iê de dibînin.

## HEQARETEK VEDIGUHERE PÎROZIYÊ

Di rojên ku dadgêran gelê Îsraêlê bi rêve dibirin de, jineke bêzar ya bi navê Hanna hebû. Ew bi Elkana re zewicî bû ku jineke wî ya din jî bi navê Penînna hebû. Hanna ne bextewar bû ji ber ku hewiya wê ji ber bêzarbûna wê tinazên xwe pê dikir. Bêzarbûna Hanna bi gumaneke mezin bibû sedema ku Elkana cara duyem bizewice. Hanna dihat hezkirin û dilê mêrê xwe xweş dikir lê Penînna mala wî xweş û geş dikir. Her sal, bi malbatî diçûn Şîloyê ji bo ku baweriya xwe bi cih bînin. Bi taybetî gava li wir bûn, Penînna gelek caran bi tinazên xwe

dihişt ku Hanna bigirî. Heta mêrê wê jî nikaribû wê teselî bike.

Di serdaneke din a Şîloyê de, êdî hew karîbû xwe bigire. Hanna, ji dil û can êş dikişand û pir xemgîn bû û li ber REB giriya û peymanek bi Wî re çêkir û got: “Eger tu kurekî bidî min, ez ê wî heta ku bijî ji te re bihêlim.”

Kahîn û dadgerê Îsraêlê Eli, di wê kêliyê de li wê guhdar dikir û got: “Hannayê di dilê xwe de lava dikir, tenê lêvên wê dilebitîn, dengê wê nedihat bihîstin. Ji ber vê yekê Elî guman kir ku Hanna serxweş e. Lewre jî got: Ma tê heta kengê serxweşiya xwe bidomînî? Êdî dev ji şerabê berde!” (Samûêl I, 1:13-14).

Çi heqareteke giran! Eli li hemberî xemgîniya Hannayê ne tenê bêhest bû, di heman demê ew ji hêla giyanî ve ewqasî bêhest bû ku ew difikirî ku lêvên wê ji ber serxweşiyê tiştekî dibêjin. Ew ji ber dijminatiya her car û her kêlî ya hewiya xwe dûr ketibû û di hizûra REB de li aşbûnê digeriya lêbelê ji hêla rayedariyê giyanî yê herî bilind ê welêt ve bi neheqî dihat darizandin û biçûkxistin. Her sal ew destvala dihat Şîloyê, bêyî ku zarokekî wê hebe û pêşkêşî REB bike. Her sal ew bi nêrîn, pistepist û tinazên kesên li dora xwe re rûbirû ma.

Eger pastorê we di wê kêliya ku hûn êşa xwe ya herî mezin dijîn de, hûn bi nebaşiyê sûcdar bikirana, we yê çawa bertek bidaya? Belkî hûn wisa bifikiriyana: Ev zilam pastor e? Ma ew nizane ku ez rojî digirim û ji Xweda re duayan dikim? Çiqasî xemsar û dûrî giyaniyê ye! Ez ê careke din neyêm vê dêrê!

Ev raman bi hêsanî dikarîbûn bibin sedema teqînekê: “Tu ji xwe re dibêjî zilamê Xweda lê tu nikarî kesekî ku êş dikişîne nas bikî! Ma tu nikarî kesekî ku ji dil û can duayan dike nas bikî? Tu çawa pastor î? Ev dêreke çawa ye? Êdî bes e! Ez ê dêreke din bibînim ku pastorê wê ji bo min û karên Xweda re hesas be!” Ev senaryo, îro roj di dêrên me de nedibû bertekeke ku kêm tê dîtin -her çiqasî bi eşkereyî ne li rûyê pastor bê gotin jî, ew gotin in ku dikarin li dû pastor ji endamên civatê re bên gotin.

Lê li bersiva Hanna ya ku li hemberî van haqeretên giran da guhdar bikin: “Ax ezbenî, ne wisa ye! Ez jineke dilşewat im. Min ne şerab vexwar, ne jî meyeke din. Bes ez dilê xwe li ber Xudan vedikim. Hesab neke ku xulama te jineke xerab e. Ez pir bi xem û keder im. Berdewamiya lavayên min ji ber vê ne” (Samûêl I, 1:15-16). Bi rêz ê rûmetê bersiv da. Her çiqasî tevger û darizandina Eli ji heqkirina vê dûr be jî, Hanna rêz û hurmet nîşanî rayedariya wî ya ku xwediyê wê ye, da. Heta ji bo piştrast bike ku ne jinekeke xerab e û wê baweriyê nîşan bide, pir çû bi pêş de.

Ya rastî, di wê demê de kesê ku qalibên bertekên zêdegavî nîşan didan Eli û darizandina wî nêzîk bû. Bala Hannayê ne li ser tevgerên Eli bû lê li ser yên wê bi xwe bû. Hannayê jinikeke ku bi rastî ji REB ditirsiya. Eger di rêveberekî de pirsgirêk hebûya, Xweda bi vê re mijûl dibû. Îro roj çiqasî hewcedariya me bi teslîmbûneke rast û dilnizmiyeke bi vî rengî heye!

Li ser vê yekê tevgera Eli ya li hemberî Hannayê hat guhertin:

> “Elî lê vegerand û got: Nexwe bi xêr û silamet here. Bila Xwedayê Îsraêl daxwaza te pêk bîne. Hannayê got: Hêvîdar im dilê te bi min xweş be. Paşê rabû nan xwar û beşera wê jî xweş bû.” (Samûêl I, 1:17-18)

Di rêzgirtina Hanna ya ji bo Eli de tu dudilî tune bû, wê weke mirovekî Xweda rêz û hurmet ji wî re digirt û heta xwest ku di berdêla peyva pîroz de di çavên wî de dilovaniyê bibîne.

Em tiştên ku piştre qewimîn binêrin: “Serê sibê ew zû rabûn, perizîn Xudan. Paşê jî zivirîn mala xwe ya li Ramayê. Êlqana çû ba jina xwe Hannayê û Xudan Hanna anî bîra xwe. Hanna bi zaro ma û kurek anî. Wê got: “Min ew ji Xudan xwestiye” û navê wî kir Samûêl” (Samûêl I, 1:19-20).

Xweda kahînekî bedenî û xemsar bikar anî ji bo ku peyvên ku soza jidayikbûnê pêk tînin serbest belav bike. Ya rastî, piştî demek

kurt Xweda eşkere wisa radigihîne: "Ji ber vê yekê min sond xwar û got: Wê gunehê Mala Elî bi tu awayî ne bi qurban, ne jî bi pêşkêşiyê were bexişandin" (Samûêl I, 3:14). Hûn qet naxwazin bibihîzin ku Xweda van gotinan li ser we an jî malbata we dibêje. Xwedayê dilovan, bişefkat û lêbelê adil, li ser Eli û malbata wî ev tişt gotin: "Va ye rojên ku ezê hêza te û hêza mala bavê te bişikênim nêzîk dibin. Di mala te de tu kes pîr nebe. Gava ez gelê Îsraêl derxim firehiyê, tê li mala min de tengezar bibî. Wê êdî di mala te de tu kes pîr nebe" (Samûêl I, 2:31-32). Ev teqez ne rêberekî xwedayî bû.

Malzarokeke hişk şîn bû û jiyan di tariyê de derket holê. Sala din, Hanna Samûêlê biçûk xist himbêza xwe. Xortê ku hîn berî di malzaroka dêya xwe de bi cih bibe ji Reb re hatibû veqetandin, wê hişyarî ji Îsraêlê re bianiya. Bereketa ku Hanna bi salan li benda wê bû û dua dikir, piştî ku wê rêz ji kahînekî xemsar ku heqaret lê kiribû re nîşan da, hat. Tu têkiliya vê mûcîzeyê bi tevgerên Eli re tunebû, ya rastî bêtir bi rêzgirtina rastîn a Hanna ya ji bo rayedariyê û teslîmbûna wê ve girêdayî bû.

## DADGER KÎ YE?

Prensîbeke pir mezin heye ku mirov ji vê yekê hîn bibe: Eger Xweda rayedarî dabe kesekî, tevgerên wî yên taybet an jî şexsî çi dibin bila bibin, eger em ji tevgeran wêdetir lê binêrin û wan weke kesekî ku Xweda şandiye rêzê li wan bigirin, di her rewşê de em ê bên pîrozkirin. Îsa, weke Hanna, eşkere kir ku wê gelek kes ji aliyê xizmetkarên dejenere bûne ve wê bên pîrozkirin. Wisa got: "Wê rojê gelek wê ji min re bêjin: Ya Xudan, ya Xudan! Ma bi navê te me pêxemberîtî nekir? Bi navê te me cin dernexistin? Ma bi navê te me gelek keramet nekirin? Hingê ezê bi eşkereyî ji wan re bêjim: Min hûn qet nas nekirin! Ji min dûr kevin, hûn ên ku neheqiyê dikin!" (Metta 7:22-23).

Dema ku em van ayetan dixwînin, em pir caran li ser gelek kesan disekinin ku bi navê Îsa karên mûcîzeyî kirine lê ji hêla Reb

ve hatine redkirin. Ev gotineke cîdî û hişyarker e lê em li aliyê din yê meseleyê binêrin; kesên ku bi rêya van xerabkaran xizmeteke rastîn stendibûn, hebûn. Wan xizmet wergirt ji ber ku yên mîna Hanna jî bi rêya van kesan xwe gîhandin Xweda. Gelek kesên ku Îsa li vir qala wan dike mîna Eli bûn ku Xweda ew darizandibûn!

Min ev pirtûk ne ji bo xizmetkarên dejenere bûne nivîsand, min ji bo kesên di bin rayedariyê de nivîsand. Nivîsên Pîroz gumanê têde nahêle ku hem dejenere bûne û hem jî rayedariya wan ya xwedayî, heye. Eger kesên di bin rayedariyê de nîrê dadweriyê bigirin ser xwe, ew êdî teslîmî rayedariya damezrandî nabin û wê xwe li ser serê rêberên xwe hildin asta dadgeriyê. Dilê wan wê li ser dilê kesên ku Xweda ew kirine rayedar bi şanazî bilind bibe. Di esasê xwe de, wan xwe ji ferman û teşwîqa Xweda bilindtir kiriye. Bêyî ku bizanibin, ew ji Xweda re wisa dibêjin: “Tu dadweriyê bi rêkûpêk pêk nayînî, ji ber vê yekê ez ê berpirsiyariyê bigirim ser xwe.”

Hanna rayedariya ku Eli xwediyê wê bû qebûl kir û rêz jê re nîşan da. Eli ew darizand û heqaret li wê kir lêbelê Hanna rûmet nîşanî Eli da. Eger ew li gorî dîtinê û bihîstinê bijiya, dibe ku wê kiryarên Eli bidarizandina. Lêbelê wê ne bi aqilê xwezayî lê bi tirsa REB û rayedariya xwedayî tevgeriya. Wê baweriya xwe bi Xweda anî ku wê bi dadperweriyê darizîne.

Hanna, bi tişta ku Îsa piştî bi sedan salan rast derxist, zanîbû: “Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, yê ku wî kesê ez dişînim, qebûl bike, min qebûl dike û yê ku min qebûl bike, wî yê ku ez şandime qebûl dike” (Yûhenna 13:20). Baş bînin bîra xwe ku Îsa, Yehûda ji bo ku mûcîzeyan pêk bîne û bera cinan bide, bi hêzê xemilandibû. Lêbelê Îsa, dizanîbû ku di dawiya dawî de wê Yehûda xerab derkeve: “Ma min hûn her diwanzdeh nebijartin? Lê belê yek ji we yek Îblîs e” (Yûhenna 6:70). Îsa, hîn berî ku gunehê wî diyar bibe, bi xêra tirsa REB, ew bi hîskirinê hilbijart. Yehûda jî mûcîze çêkirin û ji ber ku cinan bi navê Îsa serî li ber tewand, bi yên din re bi kêfxweşiyê

vegeriya (Marqos 6:7-13; Lûqa 10:17). Ma mirovan ji destê Yehûda xizmet stendin? Erê. Ji destên ku ji qutiya pereyan ya xizmetê dizî kir? Teqez wisa ye!

## DEMA VEQETANDINÊ

Bihêlin ez li vir xaleke pir girîng destnîşan bikim. Eger derkeve holê ku rayedarekî dêrê bi awayekî eşkere di nava dizî an jî gunehê de ye, divê em ji kaniyên wî yên qirêj vexwarina xwe hew bidomînin. Ji me re bi tundî hatiye gotin ku em ji rewşeke wisa xwe teqez vekişînin. Eger rêberek zîna, homoseksuelî, zorbazî, dizî, sapiqtî an jî her gunehekî din ê ku ji aliyê we ve tê zanîn ku tevlî van bûye an jî bi eşkereyî hatibe îfşakirin ku di gunehê de be û tobe neke, di cih de ji xizmeta wî rêberî vekişin. Nivîsên Pîroz di vê xalê de zelal in. Divê em bi kesekî wisa re xwarinê jî nexwin (Korîntî I, 5:9-11). Di rewşa Eli de, tam ne diyar e bê ka haya Hanna bi tevahî ji tevgera dejenerebûyî ya Eli û kurên wî heye an na. Bi heman awayî, mirovên ku xizmet ji Yehûda distandin bêguman jê ne haydar bûn ku ew diz û xayînek e.

Pawlos, bi niyeta ku rêberê dêrê têbigihêje, wisa got: “Gunehên hin mirovan kifş in (li ber çavên her kesî ne) û ji berî wan diçin ber dîwanê, lê gunehên hinekan jî li pey wan tên (sûcdar heta ber dadger dişopîne û li wir xiya dibe)” (Tîmotêyos I, 5:24).

Weke encam: Eger jiyana rêberekî dejenere bibe û darizandina Xweda hîn ne eşkere be, bêguman ew ê were dîtin, çi di vê jiyanê de û çi jî di jiyana pêşerojê de. Hûn ne mecbûr in ku tiştekî ku hûn pê ne ewle ne bidarizînin an jî eşkere bikin. Gelek kes bi gumanan tevdigerin û pir caran zirarê didin xwe û kesên li dora xwe ji ber ku nirxandinên wan ne rast in. Ji devê wan tiştên ku ew bi neheqî gumanê jê dikin, derdikevin. Ew bi şaşî wan bi têgihîştina giyanî rewa dikin. Ew ji bo yên din zehmet dikin ku ji rêberên tayînkirî bereketê bistînin û gelek ji wan bereketên ku Xweda dixwaze bide

wan ji dest didin. Ji ber vê Xweda vê dibêje: “Heta ku ne bi şahidiya dido an sisiyan be, sûcdariya li hember rihspiyekî qebûl neke” (Tîmotêyos I, 5:19). Şahid ne ew kes e ku ji hinekên din hin tişt bihîstibin, ew kes e ku karibe delîlan derxîne.

Xweda her tiştî di dema xwe de didarizîne û eger ew dem an jî pêwîstiyekê pê bibîne ku rêberek ji ber gunehên ku ji ber wan tobe nekiriye eşkere bike, hûn ê bêguman vê yekê bizanibin û wê dem bê ku hûn ji bin wê rayedariyê derkevin. Pawlos wisa gotiye: “Wan ên ku guneh dikin, li ber hemûyan dengê xwe li wan hilde, da ku tirsa yên din jî hebe” (Tîmotêyos I, 5:20). Hişyarî: Nebin şirîkê gunehên wan û eger heta bi rastî tobe nekin ji bin rayedariya wan derkevin.

Carekê hîn ji zûde min di bin rayedariya rêberekî de xizmet kir ku gunehê wî di dawiyê de eşkere bû. Dema ku ew eşkere bû, ez ne li wir bûm, ji ber ku berî bûyer biqewime ji bo xizmetkirina weke pastorê ciwanan em çûbûn eyaleteke din. Çend sal piştî ku em çûn, ew li ber civata bawermendan rabû ser xwe û ragihand ku ew ji jina xwe veqetiyaye ji ber ku êdî naxwaze bi wê re bijî. Piştî demek kurt, wî planên xwe yên ji bo zewaca bi jineke ciwan re parve kir. Tu gunehên cinsî yên jina wî tunebûn, wî tenê jina din dixwest.

Piştre bi hezaran kesan terka wê civatê kir. Wan ji ber sedemeke baş ev kir. Mixabin, yên ku man, ketin nava rewşeke bitalûke, ji ber ku her diçû doktrîn hîn bêtir li gorî armancên rêber û jina wî ya nû dihatin birêvebirin. Ez gelek kesan nas dikim ku ji wir çûn û heya ku li dijî pastor neaxivîn, bextewar û bibereket nebûn. Lêbelê yên ku êrîşî wî kirin êş kişandin.

Piştî çend salan, em çûn dêreke din a navdar. Pastorê me eşkere di gunehê de dijiya, lê Xweda ew demekê veşartî hişt. Weke noteke girîng, divê ez behs bikim ku Reb pir sebir kir. Ew li bendê ma ku pastor ji gunehên xwe yên bi zanebûn dike, vegere. Xweda ji rêberên ku ew tayîn kirine hez dike, ji ber vê yekê wî dem da wî ku tobe bike. Di dawiya dawî de, sebra Xweda nema bû û gunehê

pastorê me eşkere bû. Ew bi fahişeyeke homoseksuel re radiza û madeyên hişber bikar dianî. Nûçe wêranker û berfireh bû, ji ber ku ew yek ji rêberên Komeleya Neteweyî ya Dêrên Mizgîniyê bû ku ji nêzîkî ve ji pêncî hezar dêran pêk dihat.

Lêbelê ev trajedî ji ya berê cudatir berê xwe da rêyeke din. Çavdêrên dêrê û pastorên ji çar dêrên din hatin bi lez û bez bazdan bi alîkariya dêrê ve û pastor neçar kirin ku nameyeke lêborînê û îstîfeya xwe binivîse. Mirovan hîs kir ku tên parastin ji ber vê yekê gelek ji wan man. Pastorekî nû hat tayînkirin û di dawiya dawî de hejmara bawermendên dêrê ji ya berê pir zêdetir bûn.

Di xizmeta min a zêdetirî sî û pênc salan de, min gelek bûyerên trajîk ên bi vî rengî dîtine. Kesên di bin rêberên ku ketine gunehê de ne pir girîng e ku di asteke krîtîk de berteka xwedayî bidin. Dawid mînakeke tevgera rast e. Piştî ku Şeytan ji hizûra qralekî ku êş didayê hat avêtin jî, heta roja ku Şawûl mir jî jê re rêz nîşan da. Dawid fêhm kirbû ku Şawûl xizmetkarê REB ê mesîhkirî bû. Her çiqasî ez ji ber encamên hilbijartinên wan xemgîn im û ji ber ketina trajîk a ku piştî wê çêbû dilşikestî me jî, ez hewl didim ku heta roja îro rêzê li herdu zilaman bigirim. Her çiqasî ez rêzê li herduyan digirim jî, ez êdî hînkirin an jî xizmeta wan ewle an jî saxlem nabînim ji ber ku yê pêşî li hember nûbûnê li ber xwe da û yê din jî nebir serî û çû.

Min di demên cuda de ji herdu rêberan bereketa zêde stendibû. Paşê ez hîn bû ku gunehên wan vedigeriyan heta dema min a di bin rêberiya wan de. Di herduyan de jî nîşanên veşartî hebûn lê tu tişt ne eşkere an jî diyar bû. Xweda, gava ez di bin rêberiya pastorê pêşî de bûm, ji ber ku min helwesteke rexnegir nîşan da, erza min şikandibû (ez ê vê yekê di beşa bê de parve bikim); belkî Xweda hîn jî hewl dida ku xwe bigihîne vî zilamî. Di wê xalê de, ev yek ne xema min bû. Xweda ez xistibûm bin rayedariya wî û ne hedê min bû ku ez biryarê bidim bê ka ez hêjayî wergirtina bereketê me an na. Çawa ku Hanna bereket bi rêya Eli wergirt, gelekên din jî wê demê ji vî mirovî bereket wergirtin.

## RÊKÛPÊKIYA RAYEDARIYA GIYANÎ

Em vegerin gotinên Îsa û em wan li şûna kesekî weke Eli bi rêya rêberekî xwedayî, bibînin. Em li gotinên wî yên di Mettayê de binêrin:

> "Yê ku we qebûl bike, min qebûl dike û yê ku min qebûl bike, wî yê ku ez şandime qebûl dike. Yê ku pêxemberekî ji ber ku pêxember e qebûl bike, ewê xelata ku ji bo pêxember e bistîne. Û yê ku mirovê rast ji ber ku rast e qebûl bike, ewê xelata yê rast bistîne. Û kî ku tasek ava sar bide yekî ji van biçûkan, ji ber ku ew şagirtê min e, bi rastî ez ji we re dibêjim, ew tu caran xelata xwe winda nake." (Metta 10:40-42)

Di van ayetan de du xalan destnîşan dike. Berî her tiştî, ji bav dest pê dike û rayedariyeke ber bi jêr ve heye. Yê ku Îsa şandiye û hemû rayedarî daye wî, Bav e. Bi gotinên Îsa. "Hemû rayedarî li ezman û li ser rûyê erdê ji min re hatiye dayîn" (Metta 28:18). Îsa serê dêrê ye û roj wê were ku piştî ku hemû dijminên xwe di bin lingan de bitepisîne, ew ê desthilatdariyê bide Bavê xwe (Korîntî I, 15:24-26).

Di vê rêza din de di rêkûpêkiya rayedariyê de pêxember tê. Pêxember di destpêkê de di Nivîsên Pîroz de weke berdevkên Reb dihatin nîşandan (Derketin 4:16; 7:1). Pêxembertî, yek ji pênc diyariyên xizmetê ye ku Îsa piştî vejîna xwe da dêrê (Efesî 4:8-13). (Ew berdevkên Dêrê ne.) Dema ku em diyariyeke xizmetê werdigirin, bi rêya meqama rayedariya hatiye dewirkirin em bixwe ji Reb distînin.

Îsa bawermendên ji rêzê jî ji bîr nekirin. Min dît ku kesên bawer nakin tenê ji ber ku wan dilovanî nîşanî bawermendên herî biçûk dan, hatin pîrozkirin. Her çiqasî kesên bawer nakin xizmeta Reb nedikirin jî, wan rêz ji Efendiyên wan re nîşan dan. Bi pejirandin û pîrozkirina pîrozan, em di dawiya dawî de Bav dipejirînin û pîroz dikin. Şandiyên ku di nava wan de yên biçûk jî hene, xwe dispêrin

rayedariya pênc dêrên di bin serokatiya Îsa de ku îradeya Bav diyar dike. Ji ber vê yekê, yên nerizgarkirî dikevin bin pîrozkirina kesên ku di Mesîh de û di dema pitikbûnê de ne, ji ber ku di Desthilatdariyê de, kesê herî biçûk ji kesên winda bêtir xwedî rayedariya mezin ya giyanî ye. Ji gotinên Îsa, em dibînin ku rêkûpêkiyeke rayedariyê ya damezrandî heye.

## XELATA PEJIRANDINA RAYEDARIYA GIYANÎ

Xala duyem a ku di van ayetan de tê ragihandin, ew e ku bê pejirandin ku ev xizmetkar di dawiya dawî de ji aliyê Xweda ve têne şandin û stendina xelata ku beramberî vê ye. Xizmeta Îsa şayesandinekê ava dike.

Niştecihên bajarekî her çiqasî rastiya Mesîh waz bikin û her çiqasî ji Nivîsên Pîroz bi hatina Wî zanibin jî, di wergirtina bereketa ji Îsa de bi taybetî zehmetî kişandin. “Îsa jî ji wan re got: «Pêxemberek ji bajarê xwe, di nav mirovên xwe de û ji mala xwe pê ve, li cihên din ne bê siyanet e.» Wî li wê derê nikaribû tu keramet bikira, bi tenê destên xwe danîn ser çend nexweşan û ew qenc kirin” (Marqos 6:4-5).

Gava ku em meqam an jî peywira kesekî bi rûmet dikin, em dipejirînin ku ew kes ji aliyê Xweda ve hatiye şandin. Xweda, bi rêya Mûsa ji gel re wisa got: “Ezê ji bo wan, ji nav birayên wan pêxemberekî wekî te derînim” (Dubarekirina Şerîetê 18:18). Lê wan Îsa weke Berdevkê Bav an jî weke Mesîh bi rûmet nekirin.

Çima ew nepejirandin? Ji ber ku Ew, ne li gorî xwesteka wan hat. Xwesteka wan ji nasnameya rast ya Wî pir cuda bû. Di Îşayê de wisa xwendibûn:

“Çimkî wê zarokek ji me re çêbe,
Wê kurek ji me re bê dayîn.
Wê serwerî li ser milê wî be.
Wê navê wî Şêwirmendê Nûwazekar, Xwedayê Karîndar,
Bavê Herheyiyê, Mîrê Aştiyê be.

Ji bo textê Dawid û padîşahiya wî,
Wê serwerî her ku biçe zêde bibe”
(Îşaya 9:6-7)

Ji ber vê yekê ew li benda hatina qralekî fetihkar bûn ku wê Îsraêlê ji dîlgirtina Romayiyan rizgar bike û qraltiya xwe li Orşelîmê ava bike. Lê di şûna vê de, ew weke kurê xeratekî; bi masîgir, fahişeyên berê û peywirên bacê re hat. Wan di nava xwe de got: “Mesîhê ku me dixwest an jî hêvî dikir ne ev e!”

Ya din jî, ji bîr nekin ku di Nivîsên Pîroz de tê gotin ku dibêje Îsa “nikarîbû” tu mûcîzeyan bike. Ne bi awayê ku li gorî îradeya Wî diçe û nabêje “nekir.” Ew dibêje “nikarîbû” û ev hevok dide xuyakirin ku Ew hatibû sînordarkirin. Li ser vê yekê bifikirin. Kurê Xwedayê ku bi Giyanê Xweda re bê pîvan hatibû mesîhkirin û hatibû sînordarkirin! Çima? Bersiva vê du alî ye: Ew ne weke ku wan dixwest hatibû, ji ber vê yekê wan ew qebûl nekir an jî rûmet nedan wî û wan Ew pir nas dikir. Ka em lê binêrin bê wan çi gotine:

> “Çaxê bû roja Şemiyê, wî di kinîştê de dest bi hînkirinê kir û gelekên ku ew bihîstin, gelek şaş man û gotin: Vî mirovî ev tişt ji ku derê anîn? Ev çi şehrezayî ye ku jê re hatiye dayîn? Ev çi keramet in ku bi destê wî çêdibin? Ma ev ne xerat e? Ma ev ne kurê Meryemê û birayê Aqûb, Yûsês, Cihûda û Şimûn e? Ma xwişkên wî ne li vir di nav me de ne? Bi vî awayî ew ji wî enirîn. Îsa jî ji wan re got: Pêxemberek ji bajarê xwe, di nav mirovên xwe de û ji mala xwe pê ve, li cihên din ne bê siyanet e.” (Marqos 6:2-4)

Pêxemberek li kuderê tê biçûkxistin? Pirî caran li mala xwe û di nav nasên xwe de. Dawid, gava ji bo pîrozkirina malbata xwe hat mala xwe li vê rewşê rast hat. Serkeftina wî li kolanan dihat pîrozkirin lê ew di nav mala xwe de dihat biçûkxistin. Jina wî Mîkal bereketa ku Xweda ji bo wê destnîşan kiribû ji dest da. Dawid xwedî hêz bû ku

malbata xwe pîroz bike. Ma hîn çiqasî hêz û rayedariya Îsa hebû ji bo ku malbata xwe pîroz bike! Her çiqasî ew di hêza xwe ya pîrozkirinê de bêdawî bû jî, ji bo wan Wî kêm tişt kiribûn (Samûêl II, 6).

Tenê ew kesên ku dilnizm, hînker û birçîyên Xweda bûn, dikarîbûn di ser Îsa re destên Xweda bibînin û bereketa Wî bistînin. Ew, bi rastî bi kesên li dû Xweda ku li gorî dihat xuyakirin xwediyê xwedabûnê bûn lêbelê ji ber dilên wan yên bêîteatkar ew kesên kor ji hev vediqetandin, ew Şûr bi xwe bû. Weke ku Şîmon ji Meryemê re got: “Ev zarokê ha ji bo ketin û rabûna gelekan li Îsraêlê hatiye danîn û ew nîşanek e ku li hember derkevin, da ku fikrên dilê gelekan bên kifşkirin. Û şûrek wê di dilê te re jî here, wî qul bike” (Lûqa 2:34-35).

Ayetên Yûhenna 1:11-12 du komên ji hev veqetiyane pênase dike: “Ew hat mala xwe, lê gelê wî ew qebûl nekir. Lê hemûyên ku ew qebûl kirin û bawerî bi navê wî anîn, wî desthilatî da wan ku bibin zarokên Xwedê” (Yûhenna 1:11-12). Ev ji bo me hemûyan rastiyeke bingehîn e. Xweda gelek caran tişta ku pêdiviya me pê heye di nava ambalajeke ku em naxwazin de dişîne.

Ev pêşkêşkirin wê rewşa rastîn a dilê me derxîne holê û wê eşkere bike bê ka em teslîmî rayedariya Wî dibin an na, an jî em li ber Wî li ber xwe didin an na. Îsa got: “Hûn ne min nas dikin ne jî Bavê min. Eger we ez nas bikirama, weyê Bavê min jî nas bikira” (Yûhenna 8:19). Kesên Bav nas dikin, di kesên Wî şandine de rayedariya Wî nas dikin! Pêdivî pê tuneye ku daxuyaniyê, hînkirinê an jî îspatkirinê bike.

Ev rewş rave dike bê çima xizmetkarek dikare biçe Afrîkayê û bibîne ku kor baş dibin, seqet dimeşin û kerr dibihîzin, lê vegere Amerîkayê û tenê çend serêş an pirsgirêkên piçûk ên piştê baş dibin, bibîne. Ez dikarim gelek mînakan bidim. Li Afrîkayê xuyakirin an jî ambalaj çi dibe bila bibe, tê pejirandin ku xizmetkarên jin an jî mêr, ji aliyê Xweda ve tên şandin. Ji ber ku xizmetkar wisa

tê pejirandin û rêz lê tê girtin, gelê Afrîkî yê hêja bi hêz û hebûna Xweda tê pîroz kirin. Li Amerîkayê, heke ambalaj rast neyê dîtin, rêz û rûmet nayê dayîn. Ev rêjeyiya rasterast e. Peyamberê ku ji hêla Xweda ve hatiye şandin hûn di kîjan astê de bipejirînin û bi rûmet bikin, bi rêya wî kesî hûn ê ew qasî bereketê ji Xweda bistînin. Lêbelê heke hûn rêzê nîşan nedin, ev e ya ku hûn ê bistînin. Rûmeteke mezin nîşan bidin û rûmet wê li para we bikeve.

## TU NABÎ HEVALÊ MIN?

Dema ku ez pastorê ciwanan bûm, min bi kurekî panzdeh salî yê bi navê “Tim” re sohbeteke balkêş kir. Berî ku ez tevlî xizmetê bibim, Tim di nava koma pastorê ciwanan ê berê de bû. Pastor bi rêya çalakiyan, ger û geştê û werzîşê ev kom ava kiribû. Di nav pirsgirêkên di nav ciwanan de serhildanî, ducaniya di temenê biçûk de û pirsgirêkên din ên exlaqî hebûn. Bi demê re, pastorê mezin ê dêrê ew ji kar dûr xist û ez weke cîgirê wî hatim tayînkirin. Pastorê ciwanan ê berê çend kîlometreyan li jêra rê bi komeke ciwanan re dêra xwe damezrand. Tim yek ji wan kesan bû ku bi wî re neçû.

Her çiqas piraniya ciwanan man jî, ez mecbûr mam ku bingeheke nû deynim. Reb li min ferman kir ku ez şeş mehên pêşîn ji bilî waz, dua û perestîşê pê ve tu çalakiyeke din nekim. Min di wan mehan de tu plana çalakiyên civakî nekir. Ne hewceye ez bibêjim, ez ambalajek bûm ku gelek kesan tu hêvî jê nedikir. Di dawiya dawî de, şûrê Reb birî û jêkir. Hin ji wan veqetiyan, hin ji wan ji ber meraqê man û yên din jî bi coş bersiv dan, gelek ji van îro roj xizmetê dikin.

Dema ku ez êvareke piştî civînê bi Tim re axivîm, kêm zêde bibû çar meh ku min ev peywir bi cih dianî. Ew hat ba min û ji dil pirsî: “Pastor John, tu nabî hevalê min? Ez bi pastorê xwe yê ciwanan ê dawî re heval bûm.” Tiştê wî dixwest li ambalajê nedikir.

Divê pirsa wî biçûk nehata dîtin û ji bo ez bibihîzîm bê divê ez bersivekê çawa bidim, min berê xwe da Reb. Di cih de bersiv bi

awayê pirsekê hat: “Tim Îsa got ku, ‘Yê ku pêxemberekî ji ber ku pêxember e qebûl bike, ewê xelata ku ji bo pêxember e bistîne. Û yê ku mirovê rast ji ber ku rast e qebûl bike, ewê xelata yê rast bistîne’ (Metta 10:41). Ev ji bo pastorekî ciwanan jî derbasdar e. Eger tu pastorekî ji ber ku pastor e bipejirîne, tu yê xelateke ku bi pastor dikeve bistîne.”

Min berdewam kir: “Tim, gelek hevalên te hene ne wisa?”

Bersiv wisa da: “Belê ezbenî.”

“Lê tenê pastorekî te yê ciwanan heye, ne wisa?”

Bersiv da û got: “Belê ezbenî.”

Min jê pirsî: “Tu kîjanê dixwazî: xelata ku li hevalekî tê an xelata ku li pastorekî ciwanan tê? Ji ber ku tu min çawa bipejirînî, li gorî wê tu yê ji Xweda bistînî.”

Te digot qey ronahiyek di hundirê wî de vêket. Min dît ku çavên wî wehiyê qeyd dike û wî zû bersiv da: “Ez xelata ku layiqî pastorekî ciwanan e dixwazim. Ez dizanim tu çi dibêjî.” Ji wê gavê û pê ve, ew ji hêla giyanî ve bi pêş ket. Çend sal şûnda wî bar kir lê dîsa jî her gava ku ez diçûm bajarê wî, li min dipirsî û gazî min dikir.

## TECRUBEYA MIN BI XWE

Min pirtûkek bi navê “Xelata Rûmetê” (Pirtûkên ber bi Rastiyê ve) nivîsand ku tenê li ser vê mijarê disekine. Dilê min xemgîn dibe dema ku ez dibînim ku mirov tenê ji ber ku ew xizmetkarên Xweda ne nas nakin û rêzê li wan nagirin, bereketê wernagirin. Min ev yek di xizmetê de pirî caran dîtiye: Ew kesên ku xizmetkarên Xweda kêm dinirxînin, yên herî dijwar in ku meriv bigihîje wan. Ez pirî caran li dêr û dibistanên Xirîstiyanan ên li seranserê Dewletên Yekbûyî rastî wan têm. Kesên wisa jixwe ji ber pirbûna xizmetkarên derbas di nava qelsiyekê de ne û ez ji bo wan tenê vebijerkek im.

Bêguman mirovên herî hêsan yên ku mirov wazan bide wan personelên leşkerî yên ku xwedî têgihiştina rayedariyê ne. Koma din

dibe ku kesên girtî an jî mirovên li welatên kêm pêşketî bin, ji ber ku ew bêçare ne û birçî ne. Xweda bi têgehên wekhev re bi Hezekiyêl re axivî:

> "Çimkî ez te naşînim ba miletekî ku gotina wan xerîb e û zimanê wan giran e. Ez te dişînim Mala Îsraêl. Ez te naşînim ba miletên ku tu axaftina wan fêm nakî, gotina wan xerîb e û zimanê wan giran e. Bi rastî, heke min tu bişanda ba wan miletan, wê guhdariya te bikirana. Lê wê Mala Îsraêl nexwaze guhdariya te bike. Çimkî ew naxwazin guhdariya min bikin. Tevahiya Mala Îsraêl serhişk û dilhişk e." (Hezekiyêl 3:5-7)

Ji bo gelê Îsraêlê, Hezekiyêl tenê yek ji pêxemberan bû û ew ji yên din hişktir bû, tiştên ku mirovan dixwestin bibihîzin belav dikir, ji ber vê yekê wan ew qebûl nekir.

Rojekê, Xweda bi vê daxuyaniyê serê min tevlihev kir: Ez ê te bişînim cihên ku ew te qebûl nakin.

Min pirsî: "Bise deqayekê. Ma tu yê min bişînî cihên ku tu dizanî ew ê gotinên te qebûl nekin? Çima?"

Reb wisa bersiv da: "Ji ber vê yekê ew qet nikaribin bibêjin ku min şansek nedaye wan."

Ez çûme wan cihan û li wir ez wisa fikirîm: "Çima wan ez vexwendim? Ew weke ku naxwazin ez li vir bim, tevdigerin." Di demên din de, ji kêliya ku ez li balafirgehê hatim pêşwazîkirin û heta kêliya ku ez dîsa şandim, bi coş û rêzdarî ez hatim pêşwazîkirin, hem berî û hem jî piştî xizmetan. Piştî van ez çûm cihên ku bi kelecan ez pêşwazî kirim û min li wan deran qedir û qiymet dan min û rêzgiriteneke baş ji min re girtin. Di odeya otêla min de, bi selikên fêkî û xwarinên sivik ên xweşik hatim pêşwazîkirin û her tim ji min hat pirsîn: "Pêdiviya te bi tiştekî heye?" Min gelek caran xwe weke plaqeke şikestî hîs dikir, "Ez baş im. Ez baş im." Dema ku ez li paşerojê dinêrim, hin ji şahidiyên herî mezin ên veguherînê di jiyan an jî dêrên wisa de pêk tên. Di destpêkê de, ez nerehet dibûm dema

ku ewqas baş dihatim pêşwazîkirin an jî dema ku dihatim nasandin û ji bo min li çepikan dixistin. Ez wisa difikirîm: “Ez jî weke we me. Vê yekê neke.” Lê piştî demeke kin min fêhm kir ku ev yek ne bi min ve girêdayiye.

Hêdî hêdî, Xweda ev nîşanî min da: Destûrê bide bila ew ji bo qenciya xwe rûmetê ji te re bigirin, ne ji bo te. Kar hêsantir bûn dema ku min fêhm kir ku ew ne ji bo min, lê ji bo diyariya Xweda ya di jiyana min de bi rûmet dikin. Bersiva wan a erênî dilê wan vekir da ku bereketên ku Îsa dixwest bi rêya min weke amûreke bide wan bistînin. Li şûna xurûrê, min hesteke dilnizmî û girêdayîbûnê ya kûr di hundurê xwe de hîs kir. Min dizanibû ku ew ne jêhatîbûna min bû lê hilbijartina Wî bû. Rûmeta ku ew nîşan didin ez berê wê didim Reb û girêdayîbûna xwe ya bi Wî re min di cih de dipejirand. Yên ku rêz nîşan dan bi hêsanî wergirtin; yên din zehmettir bûn ku mirov xwe bigihîje wan.

## RÊZGIRTINA DU QATÎ

Pawlos ev talîmat da: “Ew rihspiyên ku serweriya qenc dikin, bi taybetî ew ên ku di ber peyivîn û hînkirinê de zehmet dikişînin, bila du qat hêjayî siyanetê bên dîtin.” (Tîmotêyos I, 5:17). Îfadeya “rêzgirtina du qatî” ya li vir ya Pawlos, di şertên normal de rêzgiritina ku hûn ê nîşanî rayedarekî sekular bidin, qesta rêzgiritineke du qatî dike.

Eger ev ayet di çarçoveya xwe de bê xwendin, ya rastî awayê ku em xizmetkaran ji aliyê aborî ve bi rûmet dikin, di xwe de dihewîne. Dibêje “Pale hêjayî heqê xwe ye” û wisa berdewam dike (Ayeta 18an). Di wergereke din ya Pirtûka Pîroz de vê yekê pir bi awayekî eşkere derdixîne holê: “Ew rihspiyên ku serweriya qenc dikin, bi taybetî ew ên ku di ber peyivîn û hînkirinê de zehmet dikişînin, bila du qat hêjayî siyanetê bên dîtin. Çimkî Nivîsara Pîroz dibêje: Devê gayê ku gêrê dike, girênede û Pale hêjayî heqê xwe ye” (Tîmotêyos I, 5:17-18). Di

wergera NLTyê de jî wisa dinivîsîne: “Rîhspiyên ku xizmeta xwe baş dikin divê rêz li wan bê girtin û divê pereyekî baş bidin wan.”

Ev prensîb qet şaş nabe. Eger civaka dêrê xwedî li pastorên ku xizmeta wan dike, derkeve û xwedî li mezinên xwe derkeve; malbat, karsaz û endamên din dewlemend dibin û tên rûmetkirin. Ew kêfa aboriyeke ezmanî derdixînin. Lê eger ew xesîsiyê bikin, min dîtiye ku mirovên wisa ji dizî, bêparî an jî şert û mercên xirab ên aboriya cîhanê ya heyî gilî dikin.

Ez di wê ferqê de me ku ev rastî, bi taybetî ji aliyê xizmetkarên li Rojava ve, tê îstismarkirin. Ez xemgîn dibim ku hin xizmetkar bi berdewamî li ser pere û tiştên madî diaxivin. Xwedî rastiyekê ne lê lêdana dilê xizmetê winda kirine û ketin rêya karkerên bi pereyan. Ferîsî bi vî rengî dijiyan. Dîtina vê îstismarkirinê bûye sedem ku gelek kes ji prensîba Nivîsên Pîroz a rêzgirtina duqatî bi paş ve gav bavêjin. Ev rewş zirarê dide bawermendên asayî yên ku hewcedariya wan bi rastiya bi awayekî saxlem heye.

Min ev zirar di sala 1990î de, di sala min a yekem a rêwîtiyê de dît. Ez di dêreke piçûk de dixebitîm ku nêzîkî sed endamên wê hebûn. Civîn baş derbas bûn û civak jî bi qîmet bû. Em bi pastor û jina wî re man û me fêhm kir ku ew zehmetiyan bi hev re dikişînin. Jin weke peywirdara firînê ya her dem dixebitî û nikaribû weke ku dixwest xizmetê ji civakê re bike. Wê nexwest îstifa bike û maaşeke ku ew lê difikirî ku wê ji derê zêdetir be nedixwest bistîne. Min rewşa wan a ku di nav de dît. Ez û pastor, berê li dêra ku min behsa wê dikir, em dixebitîn. Pastorê me yê li wir di hînkirinên xwe yên li ser aborî û pêşkêşan de pir dest belav bû. Ji ber vê yekê em herdu jî hay ji xwe hebûn û ji ber ku me nexwest heman tiştî bikin, em bêhemdî xwe ber bi serê din ve şemitîn. Lêbelê Xweda ez hîn dikirim ku li her du seriyan jî destbelavî ne baş e. Wî hevsengiyeke çêtir dixwest.

Civîn roja Yekşemê sibehê dest pê kiribûn û heta şeva Çarşemê berdewam kiribûn. Sê civînên pêşî baş derbas bûn lê weke ku tiştekî

dêrê bi paşve dixist. Roja Sêşemê ji sibehê û heta êvarî Reb, li ser van jin û mêrî derbarî aboriya wan de bi dilê min re xebitî. Min nikarîbû van ramanan ji holê rakim lê min meraq dikir ka ez dikarim çi bikim.

Berî ku hebandin dest pê bike, pastor ji min re got ku ew dixwaze pêşkêşiya xizmeta me ya êvarê ez bi rêve bibe. Dema ku wî xizmet radestî min kir, gotinên wî yên ku ji min re kirin tam ev bûn: "Ez di derbarê pêşkêşiyê de te azad dihêlim."

Ez bi vê pir kêfxweş bûm. Xweda ev derî ji bo min vekiriye ji bo ku ez bikaribim çalakiya di dilê min de çêkiriye ferq bikim. Wê şevê, min li gorî tiştê ku min nivîsandibû xizmet kir. Me ayetên di Tîmotêyos I. de xwendin û min ji wan re got ku pastor û jina wî ji hêla aborî ve ne baş têne dabîn kirin. Min bi awayekî eşkere diyar kir ku jina pastor ji bo alîkariya aborî ya malê bike, xelet e ku her ji sisê an jî çar rojan here balafirê û bifire. Min bi wan re parve kir û got ku pastor azadiya lênêrîna pêşkêşiyê daye min, lê divê me ev pêşkêşî ne ji bo xizmeta xwe bigirta. Me dixwest ku pêşkêşî ji bo xizmeta pastor û jina wî be. Mirov bi rastî ji ber derfeta pîrozkirina pastorê xwe pir bi kelecan bûn. Pêşkêşiya ku wê êvarê civiya, pêşkêşiya herî mezin bû ku heta niha hatibû lidarxistin! Jina pastor hêsir weke baranê dibarandin û pastor matmayî mabû.

Hûn ê matmayî bimînin eger ez her bûyera derxwezayî ya ku di bîst û çar saetên pêş de qewimîn, binivîsim. Jin û mêrekî, roja din çekeke ku deh hezar dolar bû wergirt; yekî din li ber deriyê xwe di nava zerfekê de çekeke hezar û pêncsed dolar dît. Ev tenê destpêk bû. Heta sibeha Yekşema din, şahidî ewqas mezin û pir bûn ku pastor nekarî wazan bide. Tevahiya xizmetê ji şahidiyên mirovên ku bereketên aborî yên ku Xweda wê hefteyê dabû wan, çi di karsaziyên wan de çi jî di jiyana wan a şexsî de parve dikirin, pêk dihat. Pastor piştre tomarkirina vîdyoyeke ji vê xizmeta xweber ji min re şand.

Mezinbûna vê dêrê di du salên pêş de bi rastî jî gelek zêde bû. Wan kampusa lîseyeke kevn ya berê bi temamî kirîn, ew nûjen

kirin, veguherandin avahiyeke xizmetê û bi awayekî berbiçav mezin bûn. Bi salan bû ku endamên dêrê li dora sed kesî bûn. Vê û gelek mînakên din yên bêhejmar fêrî min kirin ku Xweda dixwaze em rêzê li wan kesan bigirin ku di nav me de ji bo qenciya me dixebitin.

Niha, piştî sîh salên rêwîtiya ku min ji bo xizmetê kirin, ez dikarim ji we re bibêjim ku min qet îstîsnayeke ji vê rastiya Pirtûka Pîroz nedîtiye. Ez li gelek dêrên ku maaşekî pir kêm didan pastorê xwe, mam. Hişmendiya wan wisa ye: Eger em bi maaşekî kêm pastorên xwe îdare bikin, em dikarin bêtir pereyan ji bo mîsyon û çalakiyên mizgîniyê veqetînin. Ev dêr her sal bi sed hezaran dolaran didin xizmetên mîsyonan.

Ji bilî vê min gelek dêr jî ziyaret kirine ku maaşên pir baş didin pastorên xwe. Ev dêr her sal bi milyonan dolaran didin çalakiyên mizgînî û mîsyonan. Ji ber vê yekê pirsa retorîkî ev e: Kî bêtir pereyan dide ji bo çalakiyên mizgînî û mîsyonan? Bersiv hêsan e, dêrên ku maaşên baş didin pastorên xwe. Sedema vê çi ye? Ji ber ku ev dêr îteatê ji fermanên Gotina Xweda re dikin lêbelê dêrên din bawer dikin ku zanebûna wan ji ya Xweda hîn mezintir e!

Ez çûme welatên kêm pêşketî jî û gava min dît ku ev dêr çawa bi min re mijûl dibin, hema bêje ez giriyam. Her çend li gorî pîvanên Amerîkî ji hêla aborî ve dibe ku piçûk bûn jî, ji ber ku li hin dêrên xemsar yên Amerîkayê jî min bêtir pêşkêşî dabûn hev. Tişta ku herî zêde bandor li min kir, hezkirina li pişt diyariyên ku van mirovên minetdar dida bû. Her çiqasî diyariyên wan kêm bûn jî, ew ji jinebiya ku Îsa wesifand ku ji yên din bêtir dide ne cuda bûn. Jinebiyê bi diyariyên xwe rûmet da Xweda. Ev pîroziyên hêja jî rêz li xizmetkarên ku Xweda ji wan re şandiye digirin û wan teqdîr dikin. Destûrê bidin bila ev yek bikeve dilê we. Hewl bidin ku hûn rêzê li mêr û jinên di nav we de bigirin ku xizmetê ji Gotina Xweda re dikin.

## KESÊN JI ALIYÊ RÊBERAN VE HATINE TAYÎNKIRIN

Em dîsa li gotinên Îsa binêrin: “Bi rastî, bi rastî ez ji we re dibêjim, yê ku wî kesê ez dişînim, qebûl bike, min qebûl dike û yê ku min qebûl bike, wî yê ku ez şandime qebûl dike” (Yûhenna 13:20). Di Mizgîniya Metta de ya rastî Îsa zincîreke peywirê pênase kiriye: Bav, Îsa şand û Îsa pênc celeb xizmetkar şandin. Eger em xizmetkarên Wî tayîn kirine bipejirînin, em Wî dipejirînin û bi pejirandinê em Bav jî dipejirînin.

Zincîra peywirê bi pênc celeb xizmetkaran bi dawî nabe. Ew bi kesên ku ji aliyê xizmetkaran ve hatine tayînkirin berdewam dike. Di hebandina sibeheke Yekşemê de tiştên ku ji devê min derketin ez tu carî ji bîr nekim. Pastorekî baş yê derê hebû. Wî rayedariya xwe ji bo parastina civakê bi kar dianî û wan rêz li wî digirtin. Lêbelê, ev rêz li ser karmend û karkerên din ên tayînkirî berdewam nebû. Min kêmasiya rêzgirtinê ji bo kesên din ên ku ji hêla pastor ve hatine tayînkirin, weke paqijker, xizmetkarên parkkirinê, alîkar û rîhspiyên bajêr dîtin.

Min di xizmetê de bi xelata pêxembertiyê xizmet dikir. Dema ku min bi vî rengî waz dida, gelek caran min ew gotin dibihîstin dema ku ji devê min derdiketin. Min bi destê xwe peywirekî dêrê nîşan da û min got: “Çawa ku hûn bi vî kesî re tevdigerin, hûn bi pastorê xwe re jî wisa tevdigerin. Tevgera we ya bi wî re, di rastiyê de berteka we ya li hemberî Îsa nîşan dide.”

Divê we çavên hin endamên dêrê bidîtana. Ronahiya wehyê di dilê wan de dişewitî û helwestên wan eşkere dikir. Ew dêreke saxlem û baş bû û mirovan bi kêfxweşî terbiya wê pejirand. Ya rastî gotinan ji min re jî xizmet dikirin. Dema ku ez di dêrekê de xizmetê dikim an jî diçim dêra xwe, ez rêzê nîşanî wan kesên ku xizmetê dikin, didim. Ji ber ku ew ji jor ve ji hêla Bav, ji hêla Îsa û ji hêla pastor ve hatine tayîn kirin. Her tişt, bi dîtina rayedariya Xweda ya ku em li mirovên li wan rast tên ve têkildar e.

Nimûneyeke bêhempa ya ji Pirtûka Pîroz, çîroka Naeman fermandarê artêşa Aramî ye. Nexweşiyeke çermî lê peyda bibû û hêviya ku başbibe tunebû. Keçeke xizmetkar a Îsraêlî ya di malbata wî de dixebitî jê re got ku pêxemberekî li Îsraêlê dijî dikare bi hêza REB Xweda wî rehet bike.

Qralê Aramî destûr dayê û Naeman şand cem Qralê Îsraêlê. Qralê Îsraêlê jî berê wî da mala Êlîşa: “Naeman bi erebe û hespên xwe ve hat û li ber deriyê mala Êlîşa sekinî. Êlîşa bi riya qasidekî jê re got: Rabe here di Çemê Şerîayê de xwe heft caran bişo. Wê laşê te bibe wekî berê û tê pak bibî” (Padîşah II, 5:9-10).

Naeman çawa ev bihîst hêrs bû û wisa got: “Ji min kirî, wê were ba min û wê bi navê Xwedayê xwe Xudan gazî bike, destê xwe li ser cihê kotîbûnê bihejîne û min baş bike” (Padîşah II, 5:11).

Hêviya wî ya şaş hema bêje bû sedem ku ew şîfaya Xweda dixwest bi rêya darizandina xwe peyda bike, hindik mabû ji dest bide. Eger Êlîşa derketiba derve, wê pêşwaziya wî bi dilxwazî bikira, ma ne jixwe Naeman mirovekî girîng bû. Ji ber ku ew bi Êlîşa re rûbirû neaxivî, ew difikirî ku heqaret lê hatiye kirin. Lê dîsa jî, weke fermandarekî, divê wî rayedariya ku hatibû dayîn fêhm bikira. Mizgîniya baş ew bû ku xulamên wî ew razî kirin ku berevajî vê yekê bike û piştî ku heft caran xwe di Çemê Şerîa de şûşt, ji nexweşiyê jî pak û paqij bû. Her tişt tam weke wê xizmetkara ku ew di vî warî de agahdar kiribûn, derketibû. Ma ne jixwe ew di bin rayedariya zilamê Xweda de bû.

Ez xemgîn im ku dibihîzim pastorê hin dêran gava derdikevin rêwitiyekê hejmara tevlibûna derê kêm dibe. Ev kêmasiya têgihîştina mirovan ya derbarê rayedariya rastîn de nîşan dide. Eger dil bi hev re rast bin, mirov wê karibin pastorekî alîkar an jî ji waîzekî seyah jî di heman astê de bereketê bi dest bixin, ji ber ku her yek ji wan ji aliyê pastor ve hatiye tayînkirin. Pastor li ser kursiyê Îsa rûdinê. Eger em dewirkirina rayedariyê ya qraltiyê fêhm bikin,

em ê fêhm dikin ku ev ne pêşbaziyeke kesayetiyê ye lê rayedariyeke diyarkirî ye ku bi Îsa ve girêdayî ye.

Wekî bawermend, divê em rêzê li berpirsên hikûmetê, karsazan, mamosteyan û berpirsên din ên tayînkirî bigirin. Divê em rêzê li berpirsên herêmî bigirin û dema ku em wiha bikin, soza xelatê ji me re tê dayîn. Di dawiya dawî de, em du qat rêzê li wan kesan bigirin ku xizmeta Reb dikin, nemaze yên ku ji bo hînkirin û belavkirina Gotina Xweda dixebitin.

BEŞ 11

# GUHDARÎKIRIN Û PÊVEGIRÊDAN

*Em dikarin guh bidinê lê em ne mecbûr in pê ve girêdayîbin.*

Pêvegirêdan, dibe ku mijara herî gelemperî ya têgihîştina xelet di nav bawermendan de be. Em ê di sê beşên pêş de li mijarên dijwar bikolin. Di sî û pênc salên borî de, dema ku ez “di bin rayedariyê de” hîn dikim, min gelek caran pirsên weke van bihîstine:

- Guhdarîkirin bê şert û merc e?
- Eger ez tevlî biryarên rêberê xwe nebim wê çi bibe?
- An rayedar biryarên nebaş bidin?
- An rayedar ji min bixwazin ku ez tiştekî nebaş bikim?
- Ez ê li kuderê sînor bikişînim?

Eger em bixwazin ji rayedaran bawer bikin û bi wan ve girêdayî bimînin, ev pirsên pir baş in ku divê bersivên wan bên dayîn. Ji bo destpêkirinê werin em li Nameya Îbraniyan binêrin:

> “Bi ya rêberên xwe bikin û ji gotina wan dernekevin. Çimkî ew wek ên ku wê hesab bidin, berevaniya canê we dikin. Guh

bidin wan, da ku ew vê yekê ne bi nalîn, lê bi dilxweşî bikin. An na, wê ji bo we bê kêr be.” (Îbranî 13:17)

Nivîskar bi awayekî zelal me teşwîq dike ku em du tiştan bikin: (1) guh bidin rêberên xwe û (2) bi wan ve girêdayîbin. Ev talîmatên cuda ne û cihê ku serê gelek kesan tevlihev dibe ev der e. Em dikarin guh bidinê lê em dikarin pê ve negirêdayîbin. Ji bo ravekirinê, destûrê bidin ez mînakeke şexsî parve bikim.

## XWEDÎKIRIN

Weke ku min di beşeke berê de jî behs kir, di bîst saliyên xwe de, piştî kariyereke kurt ya di endezyariyê de, ez li dêreke mezin ya li başûrê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê xebitîm. Li wir, ez çar sal û nîvan weke asîstanê şexsî yê pastor xebitîm. Karûbarên şexsî yên pastor û jina wî min bi rêve dibirin û ez bi zarokên wan dadiketim.

Ev ji bo min ezmûneke fêrbûnê ya bêhempa bû û di wê sala yekem de, ez gelek caran matmayî dimam ku Xweda destûr da min ku ez di roleke wisa de xizmetê bikim. Ji ber ku destûr da ku ez tiştekî wisa bikim, ez carina difikirîm ku divê min di ser vê re pere bidana. Carekê tê bîra min, piştî ku min ji bo malbatê ji marketê tiştên lazim kirîn, li otoparka marketê ez rûniştim û digiriyam. Di dêra me de zêdetirî heşt hezar kes hebûn. Çima ez di nava ewqasan de yekî hatibûm hilbijartin? Ev qonaxa meha hingivînê berî ku hêdî bi hêdî biçilmise hema bêje nêzîkî salekê dom kir û piştre her çû li xwe kêm kir.

Her ku ez nêzîk dibûm, min hîn bêtir kêmasî dîtin. Nûbûn û kelecan êdî weke veşartinekê bi kêrî tu tiştî nedihatin. Di têgihîştina hin tiştên ku min şahidiya wan dikir de min zehmetî dikişandin. Demeke dirêj derbas nebû ku van bûyeran êdî ez ditengijandim. Ez gelek caran bi awayê ku tişt dihatin kirin, awayê ku pirsgirêk dihatin çareserkirin û biryarên ku dihatin girtin razî nedibûm.

Şîroveyên weke gotinên ku dilê mirov dihiştin yên ku min di şîrketên Amerîkayê de bihîstibûn, dihatin kirin. Eger ew kesên ku behsa wan dihat kirin karmend bûna, min dizanibû ku ew tenê meseleya demê ye berî ku ew ji kar werin avêtin an jî neçar bimînin ku bi serê xwe derkevin. Pir caran, bi wan kesên ku min ji xwe re digot weke kesên nerm diaxivîn lê xapînok bûn, dihatin guhertin. Gelek ji wan kesên nû dihatin weke ku dişemitîn ber bi rêveberiyê ve an jî pozîsyonên din ên girîng. Wisa xuya dibû, weke ku pastorê min ji hevaltiya kesên xwedayî bêtir ji hevaltiya van kesan kêf distend. Ew bi gotinên wan ên bêrûmet û gotinên wan ên xav dikeniya lêbelê di hebûna bawermendên dilsoz de bêxem û bêbal xuya dikir. Li ber van tevgerên wî ez şaş mam û di demeke kin de ez bûm kesekî rexnegirên van tevgeran.

Hin nelihevhatinên din jî hebûn û ez li ser wan hûr bûm. Ew xizmeteke navneteweyî bû ku li nav Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê xwedî xuyaniyeke girîng bû. Hemû bernameyên ji bo domandina xebatê hewceya wan bi gelek hêza mirovan û pereyan hebû. Em xwediyê zêdetirî 250 karmendan û teknolojiya herî pêşketî bûn. Şêwirmend hatin girtin ji bo ku bernameyên heyî bêtir fonan berhev bikin û ramanên nûjen derxînin holê. Ez berpirsiyarê mêvandariya wan bûm. Dema ku ez bi tenê li şîrketa wan bûm, min derbarê hevpeyvînên wan yên ku bi pastorê min re nîqaş dikirin, gelek tişt bihîstin. Min ev tişt ji xwe dipirsîn: “Ma ev şîrketeke karê ye an jî ya xizmetekê ye? Min çiqas gelek tişt dibihîstin ez ewqas bêtir difikirîm. Ev tiştekî xapînok bû. Ma ev mirov bi rastî bi mirovên xwe re eleqedar dibin, an jî ew tenê ji bo pereyan di nava vî karî de ne? Çima pastorê min van kesan li dora xwe dide hev?”

Di seran serê vê demê de, hevalên ku bi qasî min bi rexnegirî tevdigeriyan hebûn. Tê bîra min ku me li mala jin û mêrekî şîv dixwar. Me herdu aliyan jî rasterast ji pastor û jina wî re rapor amade dikirin. Me behsa wê yekê kir ku em êdî ji xizmetê bereketê

wernagirin. Tînim bîra xwe ku min got: “Min di şeş mehên dawî de ji tiştên ku li ser kursiyê hatine hînkirin tiştek ji wan nestendiye.” Ji bilî jina min ku bêdeng ma, em hemû di heman fikrê de bûn.

Hevoka “Êdî em jê xwedî nabin” di navbera me de gelek caran dubare bû. Em di heman fikrê de bûn ku dema me ya di vê xizmetê de ber bi dawiyê ve diçe. Di seran serê vê axaftinê de, me xwe pir giyanî hîs kir û me bawer kir ku Xweda amadekariya şandina me ya ji bo xizmeta ku ji bo me destnîşan kiriye, dike. Me hesteke jixwebaweriyê pêş xist ku rojên me di xizmetê de qediyane û em li ber terfîkirinê ne.

## PIRSGIRÊK DI MIN DE BÛ

Çend roj şûnde gava ku min dua dikirin, Xweda bi dilovaniya xwe, mijara ku me li mala wan jin û mêrî nîqaş kiribû, anî bîra min. Hevoka “Em jê xwedî nabin” bi taybetî ne ji bo wê êvarê bû, min di şeş mehên borî de di dema xizmetên baweriyê de gelek caran ji jina xwe re gotibû, dema ku min guhdariya dersên pastorê me dikir. Ji ber ez jê xwedî nedibûm gava li ser birçîbûna xwe ya wê demê difikirîm, Giyanê Pîroz bi tundî ji min re wisa got: Pirsgirêk ne di pastorê te de ye. Pirsgirêk di te de ye!

Ez matmayî mabûm û min ji tiştên dibihîstin bawer nekirin: Gelo Xweda wê ev yek ji min re bigota? Gelek caran, dema ku min di demên berê de ev cure şermezarî tecrube dikirin, ji bo demekê ez dudilî dimam û ji rastbûna tiştên ku min dibihîstin re min meydan li wan dixwend. Hişê min didarizand. Xwedayê min, ma tu piştrast î ku tu bi kesê rast re diaxivî? (Her ku mirov digihîje, divê ev darizandin kêmtir bibin ji ber ku em fêhm dikin ku em bi rastî çiqasî hindik dizanin û em hîn çiqasî mezin dibin.)

Min bi dengekî bilind pirsî: “Pirsgirêk çima di min de ye?”

Reb wisa bersiv da: “Tu kêmasiya xwedîkirinê hîn jî tîne rojevê.” Di Pirtûka Îşaya de wisa dibêje: “Heke hûn dilxwaz û guhdar bin,

Hûnê berê herî baş ê welêt bixwin. Lê hûn nexwazin û serî rakin, Wê şûr we bixwe û biqedîne" (Îşaya 1:19-20).

Min bi van ayetan baş dizanîbû û min wisa îtîraz kir: "Min guh da gotinê."

Lê Giyanê Pîroz bersiv da: "Tu her tiştê ku di vê xizmetê de ji te re tê gotin tu îteatê jê re dike lê min negot: 'Eger tu guh bide gotinê, tu yê berhemên herî baş yên vî welatî bixwî.' Min got: 'Eger tu daxwazkar û guh bide gotinê...' û daxwazkarî bi helwesta şexs ve girêdayiye. Lê helwesta te pir xerab e!"

Piştre gava ez li lîseyê bûm, hîn berî ku ez bawer bikim, rêzefîlmê ku êvara çarşembê min gelekî jê hez dikir, Dedektîf Barretta anî bîra min. Roja pêncşembê roja danhevkirina çopê bû û qemyona çopê serê sibehê pir zû dihat. Divê çop ji şeva borî ve bihatana derxistin û ji ber ku di malbatê de ez zarokek bi tenê bûm, ev berpirsiyariya min bû. Her hefte, di cihê herî bikelecan a rêzefîlmê de ango kêliya ku Dedektîf Barretta agahdariya girîng ji bo çareserkirina dozê bi dest dixist, dêya min dihat û dipirsî: "Kurê min, te çop derxist?"

Bersiva min her dem ev bû: "Na, hîn min dernexistiye."

Dêya min digot: "Ez aniha dixwazim tu rabî ser xwe û derxîne."

Min digot: "Temam dayê." û min bersiv didayê û ez radibûm min kar dikir.

Eger kesekî ji derve ve ev tevgera min bidîta, dibe ku ew bifikiriya bê ez çiqasî li gotina dêya xwe guhdar dikim û dibe ku ev fikra wî rast be û di heman demê de wê bifikiriya ku ez çiqasî daxwazkar im. Lê dîsa jî giliyekî tûj di hundirê min de radibû: "Çawa çêdibe û ez naxwazim bawer bikim ku her roja çarşembê tam di nîvê rêzefîlmê ku ez pir jê hez dikim, ev ji min tê xwestin. Çima ew nikare deh deqeyan li bendê bimîne heta ku rêzefîlm biqede?"

Giyanê Pîroz wisa got: "Tu yekî bi ya gotinê dikir, heta tu wisa xuyadikir ku tu daxwazkar bû lê tu ne wisa bû. Helwesta te ya li hemberî dêya te xelet bû. Sedema ku tu di vê dêrê de nikare jê bê

xwedîkirin (tu bi xwarinên baş yên Qraltiya Min têr nedibûyî) ev e ku tu guh dide gotinê lê tu ne daxwazkar e!

Min dît ku helwesta min a li hemberî pastorê min, ez birime ber bi rewşeke ku ez ji bereketa Xweda bêpar hiştime û ber bi cihekî xeternak ve çûme. Ayeta Îbranî 13:17 bi van gotinan bi dawî dibe: “An na, wê ji bo we bê kêr be.”

Çavên min vebûn. Min di cih de tobe kir. Yekşema din, ez çûm heman dêrê, li ser heman kursiyê rûniştim û min guh da heman rêze-hînkirinên heman pastorî. Lê wê sibehê, weke ku her tişt cuda xuya dikir. Ezman vebûn û ez bi wehiya ku Xweda bi rêya hînkirina pastorê min dabû min matmayî mam. Hema bêje ez di nava hêsiran de li wir rûniştim û li hemberî rayedariya ku Xweda ez xistibûm bin, ji ber helwesta min a xirab min meraq kir bê min di nav şeş mehên derbas bûn de çi winda kiriye. Di şeş mehên borî de ji ber helwesta min a rexnegir û bê xwestek a li hemberî pastorê min û li hemberî awayê ku tişt di dêrê de dihatin kirin, kar ji bo min baş neçûn serî.

Dema em bi rêberên ku xwedî rayedariya hatiye dewirkirin ve girêdayî man, em li hemberî rayedariya Xweda li ber xwe didin, ji ber ku ew ji hêla Wî ve hatine tayînkirin! Xweda, dixwaze ku em bikaribin bi rêya kesên ku wî tayîn kirine, bi azadî kêfê jê bistînin û beşdarî şîva ku Wî ji bo me amade kiriye, bibin.

Guhdarîkirin, li hemberî rayedariyê bi *çalakiyên* me kirine re girêdayîne. Pêvegirêdan jî bi *helwesta* me ya li hemberî rayedariyê ve têkildar e. Ev xala ku gelek ji me ji nedîtî ve dibînin. Xweda hem li kirinên me yên derveyî û hem jî li helwestên veşartî yên dilê me dinêre. Dema ku Dawid textê xwe dewrî kurê xwe Silêman kir, ev gotin jê re gotin: “Silêmano! Ya kurê min! Xwedayê bavê xwe nas bike. Bi yek dilî û canê bibiryar xulamiya wî bike. Çimkî Xudan lêkolîna tevahiya dilan dike. Hemû niyet û fikran fêm dike” (Dîrok I, 28:9)

Ji ber vê yekê, nivîskarê Nameyên Îbraniyan ne tenê li ser ku

em guhdariya rêberên xwe bikin, sekiniye; di heman demê de dixwaze em bi wan ve girêdayîbin jî. Dema ku Pawlos got: “Bila her kes di bin rêveberiya sereke de be.” helwesteke ku dixwaze guhdarîkirinê bike bi destê vê girt.

## HELWESTA KU PÊVE GIRÊDAYIYE LÊ NE GUHDAR E

Werin em gotinên nivîskarê Îbranî ji wergereke din lê binêrin: “Guh bidin rêberên xwe û xwe radestî rayedariya wan bikin” (13:17). Me dît ku em dikarin guhdar bin lêbelê dîsa jî me dît ku em dikarin pêve ne girêdayîbin. Lêbelê berevajî vê jî rast e. Em dikarin di helwestê de pêve girêdayîbin lê neguhdar bin. Nimûneyeke baş a vê yekê şibandina Îsa ya li ser her du kuran e ku em di beşa 3yan de li ser sekinîn. Yek ji wan kuran helwesteke wî ya daxwazker hebû: “Dibe ezbenî, ez ê biçim û di nav rez de bixebitim.” Lê wî guh neda gotina bavê xwe. Îsa, her çiqasî helwesta vî kurî baş dîtibe û daxwaza wî ji hêla rewşenbîrî ve pejirandibe jî, eşkere kir ku daxwaza bavê xwe bi cih neaniye.

Îro roj di dêran de rewş bi gelemperî wisa ye. Niyetên me yên baş hene, em serê xwe dihejînin, em dikenin û em bi rayedarên xwe re li hev dikin. Em dibêjin: “Ez ê bikim!” Lê piştre em nakin ji ber ku ji bo me ne girîng e. Ez hez dikim ku vê weke serhildana nerm bi nav bikim. Neyên xapandin: Serhildana nerm jî bi qasî serhildana ku eşkere tê kirin, kujer e. Her du jî di Qraltiya Xweda de nayên rûmetkirin.

Di pirtûka Peyxamê ya Îsa de, gotinên Wî yên diperçiqînin vê yekê rast derdixîne. Wî her dêrek bi gotinên “Ez bi kirinên we dizanim” silav kir (Peyxam 2-3). Niyetên dêran yên baş hebûn û yeka ji wan weke ku dijî bi nav û deng bibû lêbelê Îsa got ku ew mirî ne ji ber ku ew di kirinên xwe de ne îteatkar in. Ji bîr nekin, ew Xweda ye ku “wê li gorî kirinên her kesî bide” (Romayî 2:6). Niyetên baş wê di hizûra Xweda de li ser lingan bisekine. Tenê baweriya rastîn ku bi kirinên îteatkar ve tê îspat kirin, wê li ser lingan bimîne.

## EM XÊZÊ LI KUDERÊ DIKIŞÎNIN?

Werin em fermana Xweda bi bîr bînin: “Guh bidin rêberên xwe û bi wan ve girêdayîbin.” Weke ku min berê jî behs kir, mirov pirî caran bi hemû samîmiyeta xwe vê dipirsin: “Em xêzê li kuderê dikişînin? Xweda, çi ji me dixwazin bila bixwazin, ma li benda me ye ku em îteatkariyê ji rayedaran re bikin? An ji min re bibêjin ku ez tiştekî ku guneh e bikim?” Pirtûka Pîroz, bê şert û merc hîn dike ku mirov bi rayedaran ve girêdayî bin lêbelê bê şert û merc guhdarîkirinê hîn nake. Eger bê bîra we, pêvegirêdan bi helwestê ve têkildar e lê guhdarîkirin li ser kirina tiştê ku ji me re tê gotin e.

Dema ku tenê divê em îteatkariyê ji rayedaran re nekin -û tekane îstîsnaya ku divê em îteatkariyê nekin ez dixwazim li ser wê bisekinim- ew dem e ku ew ji me re dibêjin ku em tiştekî bikin ku rasterast li dijî Gotina Xweda ye. Bi gotineke din, em tenê azad in ku guh bidin rêberan dema ku ew ji me re dibêjin ku em gunehê bikin. Lêbelê, di rewşên wisa de jî, divê em helwesteke dilnizmî û teslîmbûnê biparêzin.

Qralê Babîlê Nebûxadnessar, bêrehm bû, gelek Îsraêlî kuştin û welatê wan wêran kir. Lê dîsa jî, Xweda jê re got “xulamê min” (Yêremya 25:9; 27:5-7) û bi vî awayî ji nû ve piştrast kir ku yê rayedariyê dide mirovan Ew e. Vî qralî hinek ji gelê Xweda dîl girtin û anîn Babîlê. Di nava wan de xortên weke Daniyêl, Şedrak, Meşak û Abed-Nego jî hebûn.

Nebukadnezar fermanek derxist ku hemû kesên di bin desthilatdariya wî de ne, gava dengê amûra muzîkê bihîstin peykerê wî yê zêrîn bihebînin. Ji bo kesên ku guh nedin fermana wî cezayekî pir zor hebû: Wê ew bavêtina nava firineke sorkirî. Xortên Cihû ji firinê bêtir ji Xweda ditirsiyan û ji vê fermanê re îteat nekirin, ji ber ku ev yek binpêkirina rasterast a fermana duyemîn a Xweda ya bi rêya Mûsa bû. Wan ji bo ji fermana Xweda re îteatê bikin, li ber fermana mirovan bêîteatî kirin.

Tenê meseleya demê bû berî ku bêîtaetiya wan bala Qral Nebûkadnezar bikişîne. Ew li Şedrak, Meşak û Abed-Nego hêrs bû û ji bo wan bidarizîne ew anîn ber lingê xwe. Li bersiva xortan guhdarî bikin: "Ya Nebûxadnessar, hewce nake ku em di vê mijarê de bersiva te bidin. Me bavêjin tenûra sincirî jî, Xwedayê ku em jê re xizmetê dikin dikare me ji wê tenûrê rizgar bike. Ya padîşah! Wê me ji destê te jî rizgar bike. Ew me rizgar neke jî, tu bizanibe ku ya padîşah, emê ji îlahên te re xulamiyê nekin û neperizin peykerê zêrîn ê ku te daniye" (Daniyêl 3:16-18).

Ew bi israr li gorî fermana Xweda saxlem sekinîn lêbelê dîsa jî bi rêzdarî bi qral re axivîn. Wan jê re got "Ey Qral" lê bi gotina "Ey pîsê heram, em ê tu carî tiştê ku tu dibêjî nekin" bersiv nedan. Bêrêziyeke wisa wê bibe kiryareke serîhildanê. Divê em bi rayedaran ve girêdayîbin, her çiqasî ev tê wateya bêîteatiya li ber fermanên wan jî.

Di talîmatên Petrûs dane jinan de em dibînin ku ev derdikevin holê: "Jinno, bi vî awayî hûn jî bi ya mêrê xwe bikin. Wisa ku, eger hinek ji wan bi peyva Xwedê baweriyê neynin jî, gava ew jiyana we ya hurmetkar û şîrhelal bibînin, bê gotin bi jiyana jina xwe bên qezenckirin" (Petrûs I, 3:1-2). Jinek divê bi mêrê xwe re girêdayî be (Tîtos 2:5) û divê mêrê xwe bi helwesta îteatkar re bi rûmet bike. Petrûs careke din di navbera tevger û girêdayînê de hevsengî xêz kir. Piştî van, jiyaneke paqij a li ser bingeha tirsa Xweda tê. Jinek tê şîretkirin ku helwesteke rêzdar li ber meqamê rayedariya mêrê xwe biparêze, her çiqasî ew ne bawermend be jî. Eger were ceribandin ku gunehê bike, ne hewce ye ku bê şert û merc guhdariyê bike, lêbelê ew tê gazîkirin ku bê şert û merc pêve girêdayî be û bang lê hatiye kirin ku meqamê rayedariyê bi rûmet bike.

Nimûneyeke gengaz, dibe ku jineke bawermend be ya ku bersiva telefonê dide; mêrê wê naxwaze bi kesê ku telefon dike re biaxive û ji jina xwe re dibêje: "Jê re bêje ez ne li vir im."

Li ber xwestekeke wisa bersiva herî maqûl wê ev be: “Ezîzê min, ez ê derewan nekim. Tu dixwazî ez jê re bibêjim ku aniha ne amade yî û wê piştre dîsa telefonî te bike an jî ez ê bêjim ku niha naxwazî biaxivî?” Di rewşeke wisa de jin li ber helwesta rayedariyê rêzgiritina xwe nîşan dide lêbelê derewkirina ku jê te xwestin bi cih nayîne.

Petrûs wisa berdewam dike:

> “Bila xemla we ne bi tiştên berbiçav, bi honandina porê xwe, bi wergirtina zêran û cilên spehî li xwe kirin be. Lê bila xemla we ya ku xera nabe, bi heyina we ya veşartî, bi ruhê we yê rihet û nermê ku li ba Xwedê pirr hêja ye be. Çimkî di demên berê de jî, jinên pîroz ên ku hêviya xwe bi Xwedê ve girêdabûn, bi qebûlkirina desthilatiya mêrên xwe, weha xwe dixemilandin. Bi vî awayî Sarayê bi ya Birahîm kir û jê re got: «Mîrzayê min.» Eger hûn jî qenciyê bikin û ji tu tiştî nebizdin, hûn keçên wê ne.” (Petrûs I, 3:3-6)

Rêzgirtina Sarayê, di îtaet û rêzgirtina wê de ya ji bo Birahîm ku ew weke efendiyê xwe dipejirand, diyar bû. Îfadeya wê ya “efendî” helwesta wê ya pêvegirêdanê nîşan dida û îtaet berxwedana wê ya li hember gefan nîşan dida. Tirs suxrevanekî ne dilşewat e. Tirs şûjinan di mirov de radike ku “Di mijara ez bi mêrê xwe an jî bi rayedariyeke din ve girêdayî bin, li Xweda ne bawer im. Divê ez xwe biparêzim!” Divê em ji bîr nekin kesê ku dibêje pêvegirêdayî bin ne mirovekî meraqdarê hêzê ye, Xweda ye. Dema ku em guhdariya Wî dikin, parastina Wî li ser me ye.

## JIRÊDERXISTINA FERMANÊ

Ez xemgîn dibim dema ku ez çîrokên jinên ku bê şert û merc fermana pêvegirêdanê li ser wan ferz dibe û vê ya bi awayê ku guhdarîkirina bê şert û merc wan dorpêç dike, dibihîzim. Min bihîst ku ew mêrên “bawermend” ên devjêber in ku jinên xwe neçar

dikin ku ji bo heyecana zayendî fîlimên pornoyê temaşe bikin û ku jin serî li vê daxwazê didin ji ber ku ew difikirin ku ew nikarin ji Pirtûka Pîroz alîkariyê bistînin. Ez mêrên ku ji jinên xwe dixwazin ku derewan bikin û jinên ku li gorî vê dimeşin, nas dikim. Min mêrên ku perestîşa dêrê li jinên xwe qedexe dikin, bihîstine û van jinan dev ji tevlîbûna dêrê berdan. Divê îteat ji van talîmatên wisa re neyê kirin ji ber ku ew Nivîsên Pîroz binpê dikin.

Werin em hîn bêtir pê de biçin. Ez bi bûyerên ku mêran li zarok an jî jinên xwe xistine û jinan ev îstîsmara wan veşartine, dizanim. Di rewşên din de, zarok rastî îstîsmara cinsî hatine û jinan tiştek nekirine. Ev, binpêkirineke her prensîba ku Xweda li ser wan rayedaran ava kiriye û divê jin bizanin ku Xweda di rewşên wisa de qet ji wan naxwaze ku bisekinin û tiştekî nekin. Eger mêrek bikeve tevgerên ku jiyanê tehdît dikin, divê jin xwe û zarokên xwe ji wî dûr bixe û heta ku ew ji tobeya wî piştrast nebe, venegere.

Heta Dawidê ku şervan û zilamekî bihêz bû, dema ku Şawûl rimê xwe avêt wî, li dora qesrê nema. Ew dûr ket û li çolan jiya lêbelê wî qet rêzgirtina xwe ji bo desthilatdariya Şawûl winda nekir. Dilsoziya Dawid ji bo rayedariya Şawûl qet bi dawî nekir lêbelê ew ji hizûra Şawûl reviya û li benda tobeya rastîn an jî darizandina adil a Xweda ma.

## XWEDA KESÊN KU BI YA FERMANA GUNEHÊ NAKIN BI BEREKET DIKE

Hin rewşên din jî hene yên ku ji rayedariyê re bêîteatiyê dikin. Fîrewn ji pîrikên Îbraniyan re ferman kir ku her kurikê ku jinên Îbraniyan welidandin, wan bikujin. “Lê pîrik ji Xwedê ditirsiyan, wan li gorî emrê Padîşahê Misrê nekir. Zarokên kur sax hiştin” (Derketin 1:17). Xweda ji vê kirina wan pir kêfxweş bû ku di Pirtûka Pîroz de wisa dibêje: “Ji ber ku pîrik ji Xwedê ditirsiyan, Xwedê ew kirin xweyî mal û malbat” (Ayet 21). REB, ji ber ku bi ya fermana gunehkirina qral nekirin, ew xelat kirin.

Lijneya Bilind, li xwendekaran ferman kir ku “navên Îsa qet bi bîr neynin, wî navî bi kar neynin û tu tiştî hîn nekin.” Lê Petrûs û Yûhenna wisa bersiv dan: “Gazî wan kirin û li wan emir kirin ku êdî bi navê Îsa qet nepeyivin û kesî hîn nekin. Lê Petrûs û Yûhenna bersîva wan dan û gotin: Ma li ber Xwedê kîjan rast e? Em guhê xwe bidin we, an bidin Xwedê? Hûn bêjin. Çimkî em nikarin tiştên ku me dîtine û bihîstine nebêjin” (Karên Şandiyan 4:18-20). Îsa li wan ferman kir û got: “Herin her çar aliyên dinyayê û Mizgîniyê li hemû afirînê bidin bihîstin” (Marqos 16:15). Îcar çawa dikarîbûn îteatê ji van rêberan re bikin? Nikarîbûn bikin! Lijneya Bilind, ji xwendekarên Îsa xwestibû ku ew li ber fermana Îsa derkevin, ji ber vê bi rêzdarî red kirin. Di Nivîsên Pîroz de, bê wê biryara wan çi encam derxistiye holê, wisa diyar dikê. “Şandiyan bi hêzeke mezin şahidiya vejîna Xudan Îsa didan û keremeke mezin li ser wan hemûyan bû” (Karên Şandiyan 4:33). Xweda bi tirsa xwe re bereketeke mezin ava kir û hêz anî.

Dîsa jî, em helwesta şagirtan a li hemberî rêzgirtin an jî girêdana bi rayedaran ve, di bersiva Pawlos a ji bo heman Lijneya Bilind de dibînin. Dema ku ew anîn ber Lijneya Bilind, gotinên wî yên pêşîn ên parastinê ev bûn: “Ez heta îro li ber Xwedê bi wijdanek paqij jiyam” (Karên Şandiyan 23:1). Dema ku Serkahîn Hananya ev gotin bihîstin, ferman da yên ku li kêleka Pawlos bûn ku li devê wî bidin. Li ser vê fermanê Pawlos wisa bersiv da: “Ey dîwarê spîkirî, Xwedê wê li te bide!” Piştre em wisa dixwînin: “Yên ku nêzîkî wî bûn gotin: Ma tu Serokkahînê Xwedê nizim dikî? Pawlos got: Birano, min nizanibû ku ew Serokkahîn e; çimkî hatiye nivîsîn: Tiştekî xerab ji serokê gelê xwe re nebêje” (Karên Şandiyan 23:4-5).

Piştî Pawlos hîn bû ku Hananya kesekî xwedî rayedar e, ji helwest û gotinên xwe tobe kir. Şandiyan guh nedan fermanên ku bi Nivîsên Pîroz re nakok bûn lê wan helwesteke pêvegirêdayî nîşan dan, ji ber ku wan dizanibû ku “rêveberiyek ne ji Xweda be tuneye. Yên hene ji aliyê Xweda ve têne damezrandin.”

## BIRYARA DANIYÊL YA JI BO BI YA QANÛNEKE BILINDTIR BIKE

Di dema Daniyêl de, qanûnek hat derxistin ku digot her kesê ku ji bilî qral ji xwedayekî an jî ji mirovekî din re duayan bike, wê wî kesî bavêjin nava koncala şêran. Waliyên hesûd ev qanûn derxistin ji bo ku Daniyêl tune bikin. Rêvebirên dejenere bûne, Qral Darius xapandin ji bo ku vê qanûnê îmze bike. Lê Daniyal red kir ku guh bide vê qanûnê, wî îteata ji bo Xweda hilbijart. Ew bi biryara nivîskarê Zebûrê re girêdayî ma: "Bi şev, bi roj û êvarê ji kedera xwe dinalim, Ew dibihîze dengê min" (Zebûr 55:17).

Em binêrin bê Daniyêl çi kiriye: "Gava Daniyêl hîn bû ku ferman hatiye morkirin, ew çû malê û tevî ku pencereyên odeya wê ya jorîn ber bi aliyê Orşelîmê ve vekirî bûn, wî çawa ku wî her roj dikir, kir. Wî sê caran çok dida, dua dikir û pesnê Xwedayê xwe dida" (Daniyêl 6:10)

Dema bihîstin ku Daniyêl guh nedaye qanûna qral, qral neçar ma ku wî bavêje nava şêran. Lê dîsa jî, li ber neheqiyê helwesta Daniyêl neguherî. Xweda ew rizgar kir û devê şêrên birçî girt. Dema ku qral ev yek dît, wî ew zilamên ku Daniyêl bi derewan tawanbar kiribûn, avêtin nava koncala şêran.

## ENCAM HER DEM BAŞ ÇÊNABE

Xweda ev tiştên pîroz xelas kirin lê rewş her dem ne wisa ye. Em di Nameya Îbraniyan de wisa dixwînin:

> "Jinan, miriyên xwe bi vejînê bi şûn ve standin. Hinekan îşkence kişandin, lê azadî red kirin, da ku ji mirinê rabin û bigihîjin jiyaneke hê çêtir. Hinekên din bi tinaz û qamçiyan, erê heta bi girêdan û zîndanê hatin ceribandin. Hatin kevirkirin, bi birrekê hatin birrîn, ketin ber devê şûr û hatin kuştin. Bi postê miyan, bi çermê bizinan geriyan; belengazî kişandin, tengahî dîtin, xerabî li wan hat kirin. Dinya ne hêjayî

> wan bû; li çolan û li çiyayan, di şkeftan û di kunên bin erdê de eware geriyan.” (Îbranî 11:35-38)

Van jin û mêran ji rêberan miameleya zordar û bêedalet dîtin. Tertullianê ku di dêra pêşî de mamostetî kiriye û di nava salên 140-230 PZê de jiyaye, diyar dike ku zilm û zora ku li rêvebirên Romayiyan bûye, tenê bîrdoziya Xirîstiyaniyê hîn bêtir bi hêz kiriye: “Hûn çiqasî me serjê bikin wê hejmara me ewqasî zêde bibe. Xwîna Xirîstiyaniyan bizir e” (Apology, Beş 50).

Destûrê bidin ez gotinên Romayiyekî ku nasnameya wî ne diyar e ku zilm û zora li bawermendan hatiye kirin, ragihînim:

> Ew tenê weke mêvan li welatên xwe dijîn. Ew bi beden hene lê ew li gorî bedenê najîn. Ew rojên xwe li ser rûyê erdê derbas dikin lê ew welatiyên bihuştê ne. Ew guh didin qanûnên nivîskî û di heman demê de bi jiyana xwe ji wan derbas dibin. Yên ku ji wan nefret dikin, nikarin ji bo nefreta xwe tu sedemekê nîşan bidin. (Name ji bo Diognetus, Beş 5)

Wan guhdar kir û dilsoz man lêbelê bi reftarên rêzdarî an jî yên bi wan ve girêdayî tenê ji îtaetê wêdetir çûn. Dîsa, weke ku me di teşwîqa Petrûs de dît, reftarên van bawermendan yên li hemberî rayedarên bêedalet, ew şaş hiştin û hiştin ku hin ji wan ji Reb re bin.

## QADA GEWR TUNEYE

Rayedarî çi ya dewletê be, çi ya malbatê be, çi ya dêrê be an jî çi ya civakî be, Xweda ji me hêvî dike ku em helwesteke teslîm û rêzdar biparêzin û divê em guh bidinê heya ku ji me re neyê gotin ku em tiştekî bi eşkere gunehkar di Nivîsên Pîroz de bikin. Destûrê bidin ez li ser îfadeya wî bisekinim. Di rewşên ku hatine diyarkirin de, înkarkirina bawermendan ya li hemberî Mesîh, kuştin, hebandina wan ya ji bo xwedayên sexte an jî hilweşandina rasterast

ya fermaneke Îsa ku li wan tê fermankirin, îteat nekirin. Ev ne deverên gewr an jî biryarên darizandinê bûn.

Nimûneyek ji xaleke gewr ku min ji xizmetkarên dêrê yên bi meaş dixebitin bihîstiye ev e: “Pastorê min ji min re got ku di nava seatên kar de şîretan li kesî nekim an jî ji bo mirovan duayan nekim lê ev ne hezkirina Xweda ye û mirov di hezkirinê de nemeşe guneh e, ji ber vê yekê divê ez vê bikim.” Ev, îfadeyeke dadê ye ku ji kesên di bin rayedariyê de tê. Ev şîrovekirina wan a şexsî ye. Pastor ji wan naxwaze ku Gotina Xweda binpê bikin. Bi ser halan de, ne ji bo duakirinê, ew ji bo nivîsandin, dosyakirin, hilberandina daneyan, an jî hin celeb karên din pereyan distînin.

Ya rastî kesên wisa wê di dawiyê de ji bo ku ne girêdayîne, ber bi diziyê ve diçin. Eger bi rastî dilê wan hebe ku ji bo yên din duayan bikin, divê ew ji pastor destûrê bixwazin ku di dema xwe ya vala de an jî li derveyî demjimêrên kar gazî kesên ku hewcedariya wan bi duayan heye, bikin. Eger pastor hîn jî ji vê ramanê nerazî be, dibe ku ew hîs bike ku karmend bi rêkûpêk nehatine perwerdekirin ji bo ku şîretan li kesên ku ji bo alîkariyê li xizmetên wî digerin. Eger pastor bi vê siyasetê biryareke xerab dabe, ew ê li ber Xweda hesab bide, lêbelê ev ne darizandineke li dijî kesên di bin rewşa rayedariya wî de ne. Ev di nava bi sedan de tenê nimûneyek e, lêbelê eslê wê eynî dimîne: divê em tenê dema ku binpêkirineke eşkere ya Gotina nivîskî ya Xweda hebe, dev ji bêîteatiya li rayedariyê berdin.

Dibe ku hûn hîn jî vê pirsê bipirsin: “Baş e eger rayedarên di jiyana min de ji min re bibêjin ku ez tiştekî ku ez pê ne razî me, bikim wê çi bibe? An jî eger rayedar ji min re bibêjin ku ez tiştekî bêaqil bikim çi dibe? An jî eger rayedar ji min re bibêjin ku ez tam berevajî tiştê ku dua nîşanî min dikin, bikim çi dibe?” Di beşa bê de, ez ê bersivên van pirsan ji Pirtûka Pîroz bidim.

BEŞ 12

# AN RAYEDAR JI MIN ... BIPIRSIN?

*Tişta em li dû ne ew e ku em di mijara rayedariyê de wehiyê bistînin û ev, wehiyeke ji aliyê Xweda ve ye, ji ber ku Ew û rayedariya Wî ji hev nikarin bên veqetandin.*

Em hemû, rastî mirovên ku ji rêberên xwe nerazî ne hatine. Ew ji teknîkên wan ên bêbandor an jî ji biryarên xwe yên neaqilane û bandoreke neyînî bê çawa li ser jiyana wan kiriye, gilî û gazinan dikin. Ew dibêjin ku rêberên wan soz dane wan lêbelê ew hîn jî li benda bicîhanîna wan sozan in. Ya rastî, xuya ye ku kar berepaş ve diçin. Ew piştrast in ku pastorê wan vê yekê nabîne û niha ew difikirin ku rayedariya wî ji ya Xweda cuda ye. Ev hişmendî û gilî û gazin di dawiyê de kesekî ber bi helwesta ku ji pastorê xwe qut bibin, dibe. Tenê meseleyeke demê ye berî ku ew bi xapandinê re flortê bikin û rayedariya ku Xweda ji bo mezinbûn û parastina wan li ser wan daniye, berdin.

## GAVA HÛN TUNEBÛN EM BAŞTIR BÛN!

Îsraêlî jî ketin nava vê çerxê. Serdemeke wan çêbû ku wan rêbertiya Mûsa weke bêbandor û heta ji bo xwe bi zerar dîtin. Lêbelê, meseleyê bi vî rengî dest pê nekir. Dema ku Mûsa piştî serpêhatiya xwe ya beyebanê vegeriya Misrê, berî ku bi Fîrewn re hev bibînin, bi mezinên Îsraêlê re li hev civiyan. Wî rave kir ku REB ew şandiye “ku wan ji destê Misriyan rizgar bikim.” û ji bo “ku wan ji wî welatî derînim û bişînim wî welatê xweş û fireh ê ku şîr û hingiv jê diherike” (Derketin 3:8). Dema ku wan ev nûçeya xweş bihîst, wan baweriya xwe bi Mûsa anî û Xweda hebandin. Dema ku wan li rêberê ku Xweda ji wan re tayîn kiriye ji bo ku wan ji dîlgirtinê derxîne, nihêrîn; kêfxweşiyeke mezin di nava wan de hebû.

Mûsa piştî vê hevdîtinê çû cem Fîrewn û peyama ku Xweda li çiya da wî rasterast ragihand: “Xwedayê Îsraêl Xudan wiha dibêje: ‘Gelê min berde. Bila li beriyê ji min re cejnê bike” (Derketin 5:1).

Fîrewn wisa bersiv da: “Ma Xudan kî ye ku ez guhdariya dengê wî bikim û gelê Îsraêl berdim? Ez Xudan nas nakim, gelê Îsraêl jî bernadim. Hûn çima xelkê ji karên wan dikin?” Bi vî awayî heman rojê Fîrewn barê karê wan girantir kir. Bi hêrsî talîmat dan suxreyan: “Barên wan girantir bikin. Ruhê wan derxînin!” (Ji ayetên 2-9an hatiye berhevkirin).

Ji bo hejmareke zêde ya çêkirina kerpîçên ku Îsraêliyan diviyabûn her roj çêkin, êdî wê ka nehata bidestxistin. Ew ê neçar bimana ku bi şev kayê berhev bikin û bi roj jî kerpîçan çêbikin. Her çiqasî ku êdî wê ka nehata dayîn jî, wê hejmara kerpîçan kêm nebûya.

Îsraêlî li seranserê welêt belav bûn ji bo kayê bi dest bixin. Suxre bêrehm bûn. Bi qamçiyên xwe bi tundî ferman dan: “Weke rojên ku ka peyda dibû, karên xwe yên rojane bi baldarî û bêkêmasî bikin.”

Li peywirdarên Îsraêlî yên ji xebatkaran berpirsyar, xistin. Ji wan pirsîn: “Çima duh û îro weke hejmarên berê ku divê kerpîç bihatana çêkirin, we nedane çêkirin?”

Li ser vê yekê peywirdarê Îsraêlî çûn cem Fîrewn û jê lava kirin. Xwe avêtin bextê wî û gotin: “Em rîca ji te dikin vê yekê bi me neke!” Gotin: “Çima kayê nadin me û dibêjin kerpîçan çêbikin? Ha vaye li evdên te didin lêbelê yên sûcdar gelê te bixwe ye!”

Lêbelê Fîrewn wisa bersiv da wan: “Hûn tiral in, tiral! Ji ber vê hûn dibêjin ‘Em herin ji REB re qurbanan serjê bikin.’ De rabin vegerin ser karê xwe. Wê tu kes kayê nede we, lê dîsa jî hûn ê bi qasî kerpîçên berê kerpîçan çêbikin.”

Gava dîtin ku Fîrewn ji fermana xwe venegeriya, peywirdarên Îsraêlî fêhm kirin ku serê wan di nava belayeke mezin de ye. Gava ji saraya Fîrewn vegeriyan, bi Mûsa û Harûnê ku li benda wan bûn, li hev rast hatin. “Bila Xudan a ku we kir bibîne û ceza bike! We em di çavê Fîrewn û peywirdarên wî de rezîl kirin. Ji bo ku me bikujin, we şûrek da destê wan” (Derketin 5:21).

Gelê Îsraêlê aniha ji rêbertiya Mûsa aciz bibû. Waz û talîmatên wî, ji wan re bibû acizî û zordarî. Ji REB xwestin ku wî ceze bike û destpêkirin ku rayedariya Mûsa ji ya Xweda cuda bikin.

Li gorî wan, ev xeletiya Mûsa bû. Eger wî ew bi halê wan bihiştana, wê Fîrewn ewqasî bi hovane tevnegeriya. Wan ferq nekir ku rêça bûyeran ne ji hêla rêberekî şaş an jî bêaqil ve, lê ji hêla Xweda bixwe ve hatiye bi rêvekirin. Bêyî plana orîjînal an jî pêşzanîna Xweda tu tişt çênebûye. REB ferman da Mûsa ku bi Fîrewn re biaxive. Û kesê ku Fîrewn serhişk dikir ne Şeytan û ne jî Mûsa bû, yê ku ev dikir Xweda bû! Weke ku em di gelek ayetan de dixwînin, “REB Fîrewn serhişk kir. Fîrewn nehişt ku Îsraêlî ji welatê wî derkevin.” (Derketin 11:10; her wisa binêrin: Derketin 9:12; 10:1, 20, 27). Her ku dilê Fîrewn hişk dibû, jiyana ji bo neviyên Birahîm her ku diçû xemgîntir dibû.

Piştî ku gelek êş û zehmetiyên ku kişandin, Îsraêlî ji Misrê rizgar bûn û derketin ser rêwîtiyeke li beyebaneke fireh û dirêj. Lêbelê gava ku çavkaniyên wan ên av û xwarinê kêm bûn, wan dîsa dest bi

pirsînê kirin: Ma Mûsa soza azadî û pirbûnê nedabû wan? "Erdekî fireh û berhemdar, welatekî ku şîr û hingiv tê de diherike." Erê, ew fireh bû lê ji berhemdariyê dûr bû û ne şîr û ne jî hingiv li ber çavan hebû! Ma fikra wî ya azadî û pirbûnê ev bû? Ma Mûsa bi rastî ji hêla Xweda ve hatibû şandin?

Piştî sê rojên tunebûnê, Mûsa wan bir cihekî bi navê Marayê, li wir wan av dît. Bê guman ew wisa fikirîn: "Temam, belkî jî her tişt baştir dibe." Lêbelê, wan zû kifş kir ku ew nikarin avê vexwin ji ber ku tal bû. Ji vê bawer nekirin û di nava gel de dengekî bêbaweriyê bilind bû. Gava ku wan li hev û li Mûsa nifir kirin, rexneyên wan tûjtir dibûn. Nerazîbûn bê kontrol belav bû, weke kanserê ku li seranserê civakê belav dibe. Belkî jî Mûsa bi tenê ku gel ji Misrê derxîne dizanîbû û zanebûna wî ya ku gel bibe welatê sozdayî tunebû.

Gel, dest pê kir û gilî û gazin li Mûsa û Harûn kirin: "Xwezî Xudan hê gava em li welatê Misrê bûn, em bikuştana! Qet nebe em li ber sîtilên goşt rûdiniştin û me têra xwe dixwar. Lê belê, we em anîn beriyê ku tevahiya civakê ji birçiya bikujin!" (Derketin 16:3)

Êdî ew ji ruhê xwe aciz bibûn. Eşkere bû ku jêhatiyên rêberiya Mûsa qels bûn. Berî ku ew rayedariyê têxê destê xwe ma jiyan ji bo wan ne çêtir bû? Tekane tiştê ku wan dizanibû, ji peyam û kiryarên wî yên li Misrê kiribûn ku ev ji ber stres û zordariyên mezin pêk dihat. Ma wê qet bi dawî nebûya? Ew ji zehmetiyekê xelas bûn lêbelê ketin nav zehmetiyeke din. Rêberê wan soza welatekî bi şîr û hingiv diherike da wan, lêbelê wan li beyebanê tenê axa hişkî ziwa, mar û dûpişk dîtin. Dibe ku Mûsa li derekê rêya xwe winda kiribe an jî dibe ku ew mirovekî xerab bû. Bi kêmanî di bin rêveberiya Fîrewn de xwarin û vexwarina wan hebû. Mûsa bi biryar bû ku îşkenceyê li wan bike û wan birçî bihêle. Jiyan li Misrê çêtir bû! Gilî û gazinên wan gihîştin wê astê ku wan ji hev re gotin: "Em ji bo xwe yekî bikin serek û vegerin Misrê" (Hejmartin 14:4).

Lê belê guh bidinê bê ka Mûsa çi ji gelê ku ji rêberê xwe yê ji

aliyê Xweda ve hatiye tayînkirin bêzar bûbûn re got: “Çimkî ya ku hûn li dijî wî dibêjin Xudan dibihîze. Ma em kî ne?” (Derketin 16:8).

Van mêr û jinan bawer dikir ku serhildana wan li dijî Mûsa ye û tu têkiliyeke vê serîhildanê bi Xweda re tune ye. Wan bawer dikir ku van herduyan bi serkeftî ji hev veqetandine. Ew bi aqil tevdigerin ne bi prensîba îtaetê. Ew kesên ku li gorî aqilê sînorkirî yê ku ji aliyê tiştên xuyakirî ve û ji aliyê şert û mercan ve hatine hilberandin tevdigerin, xwe di rêya bêaqiliyê de dibînin. Her çend kesên wisa di pêkanîna çarenûsa xwe de têk diçin jî, ew kesên ku rayedariyê nas dikin û îtaet dikin, weke Yeşû û Kalev digihêjin sozan.

## AN KU … JI HEV DERXÎNIM?

Dibe ku hûn xwe ji Îsraêliyan bêtir bi qedir û qiymet bibînin, yên ku rêberên xwe li gorî bandorên eşkere û yekser ên biryarên xwe dinirxînin. Dibe ku hûn xwe weke kesekî giyanî bibînin, mîna Yeşû. Dibe ku hûn bibêjin ku hûn ê mafdariya Mûsa ferq bikin û tu carî weke Îsraêliyan bersiv nedin; hûn ê bi Yeşû re li heman alî bin.

Ev dibe ku rast be lêbelê berî ku em texmînên wisa bikin, divê em baldar bin. Ferîsiyan bi israr wisa gotibûn: “Eger em di dema bav û kalên xwe de bijiyana, meyê bi wan re xwîna pêxemberan nerijanda” (Metta 23:30). Lêbelê ji wan re got ku ew bi bav û kalên xwe re xwediyê heman giyanî ne. Dema ku her tişt qediya û pirtûk hatin nivîsandin, her gav hêsan e ku mirov rastî û xeletiyan ji hev cuda bike. Tişta ku Yeşû ji xizmên wî cuda dikir ne hesta wî ya şexsî bû, lê helwesta wî ya naskirin û pêvgirêdana wî ya bi rayedariya rastîn re bû. Ji vê helwestê têgihîştina xwedayî derket holê.

Ez di dengê gelek kesan de, yên ku îdîa dikin ku sehekî ne lê ne xwedî dilên îteatkar in, di dengên wan de nerazîbûnê dibihîzim. Gava min ev pirtûk dinivîsand jî min nameyek wergirt ku tê de helwesteke “qabîliyeta ji hev cudakirinê” hebû û bi vê ramanê re jî fikra “heta ku ez di heman fikrê de bim, ez ê pêve girêdayî bim”

heye. Yên ku bi vî rengî difikirin, ji ber bawer dikin ku rêyeke wan a teqez ji pevgirêdana rastîn heye, dikevin xeteyê.

## KÊ EW ANÎ VÊ ASTÊ?

Dibe ku hûn wisa bipirsin: “An ku ez fêhm bikim ku rêberê min hilbijartineke pir baş nekiriye çi dibe? Gelo divê ez guh bidim wî, her çiqasî ez dizanim ku ew ber bi tiştê xelet ve diçe?” Dema ku ez li salên xwe yên xizmetê dinêrim, ez gelek caran tînim bîra xwe ku min ev bêhêvîbûn hîs kir: “Ew biryareke xerab didin! Ew di ser xwesteka Xweda re diqevizin! Di bin bandoreke neyênî de man. Ez nikarim teslîmî vê yekê bibim!” Pirî caran, dilê min ê xûz nebûye serxwebûna xwe nîşan da.

Ez salekê weke alîkarê îdarî yê pastorê xwe xebitîm û min xwe dît ku ez gelek biryaran didarizînim. Talîmatên wî berî ku ji berpirsyarên beşan re bên belavkirin, min talîmatên wî li ser maseya xwe dîtin. Gelek caran ez fikirîm ku biryarên wî neaqilane ne û min di dilê xwe de li dijî wî gilî û gazin kirin. Rojekê, Giyan bi min re peyivî û wisa got: “Pirseke min ji te re heye.”

Li gorî tecrubeyên min, gava ku Xweda pirsek kir, ji bo ku fikrên min yên xelet derxîne holê van pirsan dike. Min jî bersiv da û got, “Belê, Reb.”

Ma gelo min tu anî asta pastoriyê an min ew anî?

Min got: “Te ew anî asta pastoriyê.”

Reb di cih de got, “Ev rast e.” Ji ber vê, tiştên ku divê ez şanî te nekim, ez ê nîşanî wî bidim û weke ku min dişopîne û ji bo bibînim bê tu jî wî dişopînî an na, zanebûna li pişt biryarê veşartiye ez ê gelek caran ji te veşêrim.

Bi piranî piştî çend mehan, zanyariya di biryara pastor de eşkere dibû. Min ev didît, çira vediketin û min fêhm dikir ku ez careke din ji rêya bilindkirina biryara xwe ji ser prensîba îteatê dûr ketime. Ev yek di dêr, mal û kargehan de dibe sedema dabeşbûnê. Xweda

dilsoziya me ya ji bo rayedariyê bi demên ku me zanebûna wan didît, bi wan re li hev dikir, an jî ji tiştên ku wan ji me re digotin hez dikir, sînordar nedikir. Wî bi tenê got, “Guhdarî bikin!”

Piştre Reb bi dilê min re wisa axivî: “John, eger min bixwesta ku her bawermend hemû zanîn, zanyarî û rêberiya xwe tenê bi rêya dua û hevgirtina bi min re werbigire, wê demê min ê di dêrê de astên rayedariyê saz nekirina. Min di dêrê de rayedar bi cihkirine ji ber ku zarokên min nikarin her tiştê ku hewcedariya wan pê heye, tenê bi jiyana xwe ya duayan bi dest bixin. Divê ew jî fêr bibin ku dengê min bi rêya rêberên xwe nas bikin û bibihîzin.”

Ne berpirsiyariya me ye ku em li ser biryarên rêberan nîqaşan bikin an jî piştre encamên wan bidarizînin. Yê ku rayedarî daye wî, wê vê yekê bike. Eger destûr bida û bihişta ku Îsraêlî biryarên Mûsa bidarizînin, wê Mûsa weke kesê nayê xwestin bihata îlankirin û di dawiyê de wê vegeriyana Misrê.

Wê rêber bên darizandin û em ê jî bên darizandin. Wê rêber ji ber biryarên xwe bên darizandin û darizandina wan wê ji ya me girantir be. Ji ber vê Îsa wisa hişyarî da: “Ji kê re gelek hatibe dayîn, wê gelek ji wî bê xwestin û ji kê re gelek hatibe spartin, wê ji wî bêtir bê xwestin” (Lûqa 12:48). Û Aqûb jî wisa got: “Birayên min, bila gelek ji we nebin mamoste, çimkî hûn dizanin em ên ku hîn dikin, emê di dîwana hê girantir re derbas bibin” (Aqûb 3:1).

Ji aliyê din ve, darizandina me wê bi têkiliya me ya ku em bi rayedariyê ve girêdayî bin ve têkildar be ji ber ku rayedarî ya Xweda ye. Derketina li dijî rayedariya ku hatiye dewirkirin, tê wateya derketina li dijî rayedariya Xweda. Divê em tundiya ku em ji pêşî ve zanibin bê gelo rêber mafdar in an na ferq bikin û li ser xwe negirin. Piştre divê em encaman jî bidarizînin. Ev ne barê me ye lê barê Xweda ye. Tenê Ew bi dilan dizane û dikare wan li gorî dilê xwe biguherîne.

# DILÊ RÊBERAN DI DESTÊ XWEDA DE YE

Eger em vegerin ser şahidiya ku min di beşa duduyan de da, dema ku pastorê min betalkirina komên malê yên di nava dêrê de ragihand, min ne tenê bawer kir ku ew xelet e, lê di heman demê de min bawer kir ku wî ew biryar daye ji ber ku wî li dijî min helwest girtiye. Hêmaneke din a ku li dora avahiya rêbertiya dêra me digeriya ku min berê behsa wê nekiribû, hebû: rêveberê ofîsê. Wî ji min hez nedikir û hewl dida ku bin min bikole ji bo ku bera min bidin ji kar.

Ji bo vê armancê, wî raporên neyînî li ser yê din dida her yekî ji me û di navbera min û pastorê payebilind de dîwarekî veqetandinê lê dikir. Gelek rapor bi awayekî eşkere derew bûn. Wî her wiha cureyeke kampanyaya notan dabû destpêkirin ku hemû karmendan, bi taybetî min ji xwe re bikin hedef. Karmedan, ji jina min ku ew jî endama karmendan bû, dipirsiyan: “Çima ew raterast navê mêrê te nanivîse?” Min dizanibû ew çi dike lê dest û lingên min girêdayî bûn.

Dema ku pastorê payebilind komên malê betal kirin, min ev kiryar weke êrîşeke din a li dijî min dît, ji ber derew û gumanên ku vî rêberî çandibûn. Ez ji xwe piştrast bûm ku min mesele bi awayekî rast ji “nav hev derxistibû.” Min xwe hîn bêtir mafdar hîs kir û min hîn bêtir nexwest ku teslîmî rayedariya pastorê payebilind bibim. Axir, ez fikirîm ku ew hatiye şaş kirin û biryareke xerab dide. Xweda çawa dikarîbû, ji bilî xebata dijwar ya heşt mehan, ewqas mirovên ku wê bigihêjin potansiyela xelasiyê bi avê de berde? Ji ber van hemû sedeman, ez di wê civînê de ji bîst deqeyan zêdetir bi zimanekî tûj li dijî pastorê payebilind derketim. Ez bi hesta mafdar û rast ji wir derketim lê gava ez gihîştim malê, ez li rastî şermezariya Giyanê Pîroz hatim. Piştre ronahiyeke bi şewq li ber min vêket: Ez ne li ber rayedariya mirovekî lê li ber rayedariya Xweda derdiketim.

Di demeke kin de Reb di dilê min de ayeteke diyar eşkere kir. Vê ayetê ji bo heman rewşan her tişt eşkere kir û di nava zor û zehmetiyê de rê li ber min xist:

"Dilê padîşah coya avê ye ku di destê Xudan de ye,
Bi ku ve bixwaze, dişîne wê derê."
(Şîretên Silêman 21:1)

Îfadeya "padişah" tê wateya kesekî ku li ser we xwedî rayedariyê ye. Çi yekî xwedayî be û çi jî yekî hişk be, dilê wî her tim di destê REB de ye. Ayet nabêje, "Dilê padîşahê baş di destê REB de ye." Ferq nake ku ew di bin çi bandorê de ye, dilê wî di destê REB de ye. Ji ber ku nabêje: "Heta ku padîşah bi awayekî xelet bandor lê nebe, dilê wî dikare ji aliyê REB ve were wergerandin."

## AN JÎ EGER EM ZANIBIN KU BIRYAREKE NE BAŞ E?

Baş e an eger em muhakemeyê nekin lêbelê eger em piştrast bin ku rayedar biryareke nebaş daye? Eger delîlên berbiçav li cem me hebin ku rêber ji aliyê raporeke xerab ve bandor lê bûye, wê çi bibe? Ma derfeta serîlêdanê tuneye? Ma em nikarin tiştekî bikin da ku alîkariya rêberê xwe bikin? Bersiv erê ye.

Ester mînakeke baş e ji bo vê rewşê. Zarokên Birahîm di bin desthilatdariya Persan de dîlgirtî bûn. Hamanê dil xerab planeke tirsnak amade kir û qralê Persiyan Ahaşwêroş razî kir ku fermanekê derxîne ku hemû Cihûyan tune bike. Qral bi xwe dîroka êrîşê destnîşan kir.

Şahbanû Ester ji ziriyeta Birahîm bû lêbelê wê ev nehênî li ser daxwaza apê xwe Mordekay veşartibû. Lêbelê Mordekay çû ba Esterê û jê xwest ku li ser navê gelê xwe derkeve pêşberî qral. Dizanibû ku ev yek dikare bibe sedema mirina wê. Pêwîstî pê tunebû ku Esterê tiştekî wisa bike, ew şahbanû bû û nehêniya wê ewle bû.

Ester biryar da ku serî li qral bide. Piştî sê rojan rojî girt, ew nêzîkî hewşa hundir a qesra Qral Ahaşwêroş bû û Xweda, hişt ku qral wê bi dilgermî pêşwazî bike. Dema ku daxwaza wê hat pirsîn, Esterê ji qral rîca kir ku ew û Haman beşdarî şahiya ku wê ji bo qral bê çêkirin, bibin. Qral razî bû û ew û Haman beşdarî şahiyê bûn.

Derengê wê şevê xew li qral herimî. Wî ferman da ku qeydên dîrokî ji wî re werin xwendin. Ji qeydan, ew fêr bû ku Mordekayê Cihû jiyana wî xelas kiribû lê qet ji bo vê yekê xelat negirtibû. Qral li rêyekê difikirî ku wî bi rûmet bike û ji bo şîretê bi Haman şêwirî. Haman got qey qral behsa wî dike û rêbazeke berfireh ji bo rûmetkirina zilamê ku nasnameya wî nayê zanîn pêşkêş kir. Qral diyar kir ku ew kesê dixwaze bi rûmet bike Mordekay e û her çiqasî Haman ji vê rewşê ne razî bû jî li ser navê qral ji bo Mordekay bi rûmet bike hate peywirdarkirin. Xweda halîhazir dilê vî qralî ji bo gotinên ku Ester wê di şîvê de bibêje amade dikir.

Gava ku Ester; qral û Haman di serdaneke din de anîn ba hev, qral dîsa xwesteka wî jê pirsî.

> “Estera Şahbanû wiha bersiv da û got: Ya padîşahê min, heke dilê te bi min xweş be û daxwaza min bi dilê te be, ez lava dikim, canê min û gelê min bibexişînî. Ez û gelê min hatin firotin ku em bên kuştin, helakirin û tunekirin. Heke em wekî xulam û xadiman bihatana firotin, minê dengê xwe nekira, çimkî ji bo tiştekî wiha, hewce nedikir ku padîşah bihata acizkirin.” (Ester 7:3-4)

Li vir çend xalên hêjayî ku mirov lê baldar be hene. Ya pêşî qral bi awayekî eşkere biryareke tirsnak û nêzan dabû lêbelê dîsa jî Ester bi rêzdarî pê re axivî û dilê xwe yê pêve girêdayî parast. Ya duyemîn, wê gotinên xwe yên zanyarî bi dilnizmiyê û ne tenê bi xwe lê di ronahiya qral de jî da. Rîca kir lêbelê destûr da ku biryara dawî ew bide. Wê tiştên weke “Ey mêrê min î bêaqil, te guh da gotina kujerêkî. Ma tu fêhm nakî ku tu yê bi vê fermanê her tiştî xwe winda bikî?” negotin. Tenê ji tiştekî bawer dikir: Xweda wê dilê qral biguherîne. Reb bi rastî jî şîret red kir û qral zilamê pîs Haman daliqand. Gelê Cihû ji qirkirinê xilas bû.

Di destê Esterê de ne tenê muhakeme lê di heman demê de

delîlên berbiçav jî hebûn ku rêberê wê ji van rastiyan mahrûm bû. Ew bi dilnizmî çû cem wî û bi qebûlkirina hêza biryardanê ya qral re, daxwaza xwe pêşkêş kir. Ew biçûk nexist, zor lê nekir an jî manîpule nekir. Ji bo rê li ber dilê qral bixe, tenê ji hêza Giyanê Pîroz bawer kir.

## NE XWEDIYÊ HEMÛ RASTIYAN

Di vê beşa Nivîsên Pîroz de, em dibînin ku rêberek ne tenê di rêya xelet de bandor lê dibe, lê di heman demê de bêyî ku xwediyê hemû rastiyan be an jî bêyî ku hemû meseleyê bizanibe biryarê dide. Her wiha mînaka Dawid û Qral Şawûl jî heye. Dewê Filîstînî çil rojan gef li artêşa Xweda xwendin. Wî her tim gazî Îsraêliyan kir ji bo ku şervanekî pê re rûbirû şer bike û mesele bi şerekî re çareser bibe. Dawid dît ku hemû leşker ji vê ditirsiyan û nikaribûn bersiva gefên dew bidin. Xweda, xist dilê wî ku bi vî dewî re şer bike. Lê Qral Şawûl li wî nihêrî û wisa got: "Nabe. Tu tenê zarokek î û gava tu winda bikî em ê hemî neçar bimînin ku teslîmî vê artêşê bibin!" (şîroveya nivîskar).

Gava Dawid ev bihîst bi qral re nîqaş nekir lê ji wî rîca kir:

> "Ezbenî, kengê min pezê bavê xwe diçêrand, gava şêr an jî hirç dihat û pez ji kerî dibir, li pey diçûm, min lê dixist û berx ji devê wî derdixist. Gava êrîş dikir, min dest davêt pirça wî, lê dixist û dikuşt. Xulamê te hem şêr, hem jî hirç kuştiye. Evê Filîstiyê bêsinet jî, wê wekî wan be. Çimkî wî tinazê xwe bi artêşa Xwedayê Jîndar xwariye. Dawid lê zêde kir: Xudanê ku ez ji lepên şêr û hirçan rizgar kirime, wê min ji destê vî yê Filîstî jî rizgar bike. Şawûl ji Dawid re got: De here, bila Xudan bi te re be." (Samûêl I, 17:34-37)

Dema ku serpêhatiyên xwe ji rayedar re pêşkêş dikirin, di helwesta wî de rêzdarî hebû. Dema ku qral biryara xwe ya pêşî da tişta ku dizanibû kêm e, got. Ji wê demê û pê ve, Dawid baweriya

xwe bi şiyana Xweda anî ku dilê rêberê xwe biguherîne. Tiştê ku Xweda di dilê wî de bi cîh kiribû, wî bawer dikir ku bi biryara qral wê çêbibe. Bi dilnizmî û îteatkarê re, Xweda bi awayekî çalak tevlî vê meseleyê kir. Reb, dilê Şawûl guherand û Şawûl wisa got: "Naxwe here, bila REB bi te re be!" (Samûêl I, 17:34-37).

## NAVBEYNKARIYA RAST

Nimûneyeke din a Pirtûka Pîroz ya ku ji rêberekî biryara xwe daye ku jê rîca kiriye, Avigayîl e. Ew bi zilamekî dewlemend ê dijwar û xerab ê bi navê Naval re zewicî bû. Hewcedariya Dawid bi xwarinê hebû ji ber ku Şawûl berdewam dikir û gef li wî dixwar. Dawid ji Naval xwest ku xwarin û vexwarinê ji wî re bişîne; wî dizanibû ku dema cejnê ye û zanîbû wê hir tişt hebe. Berî aniha Dawid xizmetkarên Naval parastibû û di berdêla vê de tiştek jê nexwestibû.

Lêbelê Naval ne tenê daxwaza Dawid red kir, di heman demê de heqaret li wî kir. Helwesta Naval, Dawid hêrs kir û ji bo tolhildanê wî çar sed zilamên xwe li hev civandin. Wê Naval û hemû zilamên wî qir bikirina.

Xeber gihîşt jina Naval, Avîgayîl. Avîgayîl zû diyariyeke ji nan, şerab, goşt, genim, tirî û hêjîran amade kir. Wê ev li ser kerên xwe bar kirin û çû pêşiya Dawid û mirovên wî. Çawa ku wê Dawid dît di cîh de ji kera xwe peya bû û xwe avêt ber lingê wî. Piştre wê ev daxwaz jê kir:

> "Ezbenî, sûcdar ez im. Bi tenê ez sûcdar im. Destûrê bide ku xulama te ji te re bibêje. Li gotinên wê guhdarî bike. Lava dikim ezbenî, guh nede Naval, ew mirovekî cirnexweş e. Ji ber ku cira wî jî wekî navê wî ye. Navê wî tê wateya bêaqil. Ew ehmeq e. Ezbenî, min qasidên xweyê xwe Dawid nedîtin. Ezbenî, Xudan nehişt ku tu xwîn birijînî û bikevî pey tol û heyfan. Bi navê Xudanê Jîndar û bi serê te hêvî dikim ku dijminên te û kesên dixwazin xerabiyê li te bikin, bila bibin wekî Naval. Ezbenî, ev

diyariyên ku min ji te, xweyê xwe re aniye, bila bidine zilamên te. Ji kerema xwe xulama xwe bibexişîne. Wê Xudan binemala xweyê min bidomîne. Ji ber ku xweyê min, şerê Xudan pêş de dibe. Heta tu hebî, bila xerabî ji te dûr be. Heke kesek ji bo kuştinê bikeve pey te, wê Xwedayê te Xudan te di kîsekê de veşêre û jiyana te biparêze. Wê dijminên te bavêje, çawa ku bi berkaniyê kevir tê avêtin. Dema Xudan hemû sozên qenc ên ji bo xweyê min pêk bîne û te li ser gelê Îsraêl bike serwer, tê poşman û xemgîn nebî. Çimkî tu neketî pey tolhildan û xwînrijandinê. Çaxê Xudan tu serfiraz kirî, vê xulama xwe bîne bîra xwe." (Samûêl I, 25:24-31)

Mêrê vê jinikê, her tiştên ku ji bo malbat û Dawid kir, destûrê bidin ku ez wan xal bi xal diyar bikim:

1. Wî bi rêz û hurmeteke mezin bang Dawid kir, li ser hev û gelek caran xwe weke xulamê wî bi nav kir.
2. Wî diyariyeke xweş ji Dawid û zilamên wî re bir ku vê diyariyê comerdî û rêzgirtina wî nîşan dida.
3. Wî berpirsiyarî spart xwe û ji bo malbatê navbeynkarî kir. Ya rastî, wî ev yek weke "tawanbariya" xwe bi nav kir.
4. Wî ji Dawid re got ku rijandina xwînê ji bo tolhildanê, bi tirs û lerzînê wê guneh be.
5. Wî bi bîra Dawid xist ku kesê tola wî hildaye û yê soz daye wî Xweda bi xwe ye.
6. Wî jê xwest ku dema ew bi ser bikeve, wî bi bîr bîne.

Hûn dikarin bipirsin û bibêjin: "Vê jinê mêrê xwe çawa bi rûmet kir?" Wê ew ji qirkirinê xilas kir. Mêrê wê li dijî van mêran û li dijî kesê ku REB ew mesîh kiriye, guneh kir. Parastina tevgera mêrê wê gelek sedem wê bidaya Dawid ji bo tolhildanê. Wê vê rewşê benzîn bi ser agir dakira û wê hilweşîna wî bileztir bikira. Çi feydeya rûmeta di ser re heye ku bibe sedema mirina mêrê we?

Eger wê bi rastî bixwesta bêrêziyê li Naval bike, ev gotin tenê bigota bes bû: “Ez ji vir diçim û destûrê didim ku mêrê min tiştê ku heq dike bê serê wî, ji ber ku ew yekî bêexlaq e!” An jî dikaribû biçûya ba David û wisa bigota: “Guhdar bike, tu eleqeya min bi vê yekê re tune bû. Min ê tiştê ku hewcedariya te pê heye, bidaya te. Dema min bihîst ku mêrê min ê bêaqil çi kiriye, min xwarin ji te û zilamên te re anî lê plana xwe ya kuştina wî berdewam bike, ji ber ku ew yekî bêbext e. Tu çi bi wî bikî, ew heq dike.” Wê van kiryaran mêrê wê bêrûmet bikira.

Navbeynkariya li ser navê kesekî, ev nayê wê wateyê ku hûn sûc paşguh dikin; berevajî vê, hûn wî qebûl dikin. Piştre, hûn xwe di navbera wê û darizandinê de bi cîh dikin. Di esasê xwe de hûn dibêjin: “Ez dizanim ku ew darizandinê heq dike lê ez ji bo dilovaniyê lava dikim. Ez ê vê hilgirim ser pişta xwe û ez ê li şûna wê bisekinim.”

Tişta ku Avîgayîl kir tam ev bû. Dawid ji bo ku darizandinê bîne hat û Avigayîl ji bo dilovaniyê lava bike, hat. Bi gotina wê, “Ji kerema xwe sûcê xulamê xwe bibexşîne.”

Ji bo ku rê li ber gunehê tolhildanê bigire bi vî awayî axivî. Jixwe Gotina Xweda wisa fermanê dike: “Tê heyfê nestînî û ji nav gel kîna kesî negirî. Tê wekî xwe ji cîranê xwe hez bikî. Xudan ez im” (Lêwiyî 19:18). Li ber gêdîkê sekinî û li dilovaniyê geriya û ji bo Dawid rastî xwest.

Avîgayîl ji cîran an jî hevalên xwe re gotegot nedikirin. Negot: “Hûn dizanin, ez bi kesekî bêbext re zewicî me. Ew kesê herî xirab e ku ez nas dikim.” Wê her wiha bi xerabî, hêrs, nefret, bêrêzî an jî bi hesta tolhildanê qala mêrê xwe nekir. Ew ji bo bexşandina canê mirovam axivî. Lê guhdarî bikin bê ka navbeynkariya wê çi bi dest xist:

> “Xwedayê Îsraêl Xudan pîroz be ji ber ku îro tu derxistî pêşberî min! Pîroz be ev serwextiya te! Îro te nehişt ku ez bi destê xwe tolhildanê xwînê birijînim. Ez bi navê Xudanê Jîndar ê Xwedayê Îsraêl ku wî ez parastim sond dixwim,

heke te nelezanda û pêşwaziya min nekira, heta berê sibê ji zilamên Naval kitek jî sax nedima.” Dawid hemû diyariyên Avîgayilê qebûl kir û jê re got: Bi xêr û silamet here malê. Min guhdariya te kir û qedrê te girt.” (Samûêl I, 25:32-35)

Dema ku Avîgayîl vegeriya malê, mêrê wê ziyafetek li dar dixist. Derbarê bê çi bûye û nebûye de, qet nizanibû çi qewimiye. Wê êvarê, wê biryar da ku tiştekî jê re nebêje. Sibeha din, wê jê re got bê çawa jiyana wî xilas kiriye. Dema ku ev bihîst, dilê wî êşiya. Piştî deh rojan, REB canê Naval stend. Tolhildan li dijî zilamê xerab ne bi destê Dawid an jî Avîgayîl, lê bi destê Xweda pêk hat..

## JI BO XATIRÊ KESÊ RAYEDAR

Mûsa xwe di rewşeke mecbûrî de ku di darizandina biryara Rayedar de ye, dît -rayedariya Xweda! Û ev yek gelek caran qewimî. Werin em li bûyera yekem binêrin. Îsraêl bi çêkirina golikekî zêrîn re guneh kir û piştre ew hebandibû. Xweda ewqas hêrs bû ku ji Mûsa re got ku ew ê hemûyan bikuje û ji Mûsa miletekî çêbike. Guh bidin lavaya Mûsa:

“Lê Mûsa ji Xwedayê wî Xudan lava kir û got: Ya Xudan, wê çima hêrsa te li dijî gelê te rabe? Te ew ji welatê Misrê bi hêza xwe ya mezin û bi destê xwe yê hêzdar deranî. Wê çima Misrî bêjin: Xwedê ji bo xerabiyê, ji bo ku wan li çiyan bikuje û wan ji ser rûyê erdê tune bike ew ji Misrê deranî? Ji hêrsa xwe vegere. Fikra xwe biguhere û wê xerabiyê bi gelê xwe neke. Xulamên xwe ÎBirahîm, Îshaq û Îsraêl bi bîr bîne. Te ji wan re bi navê xwe sond xwar û got: Ezê ziriyeta we bi qasî stêrên ezmanan zêde bikim. Ezê tevahiya vî welatê ku min soz dabû bidim ziriyeta we. Wê bibe mîrasa wan a herheyî.” (Derketin 32:11-13)

Çend xalên ku mirov bala xwe bidiyê hene. Ya pêşî, Mûsa di nava teslîmbûneke tam de, bi tirs û lerizînê axivî. Ya duyemîn, Mûsa bi

dilgermî ji Xweda lava kir an jî li ber Wî geriya, wî qet ferman lê nekir. Ya sêyemîn, berî her tiştî, ew li ser navê Xweda axivî, ne li ser navê gel. Di esasê xwe de Mûsa ev digot: "Baş e, îcar wê rûmeta te ya ku di çarsed salî de te ava kiribû, wê çi bibe? Navê te niha li seranserê cîhanê tê zanîn lê tu yê tiştê ku te dest pê kiribû xelas nekî û tu yê wî tiştî biherimînî." Ji ber ku Mûsa ev navbeynkarî di esasê xwe de li ser navê REB kir, wî dikaribû gef li biryara Xweda bixwînî. Motîvasyona wî ne ew bi xwe bû, kesên din bûn.

Berî ku em rîcayê ji rêberekî bikin, divê em vê ji xwe bipirsin: "Ev rîca berî her tiştî ji bo kê ye?" Gava ku Mûsa soza Xweda ya ku dabû Birahîm, anî bîra Wî jî, wî di esasê xwe de ev ji bo xatirê REB kir. Wî girîngiya soza xwe bi bîra Xweda xist. Berê Mûsa li aliyekî rast bû ji ber ku dilê wî li cihê rast bû. Ew xizmetkarê Xweda bû û ji ber vê yekê ew berî xwe an jî berî Îsraêliyan, li ser Wî difikirî. Ha vaye bersiva Xweda ev e: "Bi vî awayî Xudan fikra xwe guhert û xerabiya ku gotibû, bi gelê xwe nekir" (Derketin 32:14).

Xweda fikra xwe guhert! Biryar hat berevajîkirin. Ez dixwazim li ser xaleke girîng ya din bisekinim. Mûsa dikaribû rasterast bi Xweda re biaxive ji ber ku wî gelek caran dilsoziya xwe îspat kiribû. Ji bo vê prensîbê di roja me de bi mînak bikin, endamên tîmê me li Messenger International hene ku bi salan dilsoziya xwe ya ji bo min û Lisa îspat kirine. Ew li gorî karmendên ku nû dest bi xebatê kirine bêtir nêzîkî me ne û derfeta wan heye ku daxwazên xwe zûtir îfade bikin. Divê hûn hêjayî wê axaftinê bin ku bandorê li jiyana rêberekî bikin. Ev bi saya dilsozî, rastgoyî û pêvegirêdanê tê bidestxistin. Her kes ne xwediyê wê derfeta axaftina bi vî rengî ku bandorê li jiyana rêberekî bike.

Xalek din a girîng ew e ku Mûsa bi kesên din re li ser biryara Xweda neaxivî, ew bi Xweda re li ser biryara xwe axivî. REB gelek caran li Îsraêliyan hêrs bû ji ber ku ew gelek caran û bi berdewamî li dijî rêyên Wî gilî û gazin dikirin. Ji vê re gilî û gazin tê gotin û

Xweda ji vê nefret dike! Ev tevger pir xeternak e û divê bi her awayî mirov jê dûr bisekine. Dema ku em di nav xwe de gilî û gazinan dikin û dema em ji biryara rayedarên xwe şîkayetê dikin, em nakokî û serîhildanê diçînin. Em ê di beşek din de bibînin ku ev yek dibe sedema darizandineke teqez.

Kesên ku bi min re dixebitin, ji bo wan peymaneke min heye. Eger ew bawer bikin ku min biryarek bê zanyarî daye, ew dikarin carekê ji min rîca bikin an jî eger rastiyên nû derkevin holê ku karibin alîkariya biryarê bikin, ew dikarin dîsa rîcayê ji min bikin. Gava ku wan rîca kir, girîng e ku ew bi baldarî fikirîbin û bi pêşkêşiya awayê bihêlin ku ez çi tiştên dixwazin ragihînin, bibînim. Ez gelek caran gava ku agahiyên nû dibînim, fikra xwe diguherînim. Lêbelê heke ew rîcayê ji min bikin û ez li ser biryara xwe ya pêşîn bimînim jî, wê demê em li ser heman fikrê bi pêşve diçin. Eger em bi yekîtiyê ve bi pêşve biçin û ez xelet bim, Xweda dîsa jî wê me biparêze. Eger em bi durustî tevbigerin, Reb wê hem min û hem jî yên di bin rayedariya min de biparêze. Dawid wisa dibêje: “Bila rastî û durustî min biparêze, Hêviya min hergav tu yî” (Zebûr 25:21).

## AN KU TIŞTA XWEDA NÎŞANÎ MIN DIDE LI HEMBERÎ WÊ DERKETIBE?

Dibe ku dîsa hûn vê pirsê bipirsin, “An ku rayedar ji min re bibêjin ku ez tam berevajî tiştê ku ez hîs dikim ku divê ez di duayê de bikim, wê demê çi dibe?” Ev pirseke baş e û pêdivî pê heye ku mirov li ser vê bisekine. Ji bo bersivdayînê, ez vegerim ser mînaka ku min di beşa duduyan de da. Berî ku ez dest bi temamiya bernameya “partiyê” bikim, ez bi dilgermî di duayê de li Reb geriyam û ez piştrast bûm ku Wî ji min re got ku ez vê bikim. Heta roja îro, ez hîn jî bawer dikim ku Xweda ji min re got ku ez komên malê bikim ji ber ku ev hemû tiştên qewimîn serpêhatiyek bû ku ez rayedariya ku Xweda li ser min ferz kiribû, bibînim bê ka ez ê pê ve girêdayî bim an na.

Nivîsên Pîroz bi mînakên ku Xweda gelê xwe ceribandiye tije ye. Dema ku Xweda ji Birahîm re got ku Îshaq weke qurbanê şewitandinê pêşkêş bike, Nivîsên Pîroz bi taybetî wisa dibêjin: “Xweda Birahîm ceriband” (Destpêk 22:1). REB tu carî nexwest ku Birahîm kurê xwe bikuje lêbelê wî hişt ku Birahîm sê rojan bi çiyê ve hilkişe û heta ku wî kêra xwe ranekir ew nesekinand. Xweda dilsoziya bêdawî ya Birahîm di kirinên wî yên îteatê de dît. Xweda îro roj heman tiştî di me de dibîne gelo?

Pawlosê şande, di nameya xwe ya pêşî de ya ji Dêra Korîntî re şandibû û tişta ku ji wan xwestibû bikin, di nameya duduyan de guhert. Piştî guhertina talîmatên ku dabûn dêrê, ev daxuyaniya balkêş kir:

> “Da ku ez we biceribînim, bizanim, ka hûn di her tiştî de bi ya min dikin an na.” (Korîntî II, 2:9)

Pawlos ji bo armancekê tenê talîmat da wan: ji bo ku bibîne bê ka ew ê bi rayedariya wî ve girêdayî bin an na. Hevalekî min ê pir bi heybet heye ku bi salan e pastoriyê dike. Wî ji min re got ku rêya eşkerekirina serîhildana di nav xizmetkaran de ew e ku talîmatên bêwate bên dayîn. Wî wisa got: “John, ez ê di demeke nêzîk de gilî û gazinên serîhildêran bibihîzim. Ez bi vê yekê re mijûl dibim û dûv re ez talîmatê vedigerînim rûtîna me ya normal.”

Pawlos dixwest bibîne bê ka ew ê di her tiştî de talîmatên wî bişopînin an na. Peyva sereke her tişt e. Talîmat dijwar bû û vê jî di nava xwe de armancek di xwe de dihewand. Armanc: eger ew vê talîmatê bişopînin, ew ê her tiştê din bişopînin.

Tişta ku Xweda bi Birahîm kir, tam ev bû. Wî ferman da Birahîm ku tişta herî dijwar ya îteatkirinê bike: Dev ji tiştê herî girîng ê jiyanê berde: soza ku wî piştî bîst û pênc salan li bendê mabû. Ev, ne serkeftina Birahîm bû; berevajî vê, ew tiştek bû ku Xweda di duayê de soz dabû wî. Ji bo Birahîm wê hêsantir bûya ku xwe li ser wê

gorîgehê bi cîh bike lê Xweda tiştê herî girîng xwest. Eger Birahîm di vê mijarê de îteatkar be, ew ê di her tiştî de îteatkar bûya!

Pastorê min ê mezin ji min re got ku ez dev ji tişta herî dijwar berdim. Ez bi mehan li ser wê xebitîbûm û her kesî dizanîbû. Ji bo min, ew mîna sozekê bû ji bo giyanên winda yên ku dikevin nava Desthilatdariyê. Mifteya xizmeteke ciwanan ya serkeftî ev bû, bê ka ez ê karibim vê bikim an na. Qedir û qiymetê min di xetereyê de bû ji ber ku min ji her kesî re gotibû ku ew daxwaza Xweda ye. Di duayê de, min bihîstibû ku ez ê bi vê bernameyê berdewam bikim. Min nizanibû ku ev ceribandinek e û pirî caran ceribandinên Xweda heta piştî rastiyê nayên dîtin, ji ber ku ew her gav dilên me eşkere dikin.

Partiyên min dikarîbûn gelek can bianiyana Desthilatdariya min, lêbelê Xweda ji rêbazên me yên pêkanîna karê xwe bêtir bi eşkerekirina rayedariya xwe di dilê me de eleqedar e. Ew Xweda ye, gelek ramanên wî yên din hene ji bo gihîştina giyanên winda. Tişta ku bi awayekî din nayê kirin prensîba îteatê û dilsoziyê ya di dilê mirov de ye, ji ber ku bêyî vê yekê tu mirov nikare bikeve nava Desthilatdariyê û ji bo dilekî ku ne îteatkar be alternatîfeke din tune.

Divê em di dilê xwe de prensîbeke krîtîk û zor bi cîh bikin. Piştî ku Xweda rayedariya xwe dewrî mirovan kir, ev yek wê betal nake. Tenê îstîsnayek vê yekê heye, dema ku rêberek Gotina nivîskî ya Xweda an jî qanûnên Wî rasterast îhlal dike, ev yek derdikeve holê. Xweda, wê nekeve şûna rayedariya ku dewir kiriye. Em nikarin rayedariya ku hatiye dayîn derbas bikin û xwe tenê bi rayedariya Xweda ve girêbidin. Mûsa ji rêberên eşîrên Îsraêlê re wisa behsa vê prensîbê kir:

> “Ya ku Xudan emir kir, ev e: Heke kesek ji Xudan re soz bide yan sond bixwe û xwe bi vî awayî bixe bin barekî, divê ew gotina xwe xera neke û li gorî her tiştê ku ji devê wî derketiye

> bike. Heke keçika ku hê li mala bavê xwe ye, ji Xudan re soz bide û xwe bixe bin barekî, bavê wê jî bibihîze ku wê soz daye û xwe xistiye bin barekî û herwiha bêdeng bimîne, wê soza ku jinikê daye û barê ku xwe xistiye binî li ser wê bimîne. Lê heke bavê wê roja ku ev yek bihîst li dij derkeve, wê soza ku keçikê daye û barê ku xwe xistiye binî betal bibe. Wê Xudan keçikê bibexişîne, çimkî bavê wê li dij derketiye." (Hejmartin 30:1-5)

Mûsa ev prensîb li ser jinikê û mêrê wê hîn bêtir bi pêş xist û xurt kir. Xwedayê ku xwediyê rayedariya rasterast li bilindahiyê ye, tiştê ku rayedariya hatiye dewirkirin pejirandiye, diparêze. Ew her weha tiştê ku rayedariya dewirkirî betal kiriye jî betal dike. Reb rêzê ji rayedariya ku dewir kiriye re, digire. Ji ber ku jineke ciwan di bin rayedariya bavê xwe de ye an jî jineke zewicî di bin rayedariya mêrê xwe de ye, Xweda bav an jî mêr berpirsiyar dibîne lê jin berpirasyar nayê dîtin.

Ev prensîb, ne tenê di nav malbatê de, lê di warên din ên rayedariya ku hatiye dayîn de jî û di Nivîsên Pîroz de derbas dibe. Dîsa, ez dixwazim li ser bisekinim, dema ku kesên rayedar ji me dixwazin ku em tiştekî bikin ku rasterast li dijî fermanên Xweda ye, îstîsna çêdibin. Ez xemgîn dibim dema ku ez dibihîzim mirovên di xizmetê de wisa dibêjin: "Pastorê min ji min re got ku ez ê vê yekê nekim lê ew ji Xweda nebihîze, ji ber vê yekê ez ê dîsa jî bikim -lê di rêyeke ne rasterast re." Tiştê hûn di duayê de dibîhîzin ku hûn jê bawer dikin, ne girîng e; eger ew li dijî talîmatên rayedarên di jiyana we de be, ev tê wê wateyê ku hûn li dijî rayedariya Xweda serî hildidin!

Mînakên ku ez dikarim bidim bêdawî ne. Min kifş kir ku dema zanîna wehyê di dilê me de dişewite, gelek pirs têne bersivandin û bêhejmar pirsgirêk têne çareserkirin. Ev ne pirtûkek e ku ji mînak û ravekirinên berfireh e. Tişta ku em lê digerin di mijara rayedariyê de bidestxistina wehyê ye û ev, wehya ji Xweda bi

xwe ye, ji ber ku Ew û rayedariya Wî ji hev nayên veqetandin. Weke ku min di destpêkê de we teşwîq kir, bi dilgermî ji Xweda re duayan bikin û jê bixwazin ku prensîba îteatkariya xwedayî di dilê we de geş bike. Eger ev nebe, hûn ê ji dema ku me dest pê kir bêtir li pirsan rast werin.

Di beşa bê de, em ê kifş bikin bê ka mirov çawa bi muameleya neheq re serî derdixîne û çawa bersivê dide rayedarên ku bi tundî bi me re tevdigerin. Di rewşên wisa de, em ê bibînin ku planeke bi heybet ya Xweda ji bo me heye.

BEŞ 13

# MUAMELEYA NEHEQ

*Dilşikestin nayê wateya ku mirov bêhêz dikeve. Ev bi girêdana me ya bi rayedariyê re têkildar e.*

Bavê me Xweda, ji bo her yekî ji me armanceke Wî ya diyar heye ku ew dixwaze di hundirê her yek ji me de pêk bîne. Bihêlin ez we hişyar bikim; dibe ku ev ne bizewq, ne popular an jî ne rehet be lêbelê ji bo me ya herî baş ev e. Daxwaza wî ew e ku dilê me şikestî be. Pirtûka Pîroz bi zelalî vê yekê dibêje:

“Çimkî tu hez nakî ji qurbanê,
Razî nabî bi şewitandina gorîdanê,
An na, minê ji te re pêşkiş bikira.
Qurbana ku tu qebûl dikî ruhê şikestî ye,
Ey Xwedê, tu dilê şikandî û tobekar biçûk nabînî.”
(Zebûr 51:16-17)

“Nêzikî dilşikestiyan e Xudan,
Ruhê wî rizgar dike bindestan.”
(Zebûr 34:18)

Şertê pêşî ji bo nêzîkbûna bi REB re dilekî şikestî ye. Her çiqasî pêvajo ne xweş be jî, hebûna Wî ya nêzîk ji dijwariyên têkildar pir girantir e. Dawid di ciwaniya xwe de hînî vê yekê bû. Di zebûrên ku wî nivîsandine de, hûn dikarin şikestina dilê wî û tiştê ku pêdiviya vê pê heye, bibînin. Ev dilşikestin ne bi jiyaneke fedekar an jî bi pêşkêşiya qurbanan, lê bi rêya îtaetê tê bidestxistin.

## DILŞIKESTIN BI RAYEDARIYÊ RE TÊKILDAR E

Bihêlin ez rave bikim. Hespekî şer heta ku îradeya wî neyê şikandin, ne guncaw e ji bo xizmetê. Her çiqasî ew ji hemû hespên din ên di axuran de bihêztir, bileztir û jêhatîtir be jî, ew nikare heta ku neyê şikandin xizmetê bike. Hespên jê kêm jêhatîtir diçin şer lê ew ê axurê de bimîne. Dilşikestîbûn, nayê wê wateyê ku qelsbûyî ye. Ew bi girêdana rayedariyê ve têkildar e.

Di mînaka hespê de, efendî yê siwar e. Eger hesp bi serkeftî were şikandin û perwerdekirin, di her şert û mercî de mirov dikare pê bawer be. Di wê kêlîka ku şer gur dibe de, gava ku gule an jî tîr difirin, nacesile. Gava ku şûr û balte têne hejandin, bi paş ve nakişin. Dema ku çek têne kişandin û top têne teqandin, ew ê ji daxwaza efendiyê xwe dûr nekeve. Efendiyê wê kî dibe bila bibe, ferq nake, ew ê bi daxwaza wî ve girêdayî be. Ew ê her hewldanek ji bo parastina xwe an pêşvebirina berjewendiyên xwe paşguh bike, da ku guh bide fermanên siwarê xwe.

Ev pêvajoya şikandinê li gorî reçeteyên Reb, di her şexsî de bi awayekî bêhempa pêk tê. Tekane Efendiyê dizane bê kengî pêvajo bi rastî temam dibe û gelo hûn ji bo celebê xizmeta ku Ew dixwaze bi rêya we bîne amade ne. Her asteke nû pêvajoyeke şikandinê ya din bi xwe re tîne.

Pêvajoyên min yên berê baş tên bîra min. Gelek caran, ya rastî ez tu carî ne amade bûm, ji bo asta xizmeteke din min bawer nedikir ku ez bi temamî amade û guncav im. Min bi awayekî ji xwe

bawer digot: “Ez bi temamî teslîmî rayedariya Te bûm. Ez dizanim ku ez ji bo xizmeta ku Te gazî min kiriye amade me.” Lê dîsa jî, bawermendên gihîştî yên li derdora min dizanibûn ku dilê min têra xwe neşikestî ye. Bê guman, ez ê bikevim serdemeke din a dilşikestin, têkoşîn, lerizîn û şerkirina ji bo mafên xwe.

## BAŞ E ÎCAR RÊBERÊN XUYÊ WAN NEXWEŞ?

Wekî hespan, pêvajoya şikestina me bi berteka me ya li hember rayedariyê ve girêdayî ye. Xweda ji bo her yek ji me pêvajoyeke bêkêmasî amade dike û pêdiviya vê pêvajoyê her gav bi rêberan heye. Ji ber vê yekê Petrûs wisa nivîsandiye:

> “Ji bo xatirê Xudan, bi ya hemû sazûmanên mirovî bikin, dixwazî bila padîşahê ku di ser hemûyan re be, Xulamno! Bi hemû hurmetkariyê bi ya axayên xwe bikin; ne tenê bi ya qenc û berbiwêran, lê belê bi ya cirnexweşan jî bikin.” (Petrûs I, 2:13, 18)

Werin em vê yekê di zimanê nûjen de vebêjin. Xizmetkarên di vê ayetê de dixebitin em dikarin wan weke karmend, xwendekar, endamên dêrê an jî sivîlan pênase bikin. Efendî jî dikarin kardêr, mamoste, rahêner, rêberên dêran an jî karbidestên hikumetê bin. Gelek ji me rêberên wan yên baş û nazik çêbûn û me pir ji wan hez kir. Girêdayîbûna bi wan re hêsan bû. Lêbelê Xweda ferman dide me ku em ne tenê bi yên xuyên wan baş û nerm re bin lê di heman demê de ferman dide ku em bi yên xuyên wan nebaş re jî girêdayî bin!

Peyva Girêkî ya ku weke “xuyê nexweş” tê wergerandin “skolios” e. Di Ferhenga Yewnanî ya Thayer de ev peyv weke “şaş, xerabkar, nebaş, neheq û pêşverû” tê pênasekirin. Ferhenga Vine wê weke “efendiyên zalim an jî neheq” pênase dike. Ma Reb ji me re dibêje ku em îteatê ji van rêberên wisa re bikin?

Em çend wergerên din weke referans bidin. Di Wergera Sedsala

Nû de “Ne tenê ji bo qenc û nazikan, di heman demê de ji bo kesên ne durust jî” dibêje. Wergera Îngilîzî ya Hevdem dibêje: “Vê yekê ne tenê ji bo kesên nazik û bîrwir di heman demê de bi zaliman jî bikin.” Wergera Pirtûk Pîroz a Standart a Amerîkiya Nû jî dibêje: “Ne tenê ji bo kesên qenc û nazik, di heman demê de ji bo kesên tênegihîştî jî...” Em nikarin vê fermanê paşguh bikin, ji ber vê yekê em li vir li zanebûna Xweda bigerin.

Ya rastî, berî gotinên Petrûs hêsan bibin, dikevin rewşeke ku mirov pir aciz dikin. Wisa berdewam dike: “Çimkî eger yek bi neheqî cefayê bikişîne û ji ber ku ji Xwedê ditirse xemgîniyê radigire, ev li Xwedê xweş tê” (Petrûs I, 2:19).

Bisekinin û li ser tişta ku berî aniha we xwend bifikirin. Em hemû dixwazin dilê Xweda xweş bikin; bi rastî jî ev yek arezûya hemû keç û xortên Wî ne. Çi dilê Bavê me xweş dike? Gava neheqî li me tê kirin, mesele ew e ku em li ser vê meseleyê bi awayekî rast bisekinin.

Ez sohbeteke di navbera jina min û kurê min ê mezin de tînim bîra xwe. Ew difikirî ku birayê wî ji wî bêtir distîne û muameleya ku lê dibe neheqî ye. Wî nerazîbûna xwe nîşan da û got: “Dayê, ev ne adil e!”

Jina min bi aramî bersiv da: “Kurê min, jiyan ne adil e!”

Kurê min li wê nêrî û weke ku dixwest vê jê re bibêje: “Tu çawa dikarî wisa bibêjî? Tu dêya min î.”

Lisa ji wî re ev pirsî: “Ma adil bû ku Îsa cezayê me xist stûyê xwe û her çiqasî bêguneh bû jî di çarmixê de hat kuştin?”

Di çavên kurê min de ev zanebûn şewq veda û bêdeng ma.

## MÎNAKA MESÎH

Petrûs wisa berdewam dike: “Dawiya dawî ji bo vê bang li we hatiye kirin.” Çi gava ku ez li ser vê ayetê diaxivim, ez ji mirovan dixwazim ku serê xwe rakin bi jor ve û ez bi coş vê dibêjin: “Bila her kes vê dubare bike, ev banga min e!” Em her gav di jiyanê de behsa banga xwe dikin. Belê, ev jî yek ji wan e. Guh bidin Petrûs bê ka çi

dibêje: “Erê, ji bo vê yekê hûn hatin gazîkirin. Çimkî Mesîh jî ji bo we cefa kişand û mînak ji we re hişt, da ku hûn li ser şopa wî herin” (Petrûs I, 2:21).

Wî çawa êş kişand? Petrûs di ayeta berê de wisa rave kiribû: Ew ji aliyê kesên ku rayedariya wan hatiye dewirkirin ve rastî muameleya neheq hat. Xweda car carinan dihêle ku em ji aliyê kesên rayedar ve bi neheqî bên muamelekirin, weke Dawid, Ûsif, Danîêl, Pawlosê Şande û yên din. Banga me ew e ku em rast bersivê bidin û Îsa ji me re mînakeke kesane hişt bê em ê çawa vê bikin.

Niha dibe ku hûn meraq bikin, “Gelo rêberên me bi tundî bi me re tevbigerin wê bi kêrî çi bê?” Ev fikir ji ber ku bêwate xuya dike, ne li gorî aqlê me ye. Lêbelê, zanebûna Xweda bi sê awayan dilê şikestî bi rêya vê dermankirinê sererast dike. Ya yekem, ew cîh ji bo darizandina adil a Xweda vedike. Ya duyemîn, ew karakterê Mesîh di hundurê me de pêş dixe. Ya sêyemîn, pêvegirêdana me ya bi rayedariyê ve di bin vê dermankirinê de Xweda bi rûmet dike.

Pawlos pêşgotina mijara girêdayîbûna bi rêvebirên li ser kar re, wisa anî ziman: “Hezkirîno, heyfa xwe nestînin, lê rê bidin xezeba Xwedê. Çimkî hatiye nivîsîn: Heyfhilanîn ya min e. Xudan dibêje: Ezê bergîdana wê bidim” (Romayî 12:19). Parastin, şermezarkirin, mafdarkirin an jî bersivên din ên bi kêr tên divê ji destê Xweda were, ne ji destê mirovan. Kesekî ku xwe mafdar derdixîne ji dilnizmiya Mesîh bêpar e.

Li ser rûyê erdê tu kes ji Îsa bêtir ne xwediyê rayedariyê ye, lêbelê dîsa jî Wî qet xwe li ber rayedaran neparastiye. Niha em derbasî wê kêliya ku Petrûs behs kiribû ango em herin wê kêliya darizandina Îsa: “Serekên kahînan bi gelek tiştan ew sûcdar kirin. Lê Îsa êdî tu bersîv neda…” (Marqos 15:3, 5).

Dadgehekê xeyal bikin lêbelê ne dadgeheke ji rêzê, dadgeha herî bilind a welêt û di vê dadgehê de her tiştê ku şahid gotiye dikare bi fermî li dijî Îsa were bikaranîn. Zilamên ku şahidî dikirin rêberên olî

û siyasî yên gel bûn. Zilamên bi bandor ên ku giraniya gotinên wan hebû lê di tiştên ku wan digotin de qet piçikek ji rastiyê tune bû. Wan bi eşkereyî derew kirin lêbelê Îsa li ber kesên ew sûcdar dikrin bêdeng ma û xwe neparast! “Pîlatos dîsa ji wî pirsî û got: Ma tu qet bersîvê nadî? Binêre ku çiqas giliyê te dikin! Lê Îsa êdî tu bersîv neda wî, wisa ku Pîlatos şaş ma” (Marqos 15:4-5).

Weke rayedarê siyasî yê herî bilind ê welêt, Pîlatos dadgerî dikir. Li mirovên di dadgehan de dihatin darizandin bêhejmar temaşe kirin û ji bo mirov xwe ji mehkûmkirinê xelas bikin bê çawa xwe bi dînîtî diparêzin, temaşe kir. Eger sûcdar bibûna, dihatin girtin, dihatin sirgûnkirin an jî dihatin îdamkirin. Dadgeheke bilindtir a temyîzkirinê tune bû. Wî qet berê nedîtibû ku zilamekî tê sûcdarkirin û li hemberî vê bêdeng bimîne. Pîlatos dizanibû ku van rêberan Îsa ji ber çavnebariyê anîne dadgehê û ew cezayê herî dijwar jê re dixwazin: ango wan dixwest ku Wî li çarmixê xin û bi darve vekin. Wî her wiha dizanibû ku Îsa ne ew kes bû ku wan hewl didan ku wî weke kesekî din nîşan bidin. Lê dîsa jî, Îsa red kir ku xwe biparêze. Walî Pîlatos ji ber vê helwesta aram a Îsa matmayî ma.

Çima Îsa xwe neparast? Sedema vê ev bû ku wî dixwest di bin biryara Bavê xwe de bimîne û ji ber vê yekê di bin parastina Wî de. Petrûs vê helwestê wisa rave dike: “Çaxê ku dihat nizimkirin, wî bi nizimkirinê bersîv neda. Çaxê ku êş dikişand wî li kesî gef nexwar; lê wî xwe spart wî yê ku bi dadperwerî dîwanê dike” (Petrûs I, 2:23).

Dema em red dikin ku xwe biparêzin, em di bin kerema Xweda û darizandina Wî de xwe vedişêrin. Ji vir ewletir tu cîh tuneye: “Ma kî dikare bijartiyên Xwedê sûcdar bike? Yê ku wan rast derdixe Xwedê ye” (Romayî 8:33).

Berevajî vê, ew kesên ku xwe diparêzin dikevin nav dadweriya tawanbarên xwe û bi vî awayî nahêlin ku Xweda destwerdanê di doza wan de bike. Bûyereke ku min xwe li hember kesekî ku rayedariya wî li ser min hebû diparast, tê bîra min. Piştre Xweda

di dilê min de dîtinek demkî nîşanî min da. Di dîtina xwe de, min dît ku Reb destên xwe birine pişta xwe û li kêleka min rawestiyaye. Alîkariya ku pêdiviya min pê hebû, weke ku nikarîbû pêyde bike. Dema ku min dev ji hewildana ku ez xwe mafdar derxînim, berda; Ew li ser navê min hat destê xwe avêt kar.

Gava ku Îsa li ber rayedariya ku hatiye dewirkirin sekinî jî, wî qet Dadwerê xwe yê dawîn ji bîr nekir. Ji bîr mekin, dilê qral di destê REB de ye. Bi dûrketina ji parastina xwe, ew di tevahiya pêvajoyê de di bin parastina Xweda de ma. Gava ku hûn xwe mafdar derdixînin û diparêzin, hûn di bin destê sûcdarê xwe de weke dadwer in. Hûn mafê xwe yê parastina giyanî winda dikin ji ber ku gava hûn bersiva sûcdarkirina wî didin, ew di qada giyanî de ji we bilindtir dibe. Bandora wî ji ber parastina we bilind dibe. Dema ku hûn hewl didin ku bêgunehiya xwe îspat bikin, hûn di bin dilovaniya sûcdarê xwe de ne. Ji ber vê yekê Îsa ev şîret li me kiriye:

> "Hê ku tu di riya dadgehê de yî, zû bi sûcdarkerê xwe re li hev were. An na, ewê te bide destê dadger û dadger jî te bide destê qerdiyan û tê bikevî zîndanê. Bi rastî ez ji te re dibêjim, heta ku tu qurişê dawî nedî, tu ji wê derê qet dernakevî." (Metta 5:25-26)

Li gorî vê şibandinê, ji te tê xwestin ku tu her tiştê ku sûcdarê te weke tezmînat dixwaze bidî. Kîna wî ya li hemberî te çiqasî mezin be, wê ewqas jî dilovaniya wî kêmtir be. Çi adil be û çi neheq be, ew ê her quruşekî ku tu deyndarê wî yî bi zorê ji te bistîne.

## BAWERIYA ZAROKEKÎ

Dema kurê me yê mezin Addison di pola sêyemîn de bû, êvarekê li ser şîvê bi min û Lisa re pirsgirêkeke ku ew li dibistanê pê re rûbirû mabû parve kir. Wî hîs dikir ku mamosteyekî wî her tim wî aciz dike. Addison difikirî ku mamoste jê hez nake û çi gava ku di polê

de qelebalixî û tevlihevî çêdibe, mamoste wî sûcdar dike. Ev rewş heta demekê berdewam kiribû û mamoste noteke neyênî di qerna wî de nivîsand û ew şand malê. Addison heta tu bêjî bes hesas bû û nikarîbû tehamula noteke xerab ya di qerna xwe de bike. Dema ku wî xemgînî û tirsên xwe parve kir, wî dest bi girî kir û hêsir barandin.

Me jê re got ku em bawer dikin ku xelet nekiriye û me jê xwest ku ew hûrguliyan bibêje. Bû nalîna wî û wisa got: "Ji bo her tiştî ez têm sûcdarkirin. Her çiqasî ji yekî zêdetir kes tevlî bibin jî, dîsa jî hemû sûc dikeve stûyê min. Ez ji bo tiştên ku min nekirine, têm sûcdarkirin. Îro, her du hevalên li kêleka min henek bi hev dikirin û dikeniyan lê ez bêdeng bûm. Mamoste li xwe zivirî û bi min de qêriya." Lêvên wî ji ber neheqiyê dilerizîn. Ji bo zarokekî neh salî, ev kirîzeke bêhêvî bû.

Mamosteyên din ên Addison, anîbûn ziman ku tevgerên wî bêhempa ne û ji ber vê yekê me dizanibû ku ev rewşeke îzolekiriye. Dema ku Lisa hewl da ku wî teselî bike, min jê pirsî: "Dema ku îro erza te şikerand, te çi jê re got?"

Addison, aniha bi çavên dikir ku agir ji wan derkeve, bersiv da: "Min jê re got, Ne ez axivîm. Ew her du zarok bûn!"

Min pirsî: "Gava ku erza te dişikîne bi piranî tu wisa bersivê didêyê?"

Addison, wisa bersiv da: "Erê. Eger ez zanibim min tu tişt nekiribe ez wisa dikim."

Min li wî nêrî û got: "Binêre kurê min, pirsgirêk tam jî ev e. Tu hewl didî ku xwe li ber rayedariya wî mafdar derxînî û gava tu xwe diparêzî, Xweda te naparêze."

Min ayetên ku di vê beşê de hatine pêşkêşkirin bi wî re parve kirin. Ji bo ku ez bibim alîkarê wî ku hîn bêtir fêhm bike, min axaftina xwe ya bi rêveberê ofîsê dêra me re, ku me di beşa berê de li ser nîqaş kir, bi wî re parve kir.

## RÊVEBEREKÎ BIBIRYAR KU ZERARÊ BIDE

Kurekî vî zilamî hebû ku beşdarî koma me ya ciwanan dibû. Min peyamên bihêz li ser pîrozî, dua û rayedariyê didan. Gelek ciwan veguherîneke giyanî dijiyan. Di xalekê de, ev kurik bi girî hat ba jina min û pirsî bê ka çawa mimkun e ku meriv jiyaneke paqij û pîroz bijî dema ku ewqas tevgerên nexwedayî li malê diqewimîn. Piştre wî hin hûrgulî parve kirin ku ji min re bûn alîkar ku ez fêhm bikim bê çima bavê wî ewqasî li dijî min bû.

Piştî çend mehan, çar xortên cuda ji min re gotin ku ew çiqasî ji ber ku ez ji kar hatime derxistin aciz in. Ez hîn bûm ku çavkaniya vê agahiyê kurê wî zilamî bû û gava ez çûm cem wî, wî ji min re got ku wî ev ji bavê xwe bihîstiye.

Ez çûm ba bavê wî û wî jî pejirand lê pastorê mezin sûcdar kir û got ku daxwaza wî ew e ku ez ji kar bêm avêtin. Hefte derbas bûn û rewş aloz bû. Em bi malbatî ji ber tengezariya ku me nizanibû em ê li dêrê bimînin an jî ji kar bên avêtin, em diêşiyan. Me xaniyek kirîbû, jina min ducanî bû û pereyên me an jî cihekî me tunebû ku em herinê. Min nexwest CV'ya xwe bişînim cîhekî din. Min bawer dikir ku Xweda min aniye vir û planeke min a alternatîf tunebû. Jina min dilgiran û xemgîn bû û wê min teşwîq kir ku ez tiştekî bikim: "Canê min, ez dizanim ku ew ê te ji kar derxînin. Her kes wisa ji min re dibêje."

Ew mafdar bû. Pastorê mezin di dawiya dawî de pejirand ku min ji kar derxîne. Di perestîşa sibeheke Yekşemê de, wî diyar kir ku wê guhertinên mezin di koma ciwanan de çêbibin. Ez hîn jî pê re neaxivîbûm. Roja din hatibû plankirin ku ez bi wî û rêveberê ofîsê re bicivim. Xweda ji min re got ku ez xwe neparêzim.

Roja din, gava ku ez ketim ofîsa pastorê mezin, ew bi tenê bû. Wî got: "John, Xweda te şand vir. Ez nahêlim tu herî." Wî fikra xwe guhertibû. Ez rehet bûm, Xweda di kêliya dawî de min xelas kiribû. Piştre pastor pirsî: "Çima rêveberê ofîsê dixwaze tu ji kar bê avêtin?" Min got ku ez nizanim û li ser daxwaza wî, min qebûl kir ku ez her tiştî bikim ji bo ku em li hev bên.

Piştî civînê ne bi gelekî, min biryareke nivîskî ya ku sedemên vî rêveberî nîşan didin, wergirt. Ez amade bûm ku vê delîlê bibim ba pastorê mezin. Min dixwest ku ew bibîne bê ka li dû wî çi diqewime. Min çil û pênc deqeyan dua kirin û meşiyam û min hewl dida ku hesta di hundurê min de ya ku min aciz dikir, pê re serî derxînim. Beza di nava min de berdewam dikir: “Xwedêyo, ev zilam bi durustî tevnegeriyaye. Divê ev rewş were eşkerekirin. Bandoreke wî ya wêranker li ser vê xizmetê heye. Divê ez rastiyê ji pastorê payebilind re bibêjim!” Min niyeta xwe ya eşkerekirina wî hîn bêtir mafdar derxist, “Her tiştê ku ez ê ragihînim rast û belgekirî ye. Ne hestyarî ye. Eger ew neyê sekinandin, tevgerên wî yên dejenerebûyî wê bikeve nav tevahiya dêrê.”

Di dawiyê de, bi awayekî xeyalşikestî ez qêriyam, “Xwedêyo, tu naxwazî ez wî îfşa bikim, ne wisa?” Dema ku min ev got, dilê min bi aştiya Xweda re bi ser ve çû. Min bi matmayî serê xwe hejand. Min dizanibû ku Xweda naxwaze ez tiştekî bikim, ji ber vê yekê min delîl avêtin. Paşê, dema ku min dikarî bi awayekî objektîf li rewşê binêrim, min fêhm kir ku ez li şûna parastina yên din, li xweparastin û tolhildanê digeriyam. Ji bo ez bawer bikim ku motîvasyona min ne berjewendî ye, min di aqilê xwe re derbas kir. Agahiyên min rast bûn lê sedemên min nepak bûn.

Dem derbas bû û rojekê berî seata kar dema ku min li derveyî dêrê dua dikirin, vî zilamî otomobîla xwe park kir. Xweda ji min xwest ku ez xwe dilnizm bikim. Min tavilê dest bixweparastinê kir: “Na, Xwedayo, hewce ye ku were xwe bavêje min. Sedema hemû pirsgirêkan ew e.” Min duayên xwe berdewam kirin lê Xweda bêdeng bû. Bîst deqe şûnda, Reb dîsa israr kir ku ez bi çûna ba wî xwe dilnizm bikim. Min dizanibû ku ew Xweda ye. Min gazî zilam kir û çûm ofîsa wî. Lêbelê gotinên ku min gotin û awayê ku min ew gotin, pir cuda bûn ji ya ku ew ê berî ku Xweda min terbiye bike. Min bi dilsozî lêborîna xwe ji wî xwest. Min jê re got ku ez li

hemberî wî bi rexnegirî û darizandî tev digeriyam. Ew hinekî nerm bû û em demekê axivîn. Ji wê rojê û pê ve, helwesta wî ya êrîşkar a li hemberî min rawestiya.

Şeş meh şûnda, dema ku ez li derveyî bajêr bûm, hemû kiryarên wî yên xelet ji pastorê mezin re hatin îfşakirin. Tiştên ku wî kiribûn ji yên ku min dizanibûn pir xirabtir bûn. Ew tavilê ji kar hat avêtin. Ew hate darizandin lê ne ji destê min ve. Tiştê ku wî hewl da ku bi min bike, bi serê wî hat. Lêbelê dema ku ev tişt qewimîn ez kêfxweş nebûm. Ez ji bo wî û malbata wî xemgîn bû. Min êşa wî fêhm kir ji ber ku min jî ji ber wî zehmetî kişandibûm. Ji ber ku berî bi şeş mehan min ew efû kiribû, min jê hez dikir û ez kêfxweş nebûm ku şert û mercan derbeyek li wî xistibûn.

Ez yanzdeh salên din beşdarî wê dêrê bûm û gelek caran ji min dihat xwestin ku xizmetê bikim. Şerma ku wî li ser navê min danîbû ji holê rabû, li şûna wê navê min bi rûmet bû. Dema ku ez li paşerojê dinêrim, ez fêhm dikim ku ez di wê dema dijwar de mezin bûm û piştre Xweda li ber wan kesên ku raporên derew li ser min bihîstibûn, ez bêtir bilind kirim. Çawa ku Bav, Îsa ji bo îteata wî û ji ber neparastina xwe ewqas rûmet kir, ew zarokên xwe yên ku mînaka Îsa dişopînin jî rûmet dike.

## XWENDEKARÊ SALÊ

Piştî ku min Nivîsên Pîroz û ev bûyer bi Addison re parve kir, min got: “Kurê min, hilbijartineke te heye. Tu dikarî berdewam bikî ku xwe biparêzî û di bin darizandina mamosteyê xwe de bimînî, an jî tu dikarî fêhm bikî ku tu bi awayekî xwedayî bersiva tohmetên wî nadî. Ji ber vê yekê tu dikarî herî cem mamosteyê xwe, xwe dilnizm bikî û ji ber bêrêzî û berxwedana li hemberî rayedariya wî lêborînê bixwazî. Hingê Xweda wê li doza te binêre.”

Addison, pirsî û got: “Naxwe wê demê gava ez ji bo tiştekî ku min nekiriye bêm sûcdarkirin, divê ez çi bikim?”

“Divê tu destûrê bidî ku Xweda te biparêze. Ma parastina ku te bi xwe kir, bi kêr hat?”

Addison, wisa bersiv da: “Na, ez dixwazim Xweda min biparêze.”

Roja din çû cem mamosteyê xwe û xwe dilnizm kir li ber wî. Ji ber ku gava erza wî dihat şikerandin û ew li ber mamosteyê xwe radibû, ji mamosteyê xwe xwest ku wî efû bike.

Mamoste ew bexşand û hefteya din Addison weke xwendekarê hefteyê di pola xwe de hate xelatkirin. Careke din bi mamosteyê xwe pirsgirêkek nejiya. Wî ew sal bi xelata herî bilind a mamosteyê xwe, di merasîma xelatên dawiya salê de, bi dawî kir.

Eger zarokekî neh salî dikare di krîzekê de xwe dilnizm bike û şahidiya rastiya Gotina Xweda bike, divê îcar em hîn çiqas bêtir vê yekê bikin? Ez difikirim ku ev nîşan dide bê çima Îsa wisa gotiye: “Loma, kî xwe wek vî zarokî nizim bike, di Padîşahiya Ezmanan de yê herî mezin ew e” (Metta 18:4).

## HEVDÎTINA DAWID BI RÊBEREKÎ FÊHMKOR RE

Addison, tiştê ku kurê Îşay Dawid fêhm kiribû, fêr bibû. Xweda Dadgerekî adil e û eger em muameleya neheq a ku em ji rayedaran dibînin di destên Wî de bihêlin, Ew ê her gav bi adil me bidarizînî. Dema ku em behsa Dawid dikin, divê em ji bîr nekin ku ne Şeytan, lê Xweda bû yê ku ew xist bin desthilata rêberekî fêhmkor û zalim ê bi navê Şawûl.

Pêvajo dest pê kir dema ku pêxemberê mezin ê Îsraêlê Samûêl, Dawid weke qralê ku wê bê serê gelê Xweda, tayîn kir. Dibe ku Dawid di nava kelecanê de wisa fikirîbe: “Ev ew kes e ku qralê niha mesîh kiriye. Wê demê ez ê bi rastî bibim qral!”

Şawûl îteat ji Xweda re nekiribû û ji aliyê ruhekî xerab ve eziyet lê dihat kirin. Tenê dema ku li lîrê dihat xistin, rihetî didît. Xulamên wî dest bi lêgerîna xortekî kirin ku bikaribe li ber wî bisekine û xizmetê jê re bike. Yek ji xizmetkarên qral; Dawidê kurê Îşay

pêşniyar kir. Qral Şawûl, gazî Dawid kir û jê xwest ku were qesrê û xizmeta wî bike. Dibe ku Dawid wisa fikirîbe: “Xweda soza xwe ji niha ve bi rêya pêxember pêk tîne.” Dibe ku wî ji xwe re wisa gotibe: “Dibe ku ev pozîsyona min a asta destpêkê be.”

Dem derbas bû û jê hat xwestin ku xwarinê bide birayên xwe, yên ku bi Filistîniyan re di şer de bûn. Dema ku gihîşt qada şer, wî dît ku şampiyonê Filistîniyan Golyat tinazê xwe bi artêşa Xweda dikir û hîn bû ku ev tinazên wî ev çil roj in berdewam dikin. Ew hîn bû ku qral soz daye ku keça xwe bide wî zilamî ku bikaribe zora vî dewî bibe. Dawid çû hizûra qral û destûr xwest ku şer bike. Wî Golyat kuşt û keça Şawûl qezenc kir. Wî xwe di dilê Şawûl de bi cih kiribû û ji bo bibe zavê qral bi qîza wî re bû destgirtî.

Kurê mezin ê Şawûl Yonatan, peymaneke dostaniya herheyî bi Dawid re çêkir. Destê Xweda di her karekî ku Şawûl da Dawid de li ser wî bû û serkeftina wî her çû mezin bû. Qral xwest ku Dawid bi kurên wî re li ser sifrê rûne. Her tişt baş diçû û Dawid pir bi kelecan bû. Ew li qesrê dijiya, li ser sifreya qral dixwar, bi keça qral re zewicî, bi Yonatan re dost bû û di hemû şeran de bi ser ket. Heta wî dilê xelkê jî bi dest dixist. Ew dikaribû bibîne ku pêxemberîtiya li ser wî hêdî hêdî li ber çavên wî rast derdikeve. Şawûl ji hemû xizmetkarên xwe yên din bêtir ji Dawid hez dikir û ew kir zirxhilgirê xwe. Şawûl ji bo Dawid mîna bavekî bû û Dawid bawer bû ku Şawûl dê rêberiya wî bike, wî perwerde bike û rojekê bi rûmeteke mezin wî bi cih bike. Dawid ji qencî û dilsoziya Xweda kêfxweş bû.

## GUHERÎNA JI NIŞKA VE

Lê rojekê her tişt guherî. Gava Şawûl û Dawid bi hev re ji şer vegeriyan, jinên ji hemû bajarên Îsraêlê hatibûn reqisîn, derketin meydanê û ev stran gotin: “Şawûl bi hezaran kuştin, Dawid jî bi deh hezaran.” Vê stranê Şawûl gelekî hêrs kir û ji wê rojê û pê ve, wî Dawid biçûk kir. Şawûl rim avêt Dawid û komplo lê kir ku wî bikuje.

Pirtûka Pîroz dibêje ku Şawûl ji Dawid nefret dikir ji ber ku wî dizanibû ku Xweda bi wî re ye. Şawûl dizanibû ku Xweda dev ji wî berdaye. Dawid neçar ma ku bireve ji bo canê xwe xelas bike. Ji ber ku cîhek din tunebû ku biçe wir, ew çû beyebanê. Dawid wisa difikire: "Çi diqewime?" "Soz dihat bicihanîn û niha ew bû parçe parçe. Zilamê ku şêwirmend û rêberê min bû hewl dide ku min bikuje. Ez dikarim çi bikim? Şawûl xizmetkarê Xweda yê mesîhkirî ye. Eger ew li dijî min be, çi şansê min heye ku ez xelas bibim gelo? Ew qralek e, zilamekî Xweda ye û serokê gelê Xweda ye. Xweda çima destûrê dide vê yekê?"

Êdî Şawûl bi sê hezar şervanên herî baş ên Îsraêlê re, bi mebesta tunekirina wî, di nav beyeban û şikeftan de li Dawid digeriya. Di vê gavê de sozdayîn, ji bo Dawid ku ji bo jiyanê têdikoşiya, tenê xewnek bû. Dawid êdî li qesrê nedijiya an jî li ser sifreya qral nedixwar. Ew di şikeftên tarî û evnikî de dijiya û bermayiyên heywanên kovî dixwar. Ew êdî li kêleka qral ne li ser hespan bû, lê ji aliyê heman zilamên ku wî berê li kêleka wan şer kiribû ve dihat nêçîrkirin. Ne nivînek germ, ne xizmetkarên ku bi wî re bûn û ne jî hurmetên qesra qral li cem wî hebûn. Jina wî dabûn yekî din.

Rêberê ku Xweda dixwest pêve girêdayî be çawa dikaribû vê yekê bîne serê wî? Dawid bi îhtîmaleke mezin bi hêrs, bêhêvîbûn û depresyonê re têdikoşiya. Çima Xweda di vê mijarê de tiştek nedikir? Ma Ew xema min dixwe? Baş e ka sozên Wî li kuderê man? Çima destê xwe deyne ser zilamekî ewqas zalim ji bo ku rêberiya gelê peymanê bike?

Şawûl ewqas bi biryar bû ku bi her awayî wî xortî bikuje ku ji ber vê hişê xwe winda kiribû. Kahînên li Bajarê Novê ku ji Dawid re stargeh, xwarin û şûrê Goliyat peyda kirin, hebûn. Haya wan ji reva Dawid ya ji ber Şawûl tunebû û texmîn kirin ku ew di rêwîtiyekê de ye ku xizmeta qral bike. Wan ji Reb rîca kir û ew şandin bi rêya xwe ve.

Dema Şawûl ji vê yekê agahdar bû, pir hêrs bû. Wî heştê û pênc kahînên bêguneh ên Reb kuştin û gelê Bajarê Novê -mêr, jin

û zarok- di şûr re derbas kirin. Wî heman cezayê ku diviyabû li ser Amalekiyan bidaya, li ser van bêgunehan birî. Têgihîştina hilbijartina rêber a Xweda û bi mentiqkirina li ser wê hema hema ne mumkin bû. Şawûl kujerek bû. Xweda çawa dikaribû Giyanê xwe li ser mirovekî wisa bi cih bike?

Gelek dibêjin ku Şawûl bijarteya gel bû û Dawid jî ya Xweda bû. Ev gotina şaş, ji hêla kesên ku nikarin fêhm bikin ku Xweda zalimekî dike rêber ku ev bi wan tê hînkirin. Rast e ku gel qralek dixwest lêbelê Xweda hem Şawûl û hem jî Dawid hilbijartiye. Xweda got: “Ez poşman bûm ku min Şawûl kir padîşah” (Samûêl I, 15:11).

Di xalekê de Şawûl, hîn bû ku Dawid li beyebana Eyn Gediyê ye û bi sê hezar şervanan re derket rê. Di rêwîtiya xwe de, ew bêhemdî di şikeftekê de bêhna xwe vedan ku Dawid xwe li vê şkeftê berê veşartibû. Dema ku Şawûl û leşkerên xwe cilên xwe ji bo şuştinê derxistin, Nivîsên Pîroz ji me re dibêjin ku zilamên Dawid wî wisa teşwîq kirine: “Ev ew roj e ku REB ji te re got: Ez ê dijminê te bidim destê te ji bo ku tu çi bixwazî bi wan bikî.”

Piştre Dawid bêyî ku bê ferqkirin xwe bi zikkêşkê nêzî wî kir û bi dizî perçeyek ji qiraxa cibeya Şawûl birî. Piştre, Dawid ji ber ku ev yek kir poşman bû û wijdanê wî tehamul nekir: “Zilamên Dawid jê re got: “Va ye roja ku Xudan ji te re gotibû, ‘Ji bo daxwazên te, ezê dijminê te bidim destê te.’ Ew roj ev roj e!” Dawid rabû ji dawa Şawûl, perçeyek bi dizî jê kir. Lê paşê ji ber vê kirina xwe li ber xwe ket. Ji zilamên xwe re got: “Xwedê neke ku ez li dijî xweyê xwe, kifşkiriyê Xudan vî tiştî bikim. Ez destê xwe li dijî kifşkiriyê Xudan ranakim.” Dawid bi van peyvan zilamên xwe asteng kir û nehişt ku êrîşî Şawûl bikin. Şawûl ji şikeftê derket û da rê” (Samûêl I, 24:4-7). Der barê wijdanê wî de, Wergera Qral James wisa dibêje: “Wijdanê Dawid ew ceza kir.” Dilê wî hîn jî ji bo rêberekî ku ewqas zehmetî anîbû jiyana wî hesas bû. Diyar e ku wî li hember ramanên hêrs, tirs û dilşikestinê li ber xwe dabû û stûyê xwe li ber wan tewandibû.

Ji ber ku wî ji berê ve perçeyek ji cibeya qral birîbû, wî hilbijart ku wê bikar bîne da ku bêgunehiya xwe li hember Şawûl îspat bike. Dawid li cihekî dûr sekinî, xwe avêt erdê û bang Şawûl kir: “Bavo, li vî perçeyî destê min binêre ku ji dawa xiftanê te hatiye jêkirin. Belê lê binêre! Min ji dawa xiftanê te perçeyek qut kir, lê min tu nekuştî. Ji ber vê yekê, baş bizane ku di dilê min de xerabî û fikra serhildanê tuneye. Dîsa jî, tu dixwazî min bikujî” (Samûêl I, 24:11).

Dawid ditirsiya ku Şawûl wî weke kesekî serhildêr û xerab bihesibîne. Divê Dawid dilê xwe ceribandibe û pirsîbe: “Min li kuderê şaşî kir? Dilê Şawûl çawa ewqasî zû li dijî min zivirî?” Ji ber vê yekê ew qêriya: “Hin kesan dixwestin ez te bikujim... Min perçeyek ji cibeya te birî lê min tu nekuşt. Ji ber vê yekê tu bi rastî dizanî ku di dilê min de tu ramaneke xerab an jî serhildêr tune.” Ew nikaribû bawer bike ku Şawûl wê bi tena serê xwe li tiştekî wisa bifikire. Dibe ku kesekî ew li dijî Dawid jehrî kiribe û ji ber vê yekê wî dixwest dilsoziya xwe ya ji Şawûl re îspat bike. Ew difikirî ku eger ew bikaribe vê yekê bike, Şawûl wê wî qebûl bike, bi dilovanî pê re mijûl bibe û soza pêxemberiyê wê rast derkeve.

Ew kesên ku ji aliyê bav an jî rêberekî ve tên redkirin, meyla wan heye ku hemû sûcdariyê bixin stûyê xwe. Ew di nav ramanên êşdar de asê mane: Min çi kir? Û gelo niyeta min xirab bû? Ew barê berdewam hildigirin ser pişta xwe ji bo ku bêgunehiya xwe ji rêberê xwe re îspat bikin. Ew bawer dikin ku heke ew karibin dilsozî û nirxê xwe nîşan bidin, ew ê werin qebûlkirin. Lêbelê ew çiqasî hewl bidin xwe ewqasî bêtir weke kesekî redkirî hîs dikin.

Dema Şawûl dît ku Dawid her çiqasî derfeta wî hebû ku wî bikuje jî û ew nekuştiye, wî qenciya Dawid qebûl kir û ji ber vê yekê qral û zilamên xwe ji wir çûn. Dibe ku Dawid wisa fikirîbe: “Niha wê qral min qebûl bike. Bi vî awayî wê soza pêxembertiyê pêk were. Bê guman ew dilê min dibîne û êdî wê bi min re çêtir tevbigere. Ew ê bibe rêberekî baş û dilovan. Ax, ev raman çiqasî ji rastiyê dûr in!

## BI BIRYAR E KU MIN TUNE BIKE

Piştî demek kurt, Şawûl agahdar bû ku Dawid li Girê Hakîlayê xwe vedişêre. Şawûl bi sê hezar leşkerên bijartî dîsa derket şopa wî. Armanca Şawûl ew bû ku dîsa Dawid tune bike. Ez bawer im ku berdewamiya şopandina Şawûl ji bo Dawid hilweşandina moral û motîvasyona wî bû. Wî fêhm kir ku ev ne şaşfêhmkirinek bû; Şawûl bi zanebûn û bêyî provokasyonekê niyet kiribû ku wî bikuje.

Şawûl dizanibû ku Dawid ne serî hildaye û ne jî niyeteke wî ya xerab heye lê dîsa jî li dijî wî tevgeriya. Dawid ferq kir ku tiştê wî ji destpêkê ve hêvî dikir ne rast bû: wî fêhm kir ku ew bi rêberekî xerab re mijûl dibe. Xweda çawa dikarîbû mesîhkirina xwe li ser zilamekî wisa deyne?

Dawid, bi Avîşay, birayê biçûk ê Yoav ku xortekî xwînxwar e, bi dizî ket nava artêşgeha Şawûl. Xweda ew hemû xistibûn xeweke kûr. Herdu zilam bi dizî di nava tevahiya artêşê re derbas bûn û gihîştin cihê ku Şawûl lê razabû. Avîşay li ber Dawid geriya û got: “Îro Xwedê dijminê te da destê te. Bihêle ez bi rima wî bi yekcarî wî bimîxînim. Cara diduyan êdî ne lazim e ez lê bixim” (Samûêl I, 26:8).

Gelek sedemên baş hebûn ku Dawid, Şawûl bi destê Avîşay bikuje. Berî her tiştî, Şawûl heştê û pênc kahînên bêguneh, tevlî jin û zarokên wan bi xwînsarî qetil kiribûn! Di bin rêbertiya zilamekî wisa dîn û beradayî de tevahiya gel di xetereyê de bû. Îro roj bi taybetî di derbarê rêberên dêran de heman nêrînên wekhev hene. Lêbelê rêberên dêran bi qasî Şawûl tevgerin xerab nekirin!

Ya duyemîn, Xweda bi rêya Samûêl, Dawid weke qralê Îsraêlê mesîh kiribû. Dema wê hatibû ku Dawid êdî li mîrata xwe xwedî derkeve! Ma wî dixwest weke zilamekî mirî û soza pêxemberîtiya li ser wî pûç derkeve? Min ev fikir ji xebatakarên derê yên dilşikestî gelek caran bihîstibû.

Ya sêyem, ma Şawûl bi artêşeke ku ji sê hezar kesan pêk dihat nemeşiya ji bo ku Dawid û zilamên wî bikuje? Yan kuştin yan jî dema

kuştinê bû. Bê guman, ev parastina canê xwe bû. Avîşay, dizanibû ku eger ew derkeve dadgehê, wê kuştina Şawûl ji aliyê wî ve were pejirandin. Bê guman, ev hukm wê îro jî kes îtîrazê lê neke. Em ê bê dudilî wê pesend bikin.

Ya çaremîn, ma ne Xweda bi xwe bû ku artêş xist nav vê xewa kûr û ew hişt ku bêhemdî werin ba Şawûl da ku gelê xwe ji rêberê xerab rizgar bikin? Derfeta wan hebû û dibe ku ew careke din tu carî vê fersendê bi dest nexin. Êdî dem hatibû ku pêxembertî pêk were! Çend rêveber an jî karmendên dêrê dema ku rêberê wan ket bi vî rengî fikirîne? Ew wisa difikirin, "Xweda ew xistiye rewşeke ku em dikarin wî ji rêberiya me dûr bixin." Bi rastî, ev awayê hizirkirinê tenê dilên wan ên bêîtaet eşkere dike.

Ev hemû sedem baş xuya dikirin. Ew bi mantiq bûn û Dawid ji birayekî dilsoz teşwîq û cesaret digirt. Ji ber vê yekê, heke di dilê Dawid de serîhildaneke piçûk jî hebûya, ew ê bihişta ku cîgirê wî Şawûl bi şûr bikuje û wê xwe bi tevahî mafdar hîs bikira. Lêbelê guh bidin bersiva Dawid: "Wî nekuje. Kî destê xwe dirêjî kifşkiriyê Xudan bike, wê sûcdar be" (Samûêl I, 26:9). Eger em bi termînolojiya roja me bînin ziman, "Ne bi gotinê û ne jî bi tevgerê destê xwe bide wî ji ber ku kesê ku li ber rêberê xwe serî rake, sûcdar derdikeve."

Heta eger wî mirovên bêguneh kuştibin û hewl dabe ku Şawûl bikuje jî, wê Dawid Şawûl nekuşta. Wê Dawid tol hilnedaya, wî ew bi destên Xweda ve berda. Wê hêsantir bûya tiştên ku li wir bibûna û biqediyana -hem ji bo Dawid û hem jî ji bo gelê Îsraêl. Wî dizanibû ku gel ne xwedî mîna pezê şivanekî rastî bû. Wî dizanibû ku kesekî xerab wan ji bo xwestekên xwe yên xweperest îstîsmar dike. Zehmet bû ku xwe neparêze lê bêguman hîn bêtir dijwar bû ku mirovên ji wan hez dike ji destê qralekî dînokî xelas bike!

Dawid ev biryar da her çiqasî dizanibû ku teselîya Şawûl tenê mirina wî ye jî. Dawid paqijiya dilê xwe îspat kiribû dema ku wî cara yekem Şawûl bexşandibû. Lêbelê wê careke din dest nedaya wî. Şawûl

rêberê wî û xizmetkarê Xweda yê mesîhkirî bû, ji ber vê yekê Dawid biryara darizandina Şawûl bi destê Xweda ve berda. Her çend ev li dijî şehrezayiya kevneşopî bû jî, bi vê kirinê Dawid bi aqilmendî tevgeriya.

Hûn wisa dipirsin: “Xweda ji bo ku xizmetkarê xwe Şawûl bidarizîne, kî bi kar anîn?” Bersiv: Filîstînî. Reb gelek caran ji bo ku darizandinê bîne ser rêberên xwe yên derê, wê kesên bê bawer an jî saziyên cîhanê bi kar bîne. Şawûl, bi kurên xwe re kete nava şer. Lêbelê gava ev xeber gihîşt Dawid, wî pîrozbahî nekir. Wî şîn girt!

Ya rastî Dawid, ew zilamê ku îdia dikir ku wî Şawûl kuştiye, tevî ku wî bi rastî ew nekuştibû jî, kuşt. Zilam hêvî dikir ku ev nûçe wê Dawid kêfxweş bike, lê bandora vê berevajî bû. Nûçeya ku hat ji Dawid re wisa bersivand: “Ma tu netirsiya ku destê xwe li ser mesîhkiriyê REB bilind bikî û wî tune bikî?” Piştî ku hate înfazkirin, Dawid wisa bang mirî kir: “Ji xwîna xwe tu bi xwe berpirsiyar î. Ji ber ku bi gotina ‘Min, kifşkiriyê Xudan kuşt’ te bi devê xwe, şahidî li dijî xwe kir” (Samûêl II, 1:16).

Piştre Dawid zêmarek got ji bo ku gelê Yahûda ji rûmeta Şawûl û kurên wî re bibêje. Wî ferman da ku xebera mirina wî li kolanên bajarên Filistîniyan neyê ragihandin, ji bo ku dijmin kêfxweş nebe. Wî dua kirin ku li cihê ku Şawûl lê hatibû kuştin baran nebare û li wir tu berhemdarî şîn neyên. Wî bang li hemû Îsraêlê kir ku ji bo Şawûl bigirîn. Ev ne dilê zilamekî bû ku dixwest tolhildanê bike û êdî rêzê li rêberê xwe negire. Na, zilamekî wisa wê bi vî awayî bigota: “Wî tiştê ku heq dikir dît!”

Dawid hîn bêtir lê çû. Wî kesên ji malbata Şawûl mabûn nekuştin; berevajî vê, wî dilovanî nîşanî wan da. Wî erd û xwarin da wan û li ser sifreya qral cîh da kesekî ku ji ziriyeta wî hatiye. Ma ev dişibe zilamekî ku ji darizandina rêberê xwe kêfxweş dibe? Yên ku di dilê xwe de serhildanê xwedî dikin dema ku rêberên wan ên giyanî dikevin kêfxweş dibin. Ew difikirin ku wan tiştê ku heq kiriye dîtiye. Ew pirî caran bi bêbextiyan an jî bi şîroveyên ku wan aciz

bike re, rê li ber cezayê wan vedikin. Dilê wan ne weke yê Dawid e. Ew ne li gorî dilê Xweda ne.

## XWEBICÎHKIRINA JI BO PÎROZKIRINÊ!

Divê em li ber çavan bigirin ku armanca herî dawî ya Xweda me bi destê rayedarên ku muameleya neheq li me dikin bernede û ev ji bo qenciya me ye. Ew vê yekê bikar tîne ji bo ku me ji pîrozkirinekê re amade bike. Petrûs gotinên xwe yên teşwîqkirinê didomîne: "Di şûna xerabiyê de xerabiyê nekin, di şûna nizimkirinê de jî nizim nekin. Bervajiyê vê, pîroz bikin, çimkî ji bo ku bereketê mîras bistînin hûn hatin gazîkirin" (Petrûs I, 3:9).

Pîrozkirin dibe ku her tim ji tiştên xwezayî pêk neyê; di şûna vê de, ew di warên hîn girîngtir de derdikeve: weke karakterê Mesîh, pêşketina desthilatdariyê, asteke bilindtir a rayedariyê an jî xelatên herheyî. Dema ku em bi rayedariya Xweda ve girêdayî dimînin, tu zerar nikare bigihîje rehetiya me ya giyanî. Petrûs ev yek bi pirsa "Heke hûn di kirina qenciyê de xîretkêş bin, kî dê zirarê bide we?" (Petrûs I 3:13) zelal kir. Konteksta vê gotinê şopandina mînaka kesane ya Îsa ye.

Petrûs, derbarê karekterê weke yê Mesîh de ev teşwîq kiriye: "Mesîh jî bi carekê ji bo gunehan cefa kişand, da ku me bigihîne Xwedê. Yê rast ji bo yên nerast mir. Ew di bedenê de hat kuştin, lê ji aliyê Ruh ve hat vejandin. Îcar çawa ku Mesîh di bedenê de cefa kişand, hûn jî bi eynî armancê xwe çekdar bikin. Çimkî yê ku di bedenê de cefa kişandiye, dev ji guneh berdaye" (Petrûs I, 3:18; 4:1).

Petrûs, talîmat dan me ji bo êşên weke yên ku Mesîh kişandine, em xwe bi çekdar bikin ku ev êş di çarçoveya nameyê de ji hêla rayedaran ve, muameleya neheq e. Hûn dikarin xeyal bikin ku leşker bê çek bikaribin herin şer? Ne çek, ne gule, ne kêr -tu tiştek tuneye! Wê çiqasî rewşeke pêkenok bûya. Lê dîsa jî gelek bawermend, ne çekdar in ku muameleya neheq bibînin. Dema ku êrîş li wan bê kirin,

wê şoq û matmayî bibin an jî wê serê wan tevlihev bibe. Li şûna ku li gorî prensîbên ku Gotina Xweda li ser rayedariyê fêr dike tevbigerin ku ew bi aqilê xwe bertekê nîşan didin.

Ez ê mînakeke din a çekdarbûnê bidim we. Beşek girîng a perwerdehiya pîlotên balafirgehê bikaranîna simulatorên firînê ye. Di van simulatoran de, pîlot hema hema her rewşeke awarte ya ku dibe ku di dema firînê de rastî wan werin, tecrûbe dikin. Di nava ewlehiya vê rewşê de, ew qabîliyetên xwe yên bersivdayînê bi pêş dixin heya ku ew karibin bi serkeftî rewşên awarte bi rêkûpêk bikin. Ev amadekarî wan ji bo rewşên awarte amade dike. Dema ku di dema firîneke rastîn de qezayek çêdibe, pîlot panîkê nakin -ew bi rêberî û piştgiriya perwerdehiya xwe ya berfireh bertekê nîşan didin. Her çiqasî rêwî panîkê bikin û marûzî şoq û heyecaneke zêde bên jî, pîlot aram tevdigerin û bi temamî di bin kontrolê de ne. Pisporên ku piştî qezayê li ser tomarên “qutiya reş” a balafirê lêkolînê dikin, ji ber aramiya pîlotan matmayî dimînin. Bi gelemperî heta kêliya dikevin jî di dengê wan de şopa panîkê tuneye. Ji ber ku ew bi çekdar bûn!

Ev pirtûk dikare weke rêbernameyeke perwerdehiya firînê xizmetê bike. Gotina Xweda ya di vê peyamê de, wê we di mijara rayedariyê de dijwarîyên ku hûn ê di jiyanê de rastî wan bên bi çek bike an jî wê we amade bike. Eger hûn bersiveke rast bidin, hûn ê pîroziyê bi dest bixin. Petrûs ji me re got ku ew kesên ku mînaka êşê ya Mesîh dişopînin, ji gunehê dûr dikevin. Çi gotineke bêhempa! Bi gotineke din, ew kesên ku muameleya neheq ya ji rayedaran tê bi awayekî rast hildigirin, asta gihîştina giyanî bi dest dixin.

Sozeke hîn mezintir heye. Pawlos wisa nivîsand:

> “Ev peyv dilsoz e: Eger em bi wî re mirine, Emê bi wî re bijîn jî. Eger em ragirin, Emê bi wî re padîşahiyê jî bikin. Eger em wî înkar bikin, Ew jî wê me înkar bike.” (Tîmotêyos II, 2:11-12)

Rayedariya giyanî ji bo kesên ku weke Mesîh êşê dikişînin, soza wê hatiye dayîn. Her ku hûn li ber zehmetiyên mezin li ber xwe bidin, rayedariya ku Xweda emanetî we kiriye wê ewqasî mezin bibe. Dîsa jî gava hûn rastî rayedarekî fêhmkor bên, hûn ê bibînin ku Xweda hûn ji bo pîrozkirinê amade kiriye. Lê gelo hûn ê bi awayekî rast bersivê bidin û pîroziyê bi dest bixin an jî hûn ê bi êş û dilmayînê bimînin? Hilbijartin a we ye. Bidin dû rêya yê Serkeftî ji ber ku Ew jiyan e!

BEŞ 14

# DADWERIYA LI SER XWE

*Kesên rêzê nîşanî rayedariyê didin,*
*dibin xwediyê rayedariya mezin û rêzê dibînin.*

Her kes weke Dawid bersivê nade rêberên xwe. Em gelek caran ji kêmasiyên rayedariyên xwe zewqê distînin û em xwe mafdar hîs dikin ku têkiliyên xwe yên bi wan re qut dikin. Lêbelê, çawa em berteka gunehên yên din didin, nemaze yên kesên rêber, ev yek ji nîşaneyên herî mezin ên gihîştina me ya giyanî ye. Ji ber vê yekê, Xweda gelek caran şaşî û xeletiyên rêberên di jiyana me de bikar tîne ji bo ku rewşa rastîn a dilê me eşkere bike. Em vê yekê dibînin ku di kurekî Nûh de pêk hatiye.

## RAST LÊ XELET

Piştî Tofanê, Nûh dest bi çandina erdê kir û rezek çand. Rojekê, piştî ku gelekî vexwar ew vegeriya konê xwe, bi wê serxweşiya xwe cilên xwe derxistin û şilfîtazî di xew re çû.

Kurê Nûh ê herî biçûk Ham, ket hundurê konê Nûh, tazîbûna wî dît û derket derve û çû mesele ji her du birayên xwe Sam û Yafet re got. Wî tenê ji "malbata" xwe re got. Dibe ku wî tiştekî weke vê gotibe: "Birano, bavê min pir serxweş e û şilfîtazî razaye!" An

jî dibe ku ya xerabtir, wî birayên xwe vexwendin ku rêberê xwe yê giyanî tazî bibînin.

Gava Sam û Yafet ev yek bihîstin, wan rahişt cil û bergekî avêtin ser milên xwe, rûyê xwe zivirandin û paşpaşkî ketin hundurê kon û bavê xwe yê tazî nixumandin. Gava Nûh ji serxweşiya xwe şiyar bû, wî fêhm kir ku Ham çi kiriye. Piştî vê guh bidin peyama Nûh:

“Nalet li Kenan be,
Ji birayên xwe re bibe koleyê koleyan.
Bi ser de wî got:
Pîroz be Xwedayê Sam Xudan,
Kenan jê re bibe xulam.
Xwedê cihê Yefet fireh bike
Û bila ew di konê Sam de bijî.
Kenan jê re bibe xulam.”
(Destpêk 9:25-27)

Di destpêka vê pirtûkê de, me li ser encamên bêîteatiya rayedariya Xweda nîqaş kir. Ew kesên ku bi dilxwazî serî hiltînin, dikevin bin lanetê. Ham bi awayekî dijwar hînî vê rastiyê bû. Wî rêz li rayedariya ku Xweda li ser Nûh dewir kiribû negirt, ew biçûk dît û bi vî awayî nifşên xwe xistin bin lanetê. Balkêş e ku her çiqasî sûcê Ham encamên cidî ji bo wî hebûn jî, bi qasî ku em dizanin, serxweşiya Nûh nebû sedema mehkûmkirinê.

Lawaziya exlaqî ya Nûh ji bo her sê kurên wî bû ceribandinek, dilê her yekî bi dorê eşkere kir. Yek ji wan bêaqilekî serhildêr bû, lê herdu yên din rêzdar û dilovan bûn. Nûh bi serxweşiya xwe nebû mînakeke baş lêbelê darizandina tevgera wî ne mafê kesên di binya wî re bûn ya Xweda bû. Du kuran ev yek fêhm kirin û rûmetkirina wî berdewam kirin. Lêbelê, kurê din mesele xist destên xwe ji bo ku bavê xwe bêrûmet û şerm bike, laneta ku wî jê bawer dikir ji bo bavê wî hatiye nivîsandin anî serê xwe.

Sam û Yafet, lawaziya bavê xwe paşguh kirin. Wan nexwest rewşa wî bibînin an jî yên din (jin û zarokên wan) wî wisa di wî halî bibînin, ji ber vê yekê wan ew nixwumand. Ji ber ku rêz ji meqamê bavê xwe re digirtin, wan meqamê wî û dilê xwe parastin. Lêbelê Ham, bêguman ji bo ku qabîliyeta rêvebirina bavê xwe nebaş bike, henekê xwe bi bavê xwe kir û qedir û qiymetê wî xist. Vê yekê wê hincetek bidaya Ham ku her gava ew bixwaze bêîteatiyê li bavê xwe bike. Ev rêbaz ji bo her kesê ku di dilê xwe de serhildanê dihewîne, derbas dibe. Bi nepejirandina kesên rayedar re, ew xwe ji hemû girêdanan azad hîs dikin. Ew girêdanên di dilê xwe de qut dikin.

Di “salona şerefê” ya Xweda de (Îbranî 11), bawerî û îteata Nûh tê pesinandin lêbelê em Ham di wê lîsteyê de nabînin. Ma Ham ne mafdar bû? Ma Nûh ne serxweş û tazî bû? Belê, agahiyên Ham didan ji sedî sed rast bûn, lêbelê ew ji aliyê prensîbê ve xelet bû. Mûhakemekirin tevgera wî rast derxist, wî tenê tiştê ku dîtin ragihand û ”realîst” tevdigeriya. Lêbelê prensîbên îteat û rêzgirtinê berevajî vê yekê dibêjin. Sam û Yafet rêz li bavê xwe girtin û hatin pîrozkirin.

Gelek kes weke Ham, tiştên rast di derbarê rêberên xwe de dizanin lêbelê ew li gorî standartên Xweda xelet in. Ew kesekî din bêrûmet dikin û pîrozkirina xwe winda dikin. Ew di bêaqiliya têgihîştin û muhakemeya xwe de dijîn. Ew ji dilê Dawid, Sam û Yafet bêpar in. Dema ku Şawûl jiyana xwe ji dest da, Dawid şîn girt û ev zêmar got:

“Agahiyê negihînin Gatê,
Ne jî li kolanên Aşqelonê belav bikin.
Herwiha, bila ne keçên Filîstî dilşa bin,
Ne jî keçên bêsinetan bicoşin.
Şawûl û Yonatan şîrîn û beşerxweş bûn,
Di jiyan û mirinê de ji hev veneqetiyan.
Ji eyloyan leztir û ji şêran hêzdartir bûn.

Ya keçên gelê Îsraêl, ji bo Şawûl bigirîn!
Wî hûn bi cilên sor dixemilandin
Û bi kincên ji xemlên zêrîn dineqişandin.”
(Samûêl II, 1:20, 23-24)

Dawid, çardeh salan ji destê vî rêberî zehmetiyên giran kişandibû. Têgihîştina xwezayî û muhakemeya dinyayî, wî teşwîq dikir ku kêfxweş bibe û serkeftinê îlan bike. Dawid careke din îspat kir ku ew li gorî prensîbên rayedariyê dijî û bi mînaka nîşan da ev yek ji kesên di bin rayedariya xwe de jî veguhest. Di encamê de, ew bû rêberekî mezin di qraliyê de. Yên ku rêzê li rayedariyê digirin, dibin xwediyê rayedariya mezin û rêz li wan tê girtin. Kesên wisa bereketa Xweda dikişînin ser xwe. Îcar yên ku rayedariyê biçûk dibînin an jî wê hêja nabînin, berhema bêrêziyê diçînin û dibin sedem ku darizandin bê ser serê wan.

## DADWERIYA LI SER XWE

Em pasaja xwe bingehîn ya derbarê rayedariya hatiye dewirkirin de û dîsa li ser bikolin:

“Bila her kes bi ya hukûmeta li ser xwe bike; çimkî hukûmeta ku ne ji aliyê Xwedê ve ye tune û yên heyî ji aliyê Xwedê ve hatine danîn. Ji ber vê yekê, yê ku li hember desthilatiyê derkeve, ew li ber sazûmana Xwedê radibe û yên ku li ber radibin, wê dîwankirina xwe bînin.” (Romayî 13:1-2)

Ew kesên ku li hemberî rayedariyê li ber xwe didin, tên darizandin. Eget hûn dest bidin rayedariyê, hûn dest didin Xweda. Berî ku em dest bi xizmeta xwe bikin, ez di du xizmetên navneteweyî de xebitîm. Min dît ku berxwedana li hemberî rayedariyê her gav dibe sedema darizandinê. Darizandin bi gelek awayan hat lêbelê qet nesekinî ku neyê. Bi taybetî di derxistina

karmendan de ya ji xizmetê eşkere bû. Rêber an jî şert û merc çiqasî neyên fêhmkirin jî, dema ku ew rexneyê li rêberan dikin an jî wan biçûk dibînin, dema ku dilê wan ji tahlbûnê ve tije dibe, di dawiyê de ew bi zehmetiyên mezintir re rûbirû diman. Rewşa hinekan ya aborî, ya hinekan ya kar, ya hinekan ya tendurustiyê xera bû, yên din jî ji ber pirsgirêkên zarok û zewacên xwe zehmetî kişiyan. Lîste dirêj û berdewam dike lêbelê di jiyana wan kesên ku nekarîn çavdêrên xwe yên giyanî bi rûmet bikin de kêmasiyên awarte tune bûn.

Min gelek kes dîtine ku bi neheqî ji xizmetê hatine avêtin, lê dîsa jî wan giyanekî xwe yê xweş parastine. Wan red kir ku li ser kardêrên xwe yên berê nebaş biaxivin an jî guh bidin kesên ku wisa dikirin; di şûna wê de, her gava ku pirsgirêk derdiket holê, wan pîroz dikirin û rûmet didan wan. Wan dizanibû ku Xweda çavkaniya wan e ku Xweda wê ji wan re peyda bike, wê lênêrîna wan bike û di encamê de wê wan bilind bike. Min dît ku ew tiştên mezintir ji yên ku dema ew di nav kadroyên me de bûn bi dest xistine. Piştî salan, ez bi hinekan ji wan re rast hatim û min dît ku jiyana wan hîn jî pîroz e.

Hûn rewşa giyanekî xweş çawa diparêzin? Îsa ev sir da me: “Lê ez ji we re dibêjim, ji dijminên xwe hez bikin û ji bo yên ku tengahiyê didin we dua bikin” (Metta 5:44). Reb ji me re got ku ji bo kesên zilmê li me dikin duayan bikin. Gava em vê bikin, dilê me rehet dibe û nakeve rewşeke gazinokî an jî bêtahm nabe.

## LI HEMBERÎ XELATAN RAYEDARÎ

Tişta ku ez ji Nivîsên Pîroz fêr bûm û min di jiyana xwe de ceribandiye ev e ku ew kesên li dijî rayedariyê diaxivin, darizandina teqez tînin ser xwe. Li Miryem û Harûn bifikirin: “Miryem û Harûn ji ber jinika Kûşî rexne li Mûsa girtin. Çimkî wî jineke Kûşî ji xwe re anîbû” (Hejmartin 12:1).

Pêşî, em binêrin bê ka Miryem û Harûn kî ne. Miryem, xwuşka Mûsa bû. Ez vê jî diyar bikim ku ew xwuşka wî ya mezin bû. Xweda

ew weke pêxember bi nav kir (Derketin 15:20). Harûn jî birayê Mûsa yê mezin bû û di heman demê de serkahîn bû. Ji ber vê em behsa du kesên navdar dikin ku xwedî meqamên rêbertiya girîng in.

Ji ber ku Mûsa bi jineke Kûşî re zewicî ew rexne kirin. Kûşiyî, gelek pispor wan weke binecihên axa Etiyopyayê ya li Afrîkaya Bakur pênase dikin. Jina pê re zewicî ji ziriyeta Birahîm nedihat, li derveyî peymana Birahîm bû ev rewş.

Miryam û Harûn bawer dikirin ku Mûsa guneh kiriye an jî bi îhtîmala herî baştir bawer dikirin ku bi zewaca vê jina Afrîkî re, biryareke xerab daye, bi taybetî jî ji ber ku ew rêber bû. Gelo ew li gorî nerîna xwe mafdar bûn? Wisa xuya dike, eger em ji perspektîfa qanûnê lê binêrin. Xweda ferman dabû Îsraêliyan ku di navbera xwe de bizewicin. Wî hişyarî da ku wê jinên biyanî dilên wan ber bi xwedayên biyanî ve bizîvirînin. Ev ferman di Dubarekirina Şerîetê de hatibû dayîn. Zewaca Mûsa ya bi keseka biyanî re weke nakokiyekê xuya dikir. Bêguman, bandora Mûsa biqasî ku wê bi vî rengî tevnegere xuya dike û difikirîn ku ev bandor mezin. (Nîşe: Îro tenê fermana me ev e ku em bi kesên bawer nakin re ne di bin heman fermanê de ne. Ev mesele êdî ne meseleya ziriyeteke xwezayî ye, lê meseleyeke giyanî ye. Bnr. Galatî 3:28. Li gorî Peymana Nû, du kesên ji neteweyên cuda tu pirsgirêk li ber wan tune ku bizewicin.)

Ji ber vê yekê Miryam û Harûn di nirxandinên xwe de rast bûn lêbelê mîna Ham, ew xelet bûn! Mûsa rêberê wan bû. Rexnekirina wî li dijî rêgezê bû. Weke xwuşk û bira, wan dikarbû vê mijarê weke mijareke malbatî bi wî re nîqaş bikin lêbelê gotegotkirina di navbera xwe de an jî nîqaşkirina vê kiryarê ya di nava civakê de, teqez guneh bû.

Tişta ku dihişt ew li himberî rêberên xwe derkevin û biaxivin çi bû? Bersiva vê di ayeta pêş de ye: “Wan got: Ma Xudan tenê bi riya Mûsa peyivî? Ma bi riya me jî nepeyivî? Xudan ev yek bihîst” (Hejmartin 12:2).

Gelo Xweda bi rêya wan axivîbû? Bêguman. Xweda, Harûn weke berdevkê Mûsa an jî weke pêxemberê wî pênase kir. Harûn peyamên

Xweda gihandin Fîrewn. Xweda Miryam di nivîsandina zebûra pêxemberî de, ku hîn jî di Nivîsên Pîroz de maye, bi kar anî. Bêguman diyariyên wî yên giyanî hebûn. Lêbelê, xeletiya wan ew bû ku diyariyên giyanî an jî jêhatîbûnên giyanî ji rayedariyê mezintir hesibandin. Ew difikirîn ku ji ber ku Mûsa guneh nekir û REB hemû bi kar anîn, Mûsa êdî ne mafdar bû ku bibe rayedar. Ew difikirîn ku diyariyên wan ên giyanî wan ji rayedariya bijartî ya Xweda bilindtir dikin.

Eger em li sepana Peymana Nû binêrin, Pawlos wisa dinivîse: "Îcar cûreyên diyariyên ruhanî hene, lê Ruh eynî ye" (Korîntî I, 12:4). Ev û pasajên din yên di Nivîsên Pîroz de, xelat û çavdêrî diyar dikin ku Giyanê Pîroz e. Di nava van xelatan de rêvebirî, hînkarî, bexşandin, pêxemberî, xelatên ku nexweşan baş dikin, jihevderxestina giyanan û derfetên ku mûcizeyan çêdikin, hene. (Korîntî I, 12:7-10; Romayî 12:6-8).

Pawlos wisa dewam dike: "Û cûreyên xizmetan hene, lê Xudan eynî ye" (Korîntî I, 12:4-5). Peyva Grêkî ya ku weke "xizmetan" tê wergerandin "diakonia" ye. Li gorî ferhenaga Grêkî ya Thayer, ev peyv ji bo "peywirên şandiyan, rêvebiran û pêxemberan, mizgînxêran, yextiyariyan û hwd." diyar bike, tê bikaranîn. Eger bi awayekî hêsan bê gotin, ev peyv ji bo pênasekirina pênc meqamên rayedariya giyanî ya di nava dêrê de, tê bikaranîn. Em ji vê ayetê dibînin ku Reb, ango em dibînin ku Îsa li ser peywirê ye. Pasajeke din jî vê yekê piştrast derdixîne. Pawlos derbarê mirin û piştî vejîna Îsa de wisa nivîsandiye: "Wî bi xwe diyarî da, ku hinek bibin Şandî, hinek pêxember, hinek mizgînvan, hinek jî şivan û mamoste, da ku yên pîroz ji bo xebata xizmetkirinê bên rapêçan û bedena Mesîh bê avakirin" (Efesî 4:11-12).

Rayedariya desthilatdariyê, ne bi rêya xelatan, bi rêya peywiran ber bi jêr ve diherike, ji ber ku hemû rayedarî piştî vejînê dane Îsa (Metta 28:18). Weke ku Îsa jî di pasaja Efesiyan de diyar kiriye, pênc cure peywir an jî meqam hatiye tayînkirin. Ji ber vê, rayedariya Wî bi rêya meqamên hatine tayînkirin tê ragihandin.

Divê em vê rastiyê li ber çavan bigirin ku dibe ku kesek ji pastorê xwe bi xelattir be lêbelê pastorê ku di meqamê rayedariyê de ye di ser kesê bi xelat re ye.

Ez dikarim gelek mînakan bidim ji bo encamên trajîk ên ku di rewşa bawermendekî bi xelat de derdikevin holê ku xwe bilind dike. Yek ji van, ji wan pastorê alîkar bû ku di xizmeta waz û hînkirinê de pir jêhatî bû. Ji ber diyariya wî ya eşkere ya ku Xweda dabûyê, polên ku ders didan wan qerebalix bûn û tenê cîh li ser piyan hebû di dersên wî de. Wî heftê carekê rêberiya duayan dikir û pir kes tevlî civînên wî dibûn.

Her ku populerbûna wî zêde dibû wî dest pê kir ku rexneyên li ser polîtîkayên damezrandî yên dêrê û pastorê payebilind bike. Wî digot ku rê û rêbazên pastorê payebilind tevgera Giyanê Pîroz sînordar dikin û wî ev fikra xwe bi kesên li dora xwe re parve kir. Helwesta wî ya rexnegir bandor li pastorekî din yê alîkar jî kir. Piştî demekê, wan xizmeta duayan bi hev re bi rêve birin. Êvarekê, serpastorê pêşeng di dema duayan de ji deriyê paşîn ve ket avahiyê û dît ku her du pastorên alîkar bi awayekî berevajî tiştê ku wî talîmat dabûn wan, xizmetê dikin. Li şûna ku ji bo dêrê, bajar û mirovên winda navbeynkariyê bikin, wan mirov ber bi awayên din yên duayan ve dibirin û gava wan hîs dikir ku ew tiştên rast nakin, erza wan dişkerandin. Serê mirovan tevlihev bibû.

Her du zilam jî xizmetkarên bi xelat bûn lêbelê dîsa jî wan bi ya rayedariya dêrê nekirin. Cidîbûna sûcên wan, bi karanîna wan ji hêla Reb ve ji bo axaftin û xizmetkirina gelê xwe ve hate veşartin.

## BI RÊYA DARIZANDINÊ HÎNBÛBA ÎTEATÊ

> "Mûsa ji her kesê li ser rûyê erdê nefsbiçûktir bû. Xudan jinişkave ji Mûsa, Harûn û Miryemê re got: Hûn her sê jî herin Konê Hevdîtinê. Her sê çûn." (Hejmartin 12:3-4)

Di vî parçeyê Nivîsên Pîroz de, em yek ji taybetmendiyên karakterê ku Xweda di rêberan de dixwaze bibîne, dibînin: dilnizmî. Mûsa mirovê herî dilnizm ê li ser rûyê erdê bû. Lê Miryam û Harûn wî bi vî rengî pênase nekirin. Nirxandina wan a li ser Mûsa bêtir li ser rêzê bû: “Wî digot ez û ne kesekî din, kes di ser serê xwe re nedidît. Pif ewran dikir.”

Reb ji nişka ve bang her sêyan bi hev re kir ku bên bin kon. Di wergerên din de li şûna gotina “ji nişka ve” peyva “di cih de” derbas dibe. Darizandin bi gelemperî bêyî hişyariyê tê. Gava ku hersê ber bi kon ve diçûn, dibe ku Miryam serê xwe ji Harûn re hejandibe û gotibe: “Amade be. Mûsa bi vê zewaca bi vê keçika biyanî re balteyê xwe li kevir xist. Niha Xweda wê te bike rêber ji ber ku tu bi awayekî rast tevgeriya.” Ev cure hişmendî dema ku em bi berxwedana li dijî rayedariyê, xwe ji xapandinê re vedikin derdikeve holê.

Bêguman, tiştê ku bi rastî qewimî pir cuda bû. Xweda Harûn û Miryam derxistin pêş. Wî anî bîra wan ku Wî mala xwe bi temamî spartiye Mûsa û Ew bi eşkereyî, rû bi rû, bi wî re diaxive, ne bi awayê xaçepirsan. Xweda piştre ev pirs pirsî: “Nexwe hûn çawa ji rexnekirina xulamê min Mûsa netirsiyan?” (Hejmartin 12:8). Gava ku em rayedariyê rexne dikin, derdikeve holê ku em di tirsa Xweda de kêm in. Dûra em li wan guhdar bikin: “Hêrsa Xudan li dijî wan rabû û ji wir çû. Ewr ji ser kon rabû. Nexweşiya çerman li Miryemê peyda bûbû û laşê wê wekî berfê spî bû. Harûn li Miryemê zivirî dît ku kotî ye” (Hejmartin 12:9-10).

Bi berxwedana li hemberî rayedariyê re, em darizandinê tînin ser xwe. Ev darizandin, dikare dûrxistina ji hebûna Xweda û hin felaketan jî di nava xwe de bihewîne. Eger em vegerin ser her du pastorên alîkar ên ku min berê behsa wan kir, demeke dirêj derbas nebû, her du jî ji dêrê veqetiyan. Yek ji kar hate avêtin, yê din berî ku were avêtin îstifa kir. Yekî ji wan li jêra rê dêra xwe ava kir û bi komeke piçûk a ji sed kesî kêmtir, jiyana xwe berdewam kir. Helbûkî dema ku ew pastorê alîkar

bû, zêdetirî şeş sed kes di bin lênêrîna wî de bûn. Piştî çûyîna wî ne bi gelekî, wî trajediyeke malbatî ya şexsî jî derbas kir.

Alîkarê din bajar terk kir û di xizmetê de ji bo demeke kurt serkeftinek bi dest xist. Dêra wî gihîşt çend sed endaman lêbelê wî xwe tenê û li hemberî gelek kesan xwe bêbawer hîs dikir. Di nav bîst salan de, wî gelek dabeşbûnên dêrê dîtin û şêwaza wî ya rêbertiyê hişt ku di nava civakê de tevlihevî çêbibe. Berî bi salan, ew di dêra me ya mezin de waîzkerekî îlhamdar bû û her kes li wî digeriya, gelek kesan bawer dikir ku ew ê bandoreke girîng li seranserê welêt bike. Bi awayekî trajîk, ji ber serhişkiya xwe ew ber bi rêyeke din ve çû.

Dema ku darizandin hat, Harûn di cih de ji bo xwe û Miryamê tobe kir û lava ji Xweda kir. Xweda ew bexşandin lêbelê li gorî fermana Xweda, divê Miryamê hîn jî heft rojan ji civakê hatibûya tecrîdkirin. Gelek pirs hene bê ka çima Miryamê hat cezakirin û Harûn nehat cezakirin. Sedemeke vê, dibe ku ev be ku êrîşa devkî ya Miryamê ji ya Harûn xurttir bû. Sedem çi dibe bila bibe, ev bûyer cîdiyeta Xweda ya di vê mijarê de nîşan dide.

Darizandina ku di encama berxwedana li dijî rayedariya giyanî de derdikeve, pirî caran derfetek e ji bo fêrbûn û mezinbûnê. Ew kesên ku bi tobekirinê ji darizandinê hema hema xelas dibin, pirî caran ew kesên herî dilsoz in ên ku di nava derê de cih digirin. Berxwedan her dem ne ji dilê xerab derdikeve, ew pirî caran ji nezanînê derdikeve holê. Dema ku ronîbûn bê, piştî wê di cih de tobe dide dû. Carinan dibe ku hinekî dem ji vê re lazim be ji ber ku hin kes li hemberî êşa ku halet dide wan gelekî li ber xwe didin.

Bêguman Mîryamê biçûkxistina xwe qet ji bîr nekir. Wê ev tevgera xwe careke din dubare nekir ji ber ku ew bi rayedariyê ve girêdayî ma. Lêbelê her kes weke Miryam û Harûn tobe nake an jî ji mînaka wan hînî tiştekî nabe. Hin ji gelê Îsraêl piştre li dijî rayedariya ku Xweda ava kiribû serî hildan. Wan tobe nekir û darizandina hetahetayê li wan hat birîn.

## HÛN ÇIMA XWE DI SER HER KESÎ RE DIBÎNIN?

Sê zilamên ji civakê -Qoraxê ji ziriyeta Lêwî û Datan û Aviramê ji ziriyeta Rûben dihatin- û du sed û pêncî rêberên navdar ên Îsraêlê hatin ba Mûsa û Harûn û wisa gotin: “Êdî bes e, tevahiya civakê û her kesê wê pîroz e û Xudan di nav wan de ye. Êdî çima hûn xwe di ser civaka Xudan re dibînin?” (Hejmartin 16:3).

Bi gotineke hêsantir, ev zilamên ku di bin rayedariya Mûsa û Harûn de rêberî dikirin, dixwestin vê bibêjin: “Hoo, hûn çima xwe di ser me re dibînin? Em hemû gelê Xweda ne û em dikarin bêyî ku hûn talîmatan bidin me jî em îteatê ji Wî re bikin.” We berê jî ev bihîstiye! Her çiqasî ne bi van peyvan be jî, heman peyam pirî caran bi kirin an jî bi hûrguliyên naziktir re tê ragihandin lêbelê dîsa jî giyan eynî tişt e. “Em hemû wekhev in” an jî “Em hemû bira ne” an jî “Di me hemûyan de Giyanê Pîroz heye, çima divê em teslîmî rêberiya wan bibin?” Ev mirov bi qasî her kesî îkna bibûn ku wê REB bibihîzin.

Ez dizanim ku di salên 1970’yan de tevgereke di nav dêrê de ya bi navê perwedekirina xwendekaran ji kontrolê derket û girêdayîbûna bi rêberan ve zêde bû. Mirov ji pastoran dipirsîn; gelo ew ê biçin betlaneyê an na, wê erebeyeke diyar bikirin an na, an jî alavekê bikirin an na, an jî bi kesekî diyar re wê bizewicin an na. Ji ber ku ez di wê serdemê de nejiyam, ez tam nizanim bê ew bi rastî çiqasî pê de çûne lê yên ku pê dizanin digotin ku ew di dawiya bûyerê de ne li gorî Nivîsên Pîroz bûn.

Ev tevger û îstismarkirinên din ên rêbertiyê bû sedema bandoreke berevajî. Ji ber ku rayedariya giyanî dihat îstismarkirin, mirovan tercîh kir ku wê paşguh bikin. Ev yek bû sedema derketina hin gerokên pir azad û serbest, ev kes ji dêrekê ber bi dêrekê ve, ji civatekê ber bi civatekê ve leziyan, civînên xwe yên duayan li dar dixistin û pirî caran dêrên xwe ava dikirin ji ber ku wan pastorekî “bêhempa” nedidît ku pê ve girêdayî bimînin. Ev hişmendî, beşdarî hêza veşartî ya bêqanûniyê bû ku Pawlos di roja me de li ser hişyarî da.

Ew zilamên ku li dijî Mûsa serî hildan, di bin rayedariya Fîrewn a destdirêjker de jiyabûn. Piştre Mûsa hat û ket jiyana wan û rayedariya wî zêde xuya dikir lê di wateyeke cuda de. Carinan, wî ji wan re zehmetiyên mezintir anî ji yên ku wan di bin Fîrewn de kişandibûn. Dibe ku wan hîs dikir ku ew êdî li Misrê nînin, ku Fîrewn ji lîstikê derketiye, ku Mûsa armanca xwe pêk aniye û ji wê demê û pê ve, her kes mirovê xwe bû. Ev zilam ji rayedariyê bêzar bûbûn. Her kes bi serê xwe bû. Axir, ew jî gelê Xweda bû û rayedar tê wateya zehmetiyê. Ji ber vê gelek ji wan li hev civiyan û li dijî Mûsa serî hildan.

Min ev senaryo di rêwîtiyên xwe de pirî caran dîtiye. Karsaz, komên dua yên navbeynkariyê, desteyên şêwirmendiyê an jî komên din ên di nava dêrê de li hemberî pastoran bûn çete. Hemûyan ji Xweda bihîstine û pastor bûyeran paşguh dike. Xwezî wan bizanibûna bê ka ew didin dû kîjan giyanî!

## RAYEDARIYA GIYANÎ HATIYE TAYÎNKIRIN

Weke ku min berê jî diyar kir, Rojavayî gelek caran di têgihîştina prensîbên qraltiyê de zehmetiyan dikişînin. Em di civakeke demokratîk û azad de dijîn ku ji qraltiyê pir cuda ye. Di qraltiyekê de, qraltiyeke xwedî mafê jidayikbûnê ve û rêberên wan yên tayînkirî hene. Civakên demokratîk rêvebirên xwe hildibijêrin. Di vê sîstema karsaziya azad de, mafê rêbertiyê ji bo kesên jêhatî yên xwedî pere, qabîliyet, bandor an jî xwedî şiyan ji wan re vekirî ye. Lêbelê ev di qraltiya Xweda de ku rêber lê tên tayînkiri, rewş ne wisa ye.

Îsa peywirdarên xizmetê tayîn dike. Ji bilî Reb, kes nikare kesekî di meqamên otorîteyê de bi cih bike û Ew vê yekê bi rêya Giyanê Xweda dike. Dema ku em bêyî tayînkirina Xweda meqamên otorîteyê digirin ser xwe, em xwe mezin dikin. Ev yek wan kesên ku hatine gazîkirin lê hîn nehatine tayînkirin jî di nav xwe de dihewîne. Pawlos hişyar dike û wisa dibêje: “Ez bi wê kerema ku ji min re hatiye dayîn ji her yekî ji we re dibêjim: Bila tu kes ji ya ku pêwist e zêdetir li ser xwe nefikire” (Romayî 12:3).

Nivîskarê Îbraniyan, girîngiya xwebixwe ya pozîsyona rêbertiyê ya giyanî ya ku nayîne ser xwe, piştrast kir: “Tu kes rûmeta serokkahîn bûnê xwebixwe nagire ser xwe.” Ayetên berê pêwistiya tayînkirina rêber rasterast li ber çavan radixîne. Nivîskarê Îbraniyan wisa berdewam dike: “Bi vî awayî Mesîh jî ji bo ku bibe Serokkahîn xwe bi xwe bilind nekir” (Îbranî 5:4-5). Îsa jî pozîsyona rêbertiyê xwebixwe hilnegirt ser xwe, Bavê Wî ew tayîn kir.

Li Pawlos guhdar bikin bê çawa xwe tayîn kiriye: “Ji Pawlosê xulamê Mesîh Îsa yê ku ji bo şandîtiyê hatiye gazîkirin û hatiye veqetandin, da ku Mizgîniya Xwedê” (Romayî 1:1). Ew behsa hilbijartin û gazîkirina xwe dike. Peyva “hilbijartî” li vir tê wateya ku ji hêla Xweda ve hatiye tayînkirin. Pawlos ji damezrandina dinyayê ve weke şandiyekî hatibû gazîkirin lêbelê ew çawa ku xelas bû nehat ser vê peywirê. Wî demeke ceribandinê ya girêdayîbûna bi rêberên dêrê li Antakyayê re derbas kir. Ev serdema ceribandinê bi salan dom kir û li ser bingeha tecrubeyên xwe, wî ev talîmat ji bo rêberan nivîsandinm: “Û evên ha jî bila pêşî bên ceribandin; eger bêqusûr bin, hingê bila xizmetkariyê bikin” (Tîmotêyos I, 3:10).

Jiyana Pawlos ji bo roja me mînakeke baş e li gorî Nivîsên Pîroz. Piştî ku di xizmetê de di ceribandina dilsoziyê de derbas bû, Pawlos peywira mamostetiyê wergirt (Tîmotêyos II, 1:11; Karên Şandiyan 13:1). Rêzika xizmet û peywira îlahî ya Reb di Nivîsên Pîroz de hatiye ragihandin: “Xwedê di civîna bawermendan de, pêşî Şandî, duwem pêxember, sêwem mamoste, piştre yên ku kerametan dikin, yên ku nexweşan qenc dikin, yên ku alîkariya kesên din dikin ...” (Korîntî I, 12:28).

Pawlos ne tenê di warê alîkariyê de û lê di heman demê de di rola mamosteyekî de jî dê bihata ceribandin. Şêweya tayînkirina xizmetkarên Xweda ji bo meqamên bilindtir di veguherîna Pawlos ya ji mamoste bo şandiyekî de dîsa tê dîtin: “Di civîna li Entakyayê de pêxember û mamoste hebûn: Barnabas, Şimûnê ku jê re Nîgêr digotin, Lûkyosê ji Kûrênê, Menayînê ku birayê şîrî yê Mîr Hêrodês

bû û Şawûl" (Karên Şandiyan 13:1). Piştre Şawûlê ku weke Pawlos tê binavkirin, di nava pêxember û mamosteyên di dêra Antakyayê de hatiye nivîsandin. Di Tîmotêyos I, 2:11an de ew ne weke yek ji wan pêxemberan lê em weke mamoste bi wî dizanin. Em xwendinê berdewam bikin: "Çaxê ku ev diperizîn Xudan û rojî digirtin, Ruhê Pîroz got: Barnabas û Şawûl ji bo wî karê ku min gazî wan kiriye, veqetînin" (Karên Şandiyan 13:2).

Giyanê Pîroz got, "Ji min re veqetînin." Êdî dem hatibû. Ne hefteyeke berê an jî piştre -niha! Û Reb hem dem û hem jî kesên ku wê werin veqetandin destnîşan kirin. Pawlos bi salan ji bangeke şandiyê ya di jiyana wî de haydar bû. Ev yek sê roj piştî hevdîtina wî ya bi Îsa re li ser rêya Şamê xwe nîşan da (Karên Şandiyan 9:15). Niha Îsa ew kesê ku wî bi salan berê gazî kiribû, veqetandibû an jî tayîn kiribû. Pawlos bi dilsozî, bêyî ku xwe bilind bike, xizmet kiribû.

Reb, rêbertiya damezrandî ya dêrê ku Pawlos bi dilsozî tê de xebitîbû, bi kar anî. Rûspî jî bi heman awayî hatin tayînkirin. Eger em berdewam bikin, em wisa dixwînin: "Hingê piştî ku rojî girtin û dua kirin, destên xwe danîn ser wan û ew şandin. Bi vî awayî ew ji aliyê Ruhê Pîroz ve şandî, dageriyan Sêlûkyayê û ji wir bi gemiyê çûn Qibrisê" (Karên Şandiyan 13:3-4).

Bala xwe bidinê ku "ew şandin." Rêbertiya dêrê Pawlos û Barnabas şandin. Li ayeta piştî vê binêrin: "Bi fermana Giyanê Pîroz derdikevin rê…" Giyanê Pîroz bi rêya rêbertiya damezrandî Pawlos û Barnabas ji bo peywira wan veqetandin. Axir, Reb ev bi karanîna zincîra rayedariyê guncaw dît.

Reb, çawa ku koma duayan ya navbeynkariyê ya pêxembertiya Antakyayê bi kar neanî, Pawlos û Barnabas neşand civîneke pêxemberan li bajarekî din an jî li dêreke li aliyê din ê bajêr ku Pawlos ne girêdayî wê bû. Wî kesekî xwedî xelatiyên giyanî di nava civatê de bi kar neanî ji bo ku van mirovan di rêbertiyê de bi cih bike.

Reb, rayederiya ku bi navbeynkariya dêra Antakyayê ava kiribû, bi kar anî. Sedema hişyariya Xweda ev bû: “Destê xwe bi lez daneyne ser tu kesî” (Tîmotêyos I, 5:22). Rêber dilsoziya kesên ku di dêrê de xizmetê dikin dişopînin, da ku gava Xweda ji bo tayînkirina wan kesan bi dilê wan re diaxive, ew bawer bin ku ev tayînkirina Reb e. Bi vî awayî Reb ji bo kesan di dêra Peymana Nû de ji bo meqamên rêbertiyê tayîn bike, rêyan bi kar tîne ev e.

## BANGA NEGIHIŞTIYE

Bang li Mûsa hatibû kirin û di serdemeke zû ya jiyana xwe de ev fêhm kiribû.

> “Îcar dema ew bû çil salî, daxwaza dîtina xwişk û birayên wî yên Îsraêliyan ket dilê wî. Gava wî dît ku neheqî li yekî ji wan tê kirin, wî ew parast, yê Misrî kuşt û heyfa yê ku dihat perçiqandin hilanî. Wî guman kir ku xwişk û birayên wî, wê fêm bikin ku Xwedê wê bi destê wî xilasiyê bide wan, lê wan fêm nekir. Dotira rojê çaxê ew rastî du Îsraêliyan hat, ku ew pev diçûn, wî xwest ku wan li hev bîne û got: ‹Camêrno, hûn bira ne; hûn çima neheqiyê li hev dikin?› Lê mirovê ku neheqî li cîranê xwe dikir, Mûsa dehf da û got: ‹Kê tu li ser me kiriyî serok û dadger?” (Karên Şandiyan 7:23-27)

Gelê ku wê rêbertiya wan bikira, rayedariya wî nas nekirin. Yekî piştre hema bêje heman gotina ku wê Qorax, Datan û Avîram bibêje, got: “Kê tu li ser serê me kire rêbevir û dadger?” Lê dîsa jî, tu encam jê nestend, ji ber ku Mûsa hîn nehatibû tayînkirin. Her çiqasî ev bangewazî ketibû dilê wî jî, rayedariya Xweda hîn ne li ser wî bû.

Ez bawer dikim ku yek ji sedemên ku gel paşê li beyebanê ewqasî bi tundî li hemberî Mûsa li ber xwe da ew bû ku wan rayedariya Xweda li ser wî dît, lê ev ji wan re ne xweş hat. Ev yek, wê argumana ku gel bi rastî ne Mûsa lê Xweda red dikir, bêtir rave bike. Rewş îro

roj jî pirî caran ne cuda ye. Sedema ew kesên ku xwedî rayedariya Xweda ne ewqas li ber xwe didin ev e ku mirov bi rastî rayedariya xwedayî red dikin.

## TAYÎNKIRINA XWEBIXWE -XAPÎNOK Û TALÛKE YE

Dema ku Qorax, Datan û Avîram li dijî Mûsa derketin, Mûsa bi awayekî teqez hatibû tayînkirin û rayedariya wî ji aliyê her kesî ve dihat zanîn. Lê van her sê zilaman xwebixwe xwe tayînkiribûn û qure bûn. Hişê wan xapînok û bi awayekî xeternak serhildêr bû. Baweriya wan ya ku ew hîn jî bi serhildana xwe xizmeta Xweda dikin, xapînok bû. Van 250 rêberan xwe qanih kiribûn ku ew tenê li dijî Mûsa û Harûn derdikevin; tu nîşan tunebû ku berxwedana wan digihîje heta bi Xweda, ji ber ku wan dixwest ku xizmeta Wî bikin. Li deverekê wan rêya xwe winda kir û wan rayedariya Xweda ya li ser Mûsa ji bîr kir ku ev yek serîhildana wan a li dijî Xweda da destpêkirin. Ev bi talûke bû ji ber ku darizandina herî mezin bi serîhildanê re bû. Wê wan ketineke weke ya Lusifer bijiyana.

Mûsa gava gotinên wan zilaman bihîst, wî giyanê li pişt van gotinan nas kir û xwe ser rû avêt erdê. Wî bi wan re nîqaş nekir. Yên ku ji hêla Xweda ve hatine tayînkirin, ew xwediyê dilê Wî ne û ji bo îspatkirina pozîsyona xwe şer nakin. Mûsa Xweda ji nêz ve nas dikir û dizanibû ku wê Xweda rêbertiya wî pesend bike. Mûsa wisa got:

> “Xwedayê Îsraêl, ji nav civaka Îsraêl ji bo ku we nêzîkî xwe bike, xizmeta Meskenê Xudan bi we bide kirin, ji bo xizmeta civakê û sekna li ber hizûra wan, hûn veqetandin. Ma ev têra we nake? Wî tu û hemû birayên te yên Lêwiyî nêzîkî xwe kirin. Hûn daxwaza kahintiyê jî dikin?! Ya Qorax! Hûn gilî û gazinên xwe li Harûn dikin. Lê civîn û kombûna we li dijî Xudan e!” (Hejmartin 16:9-11)

Wan ji ya ku ji wan re hatibû dewirkirin bêtir çav berdanê û ji

nişka ve li dijî REB kom bûn. Ew li asteke rayedariyê ya ku Xweda nedabû wan geriyan. Mûsa hişyarî da wan û got: “Lêwiyîno! We ji xwe zêde kir!” (Hejmartin 16:7).

Dema eşkere bû ku ew mêr dev ji serhişkiya xwe bernadin, REB ev talîmat da Mûsa: “Ji civakê re bibêje, bila ji konên Qorax, Datan û Avîram dûr bixe.” Li ser vê Mûsa ber bi konên Datan û Avîram ve bazda û rêberên Îsraêlî jî li pey wî çûn. Wî ji gel re got: “Bilezînin!” “Ji konên van zilamên xerab dûr bikevin! Destê xwe nedin tiştekî wan. Eger hûn wisa nekin, hûn ê ji ber gunehên wan ji canê xwe bibin.” Bi vî awayî hemû gel ji konên Qorax, Datan û Avîram dûr ketin. Datan û Avîram derketin û bi jin û zarokên xwe, ciwan û pîr, li ber konên xwe sekinîn.

Û Mûsa wisa berdewam kir: “Hûnê ji vê yekê fêm bikin ku ji bo van karan bikim, Xudan ez şandime û ez tu tiştî ji ber xwe ve nakim: Heke ev zilam wekî her kesî bimirin û rastî bûyerekê werin ku tê serê her kesî, wî çaxî bizanibin ku Xudan ez neşandime. Lê heke Xudan tiştekî nû çêke ku erd devê xwe veke, wan û her tiştê wan daqurtîne û bi saxî bikevin diyarê miriyan, wî çaxî hûnê fêm bikin ku wan Xudan kêm dît.”

Çawa ku Mûsa gotina xwe temam kir, axa li bin wan qelişî. Erd qelişî, ew û maliyên xwe, hemû zilamên Qorax û tevahiya mal û milkê wan daqurtandin. Ew û hemû tiştên wan bi saxî ketin diyarê miriyan. Erdê, ew nixamtin û di nav civakê de tune bûn. Tevahiya gelê Îsraêl ê li derdorê ji ber qîrîna wan reviya û got: “Bila erd me jî danequrtîne.” Agir ji ber Xudan derket û du sed û pêncî kesên ku bixûr pêşkêş dikirin daqurtandin (Hejmartin 16:24-35).

Darizandina dijwar a ku hat serê van zilaman, du rastiyên girîng nîşanî me dike. Ya yekem, ya rastî her çiqasî ew li dijî Wî bûn jî, bi rastî bawer dikirin ku ew hîn jî ji Xweda re xizmetê dikin. Ya duyemîn, di Peymana Nû de Cihûda/Yehûda, hişyar kir ku di rojên pêş de wê mirov “bi xewnan laşên xwe qirêj bikin, yên ku dê rayedariya Reb

paşguh bikin û yên ku wê li hemberî hebûnên ala re sixêfan bikin” (ayet 8). Piştre Cihûda wisa berdewam dike: “Wey li wan! Çimkî ew di serhildaneke mîna ya Qorax de winda bûn” (ayet 11).

## SERÎHILDAN JI HEV VEGIR E

Ev beş du bûyerên cuda yên serîhildanê di xwe de dihewîne. Ya yekem; Qorax, Datan û Avîram, û 250 rêberên din, vedihewand. Ya duyem; roja din bû ku tevahiya civaka Îsraêlî li dijî Mûsa û Harûn rabûn. Wan gilî û gazinên xwe kirin û gotin: “We gelê Xudan kuşt” (Hejmartin 16:41). Ew ji ber bûyera awarte ya roja berê sewsî bibûn lêbelê ji ber ku ew hêrs bûn û Mûsa sûcdar kirin, neheq bûn. Bandora serhildana van zilaman ewqas bi bandor bû ku piştî dîtina ku erd qelişî û rêberên wan daqurtand jî, civakê nedikarî peyama xwezaya kujer a serhildanê fêhm bike. Ev rewş îbretê dide mirov û min bûyerên bi vî rengî yên vê bandorê li ser mirovên roja me jî dike, dîtine.

Dema ku civak li dijî Mûsa û Harûn rabû ser xwe, Xweda ewqasî hêrs bû ku dixwest hemûyan qir bike. Lêbelê Mûsa û Harûn ji bo gel navbeynkarî kirin. Di encamê de gel xelas bû lêbelê REB nexweşiyeke mezin ya webayê ku mirov ji hev pê diketin, belav kir ku 14.700 kes ji ber wê mirin! Ev hejmar, ji hejmara kesên ku rojek berê miribûn pir zêdetir bû!

Gelî gelê Xweda, bihêlin ez we hişyar bikim: Serîhildan ji hev vegir e û kujer e. Pirtûka Pîroz, nabêje ku Xweda ji vê hez nake. Nivîsên Pîroz bi zelalî radigihînin ku Xweda ji vê nefret dike. Nêrîna Wî ya li ser vê mijarê ji nefretkirinê hîn bêtir bi şîdet e. Dema ku Lusifer serî hilda, jê nehat xwestin ku bihuştê terk bike, ew weke birûskê ji bihuştê hat avêtin (Lûqa 10:18). Hevkariya bi serhildêrekî re vexwendina mirinê ye. Ji ber vê yekê, gotinên dawîn ên teşwîqê yên Pawlos ji bo dêra Romayî ev bûn:

> “Îcar, birano, ez ji we hêvî dikim ku haya we ji wan mirovan hebe yên ku li hember wê hîndariya ku hûn hîn bûne, dubendiyê çêdikin û xelkê diterpilînin. Ji wan dûr bin. Çimkî yên weha ne ji Xudanê me Mesîh re, lê belê ji zikê xwe re xizmetê dikin. Bi gotinên xweş û xemilandî dilê mirovên saf dixapînin.” (Romayî 16:17-18)

Bila gotinên wî yên dawî ji bo vê beşê gotinên min jî yên dawî bin. Ez li xwe mikur têm, dibe ku ev peyam ji we re ne bi kelecan be lêbelê dikare jiyana we xelas bike. Ji bîr nekin ku ev derziyeke (aşî) rastiyê ye. Dibe ku bi we ne xweş bê lêbelê parastina ku ew peyda dike ji nerehetiyê pir zêdetir e. Ez dua dikim ku hûn hezkirina Xweda di vê peyamê de bibînin. Ew, gotinên xwe yên hişyariyê dide we ji bo ku we biparêze.

BEŞ 15

# YEK

*Rayedarî; yekitiya mezinbûna*
*Xweda ku di xwe de dihewîne, ava dike.*

Ma armanc û sûdeke mezintir ji jiyana di bin rayedariya xwedayî de ji her tiştê ku me heta niha nîqaş kiriye, heye? Bersiva vê bê guman erê ye! Ev armanc berfirehkirina Desthilatdariya Xweda ya mezintir e.

Îsa ji bo dêrê hedefek diyar kir: yekbûn! Sûdeke vê ya mezin heye ku mirov xwe bigihîne vê hedefê. Wî wisa dua kirin:

> "Ez ne bi tenê ji bo wan, lê ji bo yên ku bi gotina wan baweriyê bi min tînin jî dua dikim, da ku hemû bibin yek. Ya Bavo, çawa tu bi min re yî û ez bi te re me, bila ew jî bi me re bin, da ku dinya bawer bike ku te ez şandime. Rûmeta ku te da min, min da wan, da ku ew bibin yek, wek ku em yek in" (Yûhenna 17:20-22)

Mezinahiyek ji bo me hatiye veqetandin lê ev bi yekbûna me ve pir girêdayî ye. Mezinahî, ne peyvek e ku em pirî caran di axaftinê de bikar tînin. Ferhenga Merriam-Webster ya online vê peyvê weke

“xweşikbûn û îhtîşama mezin: heybet” pênase dike. Peyva Grêkî “doxa” jî xwediyê heman pênaseyê ye. Lêbelê Ferhenga Lêkolînê ya Berfireh vê îfadeyê di xwe de dihewîne: “Mezinahiya Xweda, ew tişt e ku Ew bi xwe ye.”

Hevwateya doxayê ya di Peymana Kevin de peyva Îbranî “kabod” e: îhtîşam, dewlemendî, hêz, pirbûn, rûmet, heybet û giranî, tenê çend pênaseyên yek-peyvî ne. Tenê ji bo kêliyekê bisekinin û li mezinbûna vê peyvê bifikirin. Dema ku Pirtûka Pîroz behsa mezinahiya Xweda dike, ew behsa mezinahiya Wî ya bi heybet, dewlemendiya Wî ya bêdawî, hêza Wî ya her tiştî, pirbûna Wî, rûmeta Wî ya mezin û heybeta hebûna Wî dike. Îfadeya pênaseyê ya dawîn; giranî, nîşan dide ku ev taybetmendî ne kêmasî ne lê bi tevahî hêza xwe hene ne; eger bi awayekî hêsan bê gotin, ev giraniya mezinbûna Wî ye.

Îsa, weke mirov nîşaneya Xweda ye. Dibê em van gotinê wî her dem bi bîr bînin: “Yê ku ez dîtime, Bav dîtiye” (Yûhenna 14:9). Yûhennayê şandî hîn di serî de îlan kir ku Gotin Xweda ye. Piştre wisa nivîsand: “Peyv bû xwîn û goşt, bi kerem û rastiyê tije di nav me de konê xwe danî. Me rûmeta wî, yanî rûmeta Kurê yekta yê ku ji Bav tê dît” (Yûhenna 1:14). Mezinbûna Wî di gelek şiklan de xwe nîşan da lê bi taybetî jî bi rêya hêza Wî. Yek ji pasajên ku vê gelek caran diyar dike Yûhenna 2:11 e: “Ev nîşana ku Îsa li Qenaya Celîlê çêkir a pêşî bû. Bi vî awayî wî rûmeta xwe da xuyakirin û şagirtên wî bawerî pê anîn.” Gava Îsa li ser rûyê erdê bû giranbûna mezinahiya Xweda nîşan da.

Berî ku Ew biçe peywirek da me: “Wek ku Bav ez şandim, ez jî we dişînim” (Yûhenna 20:21). Ji bo pêkanîna vê peywira mezin, Îsa dua kirin ku giraniya mezinbûna Wî li ser me be. Lêbelê, weke ku berê jî hate diyarkirin, ev soz bi meşa me ya bi yekîtîyê ve girêdayiye - weke yekbûnê. Ji me re wisa hat gotin: “Çiqas qenc e, çiqas xweş e, Di yekîtiyê de jiyana biratî! … Çimkî Xudan li wê derê, Bereket û jiyana

herheyî difermîne” (Zebûr 133:1-3). Bereketeke mezintir ji hebûna di rûmeta Wî de, ezmûna tijîbûna hebûna Wî tune. Ev bereket ne di dêreke parçebûyî de ye lê di dêrek yekgirtî de mimkun e.

## MÎNAKEKE BÊHEMPA

Dêra pêşî ev rastî bi awayekî xweşik pêşkêş kiriye. Îsa hilkişiya asîmanan û temaşevanên dilsoz li odeya qata jorê man û îteat ji fermana Wî re kirin (Karên Şandiyan 1:4). Îsa, piştî vejîna xwe di nava çil rojan de herî kêm xwe nîşanî 500 jin û mêrî kir (Korîntî 15:6), lêbelê piştî deh rojên ku ew ber bi asîmanan ve bilind bû li Yerûşalîmê tenê 120 kes man. Bi sedan kesên din li kuderê bûn? Em nizanin bê li kuderê ne lêbelê ji bo li benda soza Bav bimînin, em dizanin ku bi fermana Îsa ve girêdayî nemane.

Jin û mêrên ku li odeya jorîn dua dikirin, di bin rayedariya gotina Wî de bibûn yek -rayedariya Wî ya rasterast. Wê wan çawa bersiva rêberiya Wî ya tayînkirî bidana?

Berî ku Îsa hilkişe asîmanan, Wî Petrûs weke berpirsyarê xwendekarên xwe tayîn kir. Petrûs di nava şagirtên din de derdiket pêş. Ji bo bi rêyên Xweda zanibe Wî birçîbûneke mezin nîşanî wî da, têgihîştineke ku yên din ne xwedî wê bûm danê û li ser xwendekarên din bi bandor bû. Bê guman di jiyana wî de diyariyeke rêbertiyê hebû. Lêbelê, wî pirî caran bertek nîşan dida û bi xwesteka Xweda re ne li hev bû. Dema ku wî bi cesaret ragihand ku Îsa, Mesîhê Kurê Xwedayê zindî ye, Îsa pesnê têgihîştina wî da û pîrozkirina Petrûs îlan kir, ji ber ku ev rastî ji hêla Bav ve ji wî re hatibû eşkerekirin. Lêbelê çend deqeyan şûnda, Îsa berê xwe da Petrûs û got: “Ji rêya min derkeve, Şeytan! Tu min asteng dikî. Fikrên te ne ji Xwedê ne, lê ji mirovan in” (Metta 16:23).

Di bûyereke din, dema ku Petrûs li ser avê dimeşiya xwendekarên din di qeyikê de man û tenê lê temaşe dikirin. Careke din, wî rêbertî dikir. Lêbelê piştî çend deqeyan, berî ku yên din

bikaribin li pey wî biçin û gava xwe bavêjin nav avê, ew noqî avê bû. Îsa jê re got: “Ey kêmîmano! Tu çima dudilî bûyî?” (Metta 14:31).

Dîsa di bûyereke din de Petrûs, bi Yûhenna û Aqûb re, hat hilbijartin ku bi Îsa re biçin heta serê çiyê. Li serê çiyê, şikl û şemala Îsa guherî -rûyê wî weke rojê geş bû û cilên wî spî bûn. Mûsa û Ilyas derketin holê û bi Îsa re axivîn. Çi îmtiyazek, çi rûmetek bû ji bo xwendekaran ku şahidiya vê bûyera awarte bikin. Lêbelê berî ku civîn biqede, Petrûs pêşniyar kir ku sê konan çêbike, dudo ji bo Îlyas û yek ji bo Mûsa. Careke din, wî pêşengî dikir lê di wê rewşa rûmetê de jî, wî bi Xweda re li hev nedikir.

Trajediya înkarkirina Îsa ji aliyê Petrûs ve hîn jî di hişê van temaşevanan de teze bû. Piştî vejînê, ferîşteya li ser gorê di erkê xwe yê ji bo sê jinan de bi taybetî behsa Petrûs kir: “Lê hûn herin, ji şagirtên wî re û ji Petrûs re bêjin: Wek ku ji we re gotiye ewê beriya we here Celîlê, hûnê li wir wî bibînin” (Marqos 16:7). Van jinan, mîna gelek xwendekarên din, bêguman difikirîn ku Petrûs dev jê berdaye.

Eger wisa be pirsa esil dikeve vê rewşê: Gelo ev endamên nû yên dêrê, wê ji zilamekî bi tomarên ewqas ne aram re dilsoz û îteatkar bimînin? Reftarên wî yên bertekkar, rêbaza wî ya karsaziyê, darizandina wî û pêvajoyên biryargirtinê yên wî ne tenê bêkêmasî derketine holê, lê di heman demê de pirî caran meyla wan ya xeletiyan hatibû îspatkirin. Dibe ku ew weke namzedê herî guncav ji bo rêbertiya dêreke ciwan a ku di demên aloz re derbas dibe, nehatibe hesibandin.

Em vê yekê di hişê xwe de bigirin û em biryara yekem a Petrûs weke rêberê dêrê binirxînin. Çend roj derbas bûbûn û wî di Pirtûka Zebûrê de gotineke pêxemberîtiyê dîtibû ku ev rasterast bi îxaneta Cihûda ya li ser Îsa ve girêdayî bû. Petrûs, ji koma biçûk a li odeya jorîn re ev tişt gotin: “Çimkî li dereke Kitêba Zebûran ev hatiye nivîsîn: Bila mala wî wêran be Û bila kes tê de rûnene. û li dereke din jî: ‹Bila karê wî yê çavdêriyê yekî din bistîne” (Karên Şandiyan

1:20). Careke din, Petrûs tiştên ku yên din nedidîtin dît. Gelo wê ev zanebûn bi awayekî rast bikar bianiya?

Bêguman tiştê ku ez ê binivîsim dibe ku weke spekulatîfê bê dîtin lêbelê ez hêvî dikim ku piştgiriyeke têrker a ji Pirtûka Pîroz peyda bikim ji bo ku meseleyê bêtir rast bikim. Ez bawer dikim ku dema Petrûs di vê bûyerê de biryar da careke din bi Xweda re li hev nekir. Ji ber ku wî ”pişk” di navbera du namzetan de pêşniyar kir ku ji destpêkê ve bi Cihûda re bûn ji bo ku bibînin bê ka Xweda wê kê hilbijêre ji bo ku mîsyona wan bigire ser xwe.

Li tu devereke Peymana Nû, hûn nabînin ku Xweda şandî bi “pişkê” (sîstema lotoyê) hildibijêre! Îsa sê sal û nîvan rêyên Xweda fêrî van zilaman kirin û ji wan re mînakek hiştibû: Berî ku diwanzdeh şandiyên xwe hilbijêre, Wî seran serê şevê dua kiribûn û ji Xweda bihîstibû (Lûqa 6:12-13). Ji bo Petrûs wê ya herî baş bûya ku mînaka Îsa bişopîne. Weke din, rastiya ku çend sal şûnde, pêxember û mamosteyên li dêra Antakyayê bi rojîgirtin û duakirina beriya çûyîna Pawlos ji bo şandiya wî mînaka Îsa şopandin (Karên Şandiyan 13:1-4), delîleke din a biryara bilez a Petrûs e.

120 kesan du namzet hilbijart: Yustus û Mattiya. Em dikarin fêkiyê biryara Petrûs bibînin. Pişk li Mattiya ket û ew di nav şandiyan de hate hejmartin (Karên Şandiyan 1:23-26), lêbelê hûn careke din navê wî di Peymana Nû de nikarin bibînin. Çima? Ji ber ku ew Şawûl (Pawlos) bû, ne Mattiya, ku Xweda hilbijart ji bo ku mîsyona Yahûda bigire ser xwe. Sedema ku Pawlos wisa nivîsand ev e:

> “Piştre ji Aqûb re xuya bû, piştre jî ji hemû Şandiyan re. Piştî hemûyan jî, ji min re jî xuya bû, ez ê ku mîna zarokekî jiberçûyî me. Çimkî ez, ji Şandiyan yê herî biçûk im.” (Korîntî I, 15:7-9)

Pawlos xwe dişiband zarokekî ku ne di dema xwe de ji dayik bûye; bi gotineke din, bê guman ew pir ciwan bû ku bibe yek ji

diwanzdeh şandiyên orîjînal. Di lêkolîna xwe de, min li ser dema jidayikbûna Pawlos nerînên cuda dîtin û di rastiyê de, di navbera çavkaniyên cuda de navbereke çardeh salan heye. Ji ber vê yekê, em li rêza demê ya Peymana Nû binêrin ji bo ku em ramanekê li ser temenê wî pêde bikin. Li gorî piraniya vegotinan, şehîdbûna Îstefanos çar salan piştî vejîna Îsa pêk hatiye. Nivîsên Pîroz behsa Şawûl (Pawlos) dikin, ku di ricimkirina Îstefanos de weke "ciwanekî" li wir amade bû (Karên Şandiyan 7:58). Li gorî Ferhenga Grêkî ya Peymana Nû, peyva "ciwan" di Grêkî de dikare kesekî ku nû ji kamilbûnê derbas bûye, bê pênasekirin. Em dikarin bi ewlehî texmîn bikin ku Pawlos pir ciwan bû ji bo ku bibe şagirtekî orîjînal.

Ez bi temamî bawer dikim ku Pawlos ji aliyê Xweda ve hatiye hilbijartin. Ew xwediyê fêkî û rauedariya şandiyekî bû, hem jî ji Mattiya pir zêdetir. Xala sereke: Ez bawer dikim ku Petrûs biryareke rêberiya reaksiyoner da ku bi plana Xweda re ne lihevhatî bû. Eger wî di dêra îroyîn de biryareke wisa bidaya, bi îhtîmaleke mezin li ser vê yekê me yê dabeşbûneke derê bijiya. "Koma hilbijartina şandî ya li dijî pişkê" wê ji dêrê veqetiya û wê "koma hilbijartina şandî ya bi pişkê" bimaya. Dîsa jî guh bidin gotinên din ên ku piştî vê bûyerê di Nivîsên Pîroz de hatine tomar kirin:

> "Gava ku Roja Pentîkostê hat, ew hemû bi hev re li derekê civiyabûn." (Karên Şandiyan 2:1)

Di rastiyê de îfadeya "bi hev re" ji peyveke Grêkî tê: "homothumadon." Ferhenga Berfireh a Lêkolînan vê peyvê wiha pênase dike: "Bi dilekî, bi yekdengî, bi razîbûna tam, hemû bi hev re." Ji vê pênaseyê, hûn dikarin bibînin ku di raman an jî tevgerê de cîh ji bo dabeşbûnê tune bû. Ew di armanc, raman, dil û giyan de bibûn yek.

Encama vê yekîtiya kûr çi bû? Xweda mezinbûna xwe ji wan 120 kesên ku di dil, hiş û kirinên xwe de yek bûn re nîşan da, ne ji 380 kesên mayî yên li deverên din. Ji ber rûmeta Xweda li ser van şopînerên

Mesîh, bajarê Orşelîm wê êdî qet nebûya bajarekî weke berê.

Jin û mêrên ku li odeya jorîn kom bûbûn, ji ber du sedeman di girêdana talîmatên Petrûs de pirsgirêk nejiyan: Ya yekem, hilbijartina şandiyan bi pişkê guneh nebû, her çiqasî ew bi îhtîmaleke mezin bi plana Xweda re ne lihevhatî bûn jî; û ya duyem, ew bi temamî dilsozê rêberê ku Xweda tayîn kiribû, man.

Girêdana di navbera rayedariya rasterast a Xweda û rayedariya ku Wî daye me de careke din tê piştrastkirin. Kesên dibêjin “Ez bi Xweda ve girêdayî mam” lê di heman demê de mirovên li hemberî rêberên ku Wî tayîn kiriye li ber xwe didin, hene. Ew xwe dixapînin. Eger em bi rastî jî bi Xweda ve girêdayî bin, em ê ji ber du sedeman îteatê ji rêberên xwe re bikin: Ya yekem, rayedariya Wî ya rasterast ferman dide me ku em guh bidin rêberên xwe yên tayînkirî. Ya duyemîn, ji ber ku em rayedariya Xweda ya li ser rêberên xwe nas dikin, em îteatê ji wan re dikin. Ji ber vê yekê, heya ku rayedariya hatiye dewirkirin ji me re nebêje ku em gunehê bikin, îteatkirina me ya ji rêberên me re hem xwedayî ye û hem jî sûdmend e. Kirina vê yekê deriyê xuyabûna mezinbûna Xweda û derî li ber berfirehbûna bilez a Desthilatdariyê vedike.

## RASTIYEKE ZOR

Divê em pirsên zor yên li jêr ji xwe bipirsin:

- Ji ber ku em bi rayedariya dêrê ve girêdayî namînin, ma îcar bi vî awayî em nahêlin ku mezinahiya Xweda xuya bike?
- Ma îteata me bi gava em di meseleyekê de weke hemfikir an jî ne hemfikir bin ve girêdayiye?
- Ma gelo alîkariya me di beşan de çêbû?

Ez bawer im ku di odeya jorîn de xwendekarên ku wê karan ji Petrûs cuda bikin, hebûn. Bê guman, wê aqilmendtir bûya berî ku biryar bidin ku kesek di odeyê de hilbijêrin û mînaka Îsa bişopînin û

li rûyê Xweda bigerin. Dê pir aqilmendtir bûya ku ev bikira ji bilî ku bi pişkê û tayînkirina kesekî ku ji hêla Xweda ve nehatibû gazîkirin ku weke şandiyekî xizmet bike û meseleyê bi zorê çareser bikira.

Her çiqasî dibe ku rêyek çêtir ji bo vî karî hebe jî, mirovên di wê odeyê de rêyeke bilindtir dîtin -ku bi pejirandina stratejiya rêberê xwe re yekgirtî bimînin. Her yekî ji wan weke ku ew fikra wan be tevdigeriya. Çima em pirî caran li ser nakokiyên herî piçûk ên li ser rêbazên xizmeta xwe ji hev cuda dibin? An jî weke mînak, pirsa hatina duyemîn a Îsa gelo wê berî Tengasiya Mezin be, di dema Tengasiyê de be an jî piştî Tengasiyê wê çêbibe, ji ber doktrînên weke vê ku divê me ji hev neveqetîne, gelo em çiqasî ji hev dabeş dibin? Em hez nakin ku pastor li şûna bedlekî qumaş patorê qont li xwe bike. Em ji makîneyên dûman û ronahiyê yên ku di dema xizmetên hebandinê de bandorên taybetî diafirînin, hez nakin. Pastor an pir dirêj diaxive an jî ne têra xwe dirêj diaxive. Me têra xwe dua nekirin an jî me li ser mijareke taybet dua nekirin. Rastî ev e ku senaryo bêdawî ne. Di encamê de, gava em dibînin ku em pir bi hêsanî dabeş dibin ev me xemgîn dike. Lêbelê rastiya ku dibê em bala xwe bidinê ev e: Hemû dabeşkirin bi hêsanî nayên naskirin. Peymana Nû pirî caran ji me re ferman dide ku em ji bilî kiryarên xwe bi awayên din jî yek bin. Ha ji we re çend mînak:

> “şahiya min temam bikin. Bila fikra we yek be, eynî hezkirina we hebe, fikra we û dilê we yek be.” (Filîpî 2:2)
>
> “Hemfikir bin, di aştiyê de bijîn û Xwedayê aştî û hezkirinê wê bi we re be.” (Korîntî II, 13:11)
>
> “Lê bila jiyana we hêjayî Mizgîniya Mesîh be, da ku ez bêm we bibînim, an neyêm jî, ez bibihîzim ku hûn di ruhekî de hîmgirtî ne û bi dil û can bi hev re ji bo baweriya Mizgîniyê tekoşînê dikin” (Filîpî 1:27)

Ev dabeşbûn ne tenê bi gotin an jî kiryarên dijber ve sînordar e; ew kûrtir diçe -dikeve nav hiş, dil û giyan. Dibe ku em ji derve ve yekgirtî xuya bikin lêbelê em dikarin di motîvasyon an jî ramanên xwe de ji hev dabeşkirî bin. Dê û bavê min bi salan li Floridayê li bajarekî Perava Rojhilat yê bi navê Vero Beach jiyan. Nêzîkî bîst kîlometre li bakurê Vero Beach, kendaveke bi navê Sebastian's Inlet heye. Ev kendav ji hêla xelkê herêmê ve bi pêlên xwe yên tund tê zanîn. Ev pêlên wê bi çavan nayên dîtin ku herikînên binî yên berevajî ne. Ava li ser rûyê okyanûsê, weke ku bi hev re ber bi peravê ve diherike. Lêbelê ava di bin rûyê wê de bi hêz û bi awayekî berevajî diherike. Pêlên di binî de qurbaniyên xwe digirin û wan dikişînin binê bahrê, pirî caran ev pêl dibin sedema xeniqandina wan.

Gelo di dêrên me de pêlên ku rê li ber eşkerekirina mezinahiya Xweda digirin hene? Bi saya yekîtiya şandiyan, hemû Orşelîmê vejîna Îsa bihîst; mezinahiya hebûn û hêza Xweda ya di nav wan de pir ecêb bû. Tenê bifikirin: Ji bo ku civînên xwe ragihînin ne televîzyon, ne weşanên radyoyê û ne jî medyaya civakî hebû lêbelê dîsa jî bi hezaran kes di civînên ji nişka ve û bê plan de hatin xelaskirin.

Pirsa herî balkêş ev e. Çend ji me dema ku em derketin hizûra Îsa, wê ji tiştên ku Îsa ji me re eşkere kirine, şoq û matmayî bimîne? Belkî jî di nava hêsiran de, di civînên me de gelo wê beşdariya me ya di astengkirina Giyanê Xweda de nîşanî me bide? Nelihevkirinên me, bûne girseyên ku rê li ber gihîştina xelasiyê digirin. Bi dil, raman an jî kiryarên xwe em bi rêberên xwe re nebûn hemfikir. Belê, dibe ku em mafdar bin û dibe ku stratejî an jî rêbazên çêtir, heta ji Pirtûka Pîroz bêtir, ji bo kirina tiştan hebin lê kîjan çêtir e: mafdar be an jî di rûmeta Xweda de be? Mafdarbûn an jî şahidiya hatina girseyan ji bo Desthilatdariya Xweda?

## RÊBAZÊN CUDA

Ev ne sirek e. Dibe ku rêber bi plan û stratejiyên xwedayî re ne lihevhatî bin. Dema ku ez vê dinivîsim ez dilerizim û xemgîn dibim ji ber ku ez bawer dikim ku min weke rêberekî gelek biryarên

xerab dane. Lêbelê dema ku em di nava yekitiyê de bin, tiştekî pir xweş e ku Xweda armancên xwe bi cih bîne. Ev gotin, me teşwîq nake ku em di hewildanên xwe de ji bo lêgerîna îradeya Wî bêxem an bêserûber bin, lêbelê ew ji bo rêberên mîna min ên ku gelek xeletiyan dikin, teselî dike.

Aniha ez dixwazim li ser rastiyeke din bisekinim ku dikare me ji yekîtiyê dûr bixe. Ev, neferqkirina çalakiyên cuda yên di nav dêrê de ye. Bi gotineke din, rû û rêbazên cuda hene ku mirov bigihîje armanca pêşxistina Desthilatdariyê. Pawlos ji dêra Korîntî re got ku di nav dêrê de diyarî û peywirên cûrbecûr hene lêbelê piştre wî wisa nivîsand: “Û cûreyên kirinan jî hene, lê yê ku di hemûyan de her karî dike eynî Xwedê ye” (Korîntî I, 12:6). Çalakiyên cûrbecûr hene, ji ber vê yekê em dikarin di mîsyona xwe ya Desthilatdariyê de bikaranîna rêbazên cuda serkeftî bin.

Pawlosê şandî, gelek caran ji bo talîmatan bide dêrê termên leşkerî bi kar anîn. Ev ne tenê şibandinek tê hesibandin, ji ber ku em bi rastî li ser rûyê erdê leşkerên artêşa Xweda ne. Ji bo ez çalakiyên cuda yên xizmetan nîşan bidim, ez ê mînaka wî bişopînim. Artêşa Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ji şaxên leşkerî yên cûrbecûr pêk tê. Hêzên Bejayî, Hêzên Deryayî, Hêzên Hewayî, Peyadarên Deryayî û Parastina Peravê. Ev hêz, ji bo pêkanîna armanc û berpirsiyariyên xwe prosedurên cuda dişopînin. Ev prosedur pirî caran ji bo her hêzekê bi serê xwe ye. Lêbelê dema ku dor tê ser parastin û xizmetkirina neteweya me, ev hemû hêz li heman alî ne.

Serbazekî hêzên hewayî, ji bo bibe endemakî bibandor ê Hêzên Hewayî yê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, wê bi taybetî bê perwerdekirin. Beşek mezin ji perwerdehiya wî wê di operasyonên taqtîqî yên hewayî de be, ji ber ku xizmet bi giranî li ezmanan dixebite. Lêbelê, heke ew piştî demekê derbasî hêzên bejayî bibe, wê hewcedariya wî bi perwerdeyeke nû çêbibe. Bêguman, teknîkên cuda yên ku di her du hêzan de hevdû digirin hene. Lêbelê, ji ber ku hêzên bejayî bi giranî li ser erdê dixebitin, ev endamê berê yê hêzên

hewayî wê neçar bimîne ku gelek manevrayên taqtîqî û stratejiyên leşkerî yên nû fêr bibe.

Em vê mînakê di hişê xwe de bigirin û em lê binêrin bê Pawlos ji Dêra Korîntî re çi gotiye:

> "Loma ez hêvî ji we dikim ku hûn bibin mîna min."
> (Korîntî I, 4:16)

Pawlos bang vê dêrê kir ku wî weke mînak ji xwe re bineqînin. Nenivîsand û negot: "Çawa ku ez mîna Mesîh dikim hûn jî mîna min bikin." Ev piştre kir (Korîntî I, 11:1). Lêbelê di vir de sedemekê wê heye ku wisa nivîsand. Gotinên wî yên piştre tên sedema vê yekê eşkere dike:

> "Loma ez hêvî ji we dikim ku hûn bibin mîna min. Ji ber vê yekê min Tîmotêyos şand ba we. Ew bi saya Xudan zarokê min ê delal û dilsoz e. Ewê riyên min ên di baweriya Mesîh Îsa de bîne bîra we, yên ku ez li her derê, li her civîna bawermendan hîn dikim." (Korîntî I, 4:16-17)

Wî gazî civata ku wî damezrandibû kir ku mînaka wî bişopînin û piştre wisa got: "Bi vê armancê ez Tîmotêyos dişînim bi we ve." Çima ew Tîmotêyos dişîne? Ji bo ku rêyên Pawlos di Mesîh de bîne bîra wan. Bala xwe bidinê ku ew nabêje: "Tîmotêyos wê rêyên Aqûb di Mesîh de bîne bîra we." Ma Aqûb şandiyê dêrê bû? Bêguman, erê! Ma ew rêberekî xwedayî bû? Bêguman, erê! Ma Aqûb ji Pawlos bêtir şandîtî kiribû? Dîsa, erê. Ma rê, rêbaz an jî çalakiyên wî ji yên Pawlos cuda bûn? Bersiv dîsa, erê ye. Ma talîmatên Pawlos rêyên Aqûb yên di Mesîh de betal dikirin? Bêguman na! Lêbelê, rêyên Aqûb ji bo dêra Korîntî ya ku ji hêla Pawlos ve hatî damezrandin ve ne guncav bûn. Ev dişibe wê yekê ku çend rêyên hêzên hewayî di hêzên deryayî de bêbandor in. Her çend hin rêyên ku hevdû digirin hebin jî, gelek ji wan cuda ne.

Ka em hinekî din li ser vê bifikirin. Pawlos Tîmotêyos şand

vê dêrê ku di Mesîh de “rêyên ku Petrûsê Şandî dişopîne” an jî di Mesîh de “rêyên ku Yehûdayê Şandî dişopîne” an jî di Mesîh de “rêyên ku Yûhennayê Şandî dişopîne” û hwd, wî negot ku ew ê van hîn bike. Na. Pawlos ev dêr da destpêkirin û berdewam kir ku çanda rêbertiyê ava bike. Rêbazên wî ji yên din cuda bûn lê ew bi hînkirinên bingehîn ên Mesîh re dilsoz bû. Hemû rêberên dêra yekem xwedî heman bawerî û hînkirinên bingehîn bûn. Lêbelê her yek ji wan rêbazên wan yên cuda hebûn ku ji bo mezinkirina hemû neteweyan weke xwendekar bikar tînin.

Li ser vê rastiya ku hûn xwe aîdî vê dêrê hîs dikin, bifikirin. Em ferz bikin ku navê pastorê we û jina wî Jim û Lisa Smith in. Wan û rûspiyan, bi kerema Xweda re endamên dêrê gihandine hezar û pêncsed kesan û bi vê yekê re wan rê -çand û rêbaz- ava kirine ji bo şêwaza rêbertiya bi serê xwe. Berhemdariya dêra we bandoreke ku balê dikişîne li ser civaka we kiriye. Dêra we xwedî navûdengeke herêmî ye lê tenê evqas e.

Lêbelê, em ferz bikin ku dêreke pir populer heye ku li cîhekî din navûdengekî wê yê gerdûnî heye. Bila Doug û Heather Jones navên pastor û jina wî bin. Ew di xizmetê de meylên xwe destnîşan dikin û bi taqtîqên xwe karûbarê nû bi rêve dibin. Ew li gorî pastorê we bandorê li gelek kesan dikin. Hûn ê bidin dû rêya kê, rêya Jonesan an ya Smithan (pastorê we)? Ceribandina ku hûn ê li vir pê re rûbirû bibin wê ev be ku hûn rêyên pastorê gerdûnî yê populer bişopînin û hewl bidin ku hûn bandorê li rêberê dêra xwe bikin, ji bo ku ew jî li rêbazên wî vegere. Lêbelê hûn jî, ji Korîntî ne cudatir in ku divê hûn hewl bidin ku ji bo yekîtî û rûmeta Xweda rêyên rêberên xwe fêr bibin û wî bişopînin. Rastî ev e ku rêberên dêrê wa Smith in, ne Jones.

## DÎMENA BI ÇIVÎKFIRÊ

Zêdetirî sîh salan e ku ez heftane li seranserê cîhanê digerim. Beşdarbûna zêdetirî hezar konferans û dêran li çil û neh eyaletan

û zêdetirî şêst welatan ji bo min şanaziyek bû. Şahidiya çalakiyên cihêreng ên ewqas torên dêran ezmûneke ecêb bû ji bo min. Dema ku ez weke mêvanekî têm vexwendin, yek ji armancên min ên sereke ew e ku ez çanda dêrê fêr bibim.

Eger hûn weke mêvan bihatana mala min, we yê ji min re negota bê ka ez ê çawa mala xwe birêve bibim. Hûn ê li gorî tevgerên mala min, tevgeriyabana. Weke mêvanekî we yê wextê şîvê an jî tiştê ku wê bihatana ber we, we yê diyar nekira. Na, di şûna vê de, we yê bipirsiya û bigota: “Şîv di saet çendan de ye?” Piştre hûn ê ji bo şîvê amade bûna û bi spasdarî her tiştê ku mazûvanên we pêşkêşî we kirine, we yê qebûl bikira.

Dema ku ez weke mêvanekî têm dêrekê, ez ji pastor dipirsim: “Hûn li ser platformê çi li xwe dikin?” Piştre ez hewl didim ku tercîhên wî nîşan bidim. Tê bîra min ku ez çûm konferansekê û di bahola min de pantolonekî kont û gomlekekî yaqa wî vekirî ji bo li ser platformê li xwe bikim, hebû. Çar zilamên bi smokîn li balafirgehê bi du lîmûzînên spî pêşwazîya me kirin ji bo ku me bibin otêlê û dûv re jî bibin dêrê. Eger ez pastorekî payebilind bûma, min ê mêvanên xwe bi awayekî ji vê cudatir pêşwazî bikirina. Bêguman min ê kurekî xwe an jî endamên tîmê xwe yên ku pêbawer bûma, bi otomobîlekê an jî bi du otomobîlên xweşik û paqij bişandana pêşiya wan lê bi cilên rojane. Lê ev ne konferansa dêra min bû. Dîtina vê yekê hêsan bû ku vê dêrê girîngî dida nîşandana rêzgirtina derveyî. Min fêhm kir ku cilên min plan dikir ku ji bo xizmetê li xwe bikim, wê li dijî çand û adetên wan bin, ji ber vê yekê min di cih de amadekarî kir ji bo ku bedlekî bibînim û li xwe bikim.

Weke mêvanekî ez dipirsim û dibêjim: “Hûn dixwazin ez çiqasî biaxivim?” Ez rêzê li tiştê ku tê gotin digirim û ji dema diyarkirî dernakevim. Lêbelê min her gav wisa nekiriye. Min zêdetirî panzdeh salan, her sal li dêra yek ji qehremanên xwe Tommy Barnett, axivîm. (Dêra wî berê weke Civata Yekem a Phoenix dihat nasîn lê niha jê re

Navenda Mîsyona Phoenix tê gotin û kurê wî Luke, pastorê sereke ye.) Di serdana min a yekem de rojeke Yekşema sibehê wî çil deqe dem da min ji bo ku ez biaxivim. Wî ji min re got ku seateke li ser dîwêr ku ji platformê xuya dike heye ji bo ez bikaribim bişopînim ka çiqas dem ji min re maye. Lê di dawiya waza xwe de, ez deh deqeyan bi ser dema xwe ya diyarkirî ketim.

Piştî ayînê, ew ji nişka ve bêyî ku peyvekê ji min re bibêje derket. Min ji rûyê wî fêhm kir ku ew hêrs bûye. Min hemû piştî nîvroya xwe li ser fikra wê derbas kir bê ka min çi kiriye gelo. Berî ayîna êvarê, em di ofîsa wî de bi tenê bûn û min jê pirsî gelo min ew vê sibehê bêhêvî kiriye an na.

Bersiva wî zelal bû: "Erê, te ez bêhêvî kirim."

Min jê pirsî: "Ji ber ku min axaftina xwe dirêj kir tu dibêjî?"

Got: "Erê."

Ew hinekî sekinî û berdewam kir: "Ez ji te hez dikim John, ji ber vê yekê ez ê ji te re bêjim bê çima ez hêvîşkestî bûm. Li vir gelek xizmetkarên me hene ku li gorî bernameyeke demê xizmetê dikin. Mamosteyên me yên zarokan, xwedî bernameyeke perwerdehiyê ne ku li gorî bernameya xizmeta me ya sereke tevdigerin. Gava deh deqîqe bi ser dikeve, hemû pergal li binguhê hev dikeve. Zêdetirî sîh otobusên me li devê derî şixulandî disekinin û li bendê ne ku kesên ji taxên xizan hatina wan bibin malên wan. Ew ê çi bikin?"

Lîsteyê berdewam kir.

Piştre wî gotinên xwe wisa bi dawî kirin: "Te xema sîstema ku me li vir saz kiriye nexwar ji ber ku te dixwest tu deh deqeyên zêdetir biaxivî."

Bi van gotinan ez baş hatim terbiye kirin û min ji vê xeteya xwe ders ji xwe re derxist.

Weke mêvanekî ez ji rêber dipirsim: "Dema ku hûn mirovan vedixwînin tobekirinê, gelo hûn dixwazin ku ew derkevin pêş, an hûn dixwazin li ser kursiyên xwe bisekinin an jî tenê destên xwe

bilind bikin?" Ez bi baldarî guh didim bersiva pastor, dîsa ez li gorî çanda wan tevdigerim. Di her du senaryoyan de, ez bi temamî bawer dikim ku kesek eger bi rastî tobe bike, wê xelas bibe.

Ev tenê çend mînak in ji pirsên ku ez dipirsim. Carinan eger plana min ji çanda wan cuda be û eger ez difikirim ku rêbaza min wê çêtir encamê bide, ez ji pastor dipirsim gelo şaşbûn tê de heye ku ez tiştan hinekî cuda bikim. Ew her gav pirsbûna min teqdîr dikin û hema hema her gav bi kêfxweşî destûrê didin.

Gelek mînakên din hene ku ez dikarim bidim lê ez bawer im ku we heta niha dîtiye ku armanca min ew e ku ez li ser rêya ku rêber destnîşan kiriye bixebitim -"rêyên ku wî di Mesîh de daye ser wan." Lêbelê eger rêberek bibêje: "Ji bo xelasiyê em ji bangkirinê bawer nakin ji ber ku em bawer dikin ku Îsa tenê yek rê ye ku ber bi Xweda ve diçe. Em bawer dikin ku gelek rêyên cuda hene, yên ku diçin jiyana herheyî." Di vir de ez red dikim ku rêberiya wan bişopînim, ji ber ku tu xizmet tê de tuneye; di esasê xwe de, ev rêber wê bi dijî rastiya bingehîn a baweriya Xirîstiyaniyê derkeve.

Di seran serê ku ez bedena Mesîh ji perspektîfeke çivîkfirê ve temaşe dikim de, min gelek caran şahidiya trajediyên ku ji paşguhkirina vê rastiya bingehîn derdikevin, kiriye. Min ew kesên ku beşdarî perwerdehiya rêbertiyê an jî dibistanên Pirtûka Pîroz dibin, dîtine ku çandên wan bi tevahî ji dêrên ku ew lê mezin bûne cuda ne. Ev dibistan pirî caran bi dêreke mezintir ve girêdayî ne ku çanda wan diyar dike. Bi vî rengî, xwendekar çalakiyên wê dêrê hem di perwerdehiya xwe de û hem jî di xizmetên dawiya hefteyê de tecrube dikin.

Piştî mezûnbûnê, xwendekar bi dilgermî vedigerin malê xwe û dest bi guhertina çanda dêra xwe ya ku lê mezinbûne dikin. Dibe ku di mijara rê û rêbazên ku fêr bûne ku wan guncavtir û bibandortir dibînin de mafdar bin lêbelê heke ew pir israr bikin, ew dikarin bi hêsanî têkevin halê anaforekê. Eger rêbazên ku wan pêşniyar kirine werin redkirin, wê çêtir be ku bi duakirinê ji Xweda bipirsin bê ka ew

ê bi rêbazên rêberên xwe ve girêdayî bimînin an na.

Di rojên min ên destpêkê de ku min weke pastorê ciwanan xizmet dikir, ji ber min ferq nekir ku çalakî, teknîk û rêbazên cûrbecûr ên xizmetê hene, ev bû sedema ku ez bi tundî li hemberî pastorê xwe bisekinim. Min serdana dêreke li Louisianayê kiribû û min çavdêriya rêbazekê li wir kiribû ku pir baş dixebitî. Ez ewqasî bi serkeftina wan matmayî mam ku min guman li ser guncavbûna wê ya ji bo çanda dêra me nekir, bê ka gelo wê li ya me bê an na. Dereng be jî min fêhm kir û dema ku ez li paş xwe dinêrim, ez dikarim bibînim ku ew rêbaz bi “rêbazên di Mesîh de dişopîne” ên pastorê min re li hev nayê. Pastorê dêra Louisianayê kesek pir cuda bû li gorî pastorê min ê mezin. Şopînerên mezin ên cîhanî yên her duyan jî hebûn, her du jî bi bandor bûn, her duyan jî mirov ber bi qraltiya Xweda ve dibirin lê rêbazên wan ên kirina karan ji hev cuda bûn.

Em li gorî demên berê yên dîrokê civakeke bêtir bi tevger in. Piraniya me di tevahiya jiyana xwe de bi îhtîmaleke mezin dêra xwe herî kêm carekê, an jî çend caran diguherînin. Fêrbûna li ser çandê dema ku em dikevin nava komeleyeke nû pir girîng e. Ev, tiştek e ku divê em bi hişmendî bikin. Çiqasî em zûtir bikaribin xwe nû bikin û rêbazên wan yên ku di Mesîh de dişopînin, xwe adapteyî wan bikin em ê ewqas bihêztir bibin, hem bi awayî şexsî û hem jî weke beşeke ji bedenê.

BEŞ 16

# MÛXTELÎF

*Gava ku em bi rastî xelas bûn û em li xwesteka Xweda geriyan, em ê wê demê rayedariya meşrû ya dêrê nas bikin.*

Di beşên berê de xala me ya zîqbûnê li ser gelek dêran an jî li ser rayedarên dewletê bû. Dîsa jî weke min berê jî diyar kiribû, piraniya prensîban hemû kategoriyên rayedariyê di xwe de dihewîne. Di vê beşê de, bi qadên rayedariyê yên cuda yên di Gotina Xweda de, bi taybetî jî bi talîmatên diyar yên tên dayîn ku derbarê malbatê de ne, em ê li ser wan bisekinin. Piraniya wan tenê bi kategoriyên derbarê xwe de ne û ji ber vê divê yek bi yek li ser bê sekinandin. Di vê beşê de li ser tiştên ku em ê nîqaş bikin, wê hêsan bûya ku pirtûkek bihata nivîsandin. Lêbelê eger prensîbên ku heta aniha em hîn bûne bi cih bikin, em wan di vê beşê de bi yên ku em li ser wan sekinîne em dikarin li hev bînin û wê demê wê pirtûk li dilê me bê nivîsandin. Ya din jî, di vê beşê de, ji bo ku derbarê wê de pirtûk bi temamî bê nivîsandin, em ê hin talîmatên bi giştî yên ne berfireh jî bikolin. Ji ber vê min navê vê beşê kir mûxtelîf.

## MALBAT

Berî ku rayederên dêr, dewlet an jî civakê çêbibin, malbat hebû. Malbat fonksiyona herî girîng e ji ber ku tenduristiya her sê fonksiyonanên din bi vê ve girêdayiye. Her çiqasî di warên din ên dewirkirina rayedariyê de kêmasiyên we hebin jî, malbata we dikare bi awayekî serbixwe xurt bimîne. Lêbelê eger rêkûpêkiya malbatê têk biçe, yên din jî wê bi rengekî neyînî bandor li wan bibe. Rayedariya di nava malbatê de ji bo yên din bingeheke girîng e.

Di Nivîsên Pîroz de, rêkûpêkiya xwedayî ya nav malbatê bi xetên giştî wisa ye:

> “Zarokno, di her tiştî de serî li ber dê û bavê xwe deynin, çimkî ev li Xudan xweş tê.” (Kolosî 3:20)

> “Çimkî çawa Mesîh serê Civînê ye, mêr serê jinê ye û Mesîh bi xwe Xilaskarê Civînê, yanî bedenê ye. Îcar çawa ku Civîn bi ya Mesîh dike, bila jin jî bi vî awayî di her tiştî de bi ya mêrê xwe bike.” (Efesî 5:23-24)

Ev fermanên ku li du deverên din ên Peymana Nû de jî derbas dibin, avahiya rayedariyê ya ku Xweda di nav malbatê de ava kiriye eşkere dikin. Divê zarok di hemû aliyên jiyanê de guh bidin dê û bavên xwe. Ev ferman ne tenê wê demê derbas dibe ku dê û bav zarokên xwe teşwîq bikin ku beşdarî tevgerên dijberî Gotina Xweda bibin, weke mînak devjêberdana cinsî, derew, dizî, hilbijartina di navbera dê û bavan de û tevgerên bi vî rengî.

Nimûneyek baş a vê îstîsnayê di malbata min bi xwe de çêbû. Dema ku min li Zanîngeha Purdue endezyariya mekanîkê dixwend, min jiyana xwe ji Îsa Mesîh re terxan kir. Piştî demeke kurt, min fêhm kir ku Reb gazî min kiriye ku ez Mizgîniyê belav bikim. Ez di betlaneyeke dibistanê de hatim malê û ji dê û bavê xwe yên Katolîk ên oldar re min got ku ez ê endezyariyê xelas bikim û biçim dibistana

Pirtûka Pîroz. Vê nûçeyê ew aciz kirin û wan ev biryara min weke hişkbawer û bertekekê lê nêrîn. Diya min bi ser halan de got: “Divê berî ku tu biçî dibistana Pirtûka Pîroz, tu pê li laşê min bikî û biçî.”

Min bi dilnizmî û rêzdarî bersiva diya xwe da: “Dayê, ez ji te hez dikim û ez ji her tiştê ku te ji bo min kiriye ez spasdar im lê divê ez ji Xweda re îteatê bikim.” Van gotinan dilê wê qet rehet nekir an jî kêfa wê neanî. Heta ew hîn xemgîntir bû.

Îsa ji me re wisa got: “Yê ku dê an bavê xwe ji min bêtir hez dike, ne hêjayî min e. Yê ku kur an keça xwe ji min bêtir hez dike jî, ne hêjayî min e” (Metta 10:37). Ez bi van gotinan û yên dişibin van ên di Peymana Nû de xurt bûm, min dizanibû ku divê ez di navbera dê û bavê xwe yên delal û gazîkirina Îsa ya ji bo xizmetê de hilbijartinekê bikim. Di biryara min de tu dudilî tune bû.

Heta çend salan rewş ne baş bû. Min ji her demê bêtir ji malbata xwe re rêz digirt û ji wan hez dikir, ji ber ku niha ez xwedî kerema Xweda bûm. Di nav demê re, wan fêkiyên ku Îsa di jiyana min de çêkiribûn, dîtin û piştî hîjdeh salan şûnde, dema ku bavê min heftê û neh salî bû, min îmtiyaza duakirina bi wan re ya ku wan Îsa weke Reb qebûl kir, bi dest xist. Piştî vê yekê û pê ve, wan pirtûkên me xwendin, vîdyoyên me temaşe kirin û bi hevalên xwe re parve kirin. Têkiliya me, bibû tekiliyeke herî baş ya heta wê demê.

Îsa jî bi heman rewşê re rûbirû ma. Di mijara îteata ji bo dê û bavê de xwe: “Îcar Îsa bi wan re daket û çû bajarê Nisretê û bi ya wan dikir. Lê diya wî ev tiştên ha hemû di dilê xwe de hilanîn” (Lûqa 2:51). Lêbelê piştî dest bi xizmetê kir û şûnde, çawa ku Şîmon pêxemberî kiribû dema ku Îsa hîn pitik bû, dest pê kir ku şûr di dilê wan de rabe û ramanên di dilê wan de eşkere bike (Lûqa 2:35). Peyamên bihêz yên Îsa, malabata Wî jî di nav de gelek kes aciz dikirin û heta hêrs dikirin. Hîsên wî hat wê astê ku heta bi dêya Wî jî li hemberî Wî derket:

“Dema mirovên wî ev yek bihîstin, derketin ku wî bigirin, çimkî wan digot: «Wî hişê xwe winda kiriye!» Dê û birayên Îsa hatin, li derve rawestan, yek şandin pey wî û gazî wî kirin. Elalet li dora wî rûdinişt, îcar jê re gotin: «Va ye, diya te û birayên te li derve ne, li te digerin.» Îsa li wan vegerand û got: «Diya min û birayên min kî ne?» Hingê li kesên li dora xwe rûniştî nêrî û got: «Va ne, diya min û birayên min! Kî ku daxwaza Xwedê bîne cih, birayê min, xwişka min û diya min ew e.»” (Marqos 3:21, 31-35)

Heta kêliya ku jê dihat xwestin ku guh nede fermana Bavê xwe, Wî di her tiştî de guh dida dê û bavê xwe. Mizgîniya baş ew e ku çend sal şûnde, dema ku Giyanê Pîroz eşkere bû, em dibînin ku malbata Îsa jî li odeya jorîn amade ye. Piştî cîhekî û şûnde ew bûn şopînerên Efendî.

## MIN QENCÎ NEDÎT

Ne li îstîsnayan lê eger em li rêbazê vegerin, fermana ku zarok divê ji dê û bavê xwe re rêzê bigirin û nîşan bidin, fermana pêşî ye ku du sozan di xwe de dihewîne: Qenciyê bibînin û li ser rûyê erdê temenê wan dirêj be (Efesî 6:2-3; Kolosî 3:20).

Ez bi awayekî dijwar hînî encamên bêîteatiyê yên vê fermanê bûm. Piştî ku ez ji Zanîngeha Purdue mezûn bûm, min li Rockwell Internationalê dest bi kar kir. Ez beşdarî dêra ku min berê behs kir bûm. Piştî xizmeta xwe ya duyemîn, ez bi çend kesên ku temenê wan di yên min de, min xwarin xwar. Min rêberek di nav komeke kesên bekar de nas kir. Pêdiviya wî bi cihekî mayînê hebû û min nû bar kiribû bajêr. Piştî em hinekî axivîn, me biryar da ku em bi hev re di heman xaniyî de bijîn wê tiştekî pir baş be. Ez pir kelecanî bûm ji ber ku min ê karîbûya pereyên xwe bida ser hev û wê demê ji ber ku ez nû ji zanîngehê mezûn bibûm, ez miflis bûm.

Roja din ez li bavê xwe geriyam û min xebera xweş jê re got. Ez

fikirîm ku ew ê heyecana min a li ser teserûfa çend sed dolaran her meh bi min re parve bike. Lê wî nekir. Di şûna vê de wî got: “Kurê min, ev yek bi min ne baş e. Vê yekê neke. Tu vî zilamî nas nakî.” Min hewl da bavê xwe îkna bikim ji ber ku rêber tevlî xizmeta kesên bekar yên di dêrê de dixebitî, lê wî ji şîreta xwe paşve gav neavêt.

Dema ku min telefon girt, ez gihîştim wê encamê ku ji ber bavê min; ne kesekî bawermend bû û ji van tiştan fêhm nedikir, wisa difikirî. Di encamê de, camêr di pozîsyoneke girîng a rêbertiyê de bû. Min gotinên bavê xwe paşguh kirin û roja din, me bi hev re xaniyekî di apartmanan de dît û me peymana kirê îmze kir. Dema ku em çûn qemyonê ji bo alavên xwe kirê bikin, hevalê min ê nû ji ber ku deftera xwe ya çekan ji bîr kiribû, ji min pirsî gelo ez dikarim heqê wê bidim an na. Dema ku em çûn depozîtoya xanî bidin, wî dîsa heman tişt kir. Heman tevgerên wî berdewam kirin û di dawiyê de min hemû kirêya du mehên pêşîn ên me herduyan, hemû fatûre û heqê axaftina wî ya telefona dêdirêj (ku di wan rojan de ev axaftin pir biha bûn) dan.

Min çend caran otomobîla xwe da wî ji ber ku otomobîla wî tunebû. Dema ku wî roja din otomobîla min dianî, bêhna tixanê ji hundurê wê dihat. Wî her dem kesên ku pêdiviya wan bi alîkariyê heye, dikir mahne. Sibehekê, min dît ku deriyê otomobîla min bi awayekî pir mezin kupiyaye. Ez pir aciz bûm lê min aciziya xwe nîşan neda. Rojeke din, ez saet 4:00ê sibê ji odeya xwe ya razanê derketim û min dît ku kesekî xerîb li odeya rûniştinê bi qutiyeke bîra û cixareyekê rûniştiye. Weke ku yê xerîb ez im li min nihêrî.

Min li mala xwe îşkence didît lê weke bawermendekî nû, min di nava xwe de ji xwe re digot: “Divê ez di hezkirinê de bimeşim. Hêrs nebe û nedarizîne.” Ji ber vê yekê ez bi van pirsgirêkan re eleqedar nebûm. Ev tenê çend ji pirsgirêkên min yên rojane bûn ku ez bi vî zilamî re dijiyam.

Piştî çend hefteyên îşkenceyê, ez hîn bûm ku hevalê min ê

malê yekî hevzayend e. Min di cîh de jê re got ku ji malê here lê wî nedixwest. Ew di nava gunehan de dijiya lê berdêla her tiştî min da. Di wê demê de, pastorê bekaran jî şêwaza jiyana wî kifş kir û ew ji rêbertiyê hat dûr xistin. Ez yek ji wan kesên dawî bûm ku haya min ji şêwaza jiyana wî ya nebaş çêbibû. Bêîteatiya min, ez kor kiribûm.

Ji ber ku min şîreta bavê xwe paşguh kir, min bi sedan dolar winda kirin û ji xwe ez behsa hizûra xwe nakim jî. Ez hilweşiya bûm û ev demeke min ya herî dijwar bû ku heta niha hatibû serê min. Dema ku her tişt qediya, min ji Xweda re qîr kir û got: “Ya Reb, çima ev hate serê min? Min ji bo rêberiyê baweriya xwe bi Te anîbû.”

Reb nîşanî min da ku rêbertî ji min re kiriye lê min ev red kiriye. Min di rewşeke matmayî de jê pirsî: “Te çawa rêbertî ji min re kir?”

Bersiv da û got: “Bi rêya bavê te lê te guh neda min.”

Min îtîraz kir û got: “Lê bavê min ji nû ve çênebûye.”

Li ser vê Reb bi bîr xist ku Gotina Wî negotiye: “Zarokno, tenê eger dê û bavên we ji nû ve çêbibin, guh bidin wan.” Wî wisa rave kir: “Tu zarokê Min î û ez zanebûn û talîmatên xwe di dilê dê û bavên te de ava dikim ji bo ku rêberiya te bikim û te biparêzim.”

Di cih de ez li ber derketim: “Lê aniha ez bi tena serê xwe me. Bavê min ji min bi hezar kîlometreyan dûr e û fatûrayên min ne ew dide.”

Reb wisa got: Dayîna fatûreyên xwe û dê û bavê ku hezar kîlometreyan dûrî te ne, fermana ku divê tu bi ya wan bike, betal neke. Fermana Xweda, soz dide ku eger em îteatê jê re bikin, ew ê qencî bê rêya me lê ez dixwazim hûn ji min bawer bikin ku di vê rewşê de min tu qencî nedît!

Reb nîşanî min da bê zilamek kengî ji rayedariya dê û bavê xwe azad dibe. Xweda hîn ji serî ve wisa ferman daye: “Ji ber vê yekê wê mêr dev ji dê û bavê xwe berde, bi jina xwe ve bê girêdan û wê herdu bibin bedenek” (Destpêk 2:24).

Talîmata dawî ya ku dê û bav didin zarokên xwe pesendkirina jina ku wê kurê wan pê re bizewice. Di vir de dixwazim weke

mînekekê bidim, dema ku bavê Lisa destûr da min ku ez pê re bizewicim, Lisa ji ber vê biryarê matmayî ma. Dema ku min li sedema wê pirsî, wê bersiv da û got: “Ji ber ku wî gotibû, ji ber ew Xirîstiyan e kêfa min jê re nayê.” Ev tecrube ji bo min piştrastkirineke din bû ku dilê qral (kesên ku li ser me rayedariya wan heye) di destên Xweda de ye.

Îcar gava ku em vedigerin fermana Xweda, gotinên Wî tîne ziman ku bi girêdana jin û mêrekî ya bi zewacê re sazûmana rayedariyeke nû ava dibe. Sedema ku Xweda behsa jineke ku terka dê û bavê xwe kiriye nake, ew e ku jinê sazûmana malabateke nû ava nekiriye; mêr serokatiya rayedariyê dike.

Piştî ku zarok dizewicin, êdî ferman nayê dayîn ku guh bidin dê û bavên xwe lêbelê dîsa jî divê ew rêzê nîşanî dê û bavê xwe bidin. Carekê min ji dê û bavê xwe pirsî bê çima ew şîretan li min û jina min nakin, her çiqasî wan dît ku em bi pirsgirêkan re têdikoşin jî. Wan tenê berê xwe da min û gotin: “Te qet şîret ji me nexwestine.” Çi tevgereke xwedayî bû ev! Ez bûm şahidê ku dê û bavan talîmat didan zarokên xwe yên zewicî eynî weke berî ku bizewicin û midaxeleyî rewşa meseleyan dikirin. Berevajî tiştên ku Gotina Xweda dibêje, gava ku zarokên xwe azad nahêlin, hestên bi êş û têgihîştinên ku xelet tên fêhmkirin derdikevin holê.

## HIŞYARIYÊN TAYBET JI BO ZAROKAN

Piştî ku min çend salan weke pastorê ciwanan xizmet kir, min rêyên xeternak ên ku gelek ciwanan dabû ser wan dîtin. Ez dixwazim hin hişyariyên taybet ji Gotina Xweda li ser girîngiya rêzgirtina ji bo dê û bavan bidim. Ez hêvî dikim ku her ciwanê vê yekê dixwîne wê ji hevîrtirşka ku ev guneh di nav ciwanan de belav dike, dûr bisekine ji ber ku ew vegirtî û kûjer e. Nivîsên Pîroz wisa radigihînin: “Nalet li wî kesî ku dê û bavê xwe kêm dibîne. Bila tevahiya gel bêje: Amîn!” (Dubarekirina Şerîetê 27:16).

Li hemberî maseya min dayikek û kurê wê yê ku di dema kamilbûna xwe de bû, rûniştibûn. Di nava axaftina xwe de, vî xortî gelek caran dêya xwe biçûk dixist, mîna ku ew keseke bêaqil û rezîl be, diaxivî. Min berê çend caran erza wî şkerandibû. Lê di dawiya hevdîtina me de, min bi awayekî ku kes ne li bendî bû ji nişka ve jê re got: “Xorto, eger tu ji ber tevger û helwestên xwe yên li hemberî dêya xwe tobe nekî, di dawiya dawî de tu yê bikevî zindanê.” Gotinên min, bi qasî wan ez jî matmayî hiştim. Wî xortî, xwe weke bawermendekî bi nav dikir û endamê koma ciwanên me bû. Ev çawa dikaribû bibûya?

Nêzîkî şeş salan piştî vê bûyerê (ez êdî ne pastorê ciwanan bûm û min ji bo xizmetê rêwitî dikirin), dêya wî ciwanî sibeha Yekşemekê piştî perestîşê hat ba min û bi heyecan wisa got: “Pastor John, te ji kurê min re gotibû ku eger tobe neke ew ê rojekê bikeve zindanê. Û hûn dizanin, ev du sal in di zindanê de ye.”

Min ev hevdîtin hema bêje ji bîr kiribû lê gava wê behsa wê kir, hat bîra min. Ez fikirîm, gelo çima ev dayik ewqasî bi kelecan e gava ku vê nûçeya xerab bi min re parve bike? Di dawiyê de min sedema wê fêhm kir. Wê wisa berdewam kir: “Dilê kurê min aniha ji bo Xweda dişewite. Ew ji girtiyên din re şahidiyê dike û beşdarî xizmeta zindanê dibe. Ew pirtûkên we dixwîne û ji wan bereketeke mezin distîne.”

Ez heyran mam bê çawa hukmê Xweda di jiyana vî xortî de her tişt serûbin kiriye. Ji bo wî wê pir çêtir bûya eger neçar nebûya ku ji zehmetiyan dersan bistîne û guh bidaya gotinên ku berî bi salan jê re hatine gotin. Lê tişta girîng -arezûya ji bo Xweda- êdî di dilê wî de bû.

Em dikarin ji fermanên Peymana Kevin fêr bibin bê ka çiqasî girîng e ku zarok êrîşî dê û bavên xwe bikin, çi bi awayekî fîzîkî çi jî bi awayekî devkî: “Kesê li dê û bavê xwe bixe, divê bê kuştin” (Derketin 21:15) û “Kesê nifiran li dê û bavê xwe bike, divê bê kuştin” (Derketin 21:17). Îsa jî referans ji van fermanên Peymana Kevin girtine: “Çimkî Xwedê gotiye: ‹Qedrê dê û bavê xwe bigire› û ‹Yê ku tiştê xerab ji dê û bavê xwe re bêje, divê bê kuştin.›” (Metta 15:4).

Mûsa di mijara zarokekî serhişk û yekî ku li ber dê û bavê xwe derdikeve de, bê divê mirov çawa tevbigere talîmatê dide:

> "Heke kurê zilamekî, serhişk û serhildêr be, guh nede dengê dê û bavê xwe yan terbiyekirina wan, wê gavê wê dê û bavê wî hildin wî bibin ba rîspiyên li ber dergehê bajarê wî. Wê ji rîspiyan re wiha bêjin: 'Kurê me serhişk û serhildêr e. Ew guh nade dengê me. Ew têrnexwar û serxweş e.' Wê hemû mêrên bajêr bidin ber keviran û bikujin. Bi vî awayî hûnê xerabiyê ji nav xwe rakin û wê hemû Îsraêl bibihîze û bitirse." (Dubarekirina Şerîetê 21:18-21)

Eger ev gotin îro bihatana kirin, me yê pêwistî pê dîtibûya ku em li dêrên xwe ciwanan bi rûkûpêk bikujin. Her çiqasî ev şêweya cezakirinê êdî tune be jî, em dibînin ku helwesta Xweda ya li hemberî tevgerên serîhildêr pir hişk û dijwar e. Tenê ji ber ku awayê darizandina Wî guheriye, îcar prensîba ku Ew dihewîne neguheriye. Divê em rê nedin serhişkî û serîhildanê ku di dilê me de bi cîh bibe, ji ber ku ew kûjerek e.

Min zarokên xwe hişyar kirin ji bo ku xwe ji her cure serhildanê biparêzin. Forma herî xapînok an jî nedîtî ya vê rewşê gilî ye. Gilîkirin ew e ku mirov rayedariyê biçûk bike bêyî ku zanibe bi gotina "Ez ji awayê ku tu li min hukum dikî hez nakim û eger ez di şûna te de bûma, min ê ev bi awayekî cuda bikira." Ev helwest ji bo rêbertiyê heqaret e. Aniha hûn dikarin bibînin ku giliyên wî çawa ji axa Îsraêliyan ji Erdên Sozdayî re bûne alîkar? Her çiqasî giliyên wan li Mûsa bûn jî, di rastiyê de ev yek îfadeya şermezarkirina Xweda bû. Di esasê xwe de, wan ji Xweda re digot ku Te ev kar rast nekir û wan got ku ew ê bi awayekî cuda rêbertiyê ji xwe re bikin.

Rêzgirtina me ya li ber dê û bavên me, soza jiyaneke dirêj û tiştên baş bi xwe re tîne. Ez ji bedêla darizandinê bêtir dixwazim bijîm. Divê ev ferman di dilê me de bi cîh bibe.

## ZEWAC

Werin em bala xwe bidin rêkûpêkiya xwedayî ya zewacê. Nivîsên Pîroz ji me re dibêjin ku jin divê “di her rewşê de” bi ya mêrên xwe bikin (Efesî 5:24). Ev ferman ne tenê ji bo mijarên giyanî lê di heman demê de ji bo hemû warên jiyanê jî derbas dibe. Bala xwe bidinê ku Pawlos dibêje “ji mêrên xwe re.” Mêrên din li ser jineke zewicî rayedariya wan tuneye; tenê rayedariya mêrê wê heye. Pastorek li dêrê û di mijarên giyanî de, rayedariya wî li ser jina kesekî din heye, patronek li ser karê pîşeyî yê jinekê li derveyî malê rayedariya wî heye û dewlet li ser mijarên giştî rayedariya wê heye, lêbelê dema ku mijar dibe mal, mêrê wê rayedarê wê ye.

Di nîvê salên 1980yî de, ez û jina xwe di bin bandora hînkirineke xelet de man. Dihat hînkirin ku Peymana Nû ji aliyê hin zilamên şovenîst ve hatiye nivîsandin û dema ku behsa rayedariya di navbera jin û mêran de tê kirin, divê em bi gotinên wan ve girêdayî nemînin. Dihate gotin ku Îsa ji bo her kesî xelasiya wekhev ava kiriye. Ev teqez rast e lêbelê xelasî rayedariyê betal nake. Bi salan di mala me de hizûr tunebû. Em ji bo rêbertiya malê di nava têkoşîneke berdewam de bûn.

Piştî gelek salên tevlihev, rojekê min ji jina xwe re got: “Xweda ez kirime rêberê vê malê û tu bi ya min bike jî û neke jî ez ê rêbertiyê bikim.” Bi vî awayî ber karê min vebû lê ji bo jina min na. Reb nîşanî min dabû ku weke rêberekî, tu carî zorê li kesên binya xwe re nekim ji bo bi ya min bikin. Îsa jî vê yekê bi me nake. Lê eger kesên di bin rayedariya me de bin û rêbertiya me neşopînin, ew ê êşê bikişînin.

Min teselî û aramiya xwedayî bi dest xist. Lêbelê Lisa berdewam kir û hemû tundiyên malê li ser xwe hîs kir. Ew îkna bibû ku ez ne rêberekî berpirsiyar im. Ez ciwan bûm, gelek kêmasiyên min hebûn û ji ber vê yekê, gelek xemên wê ji ber xeletiyên min ên berê bûn ku di vê yekê de mafdar bû. Carinan tirsên wê ew qasî zêde dibûn ku wê di nîvê şevê de min şiyar dikir ji bo ku ji min re bibêje ku ez

barên xwe hilnagirim û ew ji para xwe pir zêdetir radihêje vî barî. Min tenê jê re got ku hemû xemên xwe bihêle ji Xweda re û ew bi tirs li kêleka min dirêjkirî û ez jî dîsa vegeriyam xewa xwe.

Barê Lisa her ku çû zêde bû. Xemên wê her tim ew aciz dikirin. Ramanên wê qet aram nebûn û wê her tim rewşa krîzeke ku wê malbata me dibe ku pê re rûbirû bimîne xeyal dikir.

Di demek kurt de tengezariya wê hema bêje hate asteke wisa ku nema debar ji ber dibû. Bi hêviya tundiya li ser xwe sivik bike, gelekî di dûşê de dima an jî serê xwe dişûşt. Şevekê, dema ku di serşokê de û gilî û gazin ji min dikirin, Xweda pêre axivî: “Lisa, tu difikirî ku John rêberekî baş e?”

Di cîh de bersiv da: “Na, ez nafikirim! Ez qet lê bawer nabim!”

Reb bersiv da û got: “Lisa, ne hewce ye ku tu baweriya xwe bi John bînî. Divê tu tenê baweriya xwe bi min bînî. Tu nafikirî ku John weke rêberê vê malê karekî pir baş dike. Tu hîs dikî ku ew dikare hîn çêtir bike. Rageşî û bêaramiya ku tu dikişînî ji ber giranî û tundiya rêberê malê pêk tê. Ew ji bo te nîr e lê ji bo mêrê te gomlekek e. Wî ji xwe bike û bavêje.”

Lîsa di cîh de fêhm kir. Ne zilamekî bi hêz û desthilatdar jê re digot, divê ew bi mêrê xwe ve girêdayî be, yê digot Xweda bû. Hilgirtina barê rêbertiya mala me, li ser wê zordarî dikir ji ber ku ne berpirsiyariya wê bû ku ew vê valahiyê dagire. Xweda destûr dabû ku ew barê berpirsiyariyê bêyî mesîhkirin an jî kerema ku mêrê wê hildabû ser pişta xwe, tecrube bike û biceribîne. Ew ji serşokê bi girî derket û lêborîna xwe xwest. Wê heman rehetî û aramiya ku çend meh berê min bi dest xistibû, wê jî bi dest xist û mala me cara pêşî piştî bi salan ket nav ahengeke rastîn.

Wê êvarê, Lisa fêhm kir ku Xweda nabêje; tiştekî ku mêrê we hilbijart an jî biryara wê da û gava ku hûn tenê vê yekê bipejirînin an jî biecibînin, ev nayê wê wateyê ku hûn bi vî awayî pê ve girêdayî dimînin. Eger ew îteatê ji fermana Xweda re bike, ew ê têketa bin

parastina Wî. Baş e, piştî wê rojê gelo min di rêvebirina malbata xwe de şaşî kirin? Bêguman. Gelek caran. Lêbelê di dema şaşiyên min de, Xweda Lisa parast û aramî da wê. Heta ku jin bi mêrê xwe ve girêdayî be, mêrê wê çiqasî biryarên şaş bide jî bila bide, ew di bin parastina Xweda de ye.

## MÊRÊN FÊHMKOR AN JÎ BÊBÎR Û BAWERÎ

Fermana guhdarîkirinê (pêve girêdayî) ne tenê ji bo jinên ku mêrên wan bawermend in tê dayîn. Petrûs wisa gotiye: “Jinno, bi vî awayî hûn jî bi ya mêrê xwe bikin. Wisa ku, eger hinek ji wan bi peyva Xwedê baweriyê neynin jî, “gava ew jiyana we ya hurmetkar û şîrhelal bibînin, bê gotin bi jiyana jina xwe bên qezenckirin” (Petrûs I, 3:1-2).

Berî her tiştî, em îfadeya “Jinno, bi vî awayî…” lêbikolin. Petrûs, mijara bê divê em çawa li ser muameleya neheq ya rayedariyan bisekinin, nû qedandibû. (Me ev yek di beşa 13. de bi berfirehî vegot.) Lêbelê piştre wî di cîh de talîmatên wekehev yên derbarê mêrên wan de da jinan jî. Eger em van gotinan bînin cem hev, me yê wisa bixwenda:

> “Xulamno! Bi hemû hurmetkariyê bi ya axayên xwe bikin; ne tenê bi ya qenc û berbiwêran, lê belê bi ya cirnexweşan jî bikin. Çimkî eger yek bi neheqî cefayê bikişîne û ji ber ku ji Xwedê ditirse xemgîniyê radigire, ev li Xwedê xweş tê.” “Jinno, bi vî awayî hûn jî bi ya mêrê xwe bikin. Wisa ku, eger hinek ji wan bi peyva Xwedê baweriyê neynin jî,” (Petrûs I, 2:18-19; 3:1)

Rewşeke xemgîn e lê rast e. Min hin mêrên “bawermend” nas kirin ku di rêbertiyê de ji yên bawer nakin hişktir in. Lêbelê weke qaîdeyeke gelemperî, mêrên herî dijwar yên pêve girêdayî helbet ew mêr in ku hîn xelas nebûne. Ez dixwazim dîsa dubare bikim ku eger mêrek ji jina xwe re bêje ku rêyeke berevajî Gotina Xweda

bişopîne, divê ew îteatê ji gotina wî re neke lêbelê divê helwesta xwe ya pêvegirêdanê biparêze.

Petrûs, ev rewşa jinan ya pêvegirêdayî ji bo mêrên bawer nakin, ji gotina ku ji wan re waz dibe bêtir şahidiya bi hêz nîşanî wan dide û berdewam dike. Min jineke ku mêrê wê bawer nedikir, nas dikir. Wê bi salan ji wî re waz da. Wê belavok danîn ser maseya wî ya xebatê, Pirtûkên Pîroz danîn ber serê wî û danîn ber kursiya wî ya ku herî pir jê hez dikir û kovarên Xirîstiyaniyê danîn ser sehpayê. Dema ku wê jin û mêrên bawermend vedixwendin mala xwe, mêr her dem bawermendên xurt bûn, wê hêvî dikir ku wê ev mêr şahidiyê bidin mêrê wê.

Rojekê Xweda bi wê re axivî: “Tu yê hîn çiqasî rê li ber xelasiya mêrê xwe bigire gelo?”

Di nava matmayînê de pirsî: “Ez rê li ber xelasiya mêrê xwe digirim! Çawa?”

Reb nîşanî wê da ku heta ew wazan bide mêrê xwe û şert û mercan manîpule bike, ew tiştê ku Xweda fêr kiriye nake. Wî ayetên di Petrûs I’ê de nîşanî wê dan û ev talîmat danê: “Belavok, kovar û Pirtûka Pîroz bide aliyekî û dev ji vexwendina jin û mêrên bawermend berde ji bo şîvê.”

Jinikê ji min re wisa got: “John, ji wê demê û pê ve min tenê ji mêrê xwe hez dikir, ez pê ve girêdayî bûm û di nav çend mehan de mêrê min jiyana xwe da Îsa.” Ez li mala wan mam û ez dizanim ku ev zilam ji Reb pir hez dikir.

Eger em bi dilsozî bawer bikin, pê bawer bin û îteatê ji Gotina Xweda re bikin, em ê di malên xwe de mûcîzeyan bibînin û ji aştiyeke ku ji her têgihîştinê wêdetir e kêfê bistînin. Ez nikarim têra xwe bînim ziman ku ev gotin rasterast ji Xweda tîne ziman, ne rêberên kontrolker, manîpulatîf û yên ku hêzê dihebînin. Xweda ev gotin ji bo ku me pîroz bike û biparêze gotin û em ê di beşa bê de hin ji van gotinan bibînin. Di nav dijwarîyan de, em dikarin baweriya

xwe bi soza Wî bînin: “Çimkî ez pîlanên xwe yên ji bo we dizanim.” Ev e gotina Xudan. “Ev ne pîlanên xerabiyê ne, lê pîlanên xêrê ne ku pêşeroja hêviyê bidin we” (Yêremya 29:11).

## RAYEDARIYA CIVAKÎ

Di Peymana Nû de, ji bilî van derbarê têkiliyên jiyana me ya kar û perwerdeyê de hin talîmatên diyar tên dayîn. Pawlos wisa nivîsand:

> “Ji xulaman re bêje ku bi ya axayên xwe bikin û di her tiştî de li wan xweş bên û bersîva wan nedin. Nedizin, dilsoziyeke tam û baş nîşan bidin, da ku di her tiştî de hînkirina Xilaskarê me Xwedê bê xemilandin.” (Tîtos 2:9-10)

Ne bi wazên patronên bawer nakin yên xwedî şîrketan an jî yên kardaran û xebatkaran, gava di rewşên zor de û di nav tevgera exlaqê kar de dibêjin ku wan karakterê Îsa dîtiye, ev min pir kêfxweş dike. Min ji wan bihîstiye ku ji min re dibêjin: “Ew qet nîqaş nakin, gilî nakin an jî bersiveke çewt nadin min” an jî “Ew ji karmendên din bêtir hewl didin” an jî “Ew karmendên min ên herî durust û mirov ji wan bawer dike.” Ev zilam, ji ber şahidiya karmendên xwe waza ku ez ê derbarê Îsa de bidim vekirîne ku bi baldarî guh bidinê.

Lêbelê carekê ez berevajî vê yekê jiyam. Ez li kêleka zilamekî di balafirê de rûniştim ku xwediyê duyemîn şîrketa texsiyê ya herî mezin ya li bajarekî mezin bû. Me sohbetek xweş û dostane kir heta ku ew hîn bû ku ez xizmeta Xweda dikim. Lêbelê gava ew hîn bû ku ez xizmetkarek im, ew ji nişka ve bêdeng bû û ji min dûr ket. Ji ber ku me heta wê kêliyê têkiliyeke germ ava kiribû, min cesaret kir ku jê bipirsim bê gelo çima helwesta wî ji nişka ve guherî.

Wî ji min re wisa got: “Temam, ez ê ji te re bibêjim. Berê jinek hebû di şirketa me de dixebitî. Ew yeka ji Xirîstiyanên ku “ji nû ve jidayikbûyî” bû. Wê ji her kesê li ofîsê re waz didan, wê hem seatên xebatê yên xwe û hem jî yên xebatkarên din meşgûl dikirin. Gava ku ji şîrketa min

derket, tiştên ku ne yên wê jî bûn bi xwe re birin, bi kurê xwe yê ku li Almanyayê dijiya gelek caran bi telefonê diaxivî û fatûreya xwe ya telefonê ya heyşt hezar dolar jî xist stûyê şîrketa min û çû."

Dilê min jê mabû. Her kesê li wê ofîsê, piştî serxwebûn û diziya vê jinê wê tu kes nexwaze Gotina Xweda bibihîze. Ji ber vê yekê Pawlos wisa nivîsî: "Bêyî ku bersiveke çewt bidin, bêyî ku ew diziyê bikin, bila nîşan bidin ku ew kesên ewledar in." Dema ku em guh bidin, xebatkarên hewldar bin û gava em îteatê ji kesên kar didin me re û bi qûral û qanûnên dibistanên xwe ve girêdayî bin, em ê bibin şahidên kerema Rebê xwe Îsayê Mesîh.

Pawlos li cihekî din wisa got:

> "Xulamno, di her tiştî de serî li ber mîrzayên xwe yên li ser dinyayê deynin. Vê jî, ne ji bo ku hûn li ber çavê mirovan xweş bên dîtin, lê belê bi hemû dilê xwe û bi tirsa Xudan bikin. Hûn her çi bikin, wek ku hûn ne ji mirovan re, lê ji Xudan re dikin, bi dil û can bikin." (Kolosî 3:22-23)

Bala xwe bidin îfadeya "her tiştî" ya di ayetê de. Ferq nake bê patronê we an jî mamosteyê we çiqasî tênegihiştiye an jî çiqasî bê mantiq e. Guhdarîkirina ku hûn lê dikin di rastiyê de îteata we ya ji Reb re ye.

Pawlos wisa berdewam kir: "Hûn dizanin xelata ku mîras e, hûnê ji Xudan bistînin. Çimkî hûn ji Xudan Mesîh re xizmetê dikin" (Kolosî 3:24). Eger wê jinikê di rastiyê de bizaniya ku ji Reb didize, tu hewl nedida ku tiştekî wisa bike. Ji têgihiştin û tirsa Reb mehrûm bû.

Pawlos di ayeta piştî vê de wisa got: "Lê yê ku neheqiyê dike, ewê wê neheqiya ku kiriye bistîne û xatirgirtin tune." Ez ji îfadeyên şîrovekar ên vê ayetê yên di wergera Message de hez dikim: "Xizmetkarê cirnexweş ku kar di ser serê xwe re dike wê hesabê vî tiştî bide. Xirîstiyanîbûn xerabiyê venaşêre."

Neheqiya ku wê jinikê kir, bi gumaneke mezin wê ne ji xwediyê

şîrketê an jî ji dewletê bê pêşiya wê, li şûna vê, wê li hemberî Reb berpirsyar bê hesibandin û ji bo ku tişta ku Mesîh li ser kursiyê darizandinê kir, wê hesab jê bê xwestin: "Ji bo vê yekê dixwazî bila em di bedenê de bijîn, dixwazî jî bila em ji bedenê dûr bin, armanca me ev e ku em li Xudan xweş bên. Çimkî divê em hemû li ber kursiyê Mesîh ê dîwanê xuya bibin, da ku her kes li gor tiştên ku hê ew di bedenê de bû, kirine – qenc bin an jî xerab bin – bistîne" (Korîntî II, 5:9-10).

## MIJARÊN GIŞTÎ

Gelek mirov dibêjin ku wê tu carî bi ya rêberên xwe yên ku gotin û imelê wan hev nagire, nekin. Lêbelê gelo ev fikir ji ber îteatê pêk tê an jî ji muhakemeya xwezayî çêdibe? Em wisa dixwînin: "Hingê Îsa ji elaletê û ji şagirtên xwe re got: Şerîetzan û Fêrisî li ser kursiyê Mûsa rûdinin. Loma her tiştê ku ji we re dibêjin, bikin û bînin cih. Lê li gor kirinên wan nekin, çimkî ew dibêjin û nakin" (Metta 23:1-3).

Îsa ferman da ku em teslîmî rêberên dejenere bûne jî bibin, yên ku wazên dibêjin jî û pêk naynin. Wî qelebalix ne ber bi jiyana wan a şexsî ve lê ber bi rayedariya wan a li ser wan ve bir. Watchman Nee wisa nivîsandiye:

> Xweda çi rîskên mezin kirine dema ku rayedarî ava kiriye! Rayedariyên hatine dewirkirin yên ku Wî avakirine, eger Wî xelet bidin naskirin wê çi zerareke mezin lê bibe! Lê dîsa jî Xweda ev rayedarî bê tirs ava kirine. Ji bo me, ji avakirina ku Xweda ew çêkirine pir hêsantir e ku em bê tirs îteatê ji wan re bikin. Naxwe, ji ber ku Xweda bi xwe natirse ku rayedariyê bispêre mirovan, ma em nikarin bê tirs îteatê ji wan re bikin? Çawa ku Xweda bi wêrekî rayedarî ava kiriye, em jî bi wêrekî îteatê ji wan re bikin. Eger tiştek xelet biçe, xeletî ne ya me ye lê ya rayedaran e, ji ber ku Reb wisa dibêje: "Bila her kes bi ya hukûmeta li ser xwe bike" (Romayî 13:1).

> Kesên îteatkar divê tenê îteatê bikin; Reb wê me ji ber îteateke xelet berpirsiyar negire, li şûna vê wê rayedariya ku dewirkiriye ji ber kiryara wê ya xelet berpirsiyar bigire. Lêbelê pevênegirêdan serîhildan e û ji ber vê yekê divê kesê di bin rayedariyê de hesab bidin Xweda. (Rayedariya Giyanî, r. 69-71)

Ev gotin ji aliyê zilamekî ku rayedaran neheqî lê kirine, hatine nivîsandin. Watchman Nee di salên 1930 û 1940î de alîkarî da avakirina dêrên herêmî li Çînê ku bi temamî ji rêxistinên mîsyoner ên biyanî serbixwe bûn û di anîna gelek kesan ji bo Desthilatdariya Xweda de roleke girîng lîst. Gava ku çalakiyên wî rayedar bi hêrs kirin, di sala 1952'ya de hat girtin û bi gelek tohmetan hate mehkûmkirin. Ew heta sala 1972'ya ango heta mir di girtîgehê de ma. Lê dîsa jî bi saya rêzgirtin û tirsa xwe ya ji Reb, wî di girtîgehê de ji gelek kesan re şahidî kir û mirov bi saya şahidiya Wî ya zindî, xelas bûn. Nivîsên wî hîn jî piştî gelek salan bandorê li mirovan dikin.

## FERQKIRINA RAYEDARIYÊ

Di seranserê vê peyamê de, min diyar kir bê ka wê rayedarên hatine tayînkirin çawa bên ferqkirin lêbelê berî ku ez vê beşê biqedînim, tiştên ku hatine gotin ez wan xurt bikim wê baştir çêbibe. Di hawirdorên giştî û civakî de, ferqkirina rayedariya meşrû ne zor e. Em wisa dixwînin: "Ji bo xatirê Xudan, bi ya hemû sazûmanên mirovî bikin, dixwazî bila padîşahê ku di ser hemûyan re be" (Petrûs I, 2:13). Em peywirdarên giştî yên ku sond dixwin û dest bi peywirê dikin an jî yên ku weke karmendên dewletê dikevin kar, nas dikin. Wekî din rêvebirên şîrketan an jî mamosteyên dikevin kar û rêvebirên saziyên perwerdeyê hene û em dizanin ku rayedariya wan rast e.

Rayedariya di nava malê de jî bi hêsanî dikare bê naskirin. Dema ku jinek bi zilamekî re dizewice, ew dikeve bin rayedarî, parastin û dabînkirina wî. Zarokek ku di malbatekê de ji dayik dibe, di bin rayedariya dê û bavê xwe de ye. Eger zarokek ji malbateke din re

bibe ewlad, divê ew rêzê li dê û bavê xwe bigire weke ku ew ji dê û bavê xwe yê biyolojîk re digire. Zarokek ku li yetîmxaneyê an jî li maleke ku xwedî derketiye, divê weke rayedariyê rêzê nîşanî rêberan bide.

Ferqkirina rayedariya meşrû ya di nava dêrê de hinekî din tevlihevtir e. Ji ber ku Nivîsên Pîroz, me hişyar dikin ku dibe ku şandî, pêxember û rêberên sexte di dêrê de hebin; divê em ne girêdayî wan bin. Weke ku Pawlos dibêje: “Lê ji bo ku rastiya Mizgîniyê herdem bi we re be, me ji bo saetekê jî li ber wan serî dananî” (Galatî 2:5). Rêberên sexte bi du awayan dikarin bên xuyakirin. Ya pêşî, ew doktrînên bi Nivîsên Pîroz re ne lihevhatî ne, hîn dikin. Di çarçoveya gotinên Pawlos ên berî niha de, “Lê belê eger em, an jî milyaketekî ji ezmên, ji wê Mizgîniya ku me ji we re gotiye pê ve, mizgîniyeke din ji we re bêje, bila nifir li wî be” (Galatî 1:8). Ji ber vê yekê, Pawlos serî li ber van rêberên sexte dananî û ew bi rûmet nekirin.

Ya duyemîn, rêberên sexte di nav dêrê de bi rêya tayînkirina xwe bi xwe derdikevin holê. Tayînkirina Xweda ji aliyê Giyanê Pîroz ve tê destpêkirin û ji hêla mezinên dêrê yên heyî ve tê piştrast kirin ku çavdêriya jiyana namzed kirine. Di Peymana Kevin de, ev pêvajo bê çawa di tayînkirina Yêşû de dixebite, hatiye teswîrkirin. Xweda ji Mûsa re wisa got:

> “Yêşûyê kurê Nûn ê ku Ruhê Xudan pê re ye hilde ba xwe û destê xwe deyne ser wî. Tê wî li pêş Êlezarê Kahin û tevahiya civakê bidî sekinandin û li ber çavê wan wî bikî peywirdar. Ji bo ku tevahiya civaka Îsraêl guhdariya wî bike, tê ji desthilatiya xwe bidî wî.” (Hejmartin 27:18-20)

Xweda Yêşû hilbijart lêbelê rayedarên heyî yên hatine tayînkirin, bi rêya Mûsa û Elazar hilbijartina wî piştrast kirin. Van zilaman bi salan çavdêriya jiyana Yêşû kiribûn. Ev model di Peymana Nû de tê xuyakirin (Karên Şandiyan 13:1-4).

Pawlos wisa nivîsand: “Çimkî ne yê ku xwe tewsiye dike, lê belê yê ku Xudan wî tewsiye dike, tê erêkirin” (Korîntî II, 10:18). Girêdana bi rayedarên ku xwebixwe xwe tayîn dikin, tevgereke bi talûke ye. Xweda, wê her dem destûrê bide tayînkirina wan ya li ber çavê dêrê ku namzed bi dilsoziyê xizmetê bikin. Îsa, ji ber ku bawermendên Tiyatiralî, serê xwe li ber rayedariya sexte û doktrîna pêxemberê bi navê Îzebel ku xwebixwe xwe tayîn kiriye, tewandiye, erza wan şkerand (Wehiy 2:20-25). Li ser bê mirov çawa dikare xizmetkarên ku xwebixwe xwe tayînkirine nas bike, min pirtûkek bi navê “Thus Said the Lord?” nivîsand. Ew ji bo vê peyamê referanseke baş e; ew hem li ser sextekariyê û hem jî li ser îstismara rayedariya giyanî disekine.

Dema ku em bi rastî xelas dibin û li daxwaza Xweda digerin, em rayedariya meşrû ya di dêrê de nas dikin. Îsa wisa got: “Eger mirovek bixwaze ku daxwaza Xwedê bike, wê bizane ku hînkirina min ji Xwedê ye, an ez ji ber xwe dibêjim” (Yûhenna 7:17). Îfadeya li vir ya sereke ev e: “Eger mirovek bixwaze ku daxwaza Xwedê bike.” Eger dilekî me yê ku li dû Xweda ye hebe, Ew bi rêya Giyanê Pîroz hîskirinê dide me. Weke ku Yûhenna diçespîne: “Lê hûn ji aliyê Yê Pîroz ve bi Ruh hatine meshkirin û hûn hemû jî rastiyê dizanin” (Yûhenna I, 2:20).

Watchman Nee wisa nivîsandiye: “Eger em bi rastî fêr bibin bê ka em ê çawa îteatê ji Xweda re bikin, em ê di fêmkirina rayedariya Xweda de bê ka li ser kê ye, tu zehmetiyan nekişînin” (Rayedariya Giyanî, r. 62). Naskirina Xweda tê wateya naskirina rayedariyê ji ber ku Ew û rayedariya Wî ji hev nayên veqetandin.

Xweda, wan kesên ku bi dilxwazî li Wî digerin û îteatê jê re dikin, xelat dike. Di beşa bê de, em ê berdewam bikin ku hin ji gelek feydeyên ecêb ên mayîndetiya di rayedariyê de bibînin.

BEŞ 17

# BAWERIYA MEZIN

*Îteata me çiqasî mezin be,*
*wê baweriya me jî ew ewqasî mezin be.*

Di vê beşa dawî de, em ê li ser fêdeyên "tahmandinê" bisekinin -bi gotineke din, em ê li ser xelat û bereketên mezin ên ku ji hemû kesên ku dikevin bin rayedariyê hûr bibin. Tenê ji bo nîqaşkirina van fêdeyan pirtûkek dikare were nivîsandin. Her çiqasî em ê li vir tenê hinekan vebêjin jî, bang li we hatiye kirin ku hûn bi rêya lêkolîna xwe ya kesane û ezmûna xwe ya di Mesîh de gelekên din kifş bikin.

## REB BAWERIYA WE ZÊDE DIKE

Çend sal berê, weke ku min gelek sibehan dikir ji bo ez duayan bikim, ez di saet 5:30ê sibehê de çûm ofîsa xwe. Lêbelê berî ku ez dest bi duayan bikim, min talîmatek ji Giyanê Pîroz bihîst: Beşa 17an a Lûqayê veke û ji ayeta 5an dest bi xwendinê bike.

Min bi kelecan li rûpelan çavên xwe gerand û min ferq kir ku ew beşek e ku ez pir pê dizanim. Min berê li ser vê mijarê waz jî dabûn lê vê yekê hewesa min kêm nekir. Ji ezmûnên berê, min dizanibû ku

eger Reb ji min re bigota ku ez hin ayetan bixwînim, min dizanîbû ku ez ê tiştekî nû fêr bibim ku min berê ferq nekiribû. Werin em li ayetê binêrin.

"Şandiyan ji Xudan re got: Baweriya me zêde bike" (Lûqa 17:5). Berî ku ez behsa tiştên ku Wî wê sibehê nîşanî min da bikim, bihêlin ez rave bikim bê çima van mirovan ji bo zêdekirina baweriya xwe gazî Îsa kirine. Ma gelo Îsa berî aniha mirovekî mirî sax kiribû? Gelo wî bi çend nan û masiyan pênc hezar mirov têr kiribû? An jî wî deryayeke ku gur bibû şermezar kiribû û ew aram kiribû? Bersiv na, na, na bûn! Îsa berî aniha ji van zilaman re tenê ev gotibû: "Hay ji xwe hebin. Gava birayê te li hember te guneh bike, dengê xwe lê hilde û eger ew tobe bike, hingê lê bibihûre. Eger ew di rojê de heft caran li hember te guneh bike û heft caran li te vegere û bêje: Ez tobe dikim›, hingê divê tu lê bibihûrî" (Lûqa 17:3-4).

Ne mûcîzeyên deraqil bûn ku îlhama daxwazên wan ji bo baweriyeke mezintir dan. Fermaneke hêsan bû ku ew kesên ku li dijî wan guneh kirine bibexşînin. Ev zilam di bin Qanûnê de dijiyan û ew hîn bibûn û digotin hûn serbest in çi ji destê we tê bikin. Îsa berê wan dida rêyeke ku bi temamî dermantiqî xuya dikir. Fermana ku di karakterê Xweda de bimeşin ew lerizandin. Wan çawa dikarîbû îteat ji fermaneke ewqasî mezin re bikin? Bersiv ev bû: "Baweriya me zêde bike!" Van zilaman dizanibûn ku îteat û bawerî rasterast bi hev ve girêdayî ne û ev ew tişt bû ku ez ê di nava ronahiyeke nû de bibînim.

Îsayê ku lavakirina wan ya mezintir ya baweriyê bihîst, ev şibandin anî ziman: "Û Xudan got: «Eger baweriya we wek libeke xerdelê jî hebûya, weyê ji vê dara tûyê re bigota: ‹Ji ra ve rabe û xwe di deryayê de biçikilîne!› Û wê bi ya we bikira" (Lûqa 17:6). Min hîs kir ku min ev xal fêhm kiriye. Ez jî di rêyê de hîn bibûm, min zanîbû ku divê em ji Xweda re perestîjê bikin û eger em bibêjin ku bavêje çiya û bahrê û dilê me jê guman neke, wê xwesteka me bê cih (Marqos 11:22-24). Ev ayet jî ne cuda ye. Di şibandinê de li şûna

çiya tenê dara tûyê dihat bikaranîn.

Di van gotinan de wekî din bawerî, ji her kesê bawer dike weke bizrê xerdelê hatiye dayîn û bi vî awayî tê sêwirandin. Ev, rêgeza miştaxê û dema çandiniyê ye di Desthilatdariyê de: “Padîşahiya Xwedê dimîne vê yekê: Zilamek li erdê tov diçîne” (Marqos 4:26). Gava em xelas bûn, ji me hemûyan re pîvaneke baweriyê ya diyar, hat çêkirin (Romayî 12:3). Ev bawerî di şiklê bizir de ye û mezinkirin û pêşxistina wê di berpirsyariya me de ye. Çawa mezin dibe? Bersiv tê.

## DEMA XWARINÊ YA KOLE

Min bi baldarî xwend, ji ber ku çar ayetên piştre her dem dihiştin ez biterpilim. Ez li ber kifşkirinê bûm ku Îsa ne tenê formulên ku şagirtên xwe bê çawa baweriya xwe zêde bikin, dida. Ew li ber bû ku wan ber bi şêwazeke jiyanê ve bibe ku rasterast bi îtaeta rayedariyê ve girêdayiye. Li vê şibandina Wî guhdar bikin:

> “«Kî ji we, xulamekî wî yê şivan an cotkar hebe, gava ew ji zeviyê vegere malê, wê jê re bêje: ‹Hema were û li ser sifrê rûne?› Ma ew di şûna vê de ji wî re nabêje: ‹Rabe, pişta xwe girêde, heta ku ez bixwim û vexwim xizmeta min bike û paşê tu jî bixwe û vexwe?› Û ji bo ku wî ew tiştên ku li wî hatibûn emirkirin anîn cih, ma ewê spasiya xulam bike?” (Lûqa 17:7-9)

Min her tim lê dipirsî bê çima Reb bi awayekî berbiçav mijarê diguherîne. Wî dev ji axaftina li ser baweriya ku daran ji kokê radike berdida û diçû li ser amadekirina xwarinê ya koleyekî disekinî. Ev bi min ne maqûl bû lê min ê wê sibehê fêhm bikira.

Min ev ayet dîsa hêdî bi hêdî xwendin, min guh da dilê xwe ji bo îlhama ku wê Xweda bida min. Ji nişkê ve min ev bihîst: Armanca dawîn a koleyekî ku di nav zeviyên te de dixebite çi ye? Armanca dawîn a koleyekî ku şivantiya keriyên te dike çi ye? Encam çi ye?

Ez kêliyekê fikirîm. Piştre min ev ferq kir: danîna xwarinê ya li

ser masê. Min fêhm kir bê Îsa çi dibêje. Eger encama dawî ya keda koleyekî amadekirina xwarina ya li ser masê ya efendiyê xwe be, çima wê koleyek berî efendiyê xwe xwarinê bixwe? Ma ne divê ew pêşî karê xwe biqedîne? Bêguman divê wisa bike! Karekî ku neqediyayî, dibe ku bi qasî karekî ku nehatiye destpêkirin xerab be. Çima hûn ê zeviyên xwe biçînin eger hûn ê tiştekî jê nexwin? Eger hûn ê ji hirî, goşt û şîrê keriyên xwe sûdê negirin, hûn ê çima ji keriyên xwe re şivan bigirin?

Gava ku carekê min ev dît, min gotinên piştre yên Îsa xwendin: “De îcar hûn jî, çaxê we hemû tiştên ku li we hatine emirkirin anîn cih, bêjin: Em xulamên bêkêr in; me ew karê ku li ser me deyn bû, kir” (Lûqa 17:10).

Wî ev mînak li ser me bi cîh kir. Dema ku min ev ayet xwend, gotinên “piştî ku ferman û hemû tişt bi cîh anîn” ji rûpelê pekiyan. Îsa îteata vî koleyî ya ji efendiyê xwe re bi îteata me ya ji bo Xweda re girêda. Bi vî awayî, wî sê xalên girîng li ser zêdekirina baweriyê destnîşan kirin:

1. Di navbera bawerî û îteata rayedariyê de têkiliyeke rasterast heye.
2. Bawerî, incex dema ku hemû fermanên li me hatine kirin, bên bi cîhkirin, wê zêde bibe.
3. Helwesta dilnizmiya bi rastî, di asta herî girîng de ye.

Em ji Pirtûka Pîroz li ser her xalê bisekinin.

## TEKILIYA DI NAVBERA BAWERÎ Û ÎTEATA RAYEDARIYÊ DE

Xala yekem, ango girêdana rasterast ya di navbera bawerî û îtaetê de, di qeydên Mizgîniyê de, di hevdîtina sersedekî û Îsa de xuya dibe. Îsa ket Kefernahûmê û leşkerekî Romayî yê ku xwedî rutbeya sersedê bû, nêzîkî Wî bû. Wî ji Îsa lava kir ku xulamê wî yê

felcbûyî û yê ku êşê dikişîne rehet bike. Îsa bersiv da û got: "Ez ê werim û wî rehet bikim" (Metta 8:7).

Sersed di cîh de ket navberê: "Ya Xudan, ez ne hêja me ku tu bêyî bin banê min, lê bi tenê peyvekê bêje û xulamê min wê qenc bibe" (Metta 8:8).

Îsa dixwest û amade bû ku biçe mala wî zilamî, lê leşker xwe ne hêja hîs kir û jê lava kir ku Ew neçe mala wî. Wî ji Îsa xwest ku ji cihê ku ew lê bû fermanê bide û wê demê wê xulamê wî baş bibe. Sersed, sedema xwe wisa diyar kir: "Çimkî ez jî mirovekî di bin emir de me û di bin emrê min de leşker hene. Ez ji yekî re dibêjim ‹Here›, ew diçe; ji yekî din re dibêjim ‹Were›, ew tê. Ez ji xulamê xwe re dibêjim ‹Vê bike›, ew dike" (Metta 8:9).

Em aniha meqamê wî nîqaş bikin. Di lejyoneke Romayî de şeş hezar leşker hebûn. Di nava lejyonê de şest sersedên ku rapor didan fermandar, peywirdar bûn. Di bin fermana her sersedî de sed leşker hebû.

Sersedê Romayî ji Îsa re got ku ew xwedî rêz û îtaeta leşkerên xwe ye ji ber ku ew îteatê ji fermandarê xwe re dike. Ji ber vê yekê, otorîteya fermandarê wî, ku rayedariya Romayê di destê wî de bû, piştgirî da wî. Bi gotineke hêsan: "Ez di bin rayedariyê de me; ji ber vê yekê, rayedariya min heye. Ji ber vê yekê, tiştê ku divê ez bikim ev e ku peyvekê bibêjim û wê demê wê bindestên min di cîh de fermanên min bi cîh bînin."

Sersed got, "Ez jî..." Bi vê gotina xwe, wî Îsa weke Xizmetkarekî di bin rayedariya Qraltiya Xweda de nas kir; bi vî awayî, sersed fêhm kir ku çawa leşkerek di artêşê de xwediyê rayedariyê ye, Îsa jî di nava alemên giyanî de xwediyê rayedariyê ye. Gava ku fermanê dide bindestên xwe çawa ku ew bi cîh tînin, wî fêhm kir ku tiştê ku pêwîst bû ev bû ku Îsa fermanan bide wan û wê demê nexweşiya xulamê wî dê neçar bimîne ku îteatê jê re bike.

Berteka ku Îsa da vê çi bû? "Îsa, ji ber bihîstina van gotinan heyran

ma. Piştre ji yên ku hatin re got: “Ez ê ji we re rastiyê bibêjim.” “Min li Îsraêlê yekî wisa bawermend nedîtiye” (Metta 8:10).

Mezintirîn baweriya ku Îsa di dema xwe ya li ser rûyê erdê de dît, ne baweriya Yûhennayê Waftîzker bû û ne jî ya dêya wî Meryemê bû. Ne yek ji Îsraêliyan bû ku şîfa an mûcîze dîtin. Ne yek ji diwanzdehan bû jî. Mezintirîn bawerî ya hemwelatiyekî Romayî, sersedekî, yek ji dagirkerên Îsraêlê bû. Tişta ku baweriya wî ewqasî mezin dikir çi bû? Wî rayedarî fêhm dikir û li gorî îteata rayedariyê dijiya.

Îsa di şibandina xwe de ya derbarê baweriya mezin ya ku xwediyê wê bû, tişta dixwest ragihîne ev bû. Rayedariya em xwediyê wê ne, bi girêdana me ya bi rayedariyê re rasterast têkildar e. Îteata me çiqasî mezin be, baweriya me jî ewqasî mezin e. Niha vê yekê bi gotinên Îsa yên ji şagirtên xwe yên ku dixwestin baweriya wan zêde bibe ve girêbidin: “Eger baweriya we wek libeke xerdelê jî hebûya, weyê ji vê dara tûyê re bigota: ‹Ji ra ve rabe û xwe di deryayê de biçikilîne!› Û wê bi ya we bikira” (Lûqa 17:6). Îsa got ku tekane tişta ku divê em bikin, gotina peyvekê ye û bi vî awayî wê dar ji we re îteatê bike! Ev dara tûyê ji kê re îteatê dike? “Ji kesê ku fermanên lê tên kirin, bi cîh tîne” (Lûqa 17:9).

## HETA TEMAMKIRINÊ ÎTEAT

Xala duyemîn a girîng a ku Îsa destnîşan kir ev e ku bawerî zêde dibe dema ku em her tiştê ku ji me re hatiye emir kirin temam dikin. Gotinên wî yên tam wisa bûn: “Hûn jî bi vî awayî, piştî we her tiştê ku ji we re hatiye emir kirin, bi cîh anî.” Xizmetkarek, ne ji qismekî an jî ji mînakeke ku xwesteka efendiyê xwe bîne cîh berpirsiyar e, ji temamkirina hemû alî berpirsyar e. Gelek caran, em dest bi karên ku em qet temam nakin dikin, ji ber ku em eleqeya xwe winda dikin an jî ked û êşa em dikişînin pir dijwar dibin. Xizmetkarê rastîn û dilsoz zordarî an jî astengî çi dibin bila bibin, projeyê temam dike. Ew zeviyan cot dike, hilberîna keda xwe tîne ji efendiyê xwe re û

xwarina wî datîne ser maseyê. Kirinên wî îtaeta rastîn temsîl dikin.

Ji Birahîm re tê gotin ku ew bavê baweriya me ye (Romayî 4:11-12). Birahîm bêzarok bû. Xweda di heftê û pênc saliya wî de jê re xuya bû û soz da ku wê kurekî wî çêbibe û ew ê bi rêya vî kurî re bibe bavê gelek neteweyan. Piştî bendêmayîn û îteata bi salan, Birahîm dema ku bû sed salî, bû xwedî kurê ku soza wî jê re hatibû dayîn.

Xweda hişt ku Birahîm ji Îshaq pir hez bike. Dema ku hezkirina wan bi hêz bû, Xweda ji bo Birahîm biceribîne ferman da ku Îshaq bibe herêma Moriyayê û wî weke qurban serjê bike. Di Nivîsên Pîroz de wisa tê nivîsandin: “Birahîm serê sibê zû rabû” (Destpêk 22:3). Bala xwe bidin îteata wî ya di cih de. Hin mirov bi rojan, hefteyan, mehan û heta bi salan difikirin ka gelo îteatê ji Xweda re bikin an na. Ew ji tirsa pîroz bêpar in û ji ber vê yekê baweriya wan ne mezin e. Gava me fêhm kir ku Xweda axivî û şûnde, divê em di cîh de bersivê bidin. Lêbelê, eger guhertinek mezin a jiyanê hewce be, wê bi aqilmendî be ku em razîbûna kesên ku li ser me rayedar in, erê bikin.

Sê rojan berdewam kir heta ku Birahîm gihîşt Moriyayê. Rêwîtiya sê rojan dem da wî ku ew li ser hin tiştan bifikire û hin tiştan di ber çavan re derbas bike. Eger wî bixwesta ku vegere, wê di vê demê de wê ev tişt bikirina. Lê wî nekir. Birahîm heta ser serê çiyê çû û kurê xwe yê yekta bi qurbangeha ku wan bi hev re çêkiribû ve girêda. Gava ku wî kêra xwe rakir ku Îshaq serjê bike, ferîşteya REB ew rawestand û wisa got: “Dest nede kurik! Tiştekî pê neke. Niha ez dizanim tu ji Xwedê ditirsî. Te kurê xwe yê yekta jî, ji min texsîr nekir” (Destpêk 22:12).

Birahîm heta dawiyê îteat kir! Ew dudilî nebû ku dev ji hebûna herî girîng ê jiyana xwe berde, an jî mîratgirê xwe, hêviya xwe û soza Xweda berde. Mirina Îshaq dihat wateya ku dev ji jiyana xwe berde. Birahîm îspat kir ku hewesa wî ya ji bo îteatê ji xwesteka wî ya ji bo sozan girantir û girîngtir bû. Divê em jî vê biryarê di dilê xwe de bigirin. Ya Reb, nifşeke wisa ya ji mêr û jinên ku xwediyê baweriyeke wisa bin di roja me de jî ava bike!

Di dawiya dawî de Xweda wisa got:

> “Gotina Xudan ev e: ‘Ez bi navê xwe sond dixwim, ji ber ku te ev yek kir û kurê xwe yê yekta ji min texsîr nekir, ezê te gelekî pîroz û bereket bikim. Ezê ziriyeta te bi qasî stêrên ezmanan, sêlaka ber deryayê zêde bikim. Wê ziriyeta te bajarên dijminên xwe ji xwe re bikin milk. Bi ziriyeta te, wê hemû miletên dinyayê bên pîrozkirin. Çimkî te bi gotina dengê min kir.” (Destpêk 22:16-18)

Ji bo ku Birahîm heta dawiyê îteat kir, binêrin bê soza çi da Birahîm û yên ku ji ziriyet wî tên! “Wê ziriyeta te bajarên dijminê te, ji xwe re bike cih û war.” Ma hûn nizanin bê Îsa ji ber çi gotiye “Deriyên gorên miriyan wê li hemberî dêrê nikaribin li ber xwe bidin?” Îteata Birahîm rê li ber Îsa vekir ku vê ji bo dêrê ava bike. Baweriya wî an jî îteata wî, hîn jî diaxive.

Aniha derbarê îteata Birahîm ya di Nameya Îbraniyan de tên gotin, bi baldarî bixwînin:

> “Em pirr dixwazin ku her yek ji we heta dawiyê eynî xîretkêşiyê nîşan bide, da ku hûn bigihîjin piştrastiya temam a hêviya xwe. Wisa ku hûn nebin tiral, lê bibin mîna wan ên ku bi bawerî û bîhnfirehiyê bûn wêrisên sozên Xwedê. Gava ku Xwedê soz da Birahîm, ji ber ku yekî mezintir nebû ku bi wî sond bixwe, wî bi xwe sond xwar û got: «Bi rastî jî, ezê te bi zêdehî pîroz bikim Û ezê bi zêdehî te zêde bikim.» Û bi vî awayî Birahîm sebir kir û gihîşt sozê.” (Îbranî 6:11-15)

Birahîm heta dawiyê xîretkêş bû. Wî heta ku ferman bi dawî bû îteat kir û bi sebir tehemûl kir. Îteata wî bi kirinên Qral Şawûl re bidin ber hev ku me di beşeke berê de behsa wî kiribû. Ew di çûna şer de xîretkêş bû û ji sedî 99ê tiştê ku lê hatibû ferman kirin, temam kir. Wî tenê beşek ji tiştên herî baş nekirin û difikirî

ku ew ji bo REB in. Di encamê de: Wî karê ku Xweda lê ferman kiribû, temam nekir. Ji derve ve gava mirov lê dinêre, ew nêzîkî temamkirinê bû, lêbelê bêîteatiya wî pir biha li ser wî hate hesibandin. Hate wê xalê ku ew xwarinê li ser “maseya efendiyê” xwe amade bike lê tiştê ku wî veşart motîvasyona rastîn a dilê wî eşkere kir. Wî ferman guherand ji bo ku li gorî berjewendiyên wî be, ne ku li gorî Kesê jê rêzê digire, bike.

Çend kes, weke Şawûl bi coş dest pê dikin lê piştre gava kar ne rehet be an jî dijwar dibe, an jî gava encam bi lez û bez weke ku tê hêvîkirin xuya nabin, bêîteatiyê dikin? An jî ew derfetekê dibînin ku bi dûrketinê re hinekî ji talîmatên rayedariyê sûd werbigirin. Ew kiryarên xwe bi motîfên olî an jî bi aqilmendî rewa dikin, weke ku Şawûl çêtirîn mîhên ku diviyabû li gorî peyva Reb bihata tunekirin, bi hinceta pêşkêşkirina qurbanekê, xelas kirin. Eger îteat temam nebe, wê bawerî zêde nebe, berevajî vê wê kêm bibe!

Birahîm soz bi baweriya rastîn û sebreke mezin wergirt ango heta ku ew hatin temamkirin, îteat kir. Weke ku Aqûb bi zelalî got, bawerî û kirinên wî yên îtaetê ji hev nayên veqetandin:

> “Ey mirovê bêhiş, ma tu dixwazî ku ji te re bê eşkerekirin, baweriya bêyî kirinan, bêkêr e? Ma bavê me Birahîm, gava ku kurê xwe Îshaq li ser gorîgehê pêşkêş kir, ne bi kirinên xwe rastdar derket? Tu dibînî ku baweriya wî bi kirinên wî re dixebitî û baweriya wî bi kirinên wî temam bû. Bi vî awayî gotina vê nivîsarê hat cih: «Birahîm ji Xwedê bawer kir û ev jê re rastdarî hat hesabkirin» û jê re dostê Xwedê hat gotin. Hûn dibînin ku mirov bi kirinan rastdar derdikeve, ne tenê bi baweriyê. Îcar çawa ku bedena bê ruh mirî ye, wisa jî baweriya bê kirinan be, mirî ye.” (Aqûb 2:20-24, 26)

Di ayeta dawî de kirinên bawerî û îtaetê bi beden û giyanê mirov re tê berawird kirin. Di mînaka dide de, em dibînin ku bawerî bi

laşê fîzîkî û kirinên îtaetê jî bi giyanê mirovan re tê şibandin. Ev di vê dinyaya du serî de ji bo xwe îfade bikin divê xwediyê hev bin. Eger giyan bedenê terk bike, beden dimire. Dema ku giyan carekê vediqede, weke di mînaka Lazar de, beden nikare ji nû ve were vejandin heya ku giyan venegere. Bi vê mînakê, Aqûb nîşan da ku bawerî bi temamî bi kirinên îtaetê ve girêdayî ye. Ji ber vê got: "Bê kirinên xwe baweriya xwe nîşanî min bide û ezê bi kirinên xwe ve baweriya xwe nîşanî te bidim" (Aqûb 2:18).

"Bawerî, bêyî îteatê ne baweriya rastî ye. Di vê mijarê de nekevin xeteyê." Nivîsên Pîroz, bi awayekî eşkere radigihîne ku "bi kirinên îteatê bawerî temam dibe."

Şandî qêriyan û gotin: "Ya Reb, baweriya me zêde bike." Piştre Îsa behsa berdewamiya kiryara îteatê kir heta ku ew temam bibe! Ax, birayê min yê bawermendê delal, tu niha fêhm dike bê çima min di destpêka vê pirtûkê de li ser lezgînî û girîngiya vê peyamê nivîsand? Di vê saeta zêdebûna bêqanûniyê de, divê em hemû guh bidin van gotinan.

Dibe ku hûn bibêjin: "Min digot qey bawerî di bihîstin û yeqînkirinê de ye." Belê, ev rast e lêbelê delîla baweriyê kirinên ku bi îtîrafê re ne. Ji ber vê yekê, eger em peyva Xweda bibihîzin û îteatê jê re nekin, wê bê gotin ku em hatine xapandin. Di wê rewşê de, wê baweriya me ne rast be, lê wê sexte be.

## WÊREKTIYA MEZIN YA DI BAWERIYÊ DE

Ev rastî, dîsa di danasîna Pawlosê Şandî de yên li ser kesên ku di dêrê de xizmetê dikin de, tê dîtin: "Û evên (peywirdarên dêrê) ha jî bila pêşî bên ceribandin; eger bêqusûr bin, hingê bila xizmetkariyê bikin" (Tîmotêyos I, 3:10). Xizmetkarên dêrê ne rêber in, lêbelê ew kes in ku fermanên kesekî din pêk tînin. W. E. Vine dibêje, peyva Grêkî ya ku weke "peywirdarên dêrê" hatiye wergerandin di esasê xwe de tê wateya "xizmetkar." Ya din jî ew her wiha destnîşan dike

ku ew kesekî di bin rayedariya kesekî din de ye. Pawlos got ku dema ku peywirdarên dêrê bi dilsozî xizmetê bikin, îteata wan van tiştan ji wan re bi dest dixe: “Çimkî yên ku xizmetkariya qenc dikin, ji xwe re cihekî qenc û di wê baweriyê de, ku bi Mesîh Îsa ye, cesareteke mezin qezenc dikin” (Tîmotêyos I, 3:13).

Ji bo xizmetkarên ku di şibandina me ya destpêkê de Îsa pênase kiriye, soza du tiştan li wan hatiye kirin: (1) cihekî baş yê ku terfiyên giyanî di xwe de dihewîne (Zebûr 75:7); (2) ji bo kesên ku heta dawî îteatê bikin, baweriya mezin. Kirinên bawerî û îteatê di Nivîsên Pîroz de ji hev nayên cudakirin û weke ku bi hev ve girêdayîne xuya dikin. Di Pirtûka Pîroz de ji bo vê gelek mînak hene:

- Baweriya Habîl bi îteata wî re derketiye holê û bi xêra baweriyê navê wî piştî bi hezar salan hîn jî li ser zimanan e (Îbranî 11:4).
- Baweriya Hanok ya ku bi îteatê re diyar bûye, bû sedem ku ew bi Xweda re bimeşe û bêyî ku mirinê bibîne ber bi asîmanan ve bilind bû.
- Baweriya Nûh bi îteata wî re hat îspatkirin û dinyaya tije guneh ku mahkûm bibû, ji bo malbata wî ev îteat bû xelasî.
- Baweriya Birahîm ya ku bi îteatê re hat îspatkirin, ew kir bavikê gelek neteweyan.
- Baweriya Ûsiv ya ku bi îteatê re hat pêşkêşkirin, xelasiya malbata wî ava kir.
- Bi rêya îteata wan, baweriya Yêşû û Kaleb ji wan re mîratek li welatê sozdayî misoger kir. Yêşû bi dilsozî xizmeta Mûsa kir û bû cîgirê wî. Wî xulamê xwe yê ciwan ber bi welatê sozdayî yê ku şîr û hingiv jê diherikî ve bir.
- Rahava fahîşe, “peyamnêr pêşwazî kirin û ew di rêyeke din re şandin” û “ew bi vê tevgera xwe jat bexşandin” (Aqûb 2:25). Bi îteata xwe re wê hemû malbat xelas kir. Ev îspatkirina xwediyê baweriya rastî ye.

- Îteat û teslîmbûna Hannayê ya ji kahînê ku heqaret lê kiribû re, rê li ber wî zarokê ku wê şiyarbûna giyanî ya gel ava bike, vekir.
- Îteatkirina Dawid bêyî ku xerabiyê li rêberê xwe bike, ew nekir qralekî li gorî pergala Şawûl, ew kir qralekî mezin yê li gorî dilê Xweda.
- Îteata Daniyal, Şedrak, Meşak û Abed-Nego di çavên Xweda û qral de ji wan re dilovanî û pesindarî ava kir.

> "Û hê ez çi bêjim? Eger ez tiştên li ser Gîdeyon, Baraq, Şimşon, Yêfta, Dawid, Samûêl û li ser pêxemberan bêjim, dema min têrê nake. Bi baweriyê ew li hember padîşahiyan bi ser ketin, wan dadperwerî anîn cih, gihîştin sozên ku hatibûn dayîn, devê şêran girtin, hêza êgir temirandin, ji devê şûr filitîn, di bêhêziyê de hêz standin, di şer de bûn yên xurt, ordiyên biyaniyan belav kirin. Jinan, miriyên xwe bi vejînê bi şûn ve standin. Hinekan îşkence kişandin, lê azadî red kirin, da ku ji mirinê rabin û bigihîjin jiyaneke hê çêtir. Hinekên din bi tinaz û qamçiyan, erê heta bi girêdan û zîndanê hatin ceribandin. Hatin kevirkirin, bi birrekê hatin birrîn, ketin ber devê şûr û hatin kuştin. Bi postê miyan, bi çermê bizinan geriyan; belengazî kişandin, tengahî dîtin, xerabî li wan hat kirin. Dinya ne hêjayî wan bû; li çolan û li çiyayan, di şkeftan û di kunên bin erdê de eware geriyan. Îcar bi ser ku ew hemû bi baweriyê hatin erêkirin jî, ew negihîştin tiştên ku hatibûn sozdan." (Îbranî 11:32-39)

Nivîskarê Nameya Îbraniyan bawerî bi kirinên îtaetê ve girêda. Ew ji hev nayên veqetandin. Eger bawerî tenê ji bo şahidiya mûcîzeyan tê dayîn, çima ew ê kesên ku di nav beyeban, çiya û şikeftan de geriyane, yên ku zehmetî kişandine û bindest bûne jî tê de cîh bigire? Van mêr û jinan pêşbirka baweriyê bi başî qedandine. Wan heta dawiyê îtaet kiriye. Ha ev baweriya rastîn e.

Eger hûn baweriyeke mezin bixwazin, wê demê çi di rewşa rasterast de be û çi jî hatibe dewirkirin, heta dawiyê îteatê ji rayedariya Xweda re bikin. Baweriya we rasterast bi îteatê re girêdayî ye!

## HÊZA DILNIZMIYÊ

Xala dawî ya ku Îsa ji şagirtên xwe re diyar kir, ew bû ku helwesteke dilnizmiyê biparêzin. Wî ji wan re wisa got: "Bi heman awayî hûn jî, piştî ku we her tiştê ku ji me re hatiye emir kirin, bi cîh anî; vê bibêjin: 'Em xulamên bêqîmet in; me tenê tiştê ku divê me bikira, kiriye.'" Dema ku em vê helwestê berdewam bikin, em ê ji bo xelata ku Efendiyê me wê bide, di rêza guncav de bin. Yên ku xwe bilind dikin wê bên nizimkirin. Lêbelê yên ku di çavên xwe de bêqîmet in ji hêla Efendî ve tên bilindkirin. Aqûb wisa nivîsand: "Xwe li ber Xudan nizim bikin, ew ê we bilind bike" (4:10).

Dillnizm-mayîna di dil de, tê wateya ku mirov di rewşekê de bimîne ku xelatên îteatiyê wê bi dest bixe. Her çiqasî we îteat kiribe jî, eger hûn bi îteata xwe serbilindiyê bikin hûn ê xwe ber bi ketinekê ve bibin. Ev rewş dikare her tiştê ku hûn pêve girêdayîne xera bike. Hûn dikarin guh bidin şîretên xwedayî yên di vê pirtûkê de ne an jî bidin dû Gotina Xweda lêbelê eger ku hûn serbilindiyê bikin, hûn dikarin her tiştê ku we bi rêya îteatê bi dest xistiye, winda bikin.

Lusifer hatibû mesîhkirin. Ew nimûneyeke bêkêmasiyê bû, zanebûn û bedewiya wî bêkêmasî bû. Ji hêla Xweda ve hatibû afirandin û li ser çiyayê Wî yê pîroz jiya. Ew di rêya xwe de bêkêmasî bû heta ku serbilindî ket nav wî. Piştre bi lezeke weke birûskê, ew ji bihuştê hate avêtin. Pawlos li ser kesên ku ji bo meqamên rayedariyê hatine tayînkirin, gotiye: "Divê ew ne bawermendên nû bin. An na dibe ku ew têkevin nava çerxa serbilindiyê û darizandina ku hat serê Îblîs bê serê wan" (Tîmotêyos I, 3:6)

Pawlos, îteat ji banga Xweda re kir û gelek kar kirin. Lê her ku

ew pîr dibû, di dilnizmiyê de jî ewqasî mezin bû. Di sala 56an PZ’ê de, ji çar rêwîtiyên xwe yên mezin yên mizgîniyê, di dema ya sêyem de, wî ji dêra ku wî li Bajarê Korîntê damezrandibû re nameyek nivîsand. Hîn ji mirina wî re deh yanzdeh sal hebû û di xizmeta Îsa de yekî xwedî tecrube bû. Lê dîsa jî guh bidin van gotinên wî: “Çimkî ez, ji Şandiyan yê herî biçûk im. Ez ne hêja me ku Şandî bêm gazîkirin; ji ber ku min tengahî da civîna bawermendan a Xwedê” (Korîntî I, 15:9).

Ma hûn dilnizmiya di gotinên wî de dibihîzin? Wî xwe hêjayî sernavê “şandî” nedît. Ez dixwazim vê yekê diyar bikim: Ev ne dilnizmiya sexte ye. Dilnizmiya sexte, ji aliyê siyasî ve peyvan rast bi kar tîne ji bo ku dilnizm xuya bike lêbelê di dil an jî hiş de nizmbûn tune ye. Ew xapînok û ne rast e. Lêbelê kesekî ku Nivîsên Pîroz bi îlhama Giyanê Pîroz dinivîse qet nikare derewan bike! Ji ber vê yekê, dema ku Pawlos got ku ew yê herî biçûk ê şandiyan e, ji aliyê siyasî ve jargona rast bi kar nedianî. Wî dilnizmiya rastîn nîşan dida.

Îcar aniha li gotina Pawlos ya piştî vê binêrin: “Lê ez ji wan hemûyan bêtir xebitîm. Ya rast ne ez, lê belê kerema Xwedê ya bi min re xebitî” (Korîntî I, 15:10). “Lê ez ji wan hemûyan bêtir xebitîm.” Deqayekê, gelo Pawlos pesnê xwe dida? Ev şîrove weke qurebûnê xuya dike lê ne wisa ye. Ji ber ku piştî vê gotinê, Pawlos girêdayîbûna xwe radigihîne. Piştî ku xwe weke yê herî biçûk ê şandiyan dihesiband, wî diyar kir ku her tiştê ku wî dikir, tenê bi kerema Xweda bû. Wî bi tamamî dizanibû ku her serkeftineke giyanî ya ku wî bi dest dixist bi saya jêhatîbûna ku ji hêla Xweda ve li ser wî hatibû dayîn, pêk dihat.

Zehmet e ku mirov bipejirîne ku Pawlos xwe weke “yê herî biçûk ê şandiyan” pênase dike. Ew hem di dema xwe de û hem jî di tevahiya dîroka dêrê de weke yek ji mezintirîn şandiyan hatiye pejirandin. Niha em li gotinên Pawlos ji Efesîyan re ku di sala 62 PZ’ê de, çar an pênc sal berî ku here ba Reb, binêrin. Ji salên derbasbûne

ku wî Korîntî I nivîsandiye ve, wî ji her demê din yên di jiyana xwe de bêtir tişt bi dest xistind. Lêbelê dîsa jî wî xwe bi vî rengî pênase kir: “Bi ser ku ez di nav hemû pîrozan de yê herî kêm im jî, ev kerem ji min re hat dayîn, da ku ez Mizgîniya dewlemendiya Mesîh a ku nayê salixdan ji miletan re bidim” (Efesî 3:8).

Berî bi salan, wî xwe weke şandiyê herî biçûk bi nav dikir lê vê carê ew xwe weke hemû pîrozên herî bêqîmet pênase dike! Çi? Eger kesekî ku bikaribe bi jiyana xwe ya Xirîstiyanî û rêberiya xwe pesnê xwe bide, bê guman ew Pawlos bû. Dîsa jî ew çiqasî dirêj ji Reb re xizmetê bike, xwe ewqasî bêtir biçûk didît. Dilnizmiya wî her ku çû mezintir dibû. Ma ev dibe sedema ku kerema Xweda li ser jiyana wî bi temen re zêde dibû? Ma ev dibe sedema ku Xweda rêyên xwe bi vî rengî nêzîkbûnê ji Pawlos re eşkere kir ku heta Petrûsê Şandî jî matmayî ma (Petrûs 2, 3:15-16)? Nivîskarê Zebûrê wisa beyan kir: “Di riya edaletê de, ew e ji bo nefsbiçûkan rêber, Ew riya xwe nîşanî wan dide her û her” (Zebûr 25:9). Bi heman awayî, sedema ku Mûsa pir baş bi rêyên Xweda zanîbû gelo “Mûsa ji her kesê li ser rûyê erdê nefsbiçûktir bû” (Hejmartin 12:3) dibe ku ev be? Belkî jî Mûsa û Pawlos sirek li ser baweriya mezin fêr bûbûn ku kêm kesan bi vê yekê dizanibûn.

Di dawiya jiyana xwe de, li dora salên 64-66 PZê, Pawlos du name ji Tîmotêyos re şandin, di ya yekem de wî xwe wisa pênase kir: “Ev peyv dilsoz e û bi her awayî hêjayî qebûlkirinê ye, ku dibêje: «Mesîh Îsa hatiye dinyayê, da ku gunehkaran xilas bike» û ji wan ê herî gunehkar ez im” (Tîmotêyos I, 1:15). Xwe weke “gunehkarê herî xerab” bi nav kir! Bala xwe bidinê ku xwe ne weke “ez gunehkarê herî xerab bûm” bi nav kiriye.

Na, piştî serkeftinên mezin yên ku bi salan berdewam kirin, daxuyaniya wî ne ew bû ku digot: “Min her tişt kiriye û divê rêz li xizmeta min a mezin bê girtin.” Wî bi vî awayî jî pesnê xwe neda: “Min karekî mezin kir û ez rêza şandiyekî rastîn heq dikim.” Wî

weke ku berî çenda salan gotibû: “Ez di nava şandiyan de yê herî bêqîmet im” jî nenivîsand. Wî heta wisa jî nenivîsand: “Ez di nava pîrozan de yê herî bêqîmet bûm.” Wî got: “Gunehkarê herî xerab ez im.” Her çend wî dizanibû ku ew bi rêya Mesîh rastdariya Xweda ye jî (2 Korîntî 5:21), wî qet kerem û dilovaniya Xweda ji bîr nekir. Ya rastî, her ku temenê wî dirêjtir dibû, ew bêtir bi kerema Xweda ve girêdayî dibû. Helwesta wî bi berdewamî gotinên hînkirina Îsa dianîn ziman: “Ez xulamekî bêqîmet im, min tenê tiştê ku divê min bikira, min kiriye.”

Ev helwest her wiha gotineke din a ku Pawlos di dawiya jiyana xwe de got jî rave dike: “Birano, ez xwe hê gihîştî hesab nakim, lê ya ku ez dikim ev e: Ez tiştên çûyî ji bîr dikim û xwe dirêjî yên pêş dikim. Ez ji bo qezenckirina xelata ku Xwedê di gazîkirina xwe ya ezmanî de bi Mesîh Îsa pêşkêş dike, ber bi armancê ve dibezim” (Filîpî 3:13-14). Dilnizmiya di gotinên wî de hûn dibihîzin? Ez hîn negihîştime û tiştê ku min bi dest xistiye, ez di ramanê de li dawî dihêlim.” Wî serkeftinên xwe weke “tu tiştî” li gorî lêgerîna xwe ya ji bo naskirina temamiya Îsayê Mesîh bi nav kir. Bînin bîra xwe ku Xweda xwe ji kesên dilnizm re eşkere dike! Pawlos got: “Ez ber bi armancê ve dibezim.” Ev gotin nîşan dide ku ew bi rastî jî bi zext û berxwedana dijminan re rûbirû bû. Yek ji dijminên herî mezin ên gazîkirina ezmanî serbilindî ye.

Dema ku em li jiyana Îsa dikolin, em dibînin ku Ew pesindayînê napejirîne, Ew berê pesindayînê dide Bavê xwe. Heta wî ji wan kesên ku rehet kiribûn re got ku ji kesî re qala vê yekê nekin û pesnê Xweda bidin.

Zilamekî ciwan yê dewlemend ji Îsa re got: “Mamosteyê min î baş.” Lêbelê Îsa di cih de bersiv da ku ji bilî Xweda kesekî baş tuneye. Ma Ew, ne Kurê Xweda bû? Ma ew ne baş bû? Bêguman ew baş bû! Lê dîsa jî Wî pesnê mirovan nedipejirandin, Wî tenê dixwest ku Bavê Wî bê mezinkirin. Lêbelê fezîleta ku Wî pê pesnê xwe dida

dilnizmî bû. Di dawiya dawî de wisa got: “Nîrê min deynin ser stûyê xwe û ji min hîn bibin, çimkî ez nerm û ji dil nefsbiçûk im û hûnê rihetiyê ji bo canê xwe bibînin” (Metta 11:29).

Hezkirina Xweda dilnizmiya rastî mezin dike. Em dixwînin ku hezkirin “pesnê xwe nade û pozbilindiyê nake” (Korîntî I, 13:4). Serbilindî li berjewendiyên xwe digere; hezkirin li berjewendiyên xwe nagere. Serbilindî, her îtaetê ku xizmeta rojeva wê nake biçûk dibîne lê hezkirin li bilindkirina Kesê ku xizmetê jê re dike, digere. Em îtaetê dikin ji ber ku em hez dikin, em serkeftinê dixwazin ji ber ku em rûmeta Wî dixwazin. Em dixwazin bibînin ku Ew tê rûmetkirin. Sedema ku Pawlos ev gotin kiriye belkî jî ev bû: “Eger baweriya min a tam a ku çiyayan ji cihê wan rake hebe, lê hezkirina min tune be, ez qet ne tu tişt im” (Korîntî I, 13:2).

## BANGA XWE PÊK BÎNIN

Bang li me hat kirin ku hilberînê bikin û bibin şampiyonên Xwedayê xwe. Tenê dema ku em di rêyên Wî de dimeşin, em dikarin bi rastî rûmetê bidin navê Wî yê bi heybet. Ez duayan dikim ku hûn vê peyamê hem ji bo qenciya xwe û hem jî ji bo rûmeta Wî bibînin. Girêdana bi Peyva Wî ve di pêvajoya têgihîştinê de dibe ku wekî bêaqiliyê xuya bike lê “Li Xwedê xweş hat ku yên baweriyê tînin bi bêaqiliya Mizgîniyê rizgar bike” (Korîntî I, 1:21). Ji aliyê din ve em vê bibînin: “Bêaqiliya xwedayî di ser şehrezayiya mirovan re ye” (Korîntî I, 1:25). Vê bînin bîra xwe: “û her tiştê bilind ê ku li hember zanîna Xwedê radibe, hildiweşînin û her fikrê dikin hêsîr ku serî li ber Mesîh deyne” (Korîntî II, 10:5).

Aqilmendiya li dijî îteatê, quretî ye. Ew li dijî şîreta Xweda derdikeve. Ew Gotina Xweda weke rayedariya dawî napejirîne. Weke ku me di vê pirtûkê de dît, ew talûke ye. Di van rojan de, wê gelekî Xweda yê ku bi bawerî, rayedarî û wêrekiyeke mezin bimeşe, hebe. Ew ê kesên “amade bin ku her kiryarek ku ne girêdayî wî ye

ceza bikin" (Korîntî II, 10:6).

Dem teng e, ji ber vê yekê divê em bibandor bin. Îteat me bibandor dike. Dema ku ez ji nû ve çêbûm, ez pir çalak bûm lê di îteatê de ez kêm bûm. Ez bêbandor bûm û bê guman, carinan, ne hewce bû ku ez bêjim ez ji bo karê Xweda yekî bi zerar bûm. Bi demê re, xîreta min a ji bo îteatê, her çiqasî di wê demê de xuya bû ku min nagihîne tu derê jî, di dawiyê de bibandor derket.

Banga Xweda li ber we ye. Dema ku we îteat hilbijart, hûn hildibijêrin ku banga xwe bi cih bînin. Tiştek û tu kes nikare we rawestîne. Bi salan, rêça bûyeran ji bo Dawid tarî xuya dikir, mîna ku ji bo Ûsiv, Mûsa, Yêşû, Hannah, Nûh, Ester û bavûkalên din yên bawermend tarî xuya dikir. Lê ji bîr nekin, ji bo kesên ku banga xwe bi cih tînin saloneke navdar heye û her kesê ku li vir hatiye navnîşkirin ev pêk aniye. Xweda li mêr û jinan digere ku di van rojên dawî de li lîsteya bavûkalan zêde bike ji bo ku li ser kursiya dadweriyê ya Mesîh rûmetê bide wan. Ez duayan dikim ku em di nav wan kesan de bin yên ku peywira mezinkirina Rebbê me yê bêhempa anîbin cîh.

BEŞ 18

# ENCAM

*Fêkiyê gava em di bin rayedariya Wî de ne û dixwin, me ber bi ziyafeta Wî ve dibe. Û em li wir bi ser pirbûna Wî ve vedibin.*

Me bi biryara trajîk a ku hevjînên pêşî yên zewicî dabûn, dest bi vê pirtûkê kir. Ev jin û mêr, ji bi rayedariya Yê Mezin derketin û li derveyî parastina Xweda çavkaniyeke qencî û xerabiyê dîtin. Wan rayedariya Wî red kir, lê me hem ji têkçûna wan û hem jî yên ku li pey wan in me ders jê derxist û em hîn jî dikarin dersderxistinê berdewam bikin.

Ez bi rûyê din yê pere re mijarê diyar bikim -xelata kesên ku di bin siya Yê Mezin de xwe diparêzin.

“Di nav darên daristanê de dara sêvê çawa be,
Di nav xortan de evîndarê min wisa ye.
Ez li ber siya wî rûniştim, çi xweş bû,
Tehma fêkiyê wî li ser devê min şîrîn bû.
Wî ez birim mala ziyafetê.
Ala wî ya li ser min hezkirin e.”
(Helbesta Helbestan 2:3-4)

Di bin siya Wî de dara jiyanê heye. Şirîniyeke mayînde ya vî fêkiyî heye. Fêkiyê ku Adem û Hewayê xwarin bi çavê aqilmendiyê xweş xuya dikir lê di dawiyê de mirin bi xwe re anî. Ev ji bo hemî fêkiyên ku ji dara aqilmendiyê tên xwarin, derbasdar e. Gava ku em di bin rayedariya Wî de dimînin û di vir de fêkiyê em dixwin, me ber bi ziyafeta Wî ve dibe. Li wir em bi ser pirbûna Wî ve vedibin.

Dema ku we ev pirtûk dixwend dibe ku we êşa sûcdariyê hîs kiribe. Êş her tim ne xirab e û di vê rewşê de, ew du tiştan nîşan dide. Ya yekem, ew nîşan dide ku wijdanê we hesas e û li hember Giyanê Pîroz bersivê dide. Ya duyemîn, rêyeke xelasiyê di vê de heye -jê re tobe tê gotin. Cudahiyeke bingehîn di navbera hesta sûcdarî û mahkûmiyetê de heye. Her du jî bi êşê re ne lêbelê di yekê de rêyeke xelasiyê heye lê di ya din de tune. Tobekirin bi qasî guhertina dil hêsan e ku dibe sedema guhertina hiş û çalakiyê. Di bingeh de, hûn dibêjin: “Ya Reb, min ev di rêya xwe de kir û min dît ku ew beyhûde ye. Niha ez rêyên Te ji xwe re hildibijêrim.” Ew hilbijartinek e ku mirov rêya darizandinê ku ji dara zanîna qencî û xerabiyê derdikeve, berde û vegere rêya îteatê.

Bi rêya dua û fikra kûr, dilê xwe ji Xweda re vekin û bihêlin ku Giyanê Pîroz deverên bêîteatiyê di jiyana we de destnîşan bike. Eger pêwîst be, beşên taybet yên bi rewşa we ve girêdayî ne di ber çavan re derbas bikin. Destûrê bidin bila Gotina Xweda li ser jiyana we lêkolînê bike. Ronahiya Gotina Wî deverên bêîteatiyê eşkere dike. Ev dever dibin ku bi rayedariya rasterast a Xweda re an jî rayedariya ku hatiye dewirkirin ve girêdayî be. Wan li ser kaxezeke cuda rêz bikin. Piştî vê yekê, ji bo ku em bigihêjin bexşandin û nûkirinê em bi hev re duayan bikin.

*Bavê Esîmanan, ji ber bêîtaetî û serîhildana li ber navê Îsa, li min negire min bibexşîne. Ez li gorî aqilmendiya xwe jiyam û di dawiyê de li gorî warên jêrîn min serî hilda.*
*[Ji lîsteya xwe her qada gunehkirinê ya ku we li ber rayedariya*

*Wî kiriye, li xwe mikur werin. Hem yên rasterast hem jî yên li dijî rayedariya hatiye dewirkirin derketine, têxin nava vê lîsteyê].*
*Ez ji her qadên van raman û tevgeran yek bi yek tobe dikim. Ez ji te dixwazim ku tu min bibexşînî û bi xwîna Rebê min Îsa min paqij bikî.*
*Armanca min ew e ku ez di bin rayedariya Te de bimînim û bi vê yekê re ez ê di bin rayedariyên malbat, dewlet, dêr û civakê de bimînim ku Te di jiyana min de ava kirine. Tişta ku Te xweş dike ji bo ez hem bixwazim û hem jî bikim, kerema xwe bide min. Ez dilekî ku bi Te ve girêdayî be û îteatê ji Te re bike dixwazim ku ji vê zewqê bistîne. Ez jiyana xwe ji Rebê xwe Îsayê Mesîh re dibexşînim û dev ji her cure serîhildanan berdidim. Ji bo ku ez navê Te mezin bikim, Te çawa bang min kiribe ne xem e, ez bi dilxwazî bejna xwe li ber te ditewînim. Amîn.*

Ger guncaw be, bi xwe biçin an jî nameyekê ji rayedarên di lîsteya xwe de binivîsin û lêborînê bixwazin ji bo we bibexşînin. Ev, ne dema sûcdarkirinê ye an jî argumana doza nîqaşa we ye, lêbelê derfetek e ku hûn di rewşeke dijwar de berpirsiyariya rola xwe bigirin ser xwe. Bi vî awayî ji bo ku hûn bibînin ku destê Xweda li ser navê we tevbigere, wê cîhekî diyar ji we re bê nîşankirin.

Spas dikim ji bo ku we rêyeke ewqasî berevajî vê dinyayê hilbijart. Bi xêra îteata xwe, em armancên Qralên xwe yê bi heybet xurttir dikin. Xelata îteata we, wê pir mezin be.

> "Xilaskarê me Xwedayê tenê, dikare we ji ketinê biparêze û bi şahiyeke mezin, bêleke we derxe ber rûmeta xwe; bila ji beriya deman ve, niha û her û her, bi destê Xudanê me Îsa Mesîh rûmet, mezinahî, karîn û desthilatî jê re be. Amîn."
>
> – Cihûda 1:24-25

Ji bîr nekin:
**Di bin rayedariyê de** bimînin!

# PIRSÊN NÎQAŞÊ

Eger hûn vê pirtûkê bi dersên vîdeo re yên Di Bin Rayedariyê De bixwînin (ev fikreke pir baş e!), ez pêşniyar dikim ku hûn dersa vîdeoyê ya her hefteyê temaşe bikin û pirsên nîqaşê yên têkildarî wê ne weke komekê ji hev re vekin. Dersên vîdeo, bi mijarên sereke yên di vê pirtûkê de bi hev re diçin û wan xurttir dikin, ji ber vê yekê ji bo hemû beşdaran ya herî baş ew e ku hem dersan temaşe bikin û hem jî pirtûkê bixwînin.

Li kêfa xwe binêrin!

## DERS 1

*Mijarên ku di beşa 1 û 2. de derdikevin pêş*

1. Dema ku hûn peyva rayedariyê dibihîzin, berteka we ya yekem çi ye? Ma hûn wê bi tiştekî erênî ve girêdidin, weke stargeheke di bin banekî de di dema tofanê de? An jî hûn li tiştekî neyînî difikirin, weke ku patronek jiyana we wêran kiribe?
2. Dema ku hûn li xwe dizîvirin û li paşerojê dinêrin, gelo carinan hûn bi encamên nebûna “di bin rayedariyê de” re rûbirû mane?
3. Zehmet e ku mirov prensîbên qraltiyê bi hişmendiyeke demokratîk fêhm bike. Hûn bi çi awayî bi nêrîneke demokratîk nêzî sêwirandina rayedariya Xweda bûne? Vê nêzîkatiyê bandoreke çawa li têkiliya we ya bi rêberên we re kiriye?
4. Di derbarê partiyên komên piçûk de, Xweda nîşanî min da ku

nerazîbûna min a di bin rêveberiya pastorê min de serîhildan bû. Vê teşxîsê hûn şaş nekirin? Berî vê dersê, we nêrîna min mafdar didît?

## DERS 2

*Mijarên ku di beşa 3, 4, 5, 6 û 7. de derdikevin pêş*

1. Di serê dersê de, min ji guhdaran xwest ku gava peyva gunehê dibihîzin, peyvên ku pêşî tên bîra wan bibêjin. Dema ku ev pirs hat pirsîn ramanên we yên pêşî çi bûn? Ramanên we çawa hatin guhertin?
2. Ma we yek ji van qadan -dewlemendî, kar, têkilî- di ser îteatkirina ji tiştên ku Xweda dixwaze hûn bikin re girtiye? Çi qewimî dema ku we yek ji van di ser îteata ji Xweda re girt?
3. Îteatkirina qismî ne îteat e. Serîhildan e. Demeke ku we heya dawiyê îteat kiriye parve bikin. Dûv re tenê demeke ku we bi awayekî qismî îteat kiriye parve bikin. Cudahiyên sereke çi bûn û çawa bandor li we kiriye?
4. Pirtûka Pîroz dibêje ku serîhildan falbazî ye (Samûêl I 15:23). Armanca dawîn a falbaziyê çi ye? Ev rastî çawa bandorê li nêrîna we ya li ser falbazî an sêrbaziyê dike an jî wê diguherîne?
5. Fermana yekem di pirtûka Şeytanperestan de ev e: “Tu çi dixwazî wê bide kirin.” Ev tam berevajî prensîba ku Îsa nîşan daye, dema ku wî got: “Ez ne li daxwaza xwe, lê li daxwaza yê ku ez şandime digerim” (Yûhenna 5:30). Te çi tişt kirine ku daxwaza te li pêşiya daxwaza Xweda danîne? Vê ji bo we encameke çawa derxistiye holê? Hûn dikarin çi bikin ji bo ku bi awayekî çalak hûn li daxwaza Bavê xwe bigerin û ji bo ku hûn îteatê jê re bikin, hûn dikarin çi bikin?

## DERS 3

*Mijarên ku di beşa 8, 9 û 10. de derdikevin pêş*

1. Di Romayî 13:1-2yan de, em dibînin ku li hemberî rayedariya ku hatiye dewirkirin, li hemberî fermana Xweda derketin e. Eger Îsa ji we bixwesta ku hûn li kar, li malê an jî di rewşeke civakî de tiştekî bikin, we yê çawa bertek nîşan bidaya? Baş e, an patronekî, rahênerekî, polîsekî an jî rayedarekî din ji we bixwesta ku hûn heman tiştî bikin? Ma hûn ê weke ku we bersiva Îsa da, hûn ê bi heman awayî bersivê bidin wan jî?
2. Pirtûka Pîroz wisa dibêje: “Bila her kes bi ya hukûmeta li ser xwe ve girêdayî” (Romayî 13:1-2). Peyva *girêdanê* hem di têkiliya leşkerî de û hem jî di ya derleşkerî de peyveke Grêkî ye ku tê bikaranîn. Ji bo bikaranînên derleşkerî, ew tê wateya helwesteke bi dilxwazî û heweskar a ku hewl dide xwe têxe bin rayedariyê. Ev fermana di Nivîsên Pîroz de, helwesta we ya li hemberî kesên ku rayedariya wan hatiye dewirkirin çawa diguherîne?
3. Piştî hilbijartinên serokatiyê yên 1992an, ez di demeke dijwar re derbas bûm. Ez bi depresyonê re têkoşiyam û Reb neçar ma bîne bîra min ku Xweda şaş nemaye bê kî hatiye ser vê peywirê. Gelo demeke ku hûn ji ber encamên hilbijartinê bêhêvî bûne çêbûye? Gelo çîroka min, helwesta we ya li hemberî rêvebirên we nîşan dide?
4. Ayeta 1:19ê ya Îşaya, ji me re dibêje ku eger em daxwazkar û guhdar bin, em ê berhemên herî baş yên welat bixwin. Dibe ku hûn daxwazkar bin lê guh nadinê an jî dibe ku hûn guh bidinê lê hûn ne daxwazkar bin. Demekê parve bikin ku we bêdilî xwe guhdarî kiriye. Vê yekê bi demeke ku hûn hem daxwazkar in û hem jî îteatkar in re bidin ber hev.
5. Pirtûka Pîroz dilsoziya bê şert û merc hîn dike, lêbelê ew

îteata bê şert û merc hîn nake. Em ne mecbûr in ku îteatê ji rêberên xwe re bikin eger ew ji me re bibêjin ku em tiştekî bikin ku ev li dijî Gotina Xweda be. Gelo rêberekî qet ji we xwestiye ku hûn tiştekî bikin ku li dijî Gotina Xweda ye? We rewş çawa îdare kir? Encam çi bû?

## Ders 4

*Mijarên ku di beşa 11 û 12. de derdikevin pêş*

1. Pirtûka Pîroz, rêvebirên hikûmetê weke xizmetkarên Xweda bi nav dike. Rêbaza rast a tevgera bi xizmetkarên Xweda re çi ye? Hûn çawa bi rêberên hikûmeta xwe re tevdigerin?
2. Di dîtina şaşiyan de kes di ser Şeytan re tuneye lê Îsa li ser navê me bi dilsozî navbeynkariyê dike. Derbarê rêveberin dewletê de, hûn xwe weke sûcdar dibînin an weke yekî navbeynkar? Hûn bi henekpêkirinên li ser rêberên dewletê re dikenin? Dema ku kesek li ser medyaya civakî rêberekî biçûk bike hûn xemgîn dibin?
3. Divê em rêzê li rêberên xwe yên civakî, patronên xwe, mamosteyên xwe, rahênerên xwe û rayedarên din bigirin û guhdariya wan bikin weke ku ew temsîla Xweda dikin. Xeyal bikin bê ka wê çawa be ku hûn ji bo Îsa bixebitin. Ma hûn ê di wextê xwe de werin ser kar? Di projeyên hatine dayîn de hûn ê bêdilê xwe wan bikin gelo? Ev nêrîn tevgerên we yên li hemberî rêberên we yên civakî çawa diguherîne?
4. Di Nivîsên Pîroz de binyadeke malbatî ye ku bi zelalî tê dîtin. Hûn difikirin bê çi rê li ber me digire ku em sêwirandina rayedariya Xweda ya ji bo malbatê bipejirînin? Baweriya bi Xweda çawa roleke girîng di afirandina dînamîkên malbatî yên saxlem de dilîze?

# Ders 5

*Mijarên ku di beşa 13 û 14. de derdikevin pêş*

1. Pirtûka Pîroz, dibêje ku Îsa bi xwe peywirên rêbertiyê yên di dêrê de tayîn kirine (Efesî 4:11-12). Ma hûn bi xwe tevlî mijarên ku ne bi berpirsiyariyên we ve girêdayî ne dibin? Li ser binyada rêbertiya ku Îsa di dêra xwe de ava kiriye, hûn çi difikirin bê Îsa çi hîs dike?
2. Hanna bi salan dua kirin ku zarokekî wê çêbibe. Li gorî we Xweda çima gava ku wê rêz ji rêberekî ku heqaret lê kiribû re girt, duayên we pejirandin?
3. Dema ku em li ser rêberekî bi awayekî xirab diaxivin, em ji zanebûna Xweda dûr dikevin û di encamê de em ji parastina Wî derdikevin. Di çîroka Miryam, Harûn û Mûsa de, dema ku Miryam bi awayekî neheq Mûsa rexne dike ku bi jineke Kûşî re zewicî ye, em vê rastiyê dibînin. Gelo we qet zehmetî kişandiye ji ber ku hûn ji zanebûn û parastina Xweda derketine? Encam çi bû?
4. Gelo hûn qet rastî rewşekê ku rêberê we biryareke ne aqilmend daye, hatine? Belkî jî rêberê we ji agahiyên girîng bêpar bû. Encam çi bû? Gava ku aniha hûn li ser vê yekê difikirin, hûn bawer dikin ku hûn ê wê rewşê bi awayekî cuda çareser bikin? Hûn çi fêr bûn?
5. Helwesta Dawid ya li hemberî Qral Şawûl, gava ku Şawûl weke dînan lê digeriya ku wî bikuje jî, bi awayekî rêzdar û îteatkar bû. Dawid di vê dema dijwar de ku tê re derbas dibû, ji Xweda aştî, xweşî û parastin wergirt. Hûn çawa dikarin heman helwesta rêzdar û fedakariyê di bertekên xwe yên li hemberî rêberên xwe de bi pêş bixin?

## DERS 6

*Mijarên ku di beşa 15, 16, 17 û 18. de derdikevin pêş*

1. Gava em bibin yek, em ê mezinbûneke li gorî dilê dêrê çêbikin. Gava Îsa li ser rûyê erdê dijiya mezinbûna Xweda nîşan da. Gava ku hûn peyva mezinbûnê dibihîzin, hûn çi difikirin? Hûn bawer dikin ku asteke mezintir ya hebûna Xweda heye?
2. Dema ku roja Pentîkostê hat, 120 kesên li odeya jorîn fikra wan yek bû. Ew di fikir, dil û giyan de yek bûn. Gelo îro roj dêrên me xwedî vê yekitiyê bin wê çawa xuya bike?
3. Pênc şaxên Artêşa Dewletên Yekbûyî hene -artêşek e lêbelê bi çalakiyên wan yên cuda hene. Di dêran de jî çalakiyên cuda hene. Divê em di çalakiya ku Xweda me têde bi cîhkirine de xizmetê bikin. Ev perspektîf, nêrîna we ya li ser dêra ku hûn aniha beşdarî wê dibin çawa diguherîne? Hûn dikarin çi cudahiyan bikin ji bo ku hûn bikevin bin vîzyona civaka ku hûn beşek ji wê ne?
4. Xeyal bikin gava gelê Xweda plana Wî ya ji bo yekîtiyê bipejirîne, bê em dikarin bandoreke çiqasî kûr li ser civakan, herêman û neteweyan bikin. Hûn çawa dikarin di nava derdora hevalên xwe de yekitiyeke qewîn ava bikin? Di dêra xwe de? Di civaka xwe de?

# TIRSA XWEDA




Ji bo mirov jiyana xwe baş bi dawî bike, ev yek ne bi şensê mirov ve girêdayiye, meseleyeke hilbijartinê ye.

Weke ku Nivîsên Pîroz me hişyar dikin, li dinyayeke ku hin bawermendan berê jidil û can bawer dikirin ku îcar aniha ji baweriya xwe qetiyane, hûn dikarin baweriyeke ku heta dawiyê xwe bigire ava bikin. Hûn çawa dikarin? Hûn dikarin di jiyana xwe de tirseke Xweda ya bi tenduristî û pîroz bi pêş bixin.

Di "Tirsa Xweda" de John Bevere we vedihewîne ku hûn xelasiya xwe bi rêzgitin û tirsê re çalak bikin ku bi nêrîneke din lê binêrin bê tê çi wateyê, ev term di nav dêrên roja me de bi awayekî zêde hatiye paşguh kirin. Hûn ê kifş bikin bê tirsa pîroz çawa ye:


- Mifteya têkiliyeke jidil ya bi Xweda re ye.
- We ji hemû tirs û endîşeyan xelas dike.
- Berê we dide zanîn û têgihiştina rast.
- Ji bo banga Xweda di jiyana we di bi cih bike, pêdivî pê heye.
- We ji xapandin û tavîzê diparêze.

Bi vê peyama ku gefa lê dixwîne û îkna dike, we divê we nû dabe dû şopa Wî, we divê di beşeke mezin ya jiyana xwe de hûn bi Wî re meşiyabin, ferq nake, hûn ê di têkiliya xwe û Xweda de teqez geşbûnekê bijîn.

Di vê malperê de heye: MessengerX

# NÊZÎ XWEDA

*Jiyaneke nêzî Xweda*




Gelek caran Nivîsên Pîroz ji me re diyar dikin ku Xweda dixwaze bi me re pêwendiyeke nêzîk deyne. Gava em nêzîkî Wî bibin, em ê bibînin ku hebûna Giyanê Pîroz tecrîbeyeke herî bi heyecan(kelecan) û bi enerjiyeke veguherîner e ku heta niha me tu carî nedîtiye. Xwestina tiştekî ku em bi kêmasiya wê nizanin zehmet e. Mixabin gelek ji me qîma xwe bi pirşengiyeke rijî ku ji ol û aqil bêrî û ji nêzîkbûneke Xweda bêpar tînin.


Em hewl didin ku pîrozbûna Xweda di ser guhên xwe re biavêjin û bê ku em jiyana xwe paqij bikin em hêvî dikin bi Giyanê Wî bên dagirtin. Lê em hatin afirandin ku bi Xweda re nêzîkatiyeke hevpar deynin.

Vexwendina nûwaze ya Afrînerê gerdûnê ne ku tenê hebandina ji dûr ve ya bi gotin û ritûelên ji dûr ve em dikin. Herwiha ew naskirina dilê Wî yê ji nêz ve ya bi pêwendîdanîna watedar e.

Di vê malperê de heye: MessengerX

# MessengerX

***Ji bo her kesî û li deverî rêwitiya ku xwendekarekî ava bike***





- **Ji 130 zimanan zêdetir bêpere ye.**
- Weke sepanê û weke online mirov dikare pêde bike.
- Çavkaniyên ji bo hûn xwe bi pêş bixin.
- Paşeroja xwe û rêwitiya xwendekariya xwe bişopînin.



Ji bo hûn di hemû cîhazan de temaşe bikin, bixwînin an jî guhdar bikin; e-pirtûk, pirtûkên bideng, kurte fîlm, vîdeo, Pirtûkên Pîroz û hin tiştên ji van zêdetir ku di pirtûkxaneya çavkaniya xwendekaran ya Messenger'ê de cih digire, ji bo hûn xwe bigihînin wan serdana wê bikin.

**MessengerX.com**




Daxîne ji ser App Store

Werbigire ji ser Google Play

Li temamê dinyayê di App Storê û Google Playê de

## Derbarê patron an jî rêberekî ku hûn ne di heman fikrê de ne bê hûn ê çawa bertekê bidin wan, hûn qet ji ber vê tewşomewşo bûne gelo? Hûn meraq dikin bê çima divê hûn li wan guhdar bikin?

Di vê tundiya rezîrve û guncav bûye de, nivîskarê ku pirtûkên wî pir tên firotin John Bevere, ji bo nifşekî nû ku ji nû ve tîne ziman ku li ser sînorên parastinê yên ku Xweda bi rêya kesayetên xwedî rayedar peyda dike. John, eşkere dike bê ka dijmin çawa şiyana me ya naskirina rayedariya Xwedê û rayedariya ku hatiye dewirkirin xera dike û ew çawa me manîpule dike ji bo ku em bawer bikin ku banga me ya rastîn tenê di dûrketina ji rêbertiya xwedayî de ye. John fêrî me dike bê ka em çawa bi rêkûpêk bi serokatiyê re têkiliyê deynin û nîşan dide ku jiyankirina di bin rayedariyê de bi xwe re avakirin, parastin û hêviyê ji bo pêşerojê tîne.

Di Bin Rayedariyê De, wê alîkariya we bike ku hûn van kifş bikin:

- Di rewşeke ku hûn bi temamî mafdar in, hûn çawa dikarin nehêlin ku hûn xwe nexin rewşeke ku neheqî li we bibe.
- Li gorî Pirtûka Pîroz rêya li ser muameleya neheq û bi temamî têkbirina wê.

Bi beşeke nipînû, pirsên nîqaşê û mijarên derdikevin pêş re Di Bin Rayedariyê De, pirtûkek e ku jiyanê digiherîne û girêdana bi rayedariya Xweda re û pratîka girîngiya bertekên ku em nîşanî rêberên di jiyana me de ne didin.



**JOHN BEVERE**, axêverek e ku di qada navneteweyî de bi awayekî wêrek û bêyî ku ji Gotina Xweda tawîzê bide tê nasîn û nivîskarek e ku di vê qadê de pirtûkên wî herî pir tên firotin. John û xanima wî Lisa, xizmetkar û avakarên Messengera Navneteweyî ne ku jiyana xwe dane vî karî ne ku jiyana xwe bexşî vê qadê kirine ku pê re jiyanên me guhertine û tu carî di vê mijarê de tawîzê nadin. Gava li mala xwe ya li Kolorado'yê dimîne, dibe ku hûn John gava ku bi malbata xwe re bi qelemaçan (kaxetan) dilîze an jî li ber xanima xwe Lisa digere ku wê bibe bi golfê bilîzin, bibînin.

Ji bo hûn belaş vîdeoyan temaşe bikin û wan daxînin, serdana malpera **MessengerX.com**'ê bikin.

MessengerX

Messenger INTERNATIONAL

Ev pirtûk diyariya nivîskar e û nayê firotin.

Ji bo agahiyên zêdetir vir bidin xwendin: